

K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

QEWLÊ HESPÊ REŞ
(Metn û Lêkolîn)

Ayhan YILDIZ
12711018

ŞÊWIRMEND

Doç. Alk. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn – 2015

K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

QEWLÊ HESPÊ REŞ

(Metn û Lêkolîn)

Ayhan YILDIZ

12711018

ŞÊWIRMENDÊ TEZÊ

Doç. Alk. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn – 2015

TC
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

QEWLÊ HESPÊ REŞ
İnceleme-Metin

Ayhan YILDIZ
12711018

Danışman
Yard. Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mardin 2015

JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî de wekî Teza Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok :

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn ên endamên hîndekariyê yên navborî ne.

Îmze

.....

Nasnavê Akademîk, Nav-Paşnav
Rêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

NAVEROK

| | |
|---|------|
| NAVEROK | ii |
| KURTE..... | vii |
| ÖZET | viii |
| SUMMARY | ix |
| PÊŞGOTIN | x |
| KURTEBÊJE..... | xii |
| DESTPÊK | 1 |
| 1. Wateya Peyva “Xezaname”yê | 2 |
| 2. Kurtedîroka Kevneşopî ya “Xezaname”yê | 3 |
| 3. Mijarên Naverokî yê Xezanameyan | 5 |
| 4. Di Edebiyata Neteweyên Îslamî de Çeşnê Xezanameyan | 5 |
| 4. 1. Xezaname di Edebiyata Erebî de | 6 |
| 4. 2. Xezaname di Edebiyata Farisî de..... | 7 |
| 4. 3. Xezaname di Edebiyata Turkî de..... | 8 |
| 5. Çeşnê Xezanameyan di Edebiyata Kurdî (Kurmançî) de | 9 |
| 5. 1. Qewlê Newala Sîsebanê | 10 |
| 5. 2. Qewlê Hespê Reş | 11 |
| 5. 3. Şerê Bulxar û Yunanan | 12 |
| 5. 4. Şerê Êrus | 12 |
| 5. 5. Şerê Kopê..... | 12 |
| 5. 6. Çekameya Şoreşa Bidlîsê | 13 |
| 5. 7. Huseynê Kurdîşah | 13 |
| 6. Cengname..... | 13 |

| | |
|---|-----------|
| BEŞA YEKEM | 17 |
| QEWLÊ HESPÊ REŞ | 17 |
| 1. Ji Aliyê Ruxsariyê ve Qewlê Hespê Reş | 17 |
| 1. 1. Kêşa Qewlê Hespê Reş | 17 |
| 1. 2. Şemaya Qafiyeyên Berhemê | 20 |
| 1. 3. Redîfên Berhemê..... | 20 |
| 1. 4. Qafiyeyên Qewlê Hespê Reş..... | 21 |
| 1. 4. 1. Qafiyeya tam | 21 |
| 1. 4. 2. Qafiyeya dewlemend | 22 |
| 1. 4. 3. Qafiyeya nîv | 23 |
| 1. 5. Hunerên Edebî yên Peyvan..... | 23 |
| 1. 5. 1. Hunera Teşbîhê | 23 |
| 1. 5. 2. Hunera Îstiare..... | 24 |
| 1. 5. 3. Hunera Tenasubê | 24 |
| 1. 5. 4. Hunera Telmihê..... | 25 |
| 1. 5. 5. Hunera Tekrîrê..... | 26 |
| 1. 5. 6. Hunera Întaqê..... | 27 |
| 1. 5. 7. Hunera Tezatê | 27 |
| 1. 5. 8. Hunera Teşxîsê | 27 |
| 1. 5. 9. Hunera Mubalexeyê | 28 |
| 1. 5. 10. Hunera Îrsalê Mesel | 29 |
| 1. 5. 11. Hunera Nîdayê..... | 29 |
| 1. 5. 12. Hunera Mecazê Mursel..... | 30 |
| 1. 6. Hunerên Edebî yên Dengan | 30 |
| 1. 6. 1. Hunera Alîterasyonê | 30 |
| 1. 6. 2. Hunera Asonansê..... | 31 |
| 1. 7. Avasaziya Nezmî ya Metnê Berhemê | 31 |
| 1. 7. 1. Komrêzên Beytî | 32 |
| 1. 7. 2. Komrêzên Sêrêzî..... | 32 |
| 1. 7. 3. Komrêzên Çarrêzî | 32 |
| 1. 7. 4. Komrêzên Pêncrêzî | 33 |

| | |
|--|-----------|
| 2. Ji Aliyê Naverokê ve Qewlê Hespê Reş | 33 |
| 2. 1. Zihniyeta Berhemê | 33 |
| 2. 2. Avasaziya Hêmanî ya Metnê Berhemê | 41 |
| 2. 3. Tema û Mijara Berhemê | 51 |
| 2. 4. Ziman û Vegotina Berhemê | 59 |
| 2. 4. 1. Awayê Çavnêrîna Vegoter | 59 |
| 2. 4. 2. Nîşaneyên Kurmanciya Behdînanê | 60 |
| 2. 4. 3. Bandora Zimanê Erebî | 61 |
| 2. 4. 4. Bandora Zimanê Farisî | 63 |
| 2. 4. 5. Bandora Zimanê Turkî | 64 |
| 2. 4. 6. Bandora Zimanê Biyanî | 64 |
| 2. 5. Kevneşopiya Edebî ya Metnê Berhemê | 66 |
| 2. 5. 1. Cûreyê Kevneşopiya Edebî ya Metnê Berhemê | 67 |
| 2. 5. 2. Motîfên Dîrokî yên Berhemê | 74 |
| 2. 5. 3. Hêmanên Mîtolojîk ên Berhemê | 76 |
| 3. Tertîba Qewlê Hespê Reş | 82 |
| a. Wada Cenabê Pêxember bo înana Hespê Reş | 82 |
| b. Tercîha Hz. Umer a bo çûna hespî | 83 |
| c. Çûna Hz. Umer a nav welatê ne-musliman | 83 |
| d. Hewldanên Hz. Umer bo kirîna hespî | 83 |
| e. Alîkariya Keşe | 84 |
| f. Zalimiya mîrê bajêr | 85 |
| g. Hevkariya Keşe û keça wî digel Hz. Umerî | 85 |
| h. Şhadeta Leymûn û Keşe | 86 |
| i. Pêşîrtengiya Hz. Umer di dêrê de | 87 |
| j. Hawarxwestina Hz. Umer ji sehabîyan | 88 |
| k. Hatina hawarê û şerê li hember şervanên mîr | 89 |
| l. Biserketina şervanên Musliman û têkçûna şervanên mîrê Xiristiyan | 89 |
| m. Dua | 90 |

| | |
|--|-----|
| BEŞA SÊYEM | 92 |
| DANASÎNA NUSXEYÊN DESTXET Û ÇAPKIRÎ YÊN QEWLÊ HESPÊ REŞ | 92 |
| Destpêk | 92 |
| 1. Nusxeyên Destxet | 93 |
| 1. 1. Nusxeya Zeynelabidîn Amedî | 93 |
| 1. 2. Nusxeya Petersburgê | 95 |
| 2. Nusxeyên Çapkirî | 98 |
| 2. 1. Çapa Varlı | 98 |
| 2. 2. Çapa Kovara Sirwe | 100 |
| 2. 3. Çapa Mihemed Emîn Osman | 102 |
| 2. 4. Çapa Mela Îsmet | 103 |
| 3. Hilberîvanê Eslî yê Qewlê Hespê Reş | 104 |
| 4. Elî Herîrî | 107 |
| 4. 1. Jiyana Wî | 107 |
| 4. 2. Serdema Wî | 107 |
| 4. 3. Nasnavên Wî | 109 |
| 4. 4. Kesayetiya Wî ya Edebî | 110 |
| 4. 5. Berhemên Wî | 111 |
| 2. 1. Qewlê Hespê Reş | 111 |
| 2. 2. Helbestên Wî | 111 |
| 2. 3. Dîwana wî | 115 |
| METNÊ BI KRÎTÎK | 116 |
| A) Rastnivîs û Xalbendî | 116 |
| B) Kêş | 117 |
| C) Alabeya Transkripsiyonê | 118 |
| METNÊ HÎKAYEYA HESPÊ REŞ (BORÊ QER) | 121 |
| ENCAM | 151 |

SÛRETÊN NUSXEYÊN QEWLÊ HESPÊ REŞ.....152

WÊNE:DÊRA ZERCEL / Menastıra Kiryakus (Navbera Batman û Bişêriyê) Hata! Yer işareti tanımlanmamış.

ÇAVKANÎ..... Hata! Yer işareti tanımlanmamış.



KURTE
QEWLÊ HESPÊ REŞ
AYHAN YILDIZ

Berhema *Qewlê Hespê Reş* ku bi çeşnê xwe yê edebî, weke xezanameyeke edebiyata Kurmancî ya serdema Îslamî tê qebûl kirin, di nav gel de, li gelek hêlên cihê cihê yên welêt, bi awayên cihê rengî hatiye vegotin. Mijara vê berhemê, li ser Muslimanbûna hespekî mîtolojîk e. Hz. Muhemmed, pê dihesa ku hespekî Musliman di destê Mîrekî Fileh de heye û ew hesp dixwaze ku bê ber destê Pêxember. Lewre rojêke îne ji sehabiyên xwe re dibêje ka kî dikare vî hespî bîne? Hz. Umer dibêje ez dikarim. Êdî li ser vê yekê Hz. Umer diçe ku wî hespî bîne û şer di navbera wan û şervanên Mîr de derdikeve. Keşeyekî ku birayê Mîr e, digel ku alîkariyê dide Hezretî Umer jî, di dêrekê de rewşa wan dikeve xeterê, çivîkeke efsaneyî ku hehecîk e, radibe xeberê digihîne Cenabê Pêxember. Hz. Ebbas, Hz. Hemze, Hz. Usman, Hz. Ebûbekir û Hz. Elî jî, bi hespê xwe yê bi navê Duldul, tê hewara Hz. Umer. Piştî şerekî dijwar, şervanên Mîrê Ehlê Kîtab ên Xiristîyan têk diçin û şervanên Musliman, vî hespî dibin bajarê Medîneyê.

Li hin ciyan, ji destxetên berhemê yên bi alfabeya latînî diyar e ku derbasî nivîsê jî bûye. Ev xezanameya siruştî ya menzûm, ji hêla motîfên edebiyata devkî ya kurdî ve, balê dikşîne. Digel ku heta niha, hilberînerê vê berhemê, ji aliyê hin lêkolerên edebiyata kurdî ve, weke Elî Herîrî û Feqiyê Teyran hatiye diyarkirin jî, wihareng e ku navê Ehmedê Xanî jî weke berhemdarê wê, derbas dibe. Her wiha li gor hin kesan jî ev berhem, ji aliyê Mela Xalidê Zebarî ve hatiye nivîsîn.

Bêjeyên Sereke: Qewl, Qewlê Hespê Reş, xezaname, cengname, efsane, serdemên dîrokî yên edebiyatê

ÖZET
QEWLÊ HESPÊ REŞ
AYHAN YILDIZ

Bir İslamî dönem Kürt edebiyatı, manzum ve doğal gazanamesi olan bu eser, halk arasında sözlü anlatım geleneğinde yaşam bulmuştur. Konusunu, İslami ilk dönem tarihi ve dini bir olaydan almıştır. Ehl-i Kitab olan bir “Mîr”in elinde, mistik özellikleri olup müslim olan “Hespê Reş” -diğer adıyla Borê Qer- adında bir at vardır. Bu at, Cenabê Peygamber’e iman etmiştir. Halife Hz. Ömer, bu atı Hristiyan olan Mîr’den almak için, onların memleketine gelir ve bir şekilde Peygambere götürmek ister; ancak Hristiyan Mîr, buna müsaade etmez ve aralarında savaş çıkar. Mîr’in kardeşi olan Rahip de, Hz. Ömer’e yardımcı olur; ancak yine de başaramazlar. Efsanevî bir kuş, Cenabê Peygamber ve ashabına, Hz. Ömer’in zor durumda olduğunu haber verir. Onlardan da, Hz. Ali, Hz. Osman, Hz. Hamza, Hz. Abbas, Hz. Ebûbekir yardıma gelir ve büyük bir savaş sonunda bu atı almayı başarırlar; atı alıp Medine şehrine götürürlər. Bu eserin çeşitli yörelerde, halk arasında sözlü anlatımının yanında, birkaç yazılı nüshası da vardır. Kürt edebiyat araştırmacılarının bazıları, bu nüshaların Elî Herîrî’ye, bazıları Feqiyê Teyran’a, bazıları Mela Xalidê Zebârî’ye, bazıları da Ahmedê Xanî’ye ait olduğunu yazmıştır.

Anahtar kelimeler: Qewl, Qewlê Hespê Reş, gazaname, cengname, efsane, edebiyatın tarihi dönemleri

SUMMARY

Abstract

QEWLÊ HESPÊ REŞ

Qewlê Hespê Reş is an oral Kurdish epic written in verse at the Islamic period. The subject of the epic covers the early period of Islam and a religious event. A Christian “Mir” has a Musliman horse that has mystic features named “Hespê Reş” –also called Borê Qer. This horse believed Prophet Muhammad. According to the epic, Omar travels to the land of Mir with the son of Ali, Muhammad Hanife, to take the horse and give it to the Prophet; however, Mir does not agree and a dispute occurs among them. The brother of Mir, who was a Priest, also helps Omar but he does not succeed. A legendary bird informs the Prophet that Omar was in trouble. With the help of Ali, a great war takes place and they manage to take the horse to Medina. This literary work has oral versions as well as written versions in some regions. There is no agreement among Kurdologists about the author of the epic. Elî Herîfî’, Feqiyê Teyran, Mela Xalidê Zebârî, and Ahmedê Xanî are believed to be the author of the epic according to some Kurdologists.

Key Words: Qewl, Qewlê Hespê Reş, Epic, legend, periods of literary history, natural epics, artificial epics.

PÊŞGOTIN

Lêkolînên li ser edebiyata kurdî van salên dawî bi awayekî fermî di hin zanîngehan de didomin. Bêguman karekî pîroz e ku di her beşeke vî zimanî de tez têne amadekirin. Bi vî awayî hêvî heye ku gelek berhemên kurdî ji nediyarî û wendabûnê rizgar bibin.

Me jî di vê xebatê de berê xwe da berhema *Qewlê Hespê Reş* ku bi çeşnê xwe yê edebî, weke xezanameyeke edebiyata Kurdî (Kurmançî) ya serdema Îslamî tê qebûlkirin. Çawa ku di nav gel de, li gelek ciyên cihê cihê yên welêt, bi awayên cihêrengî hatiye vegotin, bi awayekî nivîskî jî di nav ehlê medreseyê de hatiye neqîlkirin. Bi rêçikeke akademîk em li ser vê berhemê û nusxeyên wê sekinîn û encamên ku em gihastinê jî, di encamê de hate nirxandin. Çi heye ku li ser vê berhemê, bi qasî zanîna me, heta niha xebatên wiha nehatine kirin. Ev xezaname, ji aliyê gel ve hatiye hilberîn, li gelek deverên welêt hatiye vegotin û bi derbasbûna demê re bûye anonîm. Piştî ku demeke dirêj bi ser de derbas bûye, edîbên navdar û şarezayên Kurd, ev berhem bi rêbaza edebiyata nivîskî, mayinde kiriye.

Li gor krîterên edebî, çeşnê edebî yê berhema *Qewlê Hespê Reş*, xezaname ye. Metnê wê, dişibe destana dînî jî. Bûyera wê, li ser bingeha “lehengiyê” ye. Ji serî heta binî, mêrxasî û xweşmêriya serlehengên wê ku Hz. Umer, Hz. Elî û sehabî ne, hatiye vegotin. Cengnameyeke epîk a dînî ye ku di serdema Îslambûna Kurdan de hatiye derketiye. Lewre di vê tezê de li ser cûreyê edebî yê “*Xezaname*”yan agahiyên pêwîst hatine dayin.

Di vê tezê de me ev berhem, ji hêla nusxe, hilber, naverok, mijar, çeşnê edebî, teşeyê edebî û dîroka wê ya hilberînê ve raxist ber çavan û me analîza wê ya edebî kir. Mebesta me bi amadekirina vê tezê ew bû ku em serê ewil, hilberînerê wê yê eslî tesbît bikin, destxetên wê bi awayekî rast û sehîh transkrîpeyî tîpên latînî bikin, peyre van nusxeyên wê bidin ber hev, kêmahî û xeletiyên ku di destxetan de derketibûn, bi rêya berawirdkirinê sererast û tekûz bikin.

Di “Destpêk”ê de cî ji hin agahiyên di derbarê xezanameyê de hatiye veqetandin. Bi kurtî behsa wate û taybetiyên xezanameyan hatiye kirin û peyre li ser xezanameyên dunyayê û xezanameyên Kurdan agahî hatine dayin; peyre têkiliya vê berhemê, bi “*xezaname*”yên dî re jî hatiye danîn û behsa wan jî hatiye kirin. Di dawiyê de jî, ji ber ku têkiliya cûreyê cengnameyan bi xezanameyan re hebû, me pêdivî dît ku li ser cûreyê cengnameyan jî hin agahiyên pêwîst derbibirin.

Beşa yekem, derbarê cûreyî edebî yê *Qewlê Hespê Reş* de ye. Berhem, ji hêla rûxsarî û naverokî ve hatiye nikirandin. Taybetiyên rûxsarî, bi tevî redîf, serwa û pergala qafiyeyê hatine raxistin. Ji hêla naverokê ve jî zihniyeta serdema berhemê, kevneşopiya edebî ya berhemê, avasaziya hêmanî ya berhemê û mijara wê hatiye vegotin. Di pey re, li ser hêla wê ya ziman û vegotinê hatiye rawestan.

Di beşa duyem de nusxeyên wê yên cihê cihê hatine destnîşankirin û li ser wan agahî hatine dayin. Nisbeta *Qewlê Hespê Reş* bêtir bi kîjan şairî ve zeximtir hatiye dîtin, ew hatiye diyarkirin.

Beşa sêyem, li ser berawirdkirina nusxeyên berhemê ye. Di vê beşê de bi rêya “Edîsyon Krîtîk” du nusxeyên ku nisbeta wan bi Elî Herîrî ve hatiye kirin, hatine berawirdkirin. Li gor nusxeyan, kîjan rêzik rast, an xelet in, di jêrenotan de hatine destnîşankirin. Her wiha guhertoyên berhemê, yên devkî û nivîskî li gel hev hatine berawirdkirin. Ji ber ku ev xezanameya *Qewlê Hespê Reş* xwedî du hêlan bû, ango hem aliyê wê yê edebiyata klasîk hebû, hem jî berhemeke wisan bû ku bi gelek guhertoyên xwe, di edebiyata gelêrî de cî girtibû, me ew metnên wê yên gelêrî jî, da ber metnên nivîskî yên klasîk û li gor kronolojiya rûdana wê ya bûyeran jê, metnekî xweser deranî.

Di amadekirina vê xebatê de gelek mamoste û seydayan alîkarî da min. Di serî de ez dixwazim malavahî bidim şewirmendê xwe Mamoste Dr. Hayrullah Acar. Bi xêra pêşniyaz û rêlibervekirinên wî, me ber xwe dît ku em bi metodeke modern bi ser vê berhemê ve vebin. Her wiha keda mamoste Doç. Dr. Abdurrahman Adak jî gelek heye. Wî malî ava be. Seyda Mela Zeynelabîdîn Amedî, bi awayekî gelek zêde camêrane destxeta xwe da min û bi ser de jî îzîn da ku em transkrîpe bikin. Prof. Dr. Kadri Yıldırım, nusxeya Petersburgê ji arşîva zanîngehê da me. Mamoste Zulkuf Ergun jî di tercîhkirina tezê de alîkarî bi me re kir. Ji Dr. M. Zahir Ertekin re jî gelek spas dikim ku di merheleya amadekirina tezê de wî alîkarî da me û nusxeya Mihemed Emîn Osman, wî bi xwe ji me re şand. Alîkariya mamoste Zafer Acar jî gelek mezin bû, mala wî jî ava be. Seydayê Mela Hesenê Sofya jî rê nîşanî min da. Mela Yusûfê Pîranî û Mela Salih Cennet, di çavkaniyên Erebî de ji bo wergerê alîkariya min kiriye, mala wan ava be. Mamoste Yasîn Öner jî alîkarî da me, malî ava be. Keda Mamoste Mustafa Demir jî di lêgerîn û peydakirina materyalên tezê de çê bûye, mala wî jî ava be.

Ayhan YILDIZ

Diyarbakir

KURTEBÊJE

amd. : Amadekar

bnr. : Binêrin

b.n. : Berhema Navborî

c. : Cild

ç. : Çap

DÎA : Diyanet İslam Ansiklopedisi

h. : Hicrî

h.b. : Heman berhem

h.m. : Heman meqale

hwd. : Her wekî din

j. : Jimare

m. : Mîrina wî/wê

r. : Rûpel

wer. : Werger

z: Zayinî

DESTPÊK

Ji ber ku edebiyata Kurdî, ji hêla tesnîfkirin cûreyên edebî ve nû ye, di tesbîtkirina vê menzûmeyê de jî ev zehmetî derket pêşiya me. Heta di edebiyata Turkî de jî ev “lihevnekirina” tesnîfa cûre û teşeyên edebî heye. Lewre cûreyê berhema *Qewlê Hespê Reş*, di dirûv û teşeyê “xezaname” de hatiye hilberîn; bes bi gelek aliyên xwe dişibe “cengname”yê jî. Ev sedemê ku me nekarî bi awayekî vebir cûreyê edebî yê vê menzûmeyê diyar bikira ew bû ku di edebiyata Erebî de ev cûre berhem bi navê “mexazî” hatine hilberîn; lê di edebiyata Îran û Osmanî de, bi navê “cenk-name” hatiye binavkirin. Li gor tarîfên ber destê me, ew herbên ku di weqta Cenabê Pêxember de pêk hatine, di edebiyata Erebî, Farisî û Osmanî de, bi navê “xezaname” hatine binavkirin; îca ew herbên ku lehengiya Hz. Elî derdidixin pêş, bêtir bi navê cengnameyê hatine binavkirin. Ku em li piraniya nusxe û versiyonên *Qewlê Hespê Reş* dinêrin, em dibînin ku di hin metnan de Cenabê Pêxember jî weke lehengekî vê herbê ye; lê di hin versiyon û nusxeyên nivîskî de, bêtir qehremaniya Hz. Elî derketiye pêş. Lewre hem aliyê wê yê cûreyê xezanameyî heye, hem jî aliyê wê yê cûreyê cengnameyî...

Ji ber ku cûreyê edebî yê vê berhemê, bi giranî xezaname ye, serê ewil em dê behsa raveya xezanameyê, taybetiyên xezanameyê û kurtedîroka kevneşopî ya xezanameyan di edebiyata dunyayê û Kurdan de bikin. Peyre em dê li ser taybetiyên *cengnameyan* rawestin.

Ev berhemên dînî ku mijara wan rizaya Xudê, hezkirina Pêxember, Hz. Elî û sehabiyên Cenabê Pêxember in, di edebiyata Kurdî ya Klasîk de xwedî hin taybetmendiyên dîrokî, çandî û civakî ne. Ev cûre berhemên edebiyata dînî, di wê serdemê de hatine hilberîn ku dîne Îslamê hîna nû ketiye nav civaka Kurdan û hozanên wan ên şareza, ev cûre metnên edebî pev xistine. Lewre cûreyê metnên berhemên edebî yên ku di edebiyata Erebî de navê wan “mexazî” ye û di edebiyata gelên mîna Faris, Kurd û Turkan de cengname ne, ji du milan ve ketine geşedana vegotinê: Milê devkî û milê nivîskî. Di edebiyata Kurdî de maweya/demajoya dîrokî ya vî cûreyê edebî, di van merheleyan de derbas bûye. Metnên ku ji hêla hozanên gel ve bi awayê devkî hatine hilberîn, bi derbasbûna demê re bûne anonîm û piştî ku şairekî şareza û ew bihîstine, ew bi awayekî tekûz berhev kirine û derbasî nivîsê kirine. Piştî ku di nav nifşê medreseyan de geriyane, îca feqî yan jî melayan, ew ji xwe re ji ber wan îstînsax kirine û li nev gel belav kirine.

1. Wateya Peyva “Xezaname”yê

Ev peyva xezanameyê, ji zimanê Erebi û Farisî ketiye edebiyata Kurdî. Koka peyva “gezawatnameyê, “geza” ye ku bi eslê xwe Erebi ye û tê wateya herbê. Xezawat, pirjimariya peyva “geza”yê ye. Peyva “geza”, yekjimariya peyva “gezawat”ê ye. Wateya wê, çûna cengê û îcrakirina herbê ye. Peyre ev peyv, bi wateya cîhadê hatiye bikaranîn. Cîhad jî ew herb e ku di rêya Xudê de li hember dijminên dîn tê kirin. Ev têgih, hîn bêtir digel wateya xwe diyar berbelavî bûye. Lewre navê wan berhemên ku herba li hember dijminan vedibêjin “gezaname” yan jî “gezawatname” hatiye danîn. Di berhemên ku navê wan “gezaname” ye de, yek herbek tenê tê vegotin. Ji wan berhemên ku zêdetirî herbekê tê de hatiye derbirîn re, “gezawatname” tê gotin.¹

Peyva “xezaname” ji aliyê xwe yê avasazî ve, ji ber ku ji du peyvan pêk hatiye, peyveke hevedudanî ye. Peyva “xeza” û peyva “name” gihîştine hev û di wateyê nû de peyva “xezaname” derketiye. Peyva “name” ku hatiye serê, di edebiyata Turkî de weke peyveke Farisî hatiye qebûl kirin; bes di edebiyata Kurdî de ev peyva “name” îro, di wateya “mektûb”ê de tê bikaranîn. Digel vî awayî, ev peyva “name” di zimanê Kurdî de jî gelek tê bikaranîn. Çend mînak: Rojname, gername, bawername, salname.

Berhemên xezanameyî, tenê ne bi terz û teşeyê nezmî hatine nivîsîn; hem bi awayê nezmî, hem jî bi awayê pexşanî/nesrî hatine nivîsîn. Li gor vê, wateya wê ya duyem wiha ye: “Ew berhema menzûm û mensûr/pexşanî ye ku lehengî û herbên fermanarekî mezin vedibêje.”²

Li gor hin zanayên dîroka Îslamê, tenê ji wan herbên ku Cenabê Pêxember beşdarî wan bûye re “xeza” hatiye gotin û wateya wê wiha ye: “Hejmara esker çî hindik be çî jî zaf be, esker, çî ji bo şerî be, çî jî ji bo mebesteke dî be û di vê seferê de çî şer biqewime çî neqewime, ji hemû seferên ku Cenabê Pêxember bi xwe beşdar bûye re, gezwe tê gotin. Pirjimariya vê peyvê, “gezawat” e. Îca ji wan yekîneyên eskerî ku Cenabê Pêxember bi xwe beşdar nebûye; lê belê sehabiyekî xwe weke fermanar daye ser yekîneyê eskerî û ew şandiyê şerî re, “seriyye” tê gotin. Li gor dîrokzanên Îslamê, bîst û heft gezwe di bin femandariya Cenabê Pêxember de pêk hatine: Ebwa, Buwat, Bedrulûla, Sefewan, Zul-Uîeyre, Bedr, Benî Qeynûka, Sewik, Qerqeretulqudr, Xetefan, Benî Suleym, Uhud, Hemrulesed, Benî Nedir, Bedrul Mew’id, Zatur-Rîqa, Dummetul Cendel, Mureysî, (Benî Mustelîq) Xendeq, Benî Qureyze, Benî Lihyar, Xabe, Hudeybiye, Xeyber, Fetha Mekkeyê,

¹ Mustafa Erkan, “Gazawatname” DÎA, İstanbul, 1996, c. XIII., r. 439.

² Ferit Develioğlu, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 2012, r. 326.

Huneyn, Taîf û Tebûk. Di nav van de tenê di neh seferan de pevçûn qewimiye. Yên ku di wan de şer qewimiye, me navê “herb”ê lê daniye; yên ku şer di wan de neqewimiye, me ew bi navê taybet ê seferê, bi “xezwe”yê bi nav kirin.”³

2. Kurtedîroka Kevneşopî ya “Xezaname”yê

Dema ku di herba Huneynê de şervanên Hewazin ên muşrik, êrîşî ser sehabiyan dikin û sehabî dişkên, ji bilî komeke hindik, di nav wî 12 000 mucahîdî de kes li dor Cenabê Pêxember li ber xwe nade û piraniya wan direvin. Li ser daxwaza Resûlê Xudê, Hz. Ebbas bi awayekî hunerane bang li Ensar û Muhaciran dike da ku bên piştgiriya wan. Ha meriv dikare vê banga hunerî ya Hz. Ebbas, weke dendikeke çeşnê xezanameyan bihesibîne. Wî wê rojê wiha bang li sehabiyan kiribû:

“Gelî hevalên Bi’eta Roja Hudeybiyeyê! Gelî hevalên sûreta Beqere! Hûn wan wisan pêşwazî bikin, mîna deveya ku diçe ser saka/torim xwe! Bi vî awayî hemlan bibin ser dijmin û bi şerekî dijwar şer bikin!”⁴

Di nav sehabiyan Cenabê Pêxember de, baweriyeke xurt hebû ku digel jidevkirina ayetên Qur’anê, qeydkirin û mînakgirtina her peyv, tevger û helwestên Resûlê Xudê, diviya di jiyana rojane de bihatina pêkanîn. Seneda wan jî ayeta 21ê ya *sûreta Ehزاب* bû:

“Bê guman ji bo we, her di Resûlellah de mînakeke xweş heye, ji bo wan ên ku hêvîdarê Ellah û roja axretê ne û Ellah zaf zikir dikin.”

Ev ayet jî, weke sedemekî derketina çeşnê xezanameyan dibe ku bête qebûlkrin.

Mînakên ewil ên vî çeşnê edebî, di edebiyata Erebi de hatine dayin. Di vê edebiyatê de ji van berhemên vî çeşnî re “megazî” hatiye gotin. *Kitabu’l Megazî* ya Waqidî (wefat. 207/822-23), navdartirîn berhem e di vî çeşnî de. Di edebiyata Turkî de gezawatname, pirtir bi awayê menzûm û di terz û teşeyê mesnewiyan de hatine dayin. Ji hêla mijarê ve, ew qas ferqa wan ji “zafername” û “fetihname”yan tune ye. Binavkirina wan a bi vî navî, ji ber tercîha muellifê wan e. Hin kes, dîroka van metnên edebî yê mîna gezaname, gezawatname, fetihname û zafernameyan, dibin digihînin serdema Selçûkiyan û wan berhemên bi navê *Danişmendname* û *Battalnameyan* ku aliyê wan ê destanî zeximtir e jî, digrin bin sernavê çeşnê gezawatnameyan. Çi heye ku ev *Danişmendname* û *Battalname*, xwedî hêmanên destanî ne û aliyê wan ê destanî xurttir e. Lewre ew ji ber vî aliyê xwe, ji çeşnê xezawatnameyê vediqetin. Xezanameyên ku herbekê yan jî seferekê teswîr dikin, hin zanîn û

³³ İbrahim Sarıçam, Hz. Muhammed ve Evrensel Mesajı, DİB Yayınları, Ankara, 2002, r. 151-152.

⁴ Muhammed Rıza, Muhammed Resûlellah Sellellahu ‘Eleyhî Wesellem, El Mektebetu’l İslamiyyetî, Qahire, 1996, r. 325-328.

agahiyên kitekitî didin û ji vî aliyê xwe ve, valahiyên kronîk ên Osmanîyan dadigrin. Di van berheman de, bi giştî ew kesê ku xezayekê pêk tîne, bêtir li pêş tê girtin û bûyer, li dormedora wî kesî tê vegotin û dikeve geşedanê. Ha ferqa herî mezin a di navbera wan û fetihnameyan de ev hêla wan e.⁵

Di edebiyatê de bi awayekî zelal û vebir tesnîfkirina cûreyên edebiyata klasîk, wisan ne reht e. Li gor Ali Öztürk, di edebiyatê de bi awayekî tam ji hev veqetandin û tesnîfkirina çeşn û teşeyan, ne rehet e û hîn jî di edebiyata Turkî de li ser mijara tesnîfa cûre û teşeyên edebî, lihevkerin pêk nehatiye.⁶ Ji ber vê yekê, cûreyê edebî yê *Qewlê Hespê Reş* bi awayekî tam nakeve bin sernavê “xezaname”yê bi tenê; bes aliyê wê yên cûreyê “cengname”yê jî heye.

Di edebiyata Turkî de Agah Sırrı Levend, li ser çeşnê xezawatnameyan, bi berhema xwe ya *Gazavat-nameler ve Mihaloğlu Ali Bey'in Gazavat-namesi* xebata herî berfireh kiriye.⁷ Piştî ku me li gor derfetên xwe li ser xezaname û cengnameyên edebiyata Turkî lêkolîn kirin, em gihîştin wê baweriyê ku bi nav û mijara *Qewlê Hespê Reş* ne cengname, ne jî xezaname tune ye; lewre em dikarin diyar bikin ku ev cengname yan jî xezanameya Kurmancî, ji edebiyata Turkî nehatiye wergerandin.

Di edebiyata Farisî de jî kevneşopiya çeşnê xezanameyê heye. Bi navê *Behcet'ut-Tewarîx* berhemeke siyerê heye ku ji aliyê Şukrullah ve, hatiye nivîsîn. Îdrîsê Bidlîsî jî bi navê *Heşt Bihîşt* berhemek nivîsiye ku dikeve nav çeşnê xezanameyan.⁸ *Gazaname-i Rûm* a Kaşîfî weke berhemeke xezanameyî ya edebiyata Farisî tê hesabandin.⁹

Engin Yılmaz, ew berhemên ku herbên yekî ji egîten Îslamî yên mîna Cenabê Pêxember, Hz. Elî û Xalid bin Welîd ji xwe re kiriye mijar, xistine nav çeşnê xezawatnameyê. Lewre li gor wî, divê ku berhemên mîna xezawatê Nebî, xezawatê Qisseyên Muqefe û Hemzename, weke mînakên ewil ên çeşnê xezawatnameyan bêne hesabandin.¹⁰

⁵ Mustafa Erkan, “Gazavatname” DİA, İstanbul, 1996, c. XIII., r. 439.

⁶ Ali Öztürk, “Dini Tür ve Konular”, Türk İslam Edebiyatı, (Hazırlayanlar: Heyet; 9. Ünite) T.C. Anadolu Üniversitesi Yayını, Ankara, 2013, r. 209.

⁷ Mustafa Erkan, “Gazavatname” DİA, İstanbul, 1996, c. XIII., r. 440.

⁸ Gurol Pehlivan, “Varna Savaşı ve Bir Tarih Kaynağı Olarak Gazavatnameler, *Turkoloji*, http://www.turkoloji.cu.edu.tr/GENEL/gurol_pehlivan_varna-savasi_gazavatnameler.pdf (01.09.2015)

⁹ Gurol Pehlivan, “Varna Savaşı ve Bir Tarih Kaynağı Olarak Gazavatnameler, *Turkoloji*, http://www.turkoloji.cu.edu.tr/GENEL/gurol_pehlivan_varna-savasi_gazavatnameler.pdf (01.19.2015)

¹⁰ Şahin Kürşat Şamil, “Gazavatnameler Üzerine Yapılan Çalışmalar Hakkında Bir Bibliyografya Denemesi”, *Turkish Studies*, http://www.turkishstudies.net/Makaleler/1340573858_63_şahinkürşatşamil_997-1022.pdf (01.09.2015)

Dîroka berhemên xezanameyî, -heke bête îsbatkirin ku cara ewil ji hêla Elî Herîrî ve hatiye nivîsîn-, diçe digîhîje sedsala XVian. *Qewlê Hespê Reş (Borê Qer)* û *Qewlê Newala Sîsebanê*, du berhem in ku hem bi awayê devkî hem jî bi rêya nivîsê gihîştine roja me.

3. Mijarên Naverokî yê Xezanameyan

Di xezanameyan de serê pêşî behsa xêra cîhadê tê kirin. Piştî sedemê ku berhem li serê hatiye hilberîn tê diyarkirin, êdî bere bere rêzebûyerên şer dest pê dikin û ew şayesandina palewanî ya lehengên herbê derdikeve pêş, lewre şair, êdî bi awayekî çê û pêt, dîmenên şer dide şayesandin. Di dawiya berhemê de serketina egîten bûyerê, bi tehereke pesindarî tê derbirîn û ji şehîdên xezayê re jî dua tê xwestin û bi Fatîheyê diqede. Di xezanameya *Qewlê Hespê Reş* de jî, di ya *Qewlê Newala Sîsebanê* de jî ev tertîb heye.

Ji aliyê mijara xwe dibe ku xezawatname, dabeşî van koman bibin:

1. Ew berhem in ku xezayên padîshahekî teswîr dikin. Îca ev jî, bi navên mîna “Selîmname” û “Suleymanname” tînin binavkirin. Lewre weke çeşnekî cihê/cuda tînin qebûlkirin.

2. Ew berhemên ku xezaya wezîrekî, yan jî femandarekî navdar tînin zimên. Mîna xezawatnameyên Barbaros Hayreddîn Paşa, Köprülüzade Fazıl Ahmed Paşa, Özdemiroğlu Osman Paşa, Mihaloğlu Ali Bey.

3. Ew berhemên ku bîdestxistina ciyekî yan jî kelehêkê digrin dest.¹¹

Zemanê berê, mijara xezawatnameyan, muwafîqî wateya tîgîhî/terîmî ya xezayê bû û li ser wan şeran bû ku li hember ne-musliman hatibûn kirin; peyre ew şerên navbera civakên Musliman jî bûn mijara xezawatnameyan.¹²

4. Di Edebiyata Neteweyên Îslamî de Çeşnê Xezanameyan

Çawa ku li jorê behs hat kirin, berhemên edebî yê xezanameyan, çî nezmî bin çî jî pexşan bin, cara ewil di edebiyata Erebî de hatine dayin. Ji ber ku piştî gelê Ereb, di dîrokê de, cara ewil gelê Îranê ketiye bin çand û medeniyeta Îslamê, piştî edebiyata Erebî, bi zimanê Farisî berhemên xezanameyî hatine dayin. Di pey edebiyata Farisî de, herî zêde bi zimanê Turkî ev cûre berhemên xezanameyî hatine dayin. Digel ku hîna em baş nizanin ka berhemên

¹¹ Mustafa Erkan, “Gazawatname” DİA, İstanbul, 1996, c. XIII., r. 439.

¹² Şahin Kürşat Şamil, “Gazawatnameler Üzerine Yapılan Çalışmalar Hakkında Bir Bibliyografya Denemesi”, *Turkish Studies*, http://www.turkishstudies.net/Makaleler/1340573858_63_şahinkürşatşamil_997-1022.pdf (01.09.2015)

xezanameyî ku bi Kurdî hatine nivîsîn jî, dîsa çend berhem li ber destê me hene ku bi Kurmancî hatine nivîsîn.

4. 1. Xezaname di Edebiyata Erebi de

Dîroknûsiya Îslamê, bi rêya karê nivîsandina “Siyer” û “Meğazî”yê dest pê kiriye. Ew bîr, bawerî û hişmendiya gelên Musliman ku wan xwestiye baş bi jiyana, herb û hemû helwest û tevgerên di yê Cenabê Pêxember bizanibin û van zanînan biparêzin û bigihînin nîfşên dahatûyê, bûye sedem ku ilmê “Siyerê” çê bibe.¹³ Di edebiyata Erebi de ji wan berhemên ku xeza û lehengiyên xaziyan derdibirin re “meğazî” hatiye gotin. Bi xêra van cûre kitêbên “Meğazî” ew hestên qehremanî yê gelên Musliman gur û geş bûne û wisan bûye ku merivê Musliman, tim ji bo xezaya li hember dijminên Îslamê şiyar û amade be. Bi ser de jî ew rûhê cîhad û polîtîkaya fethê, bi kitêbên “Meğazî”yê hatiye xwedîkirin.

Zemanê berê, ji bo têkoşînên dînî yê li hember muşrikan, peyva “cîhad”ê hatiye bikaranîn; peyre peyva “xeza”yê, bi domana demê re di vê wateyê de hatiye qebûlkirin. Xezawatname, çeşnek e ku serê pêşî, ji edebiyata Erebi ketiye edebiyata Turkî. Berê, xezawatname di edebiyata Erebi de beşek ji siyerê bûye, peyre bûye çeşnekî xweser/musteqil.¹⁴ Serkaniya eslî ya vî çeşnê edebî, helbet di serî de Qur’an e, piştî wê, hedîsên Cenabê Pêxember in. Digel van her du çavkaniyan, ew bîreweriyên sehabiyên Serdema Seadetê jî, çavkaniyên sereke ne ji bo çeşnê xezanameyan. Ev jî di wan kitêbên ku bi navê “Kutûbu Sitte” [Şeş Pirtûk] tê zanîn de hene. Çend ji wan ev in: *Sehiha* Buxarî, *Sehiha* Muslim, *Sunena* Tirmizî, *Sunena* Ebî Dawud, *Sunena* Nesaî, *Sunena* Îbn Mace, *Musneda* Îmam Ehmed, *Muwetteya* Îmam Malik, *Fedaîlu’s-Sehabetiya* Îmam Ehmed, *Sîretu’n-Nebewiyye Fî Dew’î Mesadiruha Esliyeti* ya Ustaz Doktor Mehdî Rizqullah Ehmed.

Di gelek sûretên Qur’anê de behsa xezayên sehabiyan hatiye kirin. 17 ayetên ewil ên *Sûreta Heşr*, behsa xezaya Resûlê Xudê û sehabiyan ku li hember Yehûdiyên Benî Nedir rûdabû dike. Di *Sûreta Beqere*, ayetên 190 û 194 behsa edebên xezayên Muminan dike. Di sala 6an a koçî de Resûlê Xudê, bi niyeta ‘umreyê ber bi Mekkeyê ve derketibû rê. Dema ku gihîşt tanga ciyekî nêzî Mekkeyê ku navê wê derê Hudeybiye bû, Muşrikên Mekkeyê qebûl nekir ku bikeve Mekkeyê. Li wê derê *Peymana Hudeybiyeyê* di navbera Mumin û Muşrikan de hat çêkirin. Li ser vê peymanê û helwestên sehabiyan, ev ayetên *Sûreta Beqere* hatin û

¹³ Sabri Hizmetli, *İslam Tarihçiliği Üzerine*, DİB. Yayını, Ankara, 1991, r. 49.

¹⁴ Şahin Kürşat Şamil, “Gazavatnameler Üzerine Yapılan Çalışmalar Hakkında Bir Bibliyografya Denemesi”, *Turkish Studies*, http://www.turkishstudies.net/Makaleler/1340573858_63_şahinkürşatşamil_997-1022.pdf (01.09.2015)

wiha ferman dikir: “Li hember wan ên ku li dijî we herb îlan kirin, hûn jî sirf di rêya Xudê de herbê îlan bikin; bes nebî ku hûn zêdegavî bikin, bê guman Ellah ji wan ên ku zêdegaviyê dikin hez nake.”¹⁵

Li gor *Hedîsa Şerîf* jî, mertebe, fezîlet û rûtbeya cîhadê, di nav rîknên Îslamê de piştî îmana bi Ellah û Resûlê Xudê tê. Ji Ebî Hureyre hatiye rîwayetkirin ku wî gotiye ku ji Nebî sellellahu ‘aleyhi wesellem hat pirsîn ka kîjan ‘emel herî zêde bi xêr e? Wî got: “Îmana bi Ellah û Resûlê Xudê.” Hat pirsîn piştî çî tê? Wî got: “Cîhada sirf di rêya dîn de.” Hat gotin ka peyre? Wî got: “Hecca mebrûr.” Nebî selat û selama Îlahî li serê be, ji helbestên derbarê medha xezayê hez dikir. Wî li helbestên sehabiyekî ku li ser medha betlên xezaya Bedrê bû guhdarî kir û wiha gotiye: “Ev dîwana Ereb e.”¹⁶

Piştî van berheman, mînakên ewil ên vî çeşnê edebî, bi terzê xezanameyê, di edebiyata Erebî de hatine dayin. Di vî edebiyatê de ji van berhemên vî çeşnî re “meğazî” hatiye gotin. *Kitabu’l Meğazî* ya Waqidî (wefat. 207/822-23), navdartirîn berhem e di vî çeşnî de.¹⁷

Di serdemên ewil ên Îslamê de, ji bo wan berhemên ku welatên fetihkirî û herbên ku di vî rêyê de hatine kirin derdibirin, “*Futûh*” hatiye gotin; ji berhemên ku di vî çeşnî de hatine nivîsîn re bi giştî kitêbên “*Futûhat*”ê hatiye gotin.¹⁸ Qeremanî Qere Yaqub b. Îdrîs, bi navê *Işraqu’t-Tewarîx*, bi zimanê Erebî nivîsiye.¹⁹ Berhema bi navê *Xezwetu’l Uhud Wesfeha we Beyanu Butûllati’s-Sehabeti Fiha*, ku ji aliyê Suleyman bin Şitwî’l Muheddiwî’l ‘Ewfi ve hatiye nivîsîn û sala 1435 a hicrî, di nav weşanên Daru’l Ali we’s-Sehbi li’n-Neşri we’t-Tewî’ de hatiye weşandin jî, di edebiyata Erebî de xezanameyeke modern e ku divê meriv behsa wê bike.

4. 2. Xezaname di Edebiyata Farisî de

Ji ber ku di pey gelê ‘Ereb de cara ewil ew gelê ku bûye Musliman gelê Faris e, bivê nevê piştî edebiyata Erebî, di edebiyata Farisî de cûreyê xezawatnameyan hatine nivîsîn. Heta edebiyata Turkî jî ketiye bin bandora edebiyata Farisî. Lewre, edebiyata Farisî ji hêla

¹⁵ Sûreta Beqere, 190.

¹⁶ D. Mehmûd Seîd, “El-Xezawati’l Muhemmediyyeti Fî’ş-şî’ri’l ‘Erebiyyi’l Qedîm, *Alwaei.com*, <http://www.Alwaei.com/site/index.pdp?clD=1189>

¹⁷ Mustafa Erkan, “Gazavatname” DÎA, İstanbul, 1996, c. XIII., r. 439.

¹⁸ İsmail Hakkı Mercan, “Türk Tarihinin Kaynaklarından Olan Bazı Menakıbname ve Gazavatnameler Hakkında” *Sosyal Bilimler Dergisi*, <http://www.sbe.balikesir.edu.tr./dergi/edergi/c6s10/makale/c6s10m7.pdf> (01.10.2015)

¹⁹ Şahin Kürşat Şamil, “Gazavatnameler Üzerine Yapılan Çalışmalar Hakkında Bir Bibliyografya Denemesi”, *Turkish Studies*, http://www.turkishstudies.net/Makaleler/1340573858_63_şahinkürşatşamil_997-1022.pdf (01.09.2015)

berhemên xezawatnameyî ve dewlemend e. Heta peyva “xezawatname” ji peyva Erebî ya “xeza” û ji peyva Farisî ya “name”yê pêk hatiye.²⁰

Di sedsala XVian de bi navê *Behcetü't-Tewarîx* berhemeke siyerê heye ku ji aliyê şairekî bi navê Şukrullah ve bi Farisî hatiye nivîsîn. Wekî dî, berhema Îdrîsê Bidlîsî ya bi navê *Heşt Bihîşt* ku bi Farisî hatiye nivîsîn, ji ber ku tarîxa xezayên Îslamî tê de heye, ew jî weke berhemeke çeşnê xezawatnameyan tê hesabandin.²¹

Berhemeke bi navê *Gazaname-i Rûm* heye ku ji hêla Kaşîfî ve hatiye nivîsîn. Zimanê wê Farisî ye. Mesnewiyeke menzûm e. Nusxeya wê ya ku tê zanîn, 1053 beyt e. Ji Mehmedê II. re hatiye pêşkêşkirin. Ev şairê bi navê Kaşîfî, bi eslê xwe ji Îranê ye. Di heyama Fatih Sultan Mehmed de hatiye Stenbolê. Wî li şahidên herba Varna û herba II. a Kosovayê guhdarî kiriye û ev berhem daye.²²

4. 3. Xezaname di Edebiyata Turkî de

Ew menzûmeyên edebî ku ji wan re “xezaname” tê gotin, bi giştî behsa wan herban dikin ku di rêya dînê Îslamê de hatine kirin. Di edebiyata Turkî de hatiye diyarkirin ku navê van cûre berhemana “mexazî” ye û ev agahî li ser wan tînin dayin:

“Di edebiyata Turkî de ew berhema ku tenê yek herbekê dike mijara xwe, bi navê *xezaname* tê binavkirin. Gava ku ji herbekê zêdetir çend herban vebêje, ew berhem dibe *xezawatname*. Piştî ev navên dî lê hatine zêdekirin: Ji bo wan berhemên ku fethan kirine mijar, *fetihname*; ji wan ên ku zaferan/serkeftinan ji xwe re kirine mijar, *zafername* hatiye gotin. Mijara xezawatnameyan bi giştî, jiyan, herb û lehengiya padîşah, wezîr û fermandarên navdar e. Di dîroka Osmanîyan de ew berhemên ku behsa herbên serdemên ewil kirine, bi dest neketine. Berhema ewil ku gihîştîye roja me û ji vî cûreyî ye, ya bi navê *Xezawatname-i Sultan Murad* e ku behsa herbên Sultan Muradê II. dike.”²³

Di edebiyata Turkî de ji berhemên ku bidestxistina bajarekî, yan jî kelehekê derdibirin/vedibêjin re “fetihname” hatiye gotin; îca ji wan fetihnameyên ku behsa herbên ku

²⁰ İsmail Hakkı Mercan, “Türk Tarihinin Kaynaklarından Olan Bazı Menakıbnâme ve Gazavatnameler Hakkında” *Sosyal Bilimler Dergisi*, <http://www.sbe.balikesir.edu.tr/dergi/edergi/c6s10/makale/c6s10m7.pdf> (01.10.2015)

²¹ Şahin Kürşat Şamil, “Gazavatnameler Üzerine Yapılan Çalışmalar Hakkında Bir Bibliyografya Denemesi”, *Turkish Studies*, http://www.turkishstudies.net/Makaleler/1340573858_63_şahinkürşatşamil_997-1022.pdf (01.09.2015)

²² Gurol Pehlivan, “Varna Savaşı ve Bir Tarih Kaynağı Olarak Gazavatnameler”, *Turkoloji*, http://www.turkoloji.cu.edu.tr/GENEL/gurol_pehlivan_varna-savasi_gazavatnameler.pdf (01.19.2015)

²³ Edebiyat Ansiklopedisi, Milliyet Tesisleri, Copyright, 1991, r. 115-116.

bi t êkçûna dijmin qediyane re, “zafername” hatiye gotin.²⁴ Li gor Amil Çelebioğlu, di edebiyata Turkî de mînaka ewil a menzûm ji çeşnê xezawatnameyê re, mesnewiya bi navê *Tewarîx-i Mulûk-i Al-i Osmanî* ye ku ji aliyê Ahmedî ve hatiye nivîsîn. Vê berhemê jî, di berhema wî ya bi navê *Îskendernameyê* de cî girtiye.²⁵

Di *Danişmendnameyê* de rêzebûyerên wan kesên mîna Sari Saltuk û Bettal Gazî ku bi rewîştên/qerekerên xwe destanî ne, hatine şayesandin. Ew bûyerên ku *Saltuknameya* Ebulhayr Rûmî û di berhema bi navê *Battalnameyê* de cî digrin, ne tê de, mînakên ewil ên xezawatnameyan, di sedsala XVan de t ên dîtin. Peyre di sedsala XVian de, zêde bûne û li ser seferên Selîmê I. û Qanûnî Sultan Suleyman gur û geş bûne. Ku Dewleta Osmanî dikeve serdema paşveketinê, ev berhem kêmbûn. Bi seferên Qirimê (1853) û seferên Yûnan (1897) re, mînakên wê yê dawî hatine dayin. Hejmara xezawatnameyên ku heta niha di edebiyata Turkî de hatine tesbîtkirin, raserî 250 ye. Nêzî çil ji van, menzûm in û bi terz û teşeyê mesnewiyê hatine nivîsandin. Çend ji van berhemên bi navê “xezaname”, “xezawat” û “xezawatname” t ên zanîn, ev in:

I. *Xezaname* – Ji aliyê Gelibolulu Mehmed Zaifî Efendî ve hatiye telîfkirin. Behsa xezayên Muradê II. dike.

II. *Xezawatname* – Ji aliyê Prizrenli Sûzî Çelebî ve hatiye nivîsîn. Behsa xezayên Mihailoğlu Ali Bey ku akinciyekî serdema Fatih Sultan Mehmed û Bayezidê II. e dike. Li ser terzê mesnewiyê ye, ji 1795 beytan/malikan pêk hatiye.

III. *Xezawatê Sultan Murad* – Nivîskarê wê ne diyar e. Behsa wan xezayên Muradê II. ên herbên Izladî û Varnayê dike.²⁶

IV. *Selîmname* – Şairê wê, Şukriyê Bidlîsî ye.²⁷

5. Çeşnê Xezanameyan di Edebiyata Kurdî (Kurmancî) de

Di edebiyata Kurdî de ji berhemên xezanameyî ku li ber destê me a niha peyda dibin, tenê *Qewlê Newala Sîsebanê* û *Qewlê Hespê Reş/Borê Qer* hene. Lê belê berhemeke bi navê “*Çekameya Şoreşa Bidlîsê*” ku ji aliyê Mela Îbrahîm ve hatiye nivîsîn jî, di reng û dirûvê

²⁴ İsmail Hakkı Mercan, “Türk Tarihinin Kaynaklarından Olan Bazı Menakıbnâme ve Gazavatnameler Hakkında” *Sosyal Bilimler Dergisi*, <http://www.sbe.balikesir.edu.tr/dergi/edergi/c6s10/makale/c6s10m7.pdf> (01.10.2015)

²⁵ Şahin Kürşat Şamil, “Gazavatnameler Üzerine Yapılan Çalışmalar Hakkında Bir Bibliyografya Denemesi”, *Turkish Studies*, http://www.turkishstudies.net/Makaleler/1340573858_63_şahinkürşatşamil_997-1022.pdf (01.09.2015)

²⁶ Mustafa Erkan, “Gazavatnameler” DİA, İstanbul, 1996, c. XII., r. 439.

²⁷ Şahin Kürşat Şamil, “Gazavatnameler Üzerine Yapılan Çalışmalar Hakkında Bir Bibliyografya Denemesi”, *Turkish Studies*, http://www.turkishstudies.net/Makaleler/1340573858_63_şahinkürşatşamil_997-1022.pdf (01.09.2015)

xezanameyê de ye. Di vê berhemê de xezaya Mela Selîm a li hember Romiyan hatiye vegotin. Ev berhem ji aliyê Ebdullah Varlı ve hatiye çapkirin.²⁸

Di kilamên dengbêjên Kurd de jî berhemên bi vî rengî hene. Weke mînak, Dengbêj Şakiroyê Bedîh, bi navê *Şerê Bulxar û Yunanan*, kilamekê dibêje ku tê de behsa gazî û şehîdan û lehengiya mêrxasan tê kirin. Behsa şerê navbera Osmanîyan û Bulxaran û Ênanan dike. Gelê Turk, gelê Kurd û gelê Laz gişt tê de cî girtiye. Navê Sultan Ebdulhemîd û Sultan Reşad tê de heye.²⁹ Kilameke dî ya Dengbêj Şakiroyê Bedîh, bi navê *Şerê Êrus* heye. Pesnê Bavê Xalis Kekê Mexsê hatiye dayin.³⁰ Bi navê *Şerê Kopê* kilameke Dengbêj Şakiroyê Bedîh li ber destê me heye ku behsa mêrxasiya Bavê Dilşakê dike ku çawa li hember Êrus şer kiriye.

Wekî dî, çîrokeke mensûr/pexşan bi navê *Huseynê Kurdîşah* heye ku behsa palewaniya lehengekî Kurd ê Musliman li hember palewanên ne-muslim ên Êranî dike. Digel ku di rengê çeşnê destanan de ye jî, ji ber ku bûyera wê ya eslî, bi temamî li ser têkoşîna wî ya li hember kuffarên Êranî ye, dibe ku em wê jî weke “xezaname” yekê bihesibînin.

5. 1. Qewlê Newala Sîsebanê

Ev xeza-name, bi eslê xwe, mîna *Qewlê Hespê Reş*, ji “Xezawatnameyan” e. Leşkerên Musliman, ji bo bidestxistina Newala Sîsebanê, hatine herêmê. Çi heye, ji ber ku hejmara wan, li hember ne-Musliman gelek kêr bûye, di serê şerî de gelek zayîat dane. Peyre Hz. Elî hatiye hawara eskerên Musliman û Musliman, li hember ne-musliman bi ser ketine.³¹

Ev berhem ji aliyê Şêx Xalidê Zebariyê Yekem ve hatiye nivîsîn. Nusxeyeke vê, bi navê “*Cenga Sîsebanê Ji Nezm û Tertîba Şêx Xalid Zîbarî, Basîretî, Botî, Neqşebendî Quddise Sirruhu*” li ber destê min heye. Li serê weha hatiye nivîsîn: “Destnivîsa Muhemmed Me’sûm (Dilbirîn) Botî.

Weke cûreyekî edebî “cengname” ye ku tê de behsa qehremanî û egîdiya sehabiyên cenabê Pêxember hatiye kirin. Sîseban, di nava gel û edebiyatvanên Kurdan de zehftir bi navê *Qewlê Newala Sîsebanê* tê naskirin û berhemeke gelekî girîng tê qebûl kirin. Lewre jî ev menzûme bûye malê gel û ji aliyê gelek kesan ve (wekî Ehmedê Xanî, Bekir Begê Hekarî) hatiye nivîsandin. Di nav van giştan de nav û mijara berhemê yek e; lê nivîskarên berhemê, hejmara beytan û hwd. ji hev cihê ne.³² Nusxeyeke vê berhemê, ji aliyê Ebdullah Varlı ve jî

²⁸ Ebdullah M. Varlı, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn*, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 546.

²⁹ Ev kilam li ber destê me heye, me ew ji bandên Dengbêj Şakiro deşîfre kiriye.

³⁰ Ev kilam li ber destê me heye û me ji bandên Dengbêj Şakiro ew deşîfre kiriye.

³¹ *Qewlê Newala Sîsebanê*, (Amadekar: Ahmet Demir), Weşanxaneya Nûbihar, Istanbul, 2012, r. 11.

³² Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 181-272.

hatiye çapkirin. Ahmed Demîr jî 7 nusxeyên wê yên cihê cihê daye ber hev û metnekî xweser jê deraniye û ev xebat di nav weşanên Nûbiharê de hatiye çapkirin.

Seyda Goyan, guhertoyeke cengnameya Sîsebanê ji devê Salihê Mihemedê Şîrnexî girtiye û di kovara Warê de daye çapkirin. Ev guherto gelek dişibe teşeyê *Hespê Reş*. Serê wê, bi vî awayî dest pê dike:

Ji ewwel gotî Bismillah, Summe wel hemdulillah

Bismillahî-l Xaliqîn, ew e Rehîm û Rehman

Huwellahu'r-Raziqîn, ew e meînê Mennan

Bi qewlê wî sadiqîn, ew e Fatirê eyan

Bi hemdê wî la yeqîn, bû wextê kul xeman³³

Dema ku em li nusxeyên *Qewlê Hespê Reş* digeriyan, desxeteke dî ya fotokopî ya *Qewlê Newala Sîsebanê* ku ji aliyê “Xileb” ve hatiye îstînsaxkirin, bi destê me ket. Me jê deranî ku nezimkiroxê wê, “Ehmedê Hekarî” ye. Mela Muhemedê Erxenyî ew da me. Di beşa wê ya dawî de ev rêzik hene:

Ew Ehmedê Hekarî gotî kalam mewzûn e

Hêvî dikim ji Barî ji nefsa xerab û me‘dûm e

Biraze dikî ji narî ser ji cimle fi’lê şûm e

Guhurî zû cumle qarî ya Reb tu nekî mehrûm e

5. 2. Qewlê Hespê Reş

Bûyereke lehengî ku di navbera sehabiyên Pêxemberê Îslamê Hezretî Muhemmed û şervanên Mîrekî ne-musliman ê bi navê Mîr Lender de qewimiye, bûye mijara vê xezanemeyê. Mijara vê berhemê, li ser muslimanbûna hespekî mîtolojîk e. Hespekî efsanewî bi navê *Hespê Reş* ku ji behrê derketiye³⁴ û ketiye destê Mîr Lender, bi awayê xiyabî îman bi dînê Îslamê aniye û dixwaze ku di xezayên Îslamî de bikeve xizmeta sehabiyên. Hz. Muhemmed Pêxember, pê dihese ku hespekî Musliman di destê Mîrekî Fileh de heye û ew hesp dixwaze ku bê ber destê wî. Lewre rojê inê ji sehabiyên xwe re dibêje ka kî dikare vî hespî bîne? Hz. Umer dibêje ez dikarim. Êdî li ser vê yekê Hz. Umer diçe ku wî hespî bîne. Hezretî Umer tê devera *Hespê Reş*. Cenabê Pêxember jê re gotiye ku Keşeyê Dêra Filehan jî, digel keça xwe ya bi navê Leymûn, îman bi Îslamê aniye. Lewre rast berê xwe dide mala wan

³³ Seyda Goyan, “Sîseban”, *War*, Payîz-Zivistan Stenbol, 2002, j. 12., r. 202.

³⁴ Li gor H. Muhemedê Holî/Erol ku ji Batmanê ye, Mela Huseynê Farqînî gotiye ku ev hespê reş, ji behrê derketiye.

û dibêje ku ez təcîrê Borê Qer im. Hezretî Umer, bi zêran dixwaze ku vî hespî bikire, li hev dikin, îca peyre Mîrê Filehan Lendeho, poşman dibe û rê nade ku Hezretî Umer hespî bibe û şervanên ehlê salîbê, êrîş dibin ser Hz. Umer. Keşe digel qîza xwe tên kuştin û Hezretî Umer, bi siwariya Hespê Reş, bi ser sûra keleha bajêr de ferqaz dide û diçe digihîje dêrekê; bes dîsa dikeve hesarê. Umer çawa ku xwe li dêrê digre; li wê derê rewşa wî dikeve xetereyê, çûkek, li ser hawarxwestina Umerî, radibe xeberê digihîne Cenabê Pêxember. Ji nav sehabîyan, Hezretî Elî, bi hespê xwe yê bi navê Duldul, digel Hz. Ebû Bekir, Usman, Ebbas, Hemze tê hawara Hezretî Umer û şer, bi awayê serketina Musulmanan diqede. Piştî şerê dijwar, şervanên Mîrê Ehlê Kîtab ên Xiristiyan têk diçin û şervanên Musliman, vî hespî dibin bajarê Medîneyê.

Di *Menzûmetana Zeynelabîdînê Amedî* de, bi sernavê “*Hespê Reş (Borê Qer) Qewlê ‘Elî Herîrî’*” cî girtiye.

Ji ber ku mijara me bi giştî ev berhem e, em dê li pêş, bi berfirehî behsa wê bikin; lê belê divê ku em bi hindikî be jî hin aliyên wê bidin nasandin.

5. 3. Şerê Bulxar û Yunanan

Behsa gazî û şehîdan û lehengiya mêrxasên Musliman di vê berhemê de hatiye kirin. Behsa şerê navbera Osmanîyan û Bulxaran û Yûnaniyan dike. Gelê Turk, gelê Kurd û gelê Laz gişt tê de cî girtiye. Navê Sultan Ebdulhemîd û Sultan Reşad tê de heye. Ev kilama xezanemeyî, ji du beşên komrêzan pêk tê. Hejmara her komrêzeke wê 33 rêzik e. Tê de rexneyeke giran li Jonturkan hatiye kirin. Tê de, ji devê Sultan Ebdulhemîd pesnê eskerên Kurd hatiye dayin.

5. 4. Şerê Ūrus

Bûyereke dîrokî ye. Serlehengê bûyerê *Bavê Xalis Kekê Mexsê* ye. Ev şerê Ūrisan digel eskerê *Bavê Xalis Kekê Mexsê*, kengê rûdaye, hewceyê lêgerînê ye. Himin dema Osmanîyan e, lê belê ji aliyê hêmanê antolojîk ê berhemê ve, hiyam û dema bûyerê girîng e. Pênc rêzbandên wê hene û her komrêzeke wê, ji pênc rêzikan pêk hatiye. Mêrxasiya *Bavê Xalis Kekê Mexsê* ku li hember eskerên Rûs kiriye, bi awayekî têrzindî hatiye şayesandin.

5. 5. Şerê Kopê

Ev berhem, kilameke Dengbêj Şakiroyê Bedîh e ku behsa mêrxasiya *Bavê Dilşakê* dike bê ka çawa li hember Ūrus şer kiriye. Motîfên Îslamî û egîtiya xaziyan tê de hatiye vegotin. Bi navê “Kop”ê li aliyê Mûşê navçeyek heye. Ev serlehengê bûyerê ku *Bavê Dilşakê*

ye, kî ye gelo û ev bûyer kengê qewimiye, hêjayî lêgerînê ye. Tiştê ku heye meriv ji rêzikên kilamê pê derdixe ku Bavê Dilşakê, ji Mala Elî Axa ye. Kilam gişt ji 2 komrêzan pêk hatiye û hejmara rêzikên her rêzbendekê jî 5 e. Di navbera yekeyên nezmiyan de benedê neqeretê jî heye.

5. 6. Çekameya Şoreşa Bidlîsê

Ev berhem, ji hêla Mela Îbrahîm ve, di derdora salên 1300î yê hîcrî de hatiye nivîsîn. Ji 93 beytan pêk hatiye. Bi awayê mesnewiyê hatiye nivîsîn. Behsa wê bûyerê ku di bin pêşewatiya Şêx Selîm de li Bidlîsê li hember zordestiya Osmaniyan qewimîbû dîke.³⁵ Li gor hin lêkolêrê xezanameyan, ew şerê dînî ku di navbera musliman bi xwe de jî qewimiye, dikevin bin banê xezanameyê; lewre me li vê derê cî da navê vê berhemê jî. Piştî van her du çavkaniyên sereke, Qur'an û Hedîsê, di hişê gel de kana herî dewlemend û girîng, siyera Nebî, ango dîroka jiyana Hz. Muhammed bû. Ha edebiyat jî, li ser vê bîngê reng û rû girt.³⁶

5. 7. Huseynê Kurdîşah

Çîrokeke pexşan e ku behsa egîftî û palewaniya lehengekî Kurd ê Musliman bi navê Huseyn dîke. Ev betil, li hember palewanên ne-muslim ên Îranî herb dîke. Bûyera wê ya eslî, bi temamî li ser têkoşîna Huseynê Kurdîşah a li hember palewanên kuffar ên Îranî ye. Me ev berhema devkî, sala 1997an, li bajarê Bursayê, ji devê Heyderê Mûşî ku 60 salî bû girtiye. Hejmara rûpelên wê, li gora rûpelê kompîtûrê 6 e û pexşanî ye. Huseyin, ji ber sedemeke malbatî, ji welatê xwe diçe bajarê Misirê. Li wê derê palewanên 'Ereb ên Misirê bi egîftiya wî dihesin û dixwazin ku wî li hember zordestî û tehdehiya palewanên Îranê, bi kar bînin. Ew jî qebûl dîke û gava çend palewanên Îranî tînin Misirê li palewanên wê derê neheqî dikin, Huseyn nahêle û bi ser de jî diçe heta Îranê û wê derê jî fetih dîke. Li gor hîkayeyê, heta wê hingê Îran nebûne musliman.

6. Cengname

Ji ber ku tîkiliya çeşnê xezanameyan ji hêla edebî û dîrokî ve bi çeşnê "cengname"yan re heye, me divê ku li vê derê em cî bidin agahî û taybetiyên cengnameyan jî. Peyva "cengname"yê, ji hêla avasaziya xwe ve, peyveke hevedudanî ye ku ji du peyvan pêk hatiye:

³⁵ Ebdullah M. Varlı, Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 549-554.

³⁶ Nihad Sami Banarlı, Resimli Türk Edebiyatı Tarihi, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 2001, r. 103.

ceng+name. Eslê peyva “ceng” ji zimanê Farisî tê³⁷ û di Kurdiya Kurmancî de jî tê ev peyva “ceng”ê tê bikaranîn; eslê peyva “name” jî hem di Farisî de heye hem jî di Kurmancî de.

Cengname, ew kitêb in ku hîkayeyên herbê vedibêjin.³⁸ Li gor ku di edebiyata Turkî de tê ravekirin, tarîfa vî cûreyî edebî weha ye: “Cûreyekî edebî ye ku hin rêzebûyerên mucîzewî ku di navbera Musliman û Xiristiyanan de rû dane/qewimîne û serlehengê wan, qehremenanên Îslamî yên mîna Hz. Muhemmed, Hz. Elî û sehabî ne û hozanekî şareza, ji berî xwe ve, hûnîn û rêşîna bûyeran pev dixê û bi awayekî mubalexeyî vedibêje.³⁹

Li gor vê tarîfê, ev berhema *Qewlê Hespê Reş*, bi awayekî tam û tekûz dikeve bin banê cengnameyê. Serlehengê vê berhemê, egîten navdar ên Îslamî ne û bûyer jî, piştî ku meriv li guhertoyên wê dinêre, meriv dibîne ku bûyereke “pevxistî” ango kurmaca ye. Ji ber ku hilberînerê wê, hozanek e, diyar e bi zimanê gel, li ser bingeha edebiyata gelêrî hatiye nivîsîn; lewre xîtabî gel dike. Her 6 nusxeyên ku em gihîştin metnê wan, bi hêsayî diyar dibe ku bi tamamî bi zimanê gel ê rojane hatiye nivîsîn. Heta *Qewlê Newala Sîsebanê* hem jî *Qewlê Hespê Reş*, bi zimanê gel, li ser bingeha edebiyata gelêrî hatine nivîsîn.

Cenk ku peyveke Farisî ye û awayê nivîsîna wê di vî zimanî de “ceng” e, tê wateya şer, pevçûn û têkoşînê. Ji kesê şervan re “cengbaz” hatiye gotin. Ji bo kesê ku şerxwaz e, peyva “ceng-cû” yan jî “cengcûy” hatiye gotin. Wateya peyva “cengcûyane” ew e ku dibêjin terz û teherê ku li şervan tê.⁴⁰

Mînakên cengnameyan, hem di edebiyata Erebbî de, hem di edebiyata Farisî û Turkî de, hem jî di edebiyata Kurdî (Kurmancî) de hene. Serê ewil ev cûre berhemên edebî, di edebiyata Erebbî de derketine, peyre mînakên wan, di edebiyata Farisî û edebiyata Kurdî de hatine dîtin. Tarîfeke dî jî li ser cûreyê edebî yê cengnameyê hatiye kirin ku navê wan mesnewiyên dînî û destanî ye û xezayên ku Hz. Elî û kurê wî, Muhemmed Henîfe beşdar bûne, vedibêje. Çawa ku hin ji van cengnameyan menzûm in, hin jî hene ku bi teşeyê pexşanî ne. Destpêka cûreyê cengnameyan, di edebiyata Turkî de, rastî serê sedala XIVan tê. Nûnerên girîng ên vî cûreyî, Yusuf-i Meddah, Tursun Fakih, Kirdeci Ali û Begpazarli Maazoğlu Hasan e. Di edebiyata Tukî ya Îslamî de, hin hîkayeyên dînî ku bi zimanê gelêrî hatine nivîsîn hene ku zêde, li ser cûreyê wan ê edebî nehediye rawestîn. Qadroya kesên, digel ku ji Hz. Muhemmed û sehabiyên wî pêk hatine jî, hin aliyên bûyeran tê de cî digrin ku xeyalî ne. Ev hîkayeyên dînî, bêhtir bi rêya

³⁷37 Yusuf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî El Meqdisî, El Hediyetu'l Hemîdiyyeti Fî'l Luxeti'l Kurdiyyeti, (Tehqîq: Muḥemmed Mukrî) Weş. Mektebetu Diyarbekir, 2011, r. 9.

³⁸38 Ferit Develioğlu, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 2012, r. 150.

³⁹39 Mehmet Gümüşkılıç, “Cumhur-name’de Hz. Ali’nin Özellikleri”, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, http://www.sosyalarastirmalar.com/cilt6/cilt6sayi24_pdf/gumuskilic_mehmet.pdf

⁴⁰40 Büyük Larousse Sözlük Ansiklopedisi, Milliyet Gazetecilik A.Ş. Yayınları, İstanbul, c. V., r. 2264.

wergerê, ji edebiyata Erebi derbasî edebiyatên dî bûne û bi mudexeleya vegoteran, di wan de guherîn û pêvekirin çê bûne.

Di edebiyata Turkî de, ev cûreyê ha, di mecmûayên destanan de qeydkirî ne, hi caran jî, li metnên metnên mewlûdan hatine zêdekirin û di pirtûkxaneyan de hatine parastin. Çend ji van hikayeyan ev in: *Kesikbaş Destanı, Güvercin Hikayesi, Ejderha Destanı, İbrahim Destanı, İsmail Destanı, Fatıma Destanı, Ukkaşe Hikayesi*. Piraniya van destanan menzûm in; lê mensûrên hin ji wan jî hene. Nivîsakarên/muellifên wan ne diyar in. Li Enedolê, di şevên dirêj ên zivistanê de, di odayên malan de, ji bona geşedana zewqa edebî xizmet kirine. Ew pêvekirina wan a li metnên mewlûdan, îşaret dîke ku mîna mewlûdan, di nav gel de zaf hatine xwendin.⁴¹

Çawa ku ji pênasîyên li ser cûreyê cengnameyê, yên edebiyata Turkî diyar dibe, hem bi taybetmendiyên *Qewlê Newala Sîsebanê* hem jî bi xusûsiyetên *Qewlê Hespê Reş* diyar dibe ku di edebiyata Kurdî de jî lehengê herî mezin û navdar ê cûreyê cengnameyan, Hz. Elî rediyellahu enhu ye. Sedemê ku Hz. Elî wisan zêde bûye mijara cengnameyan gelek zêde hene. Mirov dikare van sedeman rêz bike:

- Hz. Elî, çawa ku pîrsmamê Hz. Pêxember e, ji zaroktiya xwe ve, bi Cenabê Pêxember re mezin bûye û hîn di zaroktiya xwe de hatiye ser dînê Îslamê.
- Beşdarî xezayên mezin ên mîna Bedir, Uhud, Xendeq, Xeyber û Huneynê bûye. Bi ser de jî, hema hema beşdarî hemû xeza û seriyeyên Cenabê Pêxember bûye, di van cengan de jî, wî bi xwe bi senceqa Cenabê Pêxember girtiye, egîtiyeke mêrxasane nîşan daye. Heta di herba Uhudê de jî, di xezaya Huneynê de jî, digel ku ji gelek ciyên xwe birîndar bûye û piraniya sehabîyan reviyane jî, wî terka Cenabê Pêxember nekiriye.
- Bi saya keda wî, sehabî di cenga Xeyberê de bi ser ketine.
- Dema Cenabê Pêxember diçe cenga Tebûkê, wî weke wekîl li Medîneyê hiştiye.
- Ji xeynî van xeza û cengan, di peymanên navbera Cenabê Pêxember û Ehlê Kitêbê(Xiristiyan) de, wî katibî kiriye.⁴²

Abdurrahman Adak, ji ber menzûmeya "*Borê Qer*" ango *Hespê Reş*, Elî Heîrî, weke nûnerekî cureya cengnameyê bi nav dîke.⁴³ Ji wan pirtûkên ku gel, xeza û şerên Hz. Elî, bi

⁴¹ Ali Öztürk, "Dini Tür ve Konular", Türk İslam Edebiyatı, (Hazırlayanlar: Heyet; 9. Ünite) T.C. Anadolu Üniversitesi Yayını, Ankara, 2013, r. 227.

⁴² Mehmet Atalan, "Anadolu'da Cenknamelerin Toplumsal Yansımaları", *Kelam Araştırmaları*, [http://www.Fille://c:/Users/Aktif/Downloads/167-537-1-PB%20\(3\).pdf](http://www.Fille://c:/Users/Aktif/Downloads/167-537-1-PB%20(3).pdf)

awayê destanê û dînê vedibêjin re pirtûkên cengê tê gotin. Ev cûre pirtûk, wan xezayan hikaye dikin ku Hz. Elî, ferman ji Cenabê Muhemmed girtiye û ji bo belavkirina dînê Îslamê, ketiye şer û têkoşnan. Di nav serlehengên cengnameyan de navê kesên dîrokî yên mîna Hz. Elî, Se'd İbn Ebî Weqqas, Xalid Bin Welîd û Qeyserê Rom heye. Tevî van, navê hin ciyên mîna Îran û Keleha Xeyberê heye; lê belê bûyerên cengnameyan, bi temamî pevxistinî ne. Di van cengnameyan de ji lehengên mîtolojîk ên mîna ejderha, dêw, pîrebok û periyên re jî hatiye dayin. Hz. Elî, li ser hespa Duldul, bi haviliya şûrê xwe yê Zulfîqar, dijminên dijberî Muslimanan têk dibe. Li hêla Enedolê, ji sedsala XVIan pê ve, ev cûre metn ketine ber nivîsê û di nav girseyên gel de, eleqedariyeke zindî dîtiye. Mînakên cengê yên li ser *Muhemmed Henîfe*, cara ewil bi teşeyê nezmî hatine nivîsîn û peyre pirtûkên mîna *Ceng-i Muhemmed Henîfe*, *Kan Kalesi [Keleha Kan]*, *Havezemîn ve Billur-i Azam*, *Gazavat-i Bahr-i Umman ve Sandık [Xezayên Behra Umman û Sandoq]* bi alfabeya Erebi hatine nivîsîn. Muradhan Mungan, ji van hikayeyan, ji bo edebiyata modern weke çavkanî sûd wergirtiye û bi navê *Cenk Hikayeleri* sala çap kiriye.⁴⁴

Ji bilî van pirtûkên ku li ser xezayên sehabiyên Cenabê Pêxember hatine nivîsîn, dema ku em li nusxeyên *Hespê Reş* digeriyan, pirtûkeke dî jî bi destê me ket ku ji du cildên mezin pêk dihat û zêdetirî pênc sed rûpelî bû bi Turkiya Osmanî hatibû nivîsîn bi destê me ket ku ji serî heta binî behsa xezayên Eba Muslim dikir.⁴⁵ Nexwe pirtûkên cengê, ne tenê behsa xezayên Hz. Elî û sehabiyên kiriye; diyar e ku xezayên xelîfeyan jî bûne mijara wan.

⁴³ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 179.

⁴⁴ Büyük Larousse Sözlük Ansiklopedisi, Milliyet Gazetecilik A.Ş. Yayınları, İstanbul, c. V., r. 2264.

⁴⁵ Haza Kitabı Eba Muslim, Tabî' we Naşîrî, Dagistanlı Çilzade Muhemmed Efendî, 15 Şubat 264, h. 1325, Mehmûd Beg Metbeesi.

BEŞA YEKEM

QEWLÊ HESPÊ REŞ

Di vê beşê de em dê ji du hêlan ve li berhemê bimeyizîn: Aliyê wê yê rûxsarî/teşeyî û aliyê wê yê naverokî ango muhtewayî.

1. Ji Aliyê Ruxsariyê ve Qewlê Hespê Reş

Ji bo ku em aliyê edebî yê vê berhemê nas bikin, divê ku em serê pêşî, berê bal û dêhna xwe bidin ser hêla taybetiyên wê yên çeşn û teşeyî yên mîna celebê edebî, hêmanên wê yên ahengê û pêdivî heye ku em ciyê vê berhemê di nav kevneşopiyên edebiyata Kurdî de tesbît bikin.

Li gor krîterên edebî, çeşnê edebî yê berhema *Qewlê Hespê Reş*, xezaname ye.⁴⁶ Mijara vê xezanameyê, dînî/îslamî ye. Bûyera wê, li ser bingeha “lehengiyê” ye. Ji serî heta binî, mêrxasî û xweşmêriya serlehengê wê Hz. Umer hatiye derbirîn. Mîna ye destaneke epîk a dînî ku di serdema Îslambûna Kurdan de hatiye derxistin. Cûreyê edebî yê vê xezanameyê jî, li gor tesbîta me, “gelêrî” ye; ango ne li gor terz û teherên edebiyata nivîskî ya klasîk hatiye nivîsîn. Hêla wê ya mistîk û mîtolojîk heye. Bi taybetî motîfa “hesp” bi xwe, mîtolojîk e. Motîfa çûkê jî ku tê de cî girtiye, berhemê dişibîne cûreyê edebî yê fabilan. Ev hêman jî, di edebiyata devkî ya Kurdî û edebiyata gelêrî de, gelek hatiye bikaranîn.

Em dê li jêrê ji hêla hêmanên ahengê ve berhemê binikirînin. Em dê aliyên wê yên tertîba beşan, kêş/wezin, serwa/qafiye, redîf û avesaziya wê ya nezmî raxin ber çavan û dabeşbûna helbestê ya li yekeyên nezmî bi çî awayî pêk hatiye, diyar bikin.

1. 1. Kêşa Qewlê Hespê Reş

Kêşa metnê *Qewlê Hespê Reş*, di nusxeya ku nisbeta wê, bi yekeyeke nezmî ya helbestê, bi Elî Herîrî ve hatiye kirin de, li ser bingeha “kêşa kîteyî” ye. Ev kevneşopîya kêşa kîteyî, xasî bi kevneşopîya helbesta gelêrî ye. Jixwe *Qewlê Hespê Reş*, berhemeke rengfolklorî ye. Çawa ku Mesûd Cemîl diyar kiriye, rexnegirên Kurd, li ser ewê çendê dirêkkevîne ku

⁴⁶ Her çî qas ku metnên çeşnê xezanameyê bi wezneke diyar û li gor hêmanên edebî yên teşeyî tîn îcrakirin jî, ev xezanameya *Qewlê Hespê Reş*, ji hêla taybetiyên xwe yên cûreyê/teşeyê nezmî ve ne li sorekê/nîzamekê ye. Çûnkî dîviya ku komrêzên wê, bi awayekî sistematîk dabeşî hin komrêzên birêkûpêk bibûna. Çawa ku di edebiyata Dîwanê ya Osmanî de cûreyê edebî yê bi navê Qeside heye û xwedî hin taybetiyên diyar ên edebî ye, çeşnê xezanameyê jî xwedî hin taybetiyên cûreyî û teşeyî ye. Îca xezanameya *Hespê Reş*, hem di nusxeya Elî Herîrî de, hem jî di nusxeyên dî de (nusxeya Varlı), ji aliyê awayê teşeyê û avasaziyê ve, li ser tradîsyona helbesta gelêrî ye.

hozana folkloriya Kurdî, li ser kêşa birgeyî hatiye danan. M. Cemîl ji devê rexnegirê bi navê Kamil Jîr wiha radigihîne:

“Muzîk û awaza hozana folklorî, li ser kêşa birgeyî hatine danan. Lewra birgeyên kurt û dirêj angû ‘erûza Erebbî, hîç girîngiyek bo rîtmî hozana folkloriya Kurdî nîne.”⁴⁷

Digel ku Herîrî, helbestên xwe bi kêşa ‘erûzê nivîsîne jî, wî *Qewlê Hespê Reş*, li gor kêşa helbesta gelêrî hunandiye. Hejmara kêteyên rêzikan, bi temamî ne bi rêk û pêkî be jî, 7 e. Gava ku em li beytên nusxeya Zeynelabidîn Amedî yê Elî Herîrî dinêrin, em dibînin ku wezna rêzikan jî, hin îstîsna ne tê de, li ser qalibê 7 kêteyan e û bendên wê, bi pîranî sêrêzî ne. Diyar e ku li gor pîvanên edebiyata gelêrî, ev bi destê şaîrekî şarezî hatiye nivîsîn:

Mecal ew mecal bû = 6 kête

Kafîrek dînbetal bû = 7 kête

Hespek çê li bal bû = 6 kête

Hespê di nêv kuffaran = 7

Bi dil ew bû Musulman = 7

Muħemmed pê ‘elam e = 7

Teşeyê berhemê ku nezmî ye, di her nusxeyê de ne wek hev e. Komên rêzên wê, li gor nusxeyan, cûre bi cûre ne. Di nusxeya ku Varlî ew çap kiriye de, hejmara rêzîkên koman, ne li gor sorekê/pîrûpergalekê ne. Pergala qafiyeya rêzan jî, ne li gor kêşa cûreyekî nezmî ye şî’rekê ye. Awayê pergala qafiyeya wê, mîna ye helbestên gelêrî: aaaa, bbbbbb. Wezna rêzikan jî ne bi rêk û pêk e. Mîna ye wezna kilamên dengbêjan:

Hesp, çi li ba ez bêjim ne muxalif ew rast e = 13

Dînbatilan ez girtim zîn li pišta min beste = 14

Bona wan min berdî herime cengê bê best e = 14

Dê ez wan hilînim cenga Îslamê rast e = 12

⁴⁷ Mesûd Cemîl, Qonaxên Kêşnasiya Hozana Kurdî, Pertûkxaneya Bedîrxaniyan, Dihok, 2014, r. 103.

Hewar dikem xilas bim ji zulma wan kefere = 14

Min navê ew siwar bin ‘eleyye werine şer e = 14

Ji bo hilden Îslam zemîn bimîne kefere = 14

Tenê bimîne li erdê kes nemîne hember e = 15

Min navê ku ez herim cenga wan ên bawer e = 14⁴⁸

Di nusxeya Mihemed Emîn Osman de jî pergala qafiye û rewşa dabeşbûna rêzan a li koman, bi awayê kilamên dengbêjan e. Hem hejmara kîteyan, hem jî hejmara rêzikên koman, ne wek hev e:

Ya Hebîbê Xudêwo

Tu bo min bibêwo

Hespê Reş li kê wo

Da bo te biçimêwo

Ya îmamê nazdar e

Tu rabe bike kar e

Ez dê ji te ra bêwo

Qeşek li Şûşêwo⁴⁹

Here lalê Qeşeyî

Ew li gel xwişkêwo

⁴⁸ Ebdullah M. Varlı, Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 426.

⁴⁹ “Şûşê” navê wî gundî wî kesî ye ku wî ev guherto ji berhevkar Mihemed Emîn Osman re gotiye.

1. 2. Şemaya Qafiyeyên Berhemê

Pergala qafiyeya menzûmeyê, di nusxeya Zeynelabidîn Amedî de, pergala qafiyeyî ya dûz e û bi rêk û pêk e:

2 Hespê di nêv kuffaran --- a

Bi dil ew bû Musulman -- a

Muhemmed pê ‘elam e --- b

3 Muhemmed deng hiltîne --- b

Heçî Hespê Reş bîne --- b

Qesrek ji min bistîne --- b

Çawa ku ji sêrêzên jor jî diyar e, cûreyê pergala wê ya qafiyeyê, “düz” e, ango “yekserwa” ye. Ev cûre pergala jî, bi piranî xasî bi helbestên gelêrî ye.

1. 3. Redîfên Berhemê

Di helbestan de yek ji hêmanên ahengê, redîf e. Redîf, ji wan qertaf û peyvên re tê gotin ku di dawiyê rêzikên helbestê de tên û hem wateya wan, hem awayê nivîsîna wan, hem jî peywira wan gişt eynî ye. Dema ku meriv li qafiyeyê/serwa û redîfa helbestê digere, divê ku serê ewil, meriv wan qertaf û peyvên ku di rêzikên bin hev de tên û hevpeyvir in, tesbît bike, peyre qesda dîtina qafiyeyê bike. Piraniya redîfên ku di vê berhemê de hene, ji qertafan pêk hatine:

11 Umer e rabû xweş e

Li puştê best terkeş e

Çû telbe Hespê Reş e

e: redîf:

12 Bi çol û çolistanê

Li deşt û bi yabanê

Ajote şaristanê

ê: redîf

- 15 Hatim izharî **kim**
Sirra xwe guftarî **kim**
Hespê Reş geryarî **kim**

kim: redîf

- 38 Mêrê qewî kerem **bû**
Bi wan çêranê nerm **bû**
Rû lê zer û sor **bû**

bû: redîf

1. 4. Qafiyeyên Qewlê Hespê Reş

1. 4. 1. Qafiyeya tam

Ew cûre qafiye ye ku bi piranî bi hevdengiya du dangan pêk tê. Ev “qafiyeya tam” , ango “serwaya asayî” di vê berhemê de zêde ye. Di piraniya komerêzan de ahenga hevdengiya qafiyeyan, bi du tîpan hatiye pêkanîn. Ev cûre qafiye di vê berhemê de gelek zêde ye.

- 7 ‘Umer e vedibête
‘Elî ji xwe fihêt e
Min tişteke nevête

êt: qafiyeya tam

- 9 ‘Umer e rabû xweş e
Li puştê best terkeş e
Çû telbe Hespê Reş e

eş: qafiyeya tam

- 36 Hespê tu wî dizanî
Kuştî çil xubanî

Xasma ewî beyanî

an: qafiyeya tam

41 Keşe dibû yoldaş in
Bi kenî û temaş in
Ji dîwan çûne paş in
Xeber bîr ew yoldaş in
aş: qafiyeya tam

1. 4. 2. Qafiyeya dewlemend

Ew cûre qafiyeyê ye ku bi hevdengiya zêdetirî sê tîpên dawiya rêzikên helbestê pêk tê û ne redîf e. Ango awayê nivîsîna wan eynî ye; bes ji hêla wate û peywirê ve tu têkiliyeke wan bi hev re tune ye. Qafiyeya dewlemend, di Qewlî de gelek kême.

13 Keşe ku çuhê xeber e
Merivê Pêgember e
Sed cara pê xeber e
ber: qafiyeya dewlemend

63 Umerî ew sermest e
Hilîne her du dest e
Du'a ji Xudê dixweste
Derê Dêrê şikeste
est: qafiyeya dewlemend

55 Ew Keşeê wehîd e
Merteba wî tewhîd e
Kewranê kir şehîd e
hîd: qafiyeya dewlemend

70 Kulekêt di teng e
..... tèn wekû tifeng e
Pê digerin fireng e

eng: qafiyeya dewlemend

1. 4. 3. Qafiyeya nîv

Ew cûre qafîye ye ku hevdengî, ji xeynî redîfê, bi ahenga yek tîpekê tenê tê pêkanîn. Qafiyeya nîv, di berhemê de hindik heye.

8 ‘Umer sivik wek **ba** bû
Zû ji dîwanê **rabû**
Di xizmetê westa **bû**

a: qafiyeya nîv

48 Çend seran digerîne
Li hespê dixurîne
Li ser Sûrê difirîne

r: qafiyeya nîv

81 Koma sor û **spî** ye
Alay li ber ketî **ye**
Sed selewat li **Nebî** ne

î: qafiyeya nîv

1. 5. Hunerên Edebî yên Peyvan

Hat tesbîtkirin ku hunerên edebî yên mîna teşbîh, îstîfare, tenasub, telmîh, tekrîr, întaq, tezat, teşxîs, mubalexe, îrsalê mesel hunara nîdayê di berhemê de hene. Ji van her yek huneran re yek bi yek mînak, ji metnê berhemê hatin dayin.

1. 5. 1. Hunera Teşbîhê

Ew cûre hunera edebî ya bêjeyan⁵⁰ ku bi rêya dirûvpêdanê tê pêkanîn. Ew peyva ku di helbestê de hêza wê ya peyam û vegotinê qels e, bi rêya şibandina bêjeyeke dî ya hêzdar, tê hunandin.

⁵⁰ Digel ku li şûna “peyv”ê, kelîmeya “bêje”yê van salan tê bikaranîn û dirûvê wê, ji hêla etîmolojîyê ve dide kelîmeya Dimilkî ya “vaje” û “vate” jî, me kelîmeya “peyv” di vê metnê de tercîh kiriye.

8 ‘Umer sivik **wek ba** bû
Zû ji dîwanê rabû
Di xizmetê westa bû

27 Keşe weled hebû ne
Sivik in **wekî ko** ne
Bi dîwanê ve diçûne

85 Hey hewara Hemze ye
Şûrhungîvek zêde ye
Kafir dîrev’ **wek se** ye

87 Hemî hewara Ebûbekir e
Şêr e **wekû Emîr** e

1. 5. 2. Hunera Îstiare

Bi awayekî demdemî, wategirtina peyvekê ji bo peyveke dî ye. Di edebiyatê de weke têgih, îstîare ew e ku meriv bêyî şibandinê, hema rasterast, wê peyva ku dirûv pê hatiye xistin, bi kar bîne. Weke mînak, ji bo eskerekî gava bête gotin “şêrê min” ev dibe hunera îstiare.⁵¹

78 Yaderê musulmanan
Bezîne cebexanan
Bînin silahêd **şêran**

99 Gaziya wan mêran tê
Nirrênê wan **şêran** tê
Ev xebera ji ku tê
‘El’yê Herîr jî sotê

1. 5. 3. Hunera Tenasubê

⁵¹ Ferit Develioğlu, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 2012, r. 521.

Gava şair, di nav yek yekeye nezmî ya helbestê de wan peyvên ku têkiliya wan a wateyî bi hev re xurt e bi kar bîne, hunera tenasubê pêk tê. Di vê berhemê de ev hunera peyvên jî gelek heye.

10 **Bi çol û çolistanê**
 Li deşt û bi yabanê
 Ajote şaristanê

18 Qeşe go mêvan'im bila ve
 Biha zor û zav e
 Çil **tûmen dirav** e

23 Keşe birayê **Mîr** bû
 Lê Lendêho **wezîr** bû
 Pir ew ji wî **tedbîr** bû
 Hero **dîwana Mîr** bû

47 ‘Umer **hesp** anî der e
 Lê kirî **zînê zer** e
 Şidandî **teng û ber** e
 Li **puştê** ket ‘Umer e

1. 5. 4. Hunera Telmihê

Ew hikaye, fikre, gotina pêşiyên, yan jî helbestek û gotineke navdar ku di îbareyê helbestê de derbas nabe; bes îşaret lê tê kirin, dibe hunera telmihê. Bi awayekî aşkera naye diyarkirin; lê belê bi awayê îmayî tê bibîrxistin.⁵² Ev cûre huner di Qewlî de kême.

25 Leymûn e xwe Leymûn e
 Sirr li wê zahir bûne
 Mîn daye bi yeqîn e
 Here ji bo xwe bîne

⁵² Ferit Develioğlu, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 2012, r. 1248.

Ev hevoka ku me reş û stûr destnîşan kiriye, werivên welî ku xwedî keşf û keramet in tîne bîra meriv.

29 Mîrê'm mêvanek bo Keşe hat **Qureyş** e
Mecnûn e bête pêş e
Hespê Reş kit teftêş e

Ev peyva navê **Qureyş**, qebîleya malbata Cenabê Pêxember tîne bîra me.

83 Eşhabe wî dihatin
Kafir ji ber hilatin
Xudanê bût û **Laṭ** in

Ev peyva **Laṭ**, navê wî pûtî ye ku berî hatina Îslamiyetê, li Mekkeyê çikandî bûye.

1. 5. 5. Hunera Tekrîrê

Di edebiyatê de, ji bo ku bandora/tesîra peyvê bête zêdekirin, hin peyv, bi zanetî têne dubarekirin û ev hunera peyvê ya edebî tê pêkanîn.⁵³ Di berhemê de ev hunera tekrîrê heye.

23 Keşe birayê **Mîr** bû
Lê Lendeho wezîr bû
Pir ew ji wî tedbîr bû
Hero dîwana **Mîr** bû

Peyva **Mîr** hatiye dubarekirin.

25 **Leymûn** e xwe **Leymûn** e
Sirr li wê zahir bûne
Mîn daye bi yeqîn e
Here ji bo xwe bîne

42 **Go hey hote hey hote**
Mîrê me qenc **gote**
Hespê di xwe firote
Çûye beha **negote**
Em şerker in ji bo te

⁵³ H. b. r. 1244.

1. 5. 6. Hunera Întaqê

Ew hunera edebî ya peyvê ye ku mexlûqên ji xeynî merivan, di berhema edebî de tê bizarûzimankirin.⁵⁴ Di berhemê de yek rêzbandek heye.

45 Umer çûye ji der da
Yasîn xwendî jiber da
Borî digel xeber da

1. 5. 7. Hunera Tezatê

Ew hunera edebî ya peyvê ye ku di rêzbenda helbestê de, du peyvên dijwate bi hev re tèn bikaranîn. Ev huner di berhemê de heye.

2 Hespê di nêv **kuffaran**
Bi dil ew bû **Musulman**
Muhemmed pê ‘elam e

10 Bi çol û **çolistanê**
Li deşt û bi yabanê
Ajote **şaristanê**

15 Hatim **izharî** kim
Sirra xwe guftarî kim
Hespê Reş geryarî kim

1. 5. 8. Hunera Teşxîsê

Ew hunera edebî ya peyvê/gotinê ye ku edîb, şexsiyet dide tiştan, wan dixê şûna mirovan û xîtabî wan dixe.⁵⁵ Ji ber ku serlehengê xezanameya me hesp e û weke mirovan îman bi dînê Îslamê aniye, bivê nevê jixwe di serî de hunera teşxîsê tê de heye. Ji bilî hespê, îca teyrikê bi navê “hehecîk” jî weke qasid, ji aliyê Hz. Umer ve hatiye şandin bo Medîneyê.

2 Hespê di nêv kuffaran

⁵⁴ H. b. r. 508.

⁵⁵ Ferit Develioğlu, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 2012, r. 1277.

Bi dil ew bû Musulman

Muħemmed pê ‘elam e

- 71 Înê heta îné
Çûka li hêlîné
Sor bûye ji xûnê

Cewabê bibe Medîné

Eşhaban go da biçîné

1. 5. 9. Hunera Mubalexeyê

Ew hunera edebî ya gotîné ye ku edîb, bi peyv û bêjeyan, tiştêkî zêde zêde mezin dîkin, yan jî tiştêkî piçûk, mezin nîşan didin.⁵⁶ Di vê xezanameyê de ev huner hatiye kirin. Ji ber ku berhemên xezayê, bi zimanê coş û kelecânî bûyeran vedibêjin, hunera edebî ya gotîné ya herî zêde ku di wan de tê îcrakirin, ev hunera mubalexeyê ye. Çawa ku em dê li jêrê, di mînakên de jî destnîşan bikin, di vê hunera mubalexeyê de, piraniya caran, tiştên awarte û xeyalî ku dûrî rastiye ne jî, tîr derbirîn:

- 52 Keşeyî şer bi şîr kir
‘Umerî şer bi tîr kir
Meydan ji xûnê tîr kir

- 53 Keşe şerekî zor kir
Bi misriyê muhur kir
Meydan ji xûnê sor kir

- 54 ‘Umer şerekî xweş kir
Bi tertîb û bi şeş kir
Meydan tijî wî leş kir

- 101 Elî kafîr dibirrîn
Di çil çîyan wer kirîn
Xaç ji xûnê çê kirin

⁵⁶ H. b. r. 816.

Di van yekeyên nezmî de, ew ciyên ku bi rengê reştir hatine diyarkirin, bi awayekî eyan beyan diyar dikin û di derbirîna wan de mubalexe heye.

1. 5. 10. Hunera Îrsalê Mesel

Ev hunera peyvê li ser bingeha di helbestê de bikaranîna gotinên pêşiyên e. Di berhemê de gotina pêşiyên Kurmancan ku dibêjin “Mêr ji mêran çêtir hene.” di vê rêzbenda jêr de hatiye bikaranîn. Mebesta şair pê ew bûye ku hêza vegotinê pê xurt û zexim bike.

4 Eşhabî çil Peter in
Hemî têk difikirin
Mêr ji mêran çêtir in
Sirran ji yek digirin

20 Go: “Ez ‘Umerê sor im
Şîrê merteb ji jor im
Ji serê xwe dibûrim
Di Hespê Reş nabûrim.”

1. 5. 11. Hunera Nîdayê

Ev hunera edebî ya gotinê/peyvê jî di berhemê de heye. Şair, bi peyvên baneşanê, yên mîna “ho, hê, lo, lê, gidî, gelî û hey” vê hunerê di metnê xwe de îcra dike:

3 Muhemmed **deng hiltîne:**
“Heçî Hespê Reş bîne,
Qesrek ji min bistîne.”

31 Lez kin û **bilezînin!**
Kêrana biçerxînin!
Xewlanî jê’b derînin!
Kêrê dem û kar kirin!”

42 Go: “**Hey** hote **hey** hote!
Mîrê me qenc gote!

Hespê di xwe firote!
Çûye beha negote!
Em şerker in ji bo te!”

1. 5. 12. Hunera Meczazê Mursel

Ev hunera edebî ya peyvê jî di berhemê de heye. Hin peyvên rengdêrîn, di şûna peyvên navdêrîn ê eslî de tên bikaranîn:

68 Kelkêtê di tarînê
Çûkanê li hêlînê
Dev sor bûye ji xûnê
Cewab çûye **Medînê**
Eşhaban got: “Biçûnê

Di vê derê de ku dibêje cewab çûye Medînê, mebest pê ew e ku cewab gihîştîye gelê Medîneyê. Lewre di vê yekeya nezmê de hunera edebî ya mecazê mursel çê bûye.

1. 6. Hunerên Edebî yên Dengan

Di helbestan de ji bilî hunerên edebî yên peyvan, hunerên ku li ser aheng û rîtm deng û tîpan jî tên îcrakirin hene. Ew jî du huner in ku di vê derê de behsa wan tê kirin: Hunera alîterasyon û hunera asonansê.

1. 6. 1. Hunera Alîterasyonê

Ew hunera edebî ya tîpan e ku edîb, bi dubarekirina herfên dengdar, aheng û rîtmê di nav peyvan de pêk tîne. Ev jî di berhemê de heye.

1 Mecal ew mecal bû
Kafîrek dînbetal bû
Hespek çê li bal bû

Di vê yekeya nezmê de tîpa dengdar “-I” ji bo rîtm û ahengê hatiye dubarekirin.

26 Leymûnê bi libas ke
Bi kefi û kiras ke

Mihvan'im tu xelas ke

Di vê yekeya nezmê de tîpa dengdar “-s” ji bo ahenga helbestê hatiye bikaranîn

91 **Hey hewara Hovonîs e**

Kafîrek xûnalîs e

Kafîr pê da li fêz e

Di vê yekeya nezmê de tîpa dengdar “-h” ji bo ahenga helbestê hatiye bikaranîn

1. 6. 2. Hunera Asonansê

Ew hunera edebî ya rîtmîk e ku bi xêra ser tîpên dengdêr tê îcrakirin. Di heman rêzika helbestê de, tîpeke dengdêr, bi awayekî rêkûpêkî di nav peyvên de tê dubarekirin

3 **Muħemmed deng hiltîne**

Heçî Hespê Reş bîne

Qesrek ji min bistîne

Di vê yekeya nezmê de tîpa “-e” weke tîpeke hêmana ahengê hatiye bikaranîn û hunera deng a asonansê çê bûye.

11 **Geriya li şaristan e**

Siwal kir pinhan e

Li Qeşey bû mêvan e

Di vê yekeya nezmê de tîpa dengdêr “-a” weke tîpeke ku hêmana ahengê pêk tîne hatiye bikaranîn.

1. 7. Avasaziya Nezmî ya Metnê Berhemê

Gava em ji hêla avasaziya nezmî ya metnê helbestê ve li berhemê dinihêrin, em dibînin ku rêzîkên wê, bi awayekî bêrêkûpêkî li komerêzan, ango li rêzbendan dabeş bûne. Hejmara bendên *Qewlê Hespê Reş*, 102 ye. Hejmara hin rêzbendan ji du rêzikan, hin jê ji sê, hin jê ji çar rêzikan, hinek jî jê ji pênc rêzikan pêk hatiye. Digel ku M. Emîn Osman, di xebata xwe de navê vê berhemê weke *Beyta Hespê Reş* diyar kiriye jî, komên rêzan, ne ji beytan/malikan; bes ji bendan, çarînan û pêncînan pêk hatiye. Wekî dî, ji nusxeyan diyar dibe ku di hin yekeyên nezmî de rêzîk kêmanê mane û nehatine nivîsîn.

Yekeya nezmî ya bi hejmara 57an, ji yek rêzîkeke tenê pêk hatiye:

57 Li ‘Umer kir’ne deng e

1. 7. 1. Komrêzên Beytî

Çar bendên berhemê, ji yekeyên nezmê yên beytî pêk hatine:

32 Ji serî heta xwar e
Bigrin hûn tev yek car e

56 Kewran û hem firenkan
Rim dane binê çengan

1. 7. 2. Komrêzên Sêrêzî

Şêst û heşt bendên berhemê, ji komrêzên sêrêzî pêk hatine. Herjmara herî zêde ev yekeya nezmî ye:

1 Mecal ew mecal bû
Kafîrek dînbetal bû
Hespek çê li bal bû

2 Hespê di nêv kuffaran
Bi dil ew bû Musulman
Muhemmed pê ‘elam e

3 Muhemmed deng hiltîne
Heçî Hespê Reş bîne
Qesrek ji min bistîne

1. 7. 3. Komrêzên Çarrêzî

Nozdeh bendên berhemê, ji yekeyên nezmê yên çarrînî pêk hatine:

22 Ser’im bi serê te ra
Mal’im bi malê te ra

Çêr'im bidin ji xwe ra
Keşe ye barê şer ra

23 Keşe birayê Mîr bû
Lê Lendeho wezîr bû
Pir ew ji wî tedbîr bû
Hero dîwana Mîr bû

24 Keşe keçek çê li bal bû
Ciwaneke bikemal bû
Enî ji text û xal bû
Navê ewê Leymûn bû

1. 7. 4. Komrêzên Pêncrêzî

Neh bendên berhemê, ji yekeya nezmê yên pêncînî pêk hatine:

33 Lendeho got qet venabin
Qasid ji xû terxan in
Di nêv me ew ji wan in
'Amî pê dizanin
Xelat li ser milan in

2. Ji Aliyê Naverokê ve Qewlê Hespê Reş

Ji bo ku em bi awayekî baş bi naveroka berhemê serwext bibin, divê ku em ji aliyê zihniyet, avasazî, tema-mijar, ziman-vegotin û kevneşopî ya serdemê ve wê binasin û wê şîrove bikin.

2. 1. Zihniyeta Berhemê

Kelîmeya “zihin” bi Erebi ye. Tê wateya êqil. Zihniyye, peyveke dariştî ye û dîsan bi Erebi ye, wateya wê “rêya aqil” û ramînê ye. Wekî dî, wateya zihniyetê, raman, têgihîştin, hiş û aqilparêzî ye.⁵⁷

⁵⁷ Ferit Develioğlu, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 2012, r. 1383.

Gava edîbek berhema xwe ya edebî dihûne, helbet çavkaniya wî/wê, bûyereke e û ev bûyer jî, xwedî hêlên xwe yên siyasî, sosyal, îdarî, ‘edlî, eskerî, bazirganî, perwerdehî û dînî ye. Ha ev hemû hêman gişt bi hev re, di weqta ku edîb berhema xwe dinivîsîne de, bandorê li ser wî/wê dikin. Lewre ew çanda serdemê ku edîb tê de dijî, tesîrê li ser awayê hûnandina berhema wî/wê dikin. Ew exlaq û estetîka serdemê, bi awayekî ji awayan, xwe di berhemê de dide der. Tehma hunera berhemê, bi ekla vegotina berhemdêr xweş dibe. Hetta awayê zimanê vegotina edîb jî, li gor zihniyeta serdemê, xwe bi rêk û pêk dike. Piştî tesbîtîkirina van hemû taybetiyan, meriv dikare bi awayekî hîn tekûztir berhemê vehûrîne û ji peyama edîb a zihniyetî fêm bike.

Xezanameya *Qewqlê Hespê Reş*, ji hêla zihniyeta serdema xwe ya edebî ve, bi motîfên cihêrengî diyar e ku berhemêke dînî û Îslamî ye. Ji ber ku ji hêla têgihîştina huner û edebî ve ji serdema ewil a Îslamî re bûye eynik, hêjayî behsê ye ku meriv vê berhemê, weke berhema ewil a serdema edebiyata Kurdî (Kurmancî) ya Îslamî ya nivîskî qebûl bike û tê de têgihên Îslamî zaf hene.

50 Umer hesp da meydanê
Yek bû li wî Sen’anê
Xeber be li Kewranê
Keşe ê muslimananê

55 Ew Keşeê wehîd e
Merteba wî tewhîd e
Kewranê kir şehîd e

Berhemên edebî, ji serdema xwe re dibin mirêk. Ew nixê çandî yên mîna binasaziya sosyal, aborî û siyasî ya serdemê, awayê têgihîştina jiyanê, pergala perwerdehiyê ya serdemê û zewqa hunerî ya edebî û baweriyên dînî/ayinî yên serdemê gişt, di berhema edebî de, li gor derfetên edîb xwe didin der.

Ji van rêzbandan diyar dibe ku şairê me, ji hêla zihniyeta xwe ve xwestiye ‘edl û sulhê bixe navbera mezinên dînê Îslamê û xuyaniyên dînê Xiristiyanan. Wê hingê dînê Îslamê nû hatiye, herb û xezayên muslimanan li hember ne-muslimanan berdewam dikin, gelê Kurd jî bi girseyî hîna di 17 saliya sedsala yekem a hicrî de bûne Musliman; çî heye ku ji berê ve, ew û

ne-muslimên mîna gelê Ermenî û Suryanî, kirîv û cîranê hev in. Lewre şairê me ku ronakbîrekî medreseyî ye, xwestiye kîn û girra navbera Muslim û ne-musliman, bi vê berhema xwe, li hember hev kêmbike. Bi sembola Xelîfe Umer û Keşe, peyama xweşhaliya hevgirtinê daye çîna serdest a her du dînên semawî. Jixwe li gor huqûqa dînê Îslamê jî, heta ku ne-muslim êrîşî ser nixên dînê Îslamî nekin, nabe ku Muslim têkilî ne-musliman bibin û her tiştê wan di nav Musliman de parastî ye. Me divê ku em angaştê xwe bi delîl û senedan bidin peyitandin û îsbatkirin.

Ji weqtê destpêka Îslamê ve, têkiliya sehabiyên Cenabê Pêxember bi xwegirtiyên Xiristiyanan re li ser bingeha aştî û hevkarîyê bûye. Ji bo vê yekê, mînaka ewil, koça sehabiyên a welatê Hebeşistanê ye. Hîna dema ku Cenabê Pêxember nû Nebîtiya xwe li Mekkeyê îlan kiriye û Muşrikên Mekkeyê boykot, tecrîd û îşkenceyê li Muslimên ewil dikin, bi îzna Cenabê Pêxember, hin sehabî, xwe li Melîkê Hebeşî yê Xiristiyân Necaşî digrin û ev Melîk, digel gef û gurên giran ên Muşrikan jî, xwedî li sehabiyên derdikeve û wan diparêze. Di Siyera Nebî de ev mesela bi awayekî mutewatir hatiye qeydkirin: “Resûlullah gava dît ku sehabî tûşî bela û ezabê muşrikan tên, lê belê ew bi şexsê xwe, li ciyê xwe, di bin afiyeta Ellahu teala ezze we celle û parastina Ebû Talîb de ye û qeweta wî nagihîjê ku wan eziyet û tehdeyên muşrikan bide sekinandin, ji sehabiyên re got ku heke hûn derkevin biçin welatê Hebeşî, li wê derê milûkek heye, bê guman li cem wî, li tu kesî zulm naye kirin, ka heta ku Ellahu teala fereceke xêrê bide we û hûn ji vê rewşê xelas bibin. Resûlullah li wê derê ma û bi awayekî bêrawest, bi terzê nepenî û aşkerayî wî xelkê Mekkeyê vexwendin bi bal Ellahî ve. Navê Necaşî, wê hingê Esheme bin Ebher bû. Wateya Esheme bi Erebbî, camêrî ye. Îca peyva Necaşî, ji hemî milûkên Hebeşî re dihat gotinê. Gelê Hebeş, Mesîhiyên Nestûrî bûn. Muhacir, bi awayê yeko yeko, didu didu û nepenî derketin. Meha Recebê, sala 5an a Nebîtiyê, mîladî 615 bû. Yê ku derketin, 12 mêr û 4 pîrek bûn. Heta hemî hatin gihîştin Şe‘îbetê. Ev cî, deverêke biçûk e û di navbera Mekke û Ciddeyê de ye. Hinek ji wan bi siwarî; hinek bi peyatî... Ellahu teala ew Muslim muweffeq kirin, saeta ku hatin gihîştin ber behrê, du sefîneyên bazirganiyê jî hatibûn wê derê, ew jî li wan siwar bûn û ber bi welatê Hebeşî ve çûn. Qureyşî, ketin ser şopa wan, heta gihîştin ber behrê, ciyê ku ew siwar bûbûn; lê ew negihîştin yekî tenê jî ji wan; çunkî ew bi awayekî xef û starane derketibûn. Muhaciran got em hatin ser erdê Hebeşî û em bi xêr hatin û em bûn cîranê însanên bixêr; lewre em li ser dînê xwe bi ewle ne û bi rehetî ji Ellahî re îbadet dikin û tehde li me nabe; bi ser de jî tiştêkî ku em jê îkrah bikin, naye guhê me. Welatê Hebeş, ji bo Qureyşiyên ciyê bazirganiyê bû. Wan li wê derê bazirganî dikir, di nav ewlehiyê de rizq bi dest dixistin. Îca hejmara muhaciran hidik bû;

lê di vê koça wan de nîşanên mezin û peyamên girîng hebûn ji bo dîroka Îslamê. Ji Mekkeyîyan re delîlên geş û ronak peyde bûbûn. Wan dît ku Muslim, di îxlasê de gihîştine çî dereceyeke bilind û wan fam kir bê ka Muslim di rêya eqîdeya xwe ya ku wan xwe pê ve hişk û zexm girê daye de, çî zehmetî û zerar dane pêş çavê xwe. Ha ev koça ewil, bû destpêka koça duyem a ber bi Hebeşê û peyre ber bi Medîneyê ve. Di nav koma van koçberên Hebeşê de Ruqyeteya keça Resûlallah, digel mêrê xwe ‘Usman b. ‘Efan jî hebû.’⁵⁸

Ev keşeyê kal ku digel qîza xwe piştgiriya Hz. Umer dike, peyameke hêja ye ji bo hevqirtina Xiristiyan û Muslimanan.

Hemû herbên Cenabê Pêxember, li hember muşrikan, bi awayê şerê berevaniyê bûye. Wî xwestiye ku bi ehlê dînên semawî re di nav aştiyê de bijî. Ew helwesta wî ya neyar a li hember Yahûdiyên Medîneyê jî, ne ji ber wî; bes ji ber helwest û tevgera Yahûdiyan bi xwe bûye. Di serdema xelîfetya Hz. Ebû Bekir de jî şerekî ku di navbera Xiristiyan û Musliman de qewimî be, di dîrokê de nehatiye qeydkirin.

Mînaeke gelek girîng e ku Musliman xêra Xiristiyanan xwestiye, ew herba navbera Îranî û Rûman/Bizansiyan ku Cenabê Pêxember xêrxwaziya Xiristiyanan kiriye. Heta di Qur’anê de, ji ber vê herbê, navê sûreta 30yî, “Rûm” e. Hemû sûret, 60 ayet e. Ayeta 17an ne tê de, hemû ayetên wê li Mekkeyê hatine nazilkin. Ji ber ku di vê sûretê de hatiye beyankirin ku Rûm, ango Bizansiyan Xiristiyan ku di herba li hember Îraniyan de têk çûbûn, dê careke dî, di herbeke li hember Îraniyan de bi ser bikevin, ev nav lê hatiye danîn. Peyva “Rûm”, navek e ku ‘Ereb ji Grekî, Slav û Romayiyên Latin-eslî re dibêjin. Bi vî navî, qesda teb‘ayên/peyrew ên Impertoriya Bîzans tê kirin ku bi navê Romaya Rojhilat tê zanîn.⁵⁹

Sûret bi vî awayî dest pê dike: “Elîf Lam Mîm. Rûm têk çûn. Li erdekî herî zêde nêzîk; bes piştî vê têkçûna xwe, helbet dê bibin xalib. Di nav çend bid‘e salan de, çî li pêş, çî li paş, dawîya dawî, her karûbar û emr, ên Ellahî ne û wê rojê, Mumin, helbet dê kêfxweş bibin. Bi alîkariya Ellahî, ew ji kê re bixwaze, alîkarî dike û ew ‘ezîz e (xwedî hêza mutleq e) û rehîm e.”⁶⁰

Tefsîra van ayetan, bi vî awayî hatiye kirin: “Dema ku pêxemberî ji Cenabê Muhemmed re hat, Romaya Rojhilat û Îran, du dewletên herî mezin ên cîhanê bûn. Li gor ku Suleyman Efendiyê Hindî li ser dîroka *Esra Seadetê* lêkolîn kiriye, sala 5an a pêxemberiyê, ango sala 613yan a miladî, ev du dewletên cîran û hevrik, li hember hev ketibûn herbeke

⁵⁸ Muhammed Riza, Muhammed Resûlallah Selloallahu ‘Eleyhî Wesellem, El Mektebetu’l Îslamiyyetî, Qahire, 1996, r. 97-98.

⁵⁹ Kur’an Yolu, Türkçe Meal ve Tefsir, Heyet, DİB Yayınları, cild IV, Ankara, 2008, r. 289-290.

⁶⁰ Sûreta er- Rûm, ayet, 1-5.

gelek giran. Îran, di bin femandariya Xusrewê Duyem de; diyarê Rûm jî, di bin desthilatdariya Hirakliûs de bû. Sînorên wan, li ser çemê Dicle û Firatê digihîşt hev û dî. Filestîn, Sûriye, Misir, hinek ji Iraqê û Asyaya Piçûk(Enedol), tabî'ê Rûmiyan bûn. Îraniyan, ji du hêlan ve êrîş bir ser Rûmiyan. Bi ser Dicle û Firatê (Ezraat û Busra) de, çûn ser Sûriyeyê; ji hêla Azerbêcan û Ermenistanê ve bi ser Asyaya Piçûk de girtin. Artêşên Îranê, di van her du cebheyen/eniyan de hêzên Rûmî berepaş dan vekişandin û heta ku wan ew berdan behrê, zor dan ser wan. Îraniyan, hemû bajarên pîroz ên li Sûriyeyê zebt kirin û sala 614an a miladî, hemû Filestîn û Qudsa Şerîf dagir kirin. Wan hemû dêr hilweşandin û çî qas xan û banên dînî hebûn, gişt lewitandin. 26 000 Yehûdî jî beşdarî wan Îraniyan bûn û wan zêdetirî 60 000 Xiristiyanî dan ber devê şûrî. Qesra Kisrayê Îranî, bi qoqê 30 000 kuştîyî bûbû cîgeh. Îranî bi vê dagirkeriyê nesekinîn û wan bi ser Misirê de jî girtibû.”⁶¹ Wekî dî, ayeta 28an a sûreta Maîde, ayeta 114an a sûreta En'am, ayeta 36an a sûreta Re'id, ayetên 52 û 53yan a sûreta Qeses û ayeta 13an a sûreta Şûra, delîl in ji bo wê yekê ku Qur'an, bi çavekî baş li Xiristiyanan dinêre.

Hinek hedîsên Cenabê Pêxember hene diyar dikin ku dê Hz. Îsa (e.s.) di axirê zeman de ji esmanan dakeve; bê dunyayê, li hember Deccalê Îslamê şer bike, Deccel bikuje û bi şerî'eta Îslamê 'emel bike.⁶² Şîroveya vê hedîsê jî bi vî awayî hatiye kirin: Li hember felsefeya tabîetperest ku cereyana kufrî û înkara ulûhiyetê dide, di axirê zeman de dînê Îsewîtiyê, dê safî bibe û ji tiştên xurafe dê xwe xelas bike û wergere Îslamiyetê. Ha di vê hiyamê de çawa ku şexsê manewî yê Îsewîtiyê, bi şûrê wehya semawî dê wî şexsê manewî yê bêdîniya bidehşet bikuje, Hz. Îsa jî dê temsîla şexsê manewî yê Îsewîtiyê bike û dê wî Deccalê ku temsîla şexsê manewî yê bêdîniyê dike, bikuje.⁶³

Ji hêla xusûmet û dijminahiyê ve civaka Îslamê ketiye rewşeke kambax. Aliyê aşî û kamraniya cografyaya Musliman, ev serê çendîn salan e ku di nav toz û xubara şer û pevçûnan de gelek neçê ketiye. Hal ku hal e, mezinên dînî yên vê civakê, piştî her du Herbên Mezin ên Cihanê, her û her rêya hezkirin, xweşbînî û aşîyê nîşan didin. Yek ji van mufessir û muctehîdê sedsala me Seîd Nûrsî, vê meseleyê wiha derbiriye: “Weqtê xusûmet û edawetê qediya. Du Herbên Giştî, nîşan da ku edawet çî qas fena û texrîbkar e û zulmeke çendîn bi

⁶¹ Elmalılı, Hamdi Yazır, Hak Dini Kur'an Dili, Emir Yayınevi, İstanbul,2000, r. 253-255.

⁶² Buxarî, Enbiya, 49; Muslim, Îman, 242.

⁶³ Said Nursî, Mektubat, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 1998, r. 12.

dehşet e. Tezahur bû ku tê de ti feydeyek tune ye. Nexwe xirabî û guneyên dijminên me, -bi şertê ku êrîş nekin- bila neyartiya me nekşîne. Cehennem û ezabê Îlahî têra wan dike.”⁶⁴

Zihniyet, ew binesaziya zihnî ya çandî û civakî ye ku endamên civakê, li hember bûyerên girîng xwe pê radigrin û ji ferdên civakê re dibe reng û rûyê helwest û tevgerê. Lewre wac, kelecane û hêrsa civakê, bi vî awayî dibe hevbeş û pê re jî zihniyeteke xweser di nav civakê de dibe serdest. Baweriyên dînî jî, yek ji van hêmanan e ku reng û teşe dide zihniyeta civakê. Bi ser de jî, bandor li çanda civaka xwe dike. di nav derbasbûna demê re, çawa ku baweriyên dînî bandorê li çanda civakê dikin, çanda civakê jî tesîreke berbiçav li baweriya dînî dike û ev hemû bi hev re, ji ferdên civakê re dibin zihniyet. Awa û teherê jiyana civakê, li ser vê bingehê ji xwe re têgihîştineke hişmendiyê dike serdest. Ha ev hêman gişt, dîteyisîn metnên edebî. Çi devkî ango berhemên edebiyata gelêrî bin, çi jî berhemên edebiyata nivîskî bin, vê zihniyetê di xwe de dihevine û nîşan dide. Geşedanên eskerî, aborî, sosyal, siyasî, dînî û hunerî yên serdemên dîrokî, bi xêra metnên edebî tînin qeydkirin. Lewre ev berhemên edebî, ji zanista dîrok, felsefe û sosyolijiyê re dibin çavkaniyên belgeyî. Ev berhema xezanemeyê, divê ku ji van hêlan ve bête helsegandin ku peyama hilberînerê wê, şaş neye fêmkîn.

Çanda populer, bi xwe re çand û medeniyeta serdest jî tîne. Civaka Kurd, bi hatina çanda Îslamê, bi temamî dev ji çanda xwe ya berê berneda; lê belê li hember çanda Îslamî, xwe li rik, girr û hêrsê jî girê neda. Çawa ku îro di nav civaka Kurd de bi tesîra hêmanên hemdem/esrî, em hin guherîn û veguherînên zihnî, hişmendî û asoyî dibînin, wê hingê jî –di serdema nivîsîna *Qewlê Hespê Reş* de-, bi qebûlkirina çand û şaristaniya Îslamê re, di nav civaka Kurdan de guherîn û veguherînên zihnî yên xasî bi wê serdemê, pêk hatine. Ha ev *Qewlê Hespê Reş*, bûye ciyekî qeydkirin û teyisîna vê guherîna zihnî ya wê hingê.

Di dewra xelîfetiya Hz. Umer de û roj bi roj, welatên derdora welatê Kurdan dikevin bin desthilatdariya pergala Îslamê. Îca Imperetoriya Sasanî, li hember Imperetoriya Bizansî, bi dirêjahiya serê salan li ser axa gelê Kurd şerên giran kirine, civaka Kurd, ji ber van şer û pevçûnên wan, êdî kerixiye, aciz bûye û hestên nefretî bi şêniyan re çê bûne. Gava gelê Kurd bi wê edalet û refaha navdar a Xelîfe Umer dihesa, tevî Sasanî û hin gelên Bizansî, bi çavekî baş li wan dinêrin û bi wan serketinên dîrokî yên şervanên navdar ên Îslamî, bi awayekî ji awayan, kêfxweş dibin. Em nîşaneyên vê yekê, di nav rêzikên dîrokê de jî dibînin: “Li gor Belazurî, ‘Iyaz, li gor mercên wan, Amidê jî, Ruhayê(Urfayê) jî fetih kir. Wî Meyyafariqîn jî dîsa bi van şertan girt bin destê xwe. Wî Keferosa û Nasibîn(Nisêbîn) jî bi van şertan fetih kir.

⁶⁴ Bediuzzaman Seîd Nûrsî, Rîsaleya Uxuwetê, (Wer. Ayhan Yıldız) Hizmet Vakfı Yayınları, İstanbul, 2012, r. 45.

Wî Tur-‘Abidîn, Keleha Mêrdîn û Dara jî bi van şertan bi dest xist. Dema ku ew li vê derê bûye, Begê Zewzenê hat cem wî û bi şertê ku baceke diyarkirî bide, bi ‘Iyaz re li ser axa xwe li hev kir. Ev der hemû di 19 û 20ê sala hicrî de, piştî çend rojên meha Muherrremê çê bûn.”⁶⁵

Di weqtekî wisan de Kurd, bi vî awayî, cara ewil çanda Îslamê nas dikin. Bere bere hestên civaka Kurd bi hezkirina nixxên Îslamî gur û geş bûne ku heta ev berhem hatiye hilberîn. Lewre, piştî çendakî, dema ku ew ji nêz ve pergala ‘adil û resen a Îslamî ya wê hingê nas dikin, ji dil û can vê di dilê xwe de dihevinin û bi ser de jî hozan radibin, berhemên edebî yên mîna xezanameyan hildiberînin û çanda nû, diteyise edebiyata gelêrî ya Kurdan. Edîbê Kurmanc ê herî kevnar Herîrî, bûyereke wê hingê ya girîng a civakî, bi zimanekî xweş ê serketî û bi vegotîneke zelal û rewan, li gor derfetên xwe yên wê hingê, qeyd kiriye, hûnaye û ragihandiyê roja me. Ji helwest û çavnêrîna edîbê me diyar e ku ji wî keşeyê ku mezinekî dînê Xiristiyanîyê ye hez kiriye; bes li hember siyasetmedar û desthilatdarên mîna mîr, wezîr Lendeho û fermandarên wî yên mîna Şelemon, Ferfûr û Avonis, helwesteke rexnegirane nîşan daye.

Her wiha, di berhemê de, motîfên Îslamî û kurdewar, hêmanên wê yên ahengî, teşeyê nezmî, çeşnê wê yê edebî, şewaza wê ya derbirîna bûyerê, zimanê wê û binesaziya wê ya nezmî jî reng û rûyê zihniyeta wê nîşan dide. Em di van komrêzên jêr de, rastî hin motîfên kurdewar jî tên. Ji ber ku cûreyê nezmî yê vê berhema menzûm xezaname ye; lê belê hilberînerê wê, hunermendekî Kurd e, bivê nevé xwedî hin taybetmendiyên “gelêrî yê Kurdî ye jî. Di berhemê folklorîk de, sembolên çandî yên neteweyan jî hene. Arzu Öztürkmen, wiha amaje bi vê mijarê kiriye: “Cara ewil, Johann Gottfried Herder ku ramangêrekî Almanî ye, li ser folklorê, lêkolîneke xweser derxistiyê pêş û balê kişandiyê serê. Wî têkilî di navbera gel û çandê de daniye ku ev hewldana wî, mîna keke herî ewil e di vê hêlê de. Mîna ku duduyan jî, ew têkilî ye ku di navbera neteweperperîya Fînan û destana Kalevela de ye.”⁶⁶

Gelek enteresan e ku em ji rêzikên *Qewlê Hespê Reş* tê digihîjin ku hin ji rengên ala û senceqên sehabiyên Pêxember, ji rengê **kesk**, **sor**, **spî û zer** pêk hatine. Ev reng, hem di nusxeya Edullah Varlı de, hem ji di ya Zeynelabidîn Amedî de hene. Îro ev rengên ha, di ala neteweyî ya Kurdên Bakurê Iraqê de jî hene. Em dikarin weke nêrîneke şexsî diyar bikin ku ev helwesta kesên ku ev rengên neteweyî di vê xezanameyê de bi cî kirine, ew bûye ku nixxên millî, bi xêra vê berhemê di hişê civakê de zindî bigrin. Di nusxeya Zeynelabidîn Amedî de ev motîf wiha hatine rêz kirin:

⁶⁵ Diyarbakır’ın Fethi, Tarihi ve Kültürü, (Hazırlayan: Zeynel Abidin Çiçek), Diyarbakır Söz, Diyarbakır, 2007, r. 25.

⁶⁶ Arzu Öztürkmen, Türkiye’de Folklor ve Milliyetçilik, İletişim Yayınları, İstanbul, 2009, r. 16.

- 81 Koma **sor û spî** ye
Alay li ber ketî ye
Sed selewat li Nebî ne
- 82 Koma **kesk û sor û zer**
Eşhaban dî ketine ber
Ew birayê Pêgember

Heta di xezanameya *Qewlê Newala Sîsebanê* de jî ev rengên kurdewar, wek motîf hatine bikarînan:

“**Alaya kesk û sor** e, îanen dil eyna kir
Eshabe hatin dor e şertê xezwê beyan kir
Xalid kişande bor e, ji bo qirên elwan kir
Dê kafiran kim kor e l’nik Mustefa meydan kir
...
Ala sor û zer e înane ser meydanê
Ket pêşyê Peyxember e, ya Reb tu bê li hanê
Bêyreqa Pêxember e, ket pêşiyê Umer e
Eshabyan deranî bi şîr û tîr, xencer e”⁶⁷

Di nusxeya *Qewlê Hespê Reş* a ku ji aliyê Varlı ve hatiye çapkirin de jî ev rengên navbuhûrî hene:

“Eshab serdar ew zanî, lew li dorê civane
Ala ewî hildaye, egît mêrxas bin da ne
Çi **ala sor û zer** e, îna derket Medîne
Ew ala Pêxember e, kom di bin da civiyane
Rabû çerixî Umer, hazir bû çû meydan e

⁶⁷ Qewlê Newala Sîsebanê, (Amadekar: Ahmet Demir), Weşanxaneyê Nûbihar, Istanbul, 2012, r. 48-49.

Bi quweta ekber e, mêr neman li meydan e”
Pehlewan nam li ser e, her kes wî xwe nasîne
Pur kes li bal va çûne, hemî xwe dane dû ne
Di bin ala sor û zer, ji der heval nemane
Hemî li bal civîne, ka çi tevbîr hilîne
Ew **ala sor spî** ye, eshabê Nebî standine
Umer ewa hildaye, hev ra çûne meydan e
Ji dûr va ew xuya ye, neyar saw jê hildane
Alaya kesk û pembe, ew dan destê Osman e
Ellahu ekber dizane, bo Nebî wan hildane
Ew alayek şîrîn e, bo Muhemmed hiltîne
Xenîmê Kewran tîne, hemî bi xu di **zerîn** e⁶⁸

Digel ku xezaname, cengname û destan bi temamî ne xeyalî ne jî, bes hin aliyên wan ên xeyalî, carinan bi ser rastiya wan dikevin. Êdî ew hêmanên xeyalî û rasteqînî, bi hev re, di nav hev û dî de hatine vegotin û zihniyetê diyar dikin.

2. 2. Avasaziya Hêmanî ya Metnê Berhemê

Avasaziya hêmanî ya metnên ku li dormedara bûyeran çê dibin, li ser bingeha bûyer, rêşîna/hunîna bûyerê, kesên bûyerê, ango leheng û serlehengên bûyeran, têma û mijara bûyerê, dema qewimîna bûyerê û cîyê qewimîna bûyerê tê hunandin. Ev aliyên ha, hêmanên eslî û bingehîn ên metnên edebî ne. Metnên edebî yê mîna destan, cengname û xezanameyan, bi temamî li ser bingeha vegotinê ne. Ev vegotin, bi pîr û pergaleke birêkûpêk tê pêkanîn. Ev hêmanên ku li jorê behsa wan hat kirin, di nav hev de tên vegotin. Em van hêmanan, tevî têgihên wan ên edebî bi dorê vehûrînin.

⁶⁸ Ebdullah M. Varlı, Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, Weşanxaneyê Sîpan, Stenbol, 2004, r. 481.

Di *Qewlê Hespê Reş* de, bûyereke dînî ya serdema ewil a dîroka Îslamê hatiye vegotin. Li ser daxwaza Cenabê Pêxember, Hz. Umer ji Medîneya Munewwer diçe welatê ku hesp lê ye û gava dike ku vî hespî bîne, şer dertê û Hz. Umer, ancax bi xêra hawara sehabîyan ji vî şerî rizgar dibe û piştî şerekî dijwar, hespî tînin cem Cenabê Pêxember. Ji ber ku li gor seyra bûyerê Cenabê Pêxember li heyatê ye, hîna Hz. Umer nebûye xelîfe ku ev bûyer qewimiye; diyar e ku di hiyama Cenabê Pêxember de ev bûyer qewimiye û giregirên navdar ên sehabîyan hatine nav şerî.

Edîbê me Elî Herîrî, ev hîkayeya menzûm, li ser bingeha “planê bûyerî” vegotiye. Rêzebûyerên vê hîkayeyê, bi awayekî rêkûpêkî, li gor planê xwe hatine derbirin. Serê pêşî Cenabê Pêxember, pê hisiyaye ku hespekî qer, bi dilê xwe bûye Muslim û dixwaze ku bikeve bin xizmeta sehabîyan; lê belê ji ber ku di destê mîrekî Xiristiyan de ye, gelek diwace. Li ser vê yekê ji sehabîyên xwe re vê agahiyê radigihîne û li wan teklîf dike; bê ka kî dikare here wî bîne. Hz. Umer vê teklîfê qebûl dike û dikeve rê. Heta vê derê, “*beşa raxistinê*” ye.

Piştî vê bûyera ewil, êdî rêzebûyer dest pê dîkin û bi rûdana her bûyerekê, mereqa xwendevan, an jî mereqa guhdar, her ku vegotin pê de diçe, zêde dibe. Bi vî awayî li gor plan, êdî *beşa geşedana bûyerê* dest pê dike. Bi çûna Hz. Umer a bajarê mîrê Xiristiyan re, êdî pirsgirêk dest pê dike, xwendevan-guhdar dibêje gelo ka wê Hz. Umer çi bike, çawa bikeve bajêr, çawa bigihîje Hepê Reş, çawa lê siwar bibe, çawa ji destê mîrî derxe û çawa bîne? Ev gişt “*beşa girêkê*” pêk tîne.

Dema ku bi rûdanên silsileyî, mereqa meriv tê asta herî bilind, diyar dibe ku li vî welatî, birayekî mîr heye û keşe ye. Ew jî bi awayekî nepenî bûye Muslim. Hz. Umer xwe li mala wî digre û keşe jî wî bi mêvanî qebûl dike. Keşe, digel keça xwe ya Leymûnê, bi Hz. Umer re alîkarî dike, hespî bi siyaseta bazarkirin û kirîna ji mîrî digrin û Hz. Umer lê siwar dibe. Ku mîr poşman dibe, Umer hespî bi ser sûran de difirîne. Li vê derê merheleya duyem a mereqê dest pê dike û pirsgirêka herî mezin ew e ku Hz. Umer xwe li dêreke rahiban digre û palewanên mîrê bajêr dor lê digrin; bes çûkek nûçeya hesariya Hz. Umer digihîne sehabîyan û ew tînin Hz. Umer digel hespî xelas dîkin. Ev encam jî, “*beşa çaresiyê*” ye.

Rêsîn û hunîna rêzebûyeran wiha pê de diçe:

- Hz. Umer digihîje welatê Hespê Reş û li Keşeyekî dibe mêvan
- Keşe navê wî dipirse û Hz. Umer xwe pê dide naskirin. Keşe, îslambûna xwe ya ku hîna ji zû ve ye, jê re îlan dike û sozê piştgiriye dideyê û dibêje ku mîrê vê derê birayê min e û gelek zêde xedar e; bes em dê bi planeke tekûz hespî jê bistînin.

- Keça Keşe ya bi navê Leymûnê jî ji wan re dibe alîkar.
- Bi rênîşandana Keşe, Hz. Umer xwe bi navê bazirganê hespan dide naskirin.
- Keşe diçe dîwana mîr û jê daxwaz dike ku yekî bazirgan hatiye mala min, dixwaze ku Hespê Reş ji te bikire. Mîr, serê ewil bi vê teklîfê hêrs dibe; peyre bi nermkirina Keşe, razî dibe ku bifroşe. Keşe dibêje ku jixwe ev hesp dîn e û wê nehêle ku bazirgan lê siwar bibe û dê zêrên wî jî ji me re bimînin.
- Mîr dibêje bila şênîyên bajêr werin temaşeya hesp û bazirgan.
- Hz. Umer tê ber hespî, hesp gelek hêrsokî ye; bes Hz. Umer pê re bi [Farisiyeke fesîh]⁶⁹ dipeyive û hesp serê xwe dapêl dike, Hz. Umer lê siwar dibe.
- Di bin çavdêriya xelkê wê derê de Hz. Umer hespî çend seriyan dibezîne û peyre bi ser sûrên bajêr de difirîne û diçe.
- Mîr pê dihesa ku birayê wî Keşe pê re ne rast geriyaye; pê re pê re Keşe û qîza wî Leymûnê dide kuştin.
- Hawar û gaziya şervanên mîr bi dû Hz. Umer dikeve.
- Hz. Umer digel hespî xwe davêje dêreke rahiban.
- Şervanên mîrê frengî, digel hin palewanên wan ên navdar ku navê wan Metran, Kawran, Selxûn, Hovonîs, Bextiyar, Nezir û Ferfûr e, dor li wan digrin.
- Hz. Umer bi alîkariya teyrikekî/çûkekê hawarî Medîneyê dike.
- Hinek sehabî digel Hz. Elî, Hz. Ebûbekir, Hz. ‘Usman, Hz. Hemze û Hz. Ebbas ji Medîneyê tîn hawara Hz. Umer.
- Şerekî dijwar dest pê dike; zora şervanên mîr diçe û sehabî Hespê Reş tînin Medîneyê.

Ev bûyera Hespê Reş bi rastî jî qewimiye yan na, pevxistineke xeyalî ye, bi awayekî vebir/teqez em nizanin. Çi heye ku li gor vegotina gur û geş a edîb, wisan ji meriv re tê ku paya rasteqîniya wê heye. Hêza hunera edîb, me dibe wan roj û wan ciyan. Mîna ku meriv di wê hingê de be, bûyer wisan bi vegotîneke karîger hatiye şayesandin. Dibe ku bi qasidiya teyrik, hinekî meriv bikeve şikê; bes di dîroka merivahiyê de heye ku zemanê berê bi teyran jî

⁶⁹ Hem li gor metnê, hem jî li gor qewlbêjên ku me ev hîkaye ji devê wan girtiye, hesp bi zimanê Farisî bi Hz. Umer re peyiviye. Di nusxeya destxet a Petersburgê de ev komrêz heye:

46 *Go: “Borî ber ke lêvûd
Tu çû min binyûd
Muħemmed çaver yûd.*

ragihandin pêk hatiye. Name hatine nivîsandin, bi lingê teyrikan ve hatine girêdan û berê wan dane ciyan û hev agahdar kirine.

Em ji serlehengên mîna “Keşe” yên bûyera vê xezanameyê derdixin ku sehabiyên Cenabê Pêxember, li hember Îsewiyayî şer kirine. Her wiha, ciyê rûdana bûyerê jî, dîsa “dêr” û keleh e. Ev jî qenaetê dide ku ehlê kîtabî, Xiristiyayî in. Îca şerê Musliman li hember Xiristiyayî, di serdema Xelîfe Umer’ul Farûq de, li hêla Sûriyeyê çê bûye. Ji wê derê jî gihîştine hêla Îranê.

Li ser vê hîkayetê, berhevkar Mihemed Emîn Osman, di xebata xwe ya “*Beyta Hespê Reş*” ku bi tîpên Erebi ye de van agahiyayî ji devê gel radigihîne: “Elî Herîrî, hate Şûşê.⁷⁰ Ji ber ku cihê ilm û xwendin û seyrane bû. Elî jî, şaîrekî binavûdeng bû û şîrê evînê digotin û hez ji cihê wesa dikir. Dibêjin rojek Elî Herîrî ligel feqiya çû seyrane. Seyrangeha wan, nik gorê şehîd (Wuriya) bû li Kela Şûş. Dibêjin ev Wuriyayê, demê Dawud Pêgemberî ye, hindek dibêjin reng e xelqê Iskenderûnê bît. Li seyrangehê Elî, cihek dît got:

- Eve çi ye? Gotinê:

- Eve cihê Hespê Reş e. Got:

- Hespê Reş çi ye? Gotinê:

- Dibêjin keşeyek li Şûş hebû. Musulman bûbû, li wextê xîlafeta Îmamê Umer û harîkarî kir bo îmana Hespê Reş ji nik qeralê Şûş.

Demê feqiya we gotiye, Elî Herîrî got:

- Pa bi Xudê min jî gelek nanê êreyê xwarî û min guh lê nebîbî ku ji vî cihê îman lê hatibît an şer lê hatibîte kirin. Li wî kevnezemanî û eger mirov tiştêkî pê bibêjît, dê navê cihê belav bibît û xelq dê guhê xwe dene suhetê. Her çi nebît, dê selewatan den. Ji ber hindê, ez jî dê tiştêkî pê bibêjim, ji ber ku min gelek nanê vî cihê yê xwarî.⁷¹ Piştî vê diyalogê, feqiyan dest bi dawetê kiriye û ji Elî xwestine ku tu jî tiştêkî ji me re bibêje, wî jî dest pê kiriye, “*Beyta Hespê Reş*” bi menzûmî, li ser meqamê daweta feqiyan gotiye. Awayê daweta feqiyên welatê Kurdan, ji govendên dawetên gelêrî cihêrengî ye.

Em bîn ser hin bêje, nav û simbolên nusxeya Ebdullah Varlı. Peyva “Kewran”, bêtir nêzî bêjeyên zimanên Îranî ne. Ev bêje, di nusxeya Zeyelabidîn Amedî de jî, heye. Li hêla şehîdê Batmanê, çiyayekî bi navê “Qîre” heye. Kevirên vî çiyayî, mîna kevirên Çiyayê Reş ê hêla Diyarbekirê reş in. Îca li başûrê vî çiyayî, kaniyeke kevnar heye, jê re “Kanîrewa[n] tê

⁷⁰ Şûşê jî, li Kurdistana Başûr, gundekî li ser Akrê ye. (Abdurrahman Adak, “Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk” Weş. Nûbihar, Stenbol, 2013. r. 264.)

⁷¹ Dîwanê Melan, Mihemed Emîn Osman, Emîndariya Giştî ya Rewşenbîrî û Lawan, Hewlêr, 1977, (Ji nusxeya bi alfabeya Erebi) r. 248-249.

gotin. Şênîyên hin/çend gundên ku ji berê ve li derdora vî çiyayî dijîn, li ser baweriya Êzdatiyê ne.

Navekî dî yê ku di nusxeya Ebdullah Varlı de derbas dibe, “Şelmo” ye. Ev navê ha, ji weqtê gelê Ermen ve, navê gundekî navçeya Hezoyê/Kozlukê ye. Heta serdema avakirina Komara Turkiyeyê, gelê Ermen û gelê Kurd, bi hev re li vî gundî jiyane. Îro jî li vî gundê Şelmo, tenê şênîyên Kurmanc hene û ava ye:

Lendo wezîrê Mîr bû rûreş û xayîn e

Şelmo ew bûka Mîr e di dîwan de cî dane

Bo heye zarek şirîn her kes wê dihebîne

Çi serake giran e, fêris lê rawesta ne⁷²

Ev peyva “Şelmo” dişibe navekî Suryanî “Şilomon”, wekî dî bi bi zimanê Îbranî, ji Suleyman re “Selomon” dibêjin. Dibe ku ev peyv, ji vê derê jî rastî vê veguherîna hatibe. Li gor pêzaniyên xelkê devera Xerzan⁷³, ciyê ku dêra Keşe lê bûye, îro ciyekî dîrokî yê kaviil e ku li hêla Beşîrî/Qubînê ye. Navê vî kaviilî, “Xeravbajar” e. Îca ew dêra ku Hz. Umer digel hespê Reş tê de asê mane jî, li kêleka Çiyayê Qîre ye û navê wê jî “Dêra Zercel” e. Xeravbajar, li bakurê Çiyayê Qêre ye; Dêra Zercel jî, li hêla başûrê Xeravbajar e. Ji hêla mantiqî ve maqûl e ku gava Hz. Umer ji Xeravbajar derketiye, ber bi aliyê başûr ve çûye; lewre şehrê Medîneyê li hêla başûrê Xeravbajar e. Ev jî ihtîmalek e ku bûyer li vê derê qewimîbe.

Ev Dêra Zercel ku ji aliyê qewlbêjên herêmê ve tê destnîşankirin, heye û di ber Çiyayê Qîre de ye. Navê wê yê resen, Mor Kiryakus e. Lêkolînên ku li ser wê hatine kirin hene û ev agahî hatine dayin: “Manastira Mor Kiryakus, li herêma Turabidîn, li navçeya Qubînê/Bişêrî, di nav sînore gundê Ayrancikê de ye. Ev dêr, navendeke dînî ya girîng a Suryaniyên Serdema Ewil e. Keşîşên misioner ku di sedsala 4’an de ji Helebê hatine, bi awayekî taybet, li ser gir û tehtebilindên/zinarên ku raserî Deşta Mezopotamyaya Bakur in, manastirên xwe ava kirine. Wan ev rêbaz, ji xwe re kirine kevneşopî jî. Ev manastira ku li ser qadeke bi qasî 2500

⁷² Ebdullah M. Varlı, Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 449.

⁷³ Hecî Mihemedê Hecî Evdileyê Brahîm (Erol), gundê Holê yê li ser navçeya Hezoyê, ev bûyer ji min bi xwe re gotiye. Temenê wî, 63 ye, xwendin û nivîsandina wî kême e. Cotkar e. Hîna jî li gundê xwe niştecî ye. Wî ev agahî, roja Şemiya heyva Çileyê Pêşî/Ocak, sala 2014an da.

mertrekareyî hatiye avakirin, sêqatî ye. Qatekê wê, bi dehlîzan ber bi erdê ve diçe. Wezîfeya vê manastirê ew bûye ku bi Deyrul Zaferana Mêrdînê ve têkilî/peywendî dîne û bi rêya perwerdehiyê, mîna kulliyeyekê keşeyan bigihîne.”⁷⁴ Di berhemê de jî nîşane hene ku dêr, li ciyekî bilind e:

59 ‘Umerî dî wê carê
Dêrek li ber wî warî
Qesd kiriye çû diyarî

Abdullah Çakir ku ji gundê Hesena ye, temenê wî 84 e, 50 sal berê, li gundê Hesena ku li ser navçeya Qulpê/Pasûrê ye, ji xalê xwe yê Muhemed Kuntaş ev qewl girtiye, di guhertoya xwe de ew jî, ciyê rûdana vê xezanemeyê, weke “Geliyê Xerzan” bi nav dike. Geliyê Xerzan, li herêma Xerzan dimîne. Ev herêm ji deşta Batmanê dest pê dike, heta quntara çiyayên Hezo, Sason, Bişêrî û Gurdilan/Kurtalan berfireh dibe. Koka bêjeya Xerzan, ji “xerz” ango “gherz” tê. Digel ku di zimanê erebî de bêjeya “xerez” heye û wateya wê “qesd” e û ev her du bêje dişibin hev jî, ji çavkaniyên dîrokî diyar dibe ku guhertoyeke wê ya dî jî heye. Li gor komisyona akademisyenên Universiteya Atatürk a Erzurumê qeyd kiriye, têkiliya vê bêjeyê, bi bêjeya “erzen” re heye: “Di pey sedsala 4an de, li ser parvekirina herêma Erzen, Pers û Bîzansî ketine şer û herban. Ev şer, heta dawiya sedsala 5an domiyane. Di vê serdemê de Bîzansiyan, ji bo parastin û berterefkirina êrişên li sêkoşeya Sason, Hezo û Bedlîsê, gelek keleh ava kirine. Keleha bi navê *Rabat* li gundê Yanıkkayayê/Smayilkayê dimîne. Ev der, 18 km. dûrî navçeya Kozluk/Hezoyê ye û li bakurê wê ye.”⁷⁵

Heta ji van dêrên ha, li hêla çiyayên Aydinlik/Mereto/Meleto yê navçeya Sasonê, Dêra Kom heye. Li gor lêkolînan, 365 odayên wê hene. Ev Dêra Kom, li ser navsera çiyayê Mereto hatiye avakirin. Jê re Kenîseyê Meleto jî dibêjin.⁷⁶ Metna ku me ji devê Hecî Nûrî yê Mala Şêxê Kotekan ku li ser navçeya Erxeniya Amedê ye girtiye, ji bo vê angaştê delîleleke pêt e ku ev xezanemeyê, li herêma Xerzan qewimiye. Lewre ew jî, bi awayekî zipîzelal, navê herêma Xerzan bi lêv dike. Wî jî ev qewl, 40 sal berê, li dergayê Şêxên Kotekan, ji devê mirîdekî bav û kalên wan ê bi navê Fendo girtiye:

⁷⁴ Batman İli Sosyo-Ekonomik Profili, Komsiyon, Batman Ticaret ve Sanayi Odası Yayını, Batman, 2011, r. 56.

⁷⁵ H. b. r. 53.

⁷⁶ Me ev agahî ji devê Hadi Erol girtiye ku ev camêr bi eslê xwe ji gundê Hezoya Batmanê “Holê” ye.

‘Umer Ket çol û çolistan
Hat ket Geliyê Xerzan
Şevêkê li Leymûnê bû mêvan⁷⁷

Li geliyê Xerzan, xiravabajerê ku heye, weke şehrekî kavi, a niha jî li ber çavan e û lêkolînên arkeolojîk li ser wê hatine kirin. Van çavkaniyên ha, ev der weke şehrekî entîke/antîk bi nav kiriye û vê agahiyê li ser wî didin: “Li mezraya Yeşilyurta ku li ser gundê Oyuktaşê ya navçeya Hezoyê ye, li ber qeraxê Çemê Xerzan e, lêkolînên ser-rûyê erdê hatine kirin, xerabeyên/kavilên vî şehre entîke/antîk derketine holê. Îca gundikê Yeşilyurt, li ser xerabeyên Erzenê hatiye avakirin. Lewre ev gundikê Yeşilyurt, di meha çile ya 2008an de li gor Qanûna Parastina Hebûnên Çandî û Siruştî, yê bi hejmara 2863yan, weke qada sît hatiye îlankirin. Ji Begîtiyên/Mîrekiyên Turk, Dilmaçoğulları, şehre Erzen, ji xwe re kiriye payitext. Piştî Şerê Melazgirê, begên dî yên Turk, bi ser Enedolê ve cerd kirine û di pey fethên serkeftî de, Selçûkiyan, Erzen û derdora wê, weke tîmar daye Mehmet Begê Dilmaçoğlu. Wî jî, sala 1085an, li vê herêmê begîtiya xwe damezrandiye. Dilmaçoğullariyan di dîrokê de wisan zêde deng venadebe jî, wan ev erd, maweyeke dirêj di bin himayeya xwe de daye girtin. Akkoyuniyan, sala 1395an, ev begîti bi tamamî xera kiriye. Ev şehre entîke Erzen, di çavkaniyan de, ji wan payitextên herî mezin ên Serdema Navîn hatiye hesabandin. Di hiyama nîveka sedsala 13an de, cografyagerê navdar ê îslamî, İbn Şeddad, ev şehre ziyaret kiriye û dîtînen xwe wiha diyar kiriye: *Li ciyekî berfireh ava bûye, xan û medreseyên wî hene, muferreh e. Bi 32 bircan dormedorkirî ye.* Bi xebatên zanistî derketiye holê ku Erzen, a Îslamê ye. Erzena Îslamî, di Serdema Navîn de, yek ji wan şehrên girîng ên mîna Diyarbekir, Mêrdîn û Heskîfê ye. Hetta tê diyarkirin ku wê serdemê, Erzen ji hêla qada xwe ya bicîbûnê ve, ji şehre Diyarbekirê mezintir bûye.”⁷⁸ Wekî dî, ev agahiyên ha jî, li ser şehre Erzenê hatine tomarkirin: “Kavilên şehre Erzena Entîke, li gundê Yunuslara ku li ser nevçeya Gurdilan/Kurtalana Sêrtê ye hene; îca ev kavilên ku li hêla gundê Hezoya Batmanê ne, beşa wî ya havîngehî ne.”⁷⁹

Li gor ku Selmanê Reşoyê Şûşî li ser *Beyta Hespê Reş* nêrîna xwe gotiye û berhevkar Mihemed Emîn Osman, di gotara xwe ya li ser *Beyta Hespê Reş* de diyar kiriye, ciyê rûdana vê bûyerê dorhêla Îskenderûnê ye. Gava em vê angaşte bîngê bigrin, em dikarin serdema ku

⁷⁷ H. Nurfî Aslan, 67 salî ye, ji gundê Kotekan e ku ev gund jî a niha li ser Erxeniya Amedê ye. Me ev agahî, meha adara 2015an, li mala xwe, ji devê wî bi xwe girtine.

⁷⁸ Batman İli Sosyo-Ekonomik Profili, Komsiyon, Batman Ticaret ve Sanayi Odası Yayını, Batman, 2011, r. 53-54.

⁷⁹ <http://www.haberpen.com/antik-kent-iki-arada-bir-dere-de-kaldi-haberi/> 02. 03. 2015.

H. Umer desthilatdarê Şehînsahiya Îslamê ye û Xelîfe ye, rast bihesibîn. Çunkî di serdema wî de Împeratoriya Sasanî ji ser dika dîrokê hatiye maliştin û dor li Împeratoriya Bîzansê teng bûye. Artêşa Împeratoriya Bîzansê, ji erdê Sûriyeyê hatiye bidûrxistin û pêşiya wê hatiye li Îskenderiyeyê qelibiyê. Wê hingê “Dêr”û “Keleh”ên vê herêmê jî gelek girîng in. Di serdema Xelîfe Hz. Osman de, hêzên deryayî yê Îslamê, Girava Qibrîsê jî fetih dîke⁸⁰ û artêşa Îslamê, li hember Bîzansiyan bi ser dîkeve. Dibe ku ev zafera muslumanan di nav gelê kurd de jî nav û deng dabe û wan jî ev serketina Hz. Umer weke xezanameyekê di nav girseyan de wiha bi nezmî belav kiribe.

Ji ber ku ev berhem ji hêla krîterên edebî ve dişibe *efsaneyê*, di nav gel de weke *qewlêrk* jî tê binavkirin. Wateya qewlêrkê ew e ku bûyera wê, bîngeha xwe ji gotegotên çîrokbêjan digre. Jixwe gava em li kitêbên siyerê dinihêrin, em dibînin ku ne Xelîfe Umer, ne Xelîfe Osman û ne jî Xelîfe Elî hatiye nav erdên kurdan. Hetta di hin guhertoyên xezanameyê de, behsa hatina Pêxember jî tê kirin. Li gor rasteqîniya siyera Nebî ku di kitêbên muteber ên Îslamî de tê vegotin, Cenabê Pêxember nehatiye herêmên Îran, Kurdistan û Skenderûnê.

Bi rastî, navê hin serlehengên mîna Lendo, Balendo, Leymûn, Têran, Lîl, Mîl û Sorgul hem dişibin navê kurdan hem jî navê gelê Îbranî û Suryaniyan. Navê hin serlehengên mîna Honoso, Kirapêt, dişibe navê Ermeniyan. Navê Feyfûr, Esfer, Melîkê Ejder jî, dişibe navên Îraniyan.

Ev xezanameya Kurmancî, di serdema muslimbûna Kurdan de hatiye hilberîn. Em ji mijar û motîfên wê tê digihîjin ku berhemeke edebiyata Kurdî ya Îslamî ye ku digel nîrxên kurdariyê, pîroziyên Îslamî jî di xwe de hewandine. Gelê Kurd ji sedsala 7an a mîladî ve bi girseyî tevî çand û baweriya Îslamê bûye. Li gor Mehrdad R. Izady, çanda Îslamî, li gor kevneşopiya mezheban, li her herêmekê, bi awayekî cihê, merhele bi merhele, ciyê xwe di nav Kurdan de dîtiye û cî girtiye: “Ji weqtê ku wan dîne Îslamê qebûl kiriye û heta niha, Kurdan, mezhebên cihê cihê qebûl kirine. Di nav Kurdên Musliman de, bêhtir jî di nav Kurdên Musliman ên Sunnî û Şîî de, pevçûnên cûre bi cûre derketine. Dirûvê van pevçûnan jî, ji hêla zafbûn û bîngeha xwe ve, dide rûdanên navbera hin beşên dî yê cîhana Îslamî. Piraniya Kurdên derdora şehrê Kirmanşaha Başûrê Kurdistanê ku Sunnî ne, her sal, hin pîrozbahiyên li ser mezinahî û pîroziya Xelîfeyê Îslamê Umer pêk tînin. Ev pîrozbahiyên ha, weke roşanên wan ên salane hatine qebûlkirin.”⁸¹

⁸⁰ h. b. r. 529.

⁸¹ Mehrdad R. Izady, *Bir El Kitabî, Kürtler*, (Ingilizceden Çeviri: Cemal Atilla) Doz Yayınları, İstanbul, 2007, r. 252.

Ji ber van egerên siyasî û mezhebî, dibe ku ev berhema *Borê Qer*, ji aliyê hozanekî sunnî ve, li ser bingeha “ezîzkirina” Hz. Umer hatibe derxistin. Digel vê yekê, ji encama helbestê diyar dibe ku qaremaniya Hz. ‘Emer têra rizgarkirina Hespê Reş nake; lewre dîsa pêdivî bi alîkariya Hz. Elî û xweşmêrên navdar ên mîna Hz. Hemze hatiye dîtin ku betlên hevrê bûn ji doza Cenabê Muhemmed Pêxember re. Êdî ji vê sedsalê bi şûn de, di sedsaleke şaristaniya Îslamî de, hozanekî Kurmanc, [yan jî çend hozanên cihê cihê] dibe ku ev berhem li ser bingeha taybetiyên çandî û cografî yên Kurdan derxistibe û wî xwestibe ku di navbera Kurdên Sunnî û Şîî de germegermiyeye çandî-dîrokî derxe pêş. Ahmet Demir jî di xebata xwe ya li ser *Qewlê Newala Sîsebanê* de vê agahiyê dide: “... bi qasî ji çavkaniyan tê fêmkirin jî, gelek sehabiyên Cenabê Pêxember hatine Kurdistanê; lê belê di nav wan sehabiyan de navê Cenabê Elî –ku lehengekî herî navdar yê qêwl e – tu caran derbas nabe.”⁸²

Di nav lehengên xezanemeyê ku ji guhertoyên gelêrî hatine girtin de, navê Muhemmed Henîfe bala me kêşa. Li gor guhertoya H. Mihemedê Holî, Muhemmed Henîfe, lawê Hz. Elî ye û ew jî digel Hz. Umer hatiye Xeravbajar. Îca ev M. Henîfe, ne ji Hz. Fatîmetu’z- Zehra ye; ji Henîfeya Qeyserê Rom e. Gava Hz. Elî çûye xezaya welatê Qeyser, piştî fethê, li wê derê rastî vê qîza Qeyser hatiye. Ev qîzik jî, betl bûye û Hz. Elî ew vexwendiyê îmanê. Wê jî hin merc dane berê û bi hev re hatine Medîneyê. Li Medîneyê mercên vê qîzê hatine qebûlkirin û mehra wê li Hz. Elî hatiye birîn. Navê wê jî Henîfe bûye. Ev Muhemmed Henîfe, ji vê pîrekê hatiye dunyayê. Îca li ser vê agahiyê, em ketin pey şopa esehiya wê. Li cem seydayê Mela Mihemed Zulfîyê Zilî, kitêbeke bi zimanê Osmanî hebû gelek behsa xezayên Hz. Elî û Muhemmed Henîfe dikir. Bergê ewil ê vê kitibê qelişî bû. Me ji pirtûka dersa Îlahiyatê ya Zanîngeha Anadolu ya bi navê “*Türk İslam Edebiyatı*” derxist ku muellifê wê, Dursun Fakih e. Ev kitêb, di “Millî Kütübhane”yê de bi vê şîfreyê hatiye parastin: 06 Mil Yz A 3538/6.⁸³ Di rûlepê 144an de cengnameya bi navê *Haza Xezewatı Muhammed Hanîfe Ba Xezênfer-i Kafir ‘Eleyhi Le’neh [Ev Xezayên Muḥemmed Ḥenîfe Digel Xezênferê Kafir ‘Elyhi Le’ine]* hebû. Me jî ev ji wê derê girtin: “Muhemmed Mustefa sellellahu ‘eleyhi wesellam, rojekê piştî edakirina nimêja sibehê, piştî xwe dabû mîhrabê û nesîhet li sehabiyan dikir. Sehabiyan, guh dabû gotinên wî yên şekirîn. Wê kêliyê, yek hat û got: “Mizgîn li te ya Resûlellah, Elî tê!” meger Îmam Elî, şeş meh berê çûbû Xezaya welatê Qeyserê Rom. Resûlellah bi vê nûçeyê şad bû û got: “Gelî sehabiyan, rabin em Îmam Elî pêşwazî bikin.” Digel hev bi qasî menzîlekê çûn û îca ew tevî hev hatin Medîneyê. Hz. Elî hat Mizgefta

⁸² Qewlê Newala Sîsebanê, (Amadekar: Ahmet Demir), Weşanxaneyê Nûbihar, Istanbul, 2012, r. 12.

⁸³ Ali Öztürk, “Dini Tür ve Konular”, Türk İslam Edebiyatı, (Hazırlayanlar: Heyet; 9. Ünite) T.C. Anadolu Üniversitesi Yayını, Ankara, 2013, r. 229.

Nebewî, Resûlallah got: “Ya Elî behsa Qeyser bike.” Hz. Elî got: “Min welatê Qeyser xerabe kir, peyre min ew vexwende îmanê; nehat. Min serî birît û xan û malê wî talan kir. Keçeke wî ya henûn hebû, min ew jî kir dîl û anît.” û bi vî awayî hikaye qedand. Peyre xenîmetên Xezaya Qeyser li mucawiran belav kir. Resûlallah ferman kir ku Henîfe bînin. Wan jî Henîfe Xanim anît huzûra Nebewî. Resûlallah dît ku di dunyayê de kes di durûvê de tune ye û pirsî: “Tu qîza kê yî? Ji me re bibêje.” Wê got: “Ya Resûlallah, ez qîza Qeyserê Rom im. Navê min Henîfe ye” û bi kitekitî behsa xwe kir. Hz. Resûlallah got: “Ya Henîfe, were îmanê; rehmet bibîne da ku tu bibî ehlê Cennetê.” Henîfe got: “Ya Resûlallah, tu çi bibêjî li ser ser û çavê min; lakin sê pêdiviyên min ji qatê cenabê te hene; qebûl bike, ez bêm îmanê.” Wî got: “Hacetê te çi ne?” Wê got: “Ê ewil ew e ku tu min bidî Hz. Elî, ê duduyan ew e ku tu ji qîza xwe Fatîme re bibêjî, bila tehde li min neke; bi min re xweş li hev bike. Ê sisiyan ew e ku gava Xudê ji Elî kurek bide min, tu navê wî Muhemmed Henîfe dênî.” Resûlallah got: “Min du hacetên te dîrek qebûl kir; bes qudreta min bi hacetê sisiyan tune ye. Ew di bin qudreta Îlahî Heq teala de ye.” Weqtakî wisan melûl ma. Peyre cebrâîl nazil bû û got: “Ya Resûlallah, Ellahu teala selam kir û ferman kir got bila hacetê qebûl bike.” Resûlallah ji Henîfe re got: “Min hacetê te qebûl kir; were îmanê.” Henîfe got: “Ya Resûlallah çawa bêm îmanê?” Resûlallah got: Eşhedu enlaîlahe îlallah we eşhedu enne Muhemmeden resûlullah.”⁸⁴

Çi heye ku li gor siyera Nebî, heta ku Resûlê Xudê li heyatê bûye, Hz. Elî bi ser Hz. Fatîme de nezewiciye. Lê di pey wefata Hz. Fatîmeyê de, behs tê kirin ku Hz. Elî cara duyem zewiciye û lawekî wî yê bi navê Muhemmed heye.

| Navê leheng | Taybetiyên leheng |
|-----------------|--|
| Cenabê Pêxember | Pêxemberê Îslamê, Hz. Muḥemmed (e.s.w.) |
| Borê Qer | Hespê Reş, heywanekî efsanewî ye. |
| Çûk | Teyrikekî reş e, jê re hehecîk dibêjin. Weqtê biharkî tê welatê Kurdistanê heta payizkî lê dimîne. |
| Hz. Umer | Xelîfeyê duyem ê dewleta Îslamê ye. Serlehengê bûyerê ye. Rewîştaya wî heye. |
| Hz. Ebûbekir | Xelîfeyê ewil ê Îslamê |
| Keşe | Li gor qewlbêjan, navê wî, piştî ku bûye Musliman, bûye Muhemmed Seîdî. |
| Leymûn | Qîza keşe ye. Digel bavê xwe, bi awayekî nepenî bûye Musliman. Di şerê |

⁸⁴ Dursun Fakih, Xezawat-i Xezanfer-i Kafîr, weş? Sal? r. 144-145.

| | |
|----------------|--|
| | xelaskirina Umer de şehîd ketiye. |
| H.z. Ebbas | Şeranekî Îslamê |
| H.z. Hemze | Şeranekî Îslamê |
| H.z. ‘Usman | Xelîfeyê sêyem ê Îslamê ye |
| H.z. Elî | Xelîfeyê çarem ê dewleta îslamî ye. |
| | Serlehengên Xiristiyanan |
| Mîr Lendeh | Mîrê bajarê ku Hespê Reş lê ye. Mîrê devera xwe ye. Li gor qewlbêja Xiristiyanekî katolîk e. |
| Metran | Palewanekî Xiristiyan e |
| Kawran | Palewanekî Xiristiyan e |
| Nezr | Palewanekî Xiristiyan e |
| Bextiyar | Palewanekî Xiristiyan e |
| Hovonîs | Palewanekî Xiristiyan e |
| Şelemon/Selxûn | Palewanekî Xiristiyan e |
| Ferfûr | Palewanekî Xiristiyan e |

Di çavkaniyên Îslamî de li ser jiyana Hz. Elî ev agahî hene: **“Elîyyul Murteza (r. e):** Bi navên mîna Esedullah (Şêrê Xudê) Eliyy- İbni Ebî Talib, Ebût-Turab, İmamê Elî jî tê binavkirin. Kurê Ebû Talibê apê Pêxember e. Bîst û sê sal berî Hicretê welidiye. Roja duyem a a bî’setê, di dehsaliya xwe de îman bi Îslamê aniye; qet pûtpersefî nekiriye. Ji ber vê, gava navê wî tê gotin, ji bo mezindîtina wî, *kerremellahu wechehu*(*Xudê kerema xwe lê bike*) tê gotin. Ji ber ku beşdarî piraniya xeza û muherebeyên Cenabê Pêxember bûye, navê Esedullah girtiye. Ji ‘eşereyê mubeşşere (dehên bi cennetê mizgînkirî) ye. Di nav Ehlê Beytê de kesê yekem e. Bi ayetê pesnê wî hatiye dayin. Bi dilxweşî ji her sê xelîfeyên berî xwe re bî’et kiriye. Digel wan, bi xizmeta Şeyxu’l Îslamîyê xebitiye. Serokê weliyan e. Di 40 saliya Koçî de şehîd ketiye.”⁸⁵

2. 3. Tema û Mijara Berhemê

Metnên edebî, li dormedora temayê çê dibin. Ew bûyera eslî û rêzebûyerên ku rêsîn û hunandina bûyeran pêk tînin, diyalogên navbera kes û lehengan, pevçûn û aksiyon gişt bi hev re temayê diyar dikin. Bi vî awayî temaya berhemê, zihniyeta wan bûyerên sosyal û siyasî yên

⁸⁵ Abdullah Yeğîn, İslamî - İlmî - Edebî – Felsefî Lûgat, Yeni Asya Yayınları, İstanbul, 1975, r. 24.

serdema ku berhema edebî tê de hatiye hilberîn ronî dike. Guhdar an jî xwendevan, bi reng û dengê ku wê hingê civak bi çî awayî difikire û bi çî teherî dijî, dide hisandin.

Hespê Reş, helwest û tevgera Îslamîbûna civakî ya serdema xwe, li dor temaya hest û ramana çandî ya Îslamî vedibêje. Ew nîşê sehabiyên canfîda, digel wî keşeyê biwicdanî kal ê azadîxwaz, li hember zordestî û pêkûtiya desthilatdarên siyasî û çîna serdestan, bi çî awayî bûne hevkar û li dijî sîstema xedar a mîrê dilhişk, çawa ketine serhildan û berxwedanê, bi xêra vê berhemê, bi awayekî coşiyane hatiye zimên. Di her komrêza menzûmeyê de, çî cara ku behsa mîr û şervanên wî yên eskerî hatiye kirin, ew bêrehmî û xedariya wan jî pê re hatiye şayesandin. Temaya metnê, di şexsê serlehengên bûyerê de hatiye vegotin. Di serî de Hz. Umer, qerekerê tekane ye ku ji bo azadkirina hespî, bi awayekî canfîdayî derketiye rê. Di rêya azadiya vî hespî de, her cûre têkoşînî daye ber çavê xwe. Azadîxwazekî rikoyî ye ji bo hespê berxwedêr. Bê çek e. Niyeta wî ne xerabî ye û derdê wî tenê ew e ku vî hespî ji nav lepê mîrî xelas bike. Di qonaxa ewil de xwe li mala keşeyê kal digre. Keşe çî dibêje, bi xebera wî dike. Peyama edîb bi vê helwesta Umer ew e ku rûmetê bide rêberên ayinî yên dîne Îsewîyan û pê re jî hurmeta Xiristîyanîyê diyar bike. Gelek enteresan e ku ji weqtê serdema Cenabê Pêxember ve, navbera Muslim û Îsewîyan xweş bûye. Heta ku Cenabê Pêxember li heyatê bûye, li hember Îsewîyan neketiye herbê.

Keçika keşeyê kal Leymûnê jî, nîşana esîliya xanimên wan gelên Îsewî dide simbolîzekirin. Peyva “Leymûn” nêzî peyva “lîmon”ê ye. Keçxatûnên gelê Ermenî, Suryanî û Rûmî, bi piranî rengzerî ne, dibe ku ev nav, jê kînyayê be. Weke bûyereke trajîk di şerî de şehîd ketiye. Ev kirdeyeke girîng e. Ev hêmana temayî, berhema Feqiyê Teyran a bi navê *Şêx Se‘an* tîne bîra me ku çawa Şêx bûbû mubtelayê keçika fileh û dev ji serterîqetiya xwe berdabû.

Tiştê ku neçê ku di berhemê heye ew e ku Umer, gava xwe li dêrê digre, çil rahîb li wê derê ne û emanê nadinê; ew jî wan dîkujê. Bi rastî ev bûyereke gelek trajîk e. Bi qenaeta me, mebesta edîb bi vê cezakirina ecêb ew e ku pêşewayên dînî, divê ku di rojên teng û zehmet de hevkarî bi hev re bikin. Mîna ku van rahîbên dêrê, li hember têkoşerekî dînî yê berxwedêr, bi desthilatdarekî xedar re hevkarî kiriye, lewre bi vî awayî hatine sizakirin. Peyam bi vê helwest û tevgera Umer dibe ku ev be: Çî cara ku rêberên dînî, li hember mezlûman bi zalimên serdest re hevkarî bikin, destê xwe dirêjî destê merivên neçar nekin û emanê nedin wan, helbet kengê hebe, teqez wê poşman bibin. Di silsîleya van rêzebûyeran de “rexne” li pergala dînî ya rahîbên wê dêrê hatiye kirin ku gava yek xwe bavêje dergayê meriv, divê ku meriv emanê bidê. Çend komrêzên berhemê hene ku bi qenaeta me, bûyerên xeyalî û awarte ne. Edîbê berhemê, ew bi awayekî zêde mubalexeyî rêsanê:

65 ‘Umer şolekî çê kir
Serê çil Rahibî jê kir
Derê Dêrê asê kir

Ji bo qebûlnekirina vê bûyerê em dikarin van hincet û delîlên xwe rêz bikin:

1) Aliyekî wê yê trajediyê heye ku rêzebûyereke “xeyalî” ye û awarte ye.

2) Tê de mubalexe heye. Çunkî li gor eql û mentiqê, bi tu awayî ne pêkan e Umer karibe bi tena serê xwe çil zilamî bikuje.

3) Hz. Umer ku sehabiyekî nêztirîn e ji bo Cenabê Pêxember, her çi qas zilamekî hêrsoke bûye jî, nikare bêwijdaniyeke wisan bike. Çunkî ew hem ji ber zulmê direve, hem jî radibe zulm li wan rahibên reben dike. Bi rastî di vê yekê de “nakokî” heye.

4) Hz. Umer ku di nav sehabiyên de yek ji wan giregir û pêşewayan e ku herî zêde bi hukmên Qur’anê dizane, wisan nikare li gor nefsa xwe qira ricalên dînî bîne. Bi hedîsa sehîh sabit e ku Cenabê Pêxember ferman li cengawerên xwe kiriye ku di xeza û herban de tu carî, bi tu awayî têkilî kalepîrên ku nehatine herbê, pîrek, zarok û ehlê dîn nebin. Delîlên vê jî ev hedîs e: Ji Îbn Ebbas: Wî got ku Resûlullah sellellahu ‘aleyhî wesellem gava eskerên xwe şand, got: “Bi navê Ellahu te‘ala derkevin, li hember wan ên ku Ellah înkâr dikin, sirf ji bo Ellah herbê bikin, xedrê mekin, xilêletiyê/xayiniyê mekin, azayên canê wan jê mekin, zarokan mekujin û wan ên ku di dêran de dimînin û kar û barên dêran dikin, (rahiban) mekujin.”⁸⁶

5) Hz. Umer hem xwe li dêrê û rahiban digre, hem jî gava ew bi gotina wî nakin, wan dikuje. Helbet di virê de “nakokî” heye. Ku bigota va ye ez dikevim dêrê, îca ku hûn mêr bin, hûn dê li min bidin. Şairê me, hem wî xistiye dêrê, hem bi ser de jî, bêyî ku rahibek êrîşî wî bike, wan bi wî daye kuştin. Ev yek li temaya berhema edebî naye.

6) Di nusxeya Mela Nadirê Erdîşê de jî ev beşa ku Hz. Umer di weqtê pêşîrtengiyê de xwe li dêrê digre heye. Hejmara rêzikên vê beşê 126 e. Digel vê dirêjahiya beşê jî, ji binî behsa kuştina çil rahibî nehatiye kirin.⁸⁷

48 Çend seran digerîne
Li hespê dixurîne
Li ser Sûrê difirîne

⁸⁶ Muhammed Subhî bin Hesen Hellaq eş-Şamilu’l Muyesser Fî Fiqh’il Kitabî wes-Sunnetî, Dar’ul Îbad’ir-Rehman, Qahire, 2011, c. 3, r. 251-252.

⁸⁷ Ebdullah M. Varlı, Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 467-475.

52 Keşeyî şer bi şîr kir
‘Umerî şer bi tîr kir
Meydan ji xûnê têr kir

53 Keşe şerekî zor kir
Bi misriyê muhur kir
Meydan ji xûnê sor kir

54 ‘Umer şerekî xweş kir
Bi tertîb û bi şeş kir
Meydan tijî wî leş kir

Di van yekeyên nezmî yên jor de hem mubalexe heye, hem awartebûn heye hem jî zêdegavî heye. Ev ku heye, ji taybetmendiyên mubalexeyî yên cengname, xezawatame û destanan in. Heta di komrêzeke dî de jî tevî ku mubalexe hatiye nîşandan, îca tiştê ku di berhemê de hatiye diyarkirin, gelek zêde dûrî rastiyê ye:

5 ‘Umeru binu Xettab e
Kuştî da û bab e
Fîl hâlî da cewab e
Ne xêr ne sewab e
Ew şolekî sewab e

Di van rêzikên jor de Hz. Umer weke qatilê bavê xwe hatiye nîşandan. Me çi qas li vê meseleyê kola, di tu çavkaniyekê de em rast lê nehatin ku Hz. Umer bavê xwe kuştîye. Îca bi ser de jî, hukmekî huqûqî/fiqhî jî tê de hatiye dayin ku Hz. Umer bavê xwe kuştîye, lê jê re ne xêr heye, ne jî sewb û cewab û ev karê wî, weke şolekî sewab hatiye destnîşankirin. Helbet bi tu awayî ne rast e û ne di cî de ye.

Di dîroka Îslamê de gelek bûyerên mînak hene ku şervanên eslî û xalis ên Mumin, ne li pey xenîmetan e. Serdema ku Hz. Umer xelîfe ye, di destpêka Herba Qadisiyeyê de, fermanarê Faris Rustem, ji femandarekî Mumin ê bi navê Rib‘iyy b. ‘Emr vê pîrsê dipirse: “Hûn ji bo çi hatine vê derê?” Bersiva femandar Rib‘iyy b. ‘Emr wiha ye: “Xudê em şandine. Wî em şandine ku em ji yên ku Xudê xêra wan dixwaze, ji ‘ebdîtiya ‘ebdan xelas bikin û wan bighînin ‘ebdîtiya ji Xudê re û em wan, ji dunyaya tengkirî, bikşînin dunyayeke fireh û em wan

ji wê zulma dînên xurifî, derxînin ber ‘edaleta Îslamê. Ellah em şandin ku em xelkê wî vexwînin dînê wî.’⁸⁸

Em wan mubalexeyên zêde, di destanên dînî-xezawatî yên edebiyata Turkî de jî dibînin. Destana Seyyîd Bettal Gazî, mînakek ji van e. Di edebiyata gel a Turkî de, berhemek destanî ya bi navê *Bettalname* heye. Bettal, serlehengê vê destanê ye û bi eslê xwe ‘Ereb e. Gel, ew di nav xwe de bi navê Bettal Gazî kiriye lehengekî navdar ê xezayên dînî. Bettal, bi wan herbên ku Emewiyan li hember Rûman kiriye, ketiye dilê gel û weke destan ketiye ser zar û zimanê wan. Navê wî yê eslî, Ebdullah Îbn ‘Emer e, femandarekî Emewî ye. Ji ber ku herbên dînî di navbera Turk û Rûman de jî qewimîne, gel ew weke qehremanekî xwe jî hesibandiyê û menqîbeyên wî di nav xwe de nifş bi nifş neqil kirine. Ji serdema Danişmendiyan ve, ji sedsala VIIIan ve, li herêma Enetolê, hîkayeyên Seyyîd Bettal hem bi nesrî hem jî bi awayê nezmî hatine vegotin. Di van rêzamacerayan de Bettal, tim li hember Bizansiyan bi ser dikeve. Peyva “bettal” ji zimanê Erebî ketiye Turkî. Wateya wê “leheng” e. Di edebiyata Erebî de kitêb li ser zaferên wî hatine telîfkirin û navê wan jî “zelhimme” ye. Di edebiyata Turkî de, ew macerayên Bettal ku hatine vegotin, dişibin kitêbên Erebî. Serê ewil, dibe ku ji Erebî jî hatibe wergerandin. Ev kevneşopiya ku macerayên Bettal di edebiyata Turkî de hatine vegotin, heta sedsala XVIIIan jî berdewam kiriye. Beksaiyê Darendeyî, bi awayekî menzûm ji nû ve nivîsiye û navê berhemê, “*Bettal Gazî*” daniye.⁸⁹

Di beşeke destana Bettal Gazî de, hêmanên mubalexeyê, wiha hatine vegotin ku Bettal Gazî derdikeve hemberî begekî Bîzansî ku navê wî Simbat e. Vî begî, li ciyekî, ji xwe û şervanên xwe re kelehek zexm lê kiriye û bi zordestiya xwe tirs û xofeke mezin xistiye ser Muslimên derdorê. Bettal Gazî pê dihesê û bi tena serê xwe tê ku dawî li zulma wan bîne. Gava dike ku here ser wan, dikeve cuheke avê û pê de diçe, dikeve nav kelehê, li wê derê dikeve sarincokekê. Dayikeke pîr wî tê de dibîne. Lawê wê pîrê, weqtakî berê wenda bûye, lewre jinika pîr, Bettal dişibîne lawê xwe û wî tîne malê, kincên lawê xwe lê dike. Bi vî awayî hinekî dimîne, peyre qesda qesra Simbat dike û diçe wê derê, Simbat dukuje û serê wî bi xwe re dibe ku derkeve, li ber deriyê qesrê, çil kes hene ku bi şerabê sermest bûne, wan jî dukuje. Êdî şer dest pê dike, heta ku ji Meletiyê 300 gazî tîne hawara wî û kelehê distînin. Qîza Simbat jî, tînin didin Huseyn bin Elî û vedigerin Meletiyê.⁹⁰ Ev aliyê mubalexeyî, di *Qewlê Newala Sîsebanê* de jî derdikeve pêşberî me:

⁸⁸ Hayreddin Karaman, *İslam’da Kadın ve Aile*, Ensar Neşriyat, Tic. A.Ş., İstanbul, 2010, r. 38.

⁸⁹ Nihad Sami Banarlı, *Resimli Türk Edebiyatı Tarihi*, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 2001, r. 301.

⁹⁰ Yusuf Aras, *Türk Edebiyatı*, Esen Yayınları, Ankara, 2012, r. 134-135.

“Qirên e germegerm e şedîd bûye qîtal e
Ji hev ra d’kirin çermegirî wekî mortal e
Ji hev tavêtin **term e tijî bûye newal e**
Bi Xaliqê li ser me xweşceng e xweşqîtal e”⁹¹

Temaya wê, bi tamamî li ser dahezkirina lehengên Musliman ên ewil ên dîrokî yên dînê Îslamê ye. Çi heye ku rasteqîniya bûyera ku di xezanameyê de hatiye vegotin, bi dîroka rast a Îslamê re li hev nake. Gava em berê bala xwe didin ser dîroka rast a xezayên Nebî, em bi awayekî zipîzelal, li gor Qur’an û hedîsê, awayê terz û tevgerên sehabiyên Cenabê Pêxember dibînin. Helwesta Îlahî ya herba li hember muşrik û înkarkirên dînê Îslamê, gelek balkêş e û gelek zêde dûrî zihniyeta îro ye. Dema ku em li kronolojiya maweya berî destpêka xezayê dinêrin, em dibînin û fêm dikin ku çanda cîhadê, bi tamamî li ser bingeha derketina li dijî zulmê ye û berevaniya li hember êrîşan e: Resûlê Xudê, dema ku cara ewil nebîtiya xwe bi awayekî nazik û medenî da diyarkirin, apê wî, bi awayekî gelek qube neheqî lê dike. Resûlallah, heta ku Hz. Umer tê îmanê, karê teblîxa xwe, li mala Erqam, bi awayekî nepenî berdewam dike. Di vê maweyê de çi kesê/kesa ku îman bi dînê wî tîne, teqez rastî neheqî, tacîz û îşkenceyan tê.⁹² Di van tehdeyî û eziyetan de malbata Yasîr şehîdên ewil jî didin. Boykota aboriyê û têkiliyên civakî li ser wan tê ferzkirin, dawîya dawî, mecbûr dimînin ku koç bikin û cara ewil bi awayekî vedizî, hinek sehabî berê xwe didin welatê Hebeşistanê.⁹³ Boykot û tecrîdkirina muşrikan li ser Muminan bi awayekî gelek zêde bêînsafiyane derdikeve pileya herî jor; bes ew li gor fermana Îlahî, di nav sebr û sebatê de îdare dikin. Peyre cara duyem hin sehabiyên dî koç dikin.⁹⁴ Di vê navberê de Muşrikên Mekkeyê tu meferekê nadin Nebî (s.e.w.), ew îca berê xwe dide Taîfê û li wê derê jî tûşî êrîşê tê.⁹⁵ Tam sêzdeh salên Muminan di nav vê eziyet û tengasiyê de derbas dibe; bes îzna şerê li hember van Muşrikên zalim, ji aliyê Îlahî ve naye dayin; hema tenê şîreta sebr û berxwedanê li Muminên mezlûm tê kirin. Dîroka Îslamê diyar dike ku Muşrik, êdî bi awayekî vebir/qet’î, qesda jiholêrakirina Resûlallah dikin û şeva ku ew dê planê xwe yê bidehşet îcra bikin, Xudê destûra Nebî ya Medîneyê dide.⁹⁶ Resûlê Xudê tê bajarê Yesrîbê û bi Yehûdiyên wê derê re jî, Peymana Medîneyê çê dike.⁹⁷ Cenabê Pêxember

⁹¹ Qewlê Newala Sîsebanê, (Amadekar: Ahmet Demir), Weşanxaneya Nûbihar, Istanbul, 2012, r. 68.

⁹² Muhammed Riza, Muhammed Resûlallah Selloallahu ‘Eleyhî Wesellem, El Mektebetu’l Îslamiyyetî, Qahire, 1996, r. 88.

⁹³ h. b. r. 97.

⁹⁴ H. b. r. 108.

⁹⁵ H. b. r. 112.

⁹⁶ H. b. r. 127.

⁹⁷ H. b. r. 134.

du salên dî jî li bajarê Medîneyê dimîne û di nav sebr û hedanê de li ber xwe dide. 15 salên pêxemberiyê diqedin, hîna nû Rebbê ‘alemê destûra îzna Muminan dide ku li hember muşrikên belakir û êrîşkar şerê xweparastinê bikin: “Ji wan ên ku herb li hember wan hatiye îlankirin û tûşî zulmê dibin, îzn hat dayin. Bê guman Ellah her qadir e ku alîkarî bide wan. Ew, ew kes in ku bi awayekî neheq ji welatê xwe hatin biderkirin, tawanê wan tenê ew bû ku digotin Rebbê me Ellah e. Heke Ellah, bi hin merivan, merivên dî neda sekinandin, ew menestir, dêr, hewra û mizgeftên ku navê Ellah di wan de zaf tê zikirkirin, helbet dê bihatina hedimandin. Bê guman Ellah, dê her alîkarî bide wan ên ku alîkariya wî dikin. Bê guman Ellah her qewî û ‘ezîz e. Ew ên ku gava em li ser erdê welat [û serketinê] bidin wan, nimêjê dikin, zekatê didin, emrê bi qencyê û nehya ji xerabiyê dikin, encam û dawîya kar û baran, her ji bo Xudê ye.”⁹⁸

Di *Sûreta Beqere*, ayeta 190î de jî, temîniya Îlahî bi awayekî zipîzelal di derbarê pîr û edebên herba berevaniyê de heye: “Li hember wan ên ku li dijî we şer îlan kirine, hûn jî, sirf ji bo Ellah herbê bikin û nebî ku hûn zêdegavî bikin, bê guman Ellah, ji wan ên ku zêdegavî dikin, hez nake.” Di vê merheleyê de Ellahu teala, îca li Muminan fermana herbê dike; lê belê bêyî ku ayetê biqedîne, di heman ayetê de jî, weke ku bibêje, ha nebî nebî ku hûn ji heddê xwe derkevin...

Berî ku ev ayet bête nazil kirin, divê ku meriv li ayeta 41ê ya sûreta Nehl binêre: “Wan ên ku zulm li wan hat kirin û wan ên ku di rêya Xudê de koç kir, em dê bi awayekî xweş bi cî û war bikin. Îca ecra axretê, mezintir e, ku wan bizanibûya.” Bi vê ayeta mubarek, hîna jî Xudê teala, li ber dilê Muminên bindest dide û berê bala wan dide hêvîdariya bi rehma Îlahî. Bêhna tundrawî û tolhildanê jê naye. Piştî vê ayetê, pileya zordestiya Muşrikên Mekkeyê, wisan zêde bûye ku dê û bavê ‘Emmar bin Yasîr, li ber çavê wî dikujin û berê îşkenceya xwe didin ‘Emmar ku wî jî bikujin, êdî ew hew debar dike û bi gotina wan îşkencevan û qatilan dike, pesnê îlahên wan dide. Îca çawa ku ji destê wan difilite, digrî û xwe digihîne Resûlê Xudê û derdê xwe jê re gilî dike ku Ya Resûlellah, heta ku min derheqê te de ne baş xeber neda û bi başî behsa îlahên wan nekir, wan ez bernedam. Resûlellah jê pirsî: Gelo wê gavê, îman di dilê te de sabit bû? Wî bi awayekî jidil got: Dilê min bi îmanê tije bû. Cenabê Pêxember, li ser vê got: Ku wan eynî îşkenceyî kir, tu jî heman tiştî bibêje.⁹⁹ Ayeta 106an a sûreta Nehl ku tê nazilirin jî wiha ye: “Kî piştî îmana xwe, înkara Ellah bike -ên ku bi îkrahi vê bikin û dilê wan bi îmanê tije ye, ne tê de- û hinava dilê xwe ji kufrê re veke, tafilê xezebek ji Xudê li ser wan heye û ji wan re ‘ezabekî ‘ezîm heye.”

⁹⁸ Tefsîra Şîrîn, Mela Muhemedê Kurê Mela Yehya Nîvelî, Çapxana Diyarbekir Soz, Diyarbekir, 1995, Sûreta Hec, ayet: 39-41.

⁹⁹ H. b. r. 64.

Siyerzanan, dîroka doza vexwendinê ya Nebî selat û selama Îlahî li serê be, dabeşî van merheleyan kiriye:

Merheleya pêşî: Vexwendina bi awayê nepenî ku sê salan ajot.

Merheleya duyem: Vexwendina bi aşkerayî ku tenê bi ziman dihat kirin û heta roja hicretê berdewam kir.

Merheleya sêyem: Vexwendina bi aşkerayî û bi berevaniya aktîf, li hember wan ên ku êrîş dianîn ser Muminan û bi ser de jî bi awayê zêdegavî li Muminên mezlûm zordestî dikirin. Maweya vê merheleyê, heta Peymana Hudeybiyeyê berdewam kiriye.

Merheleya çarem: Vexwendina bi rêbaza aşkerayî, bi tevî şerê li hember hemû astengên Muşrik, mulhîd/Xwedênenas û pûtperestên ku diketin pêşiya merivan û nedihîştin ku bikevin Îslamê. Piştî serdema ku êdî Îslamê, awayê vexwendin û rêya xwe belî kiribû. Kar û barên şerîeta Îslamê ketin îstîqrar û rêkûpêkiyê û hukmên cîhadê, di Îslamê de li ser van ava bû.¹⁰⁰ Di pey van ayet û bûyerên dîrokî de, bala meriv lê ye ku ayeta 4an a sûreta Muhemmed ku navekî di yê vê sûretê, di hin ciyan de *Qital* e, fermaneke cihêrengî dide: “Îca kêliya/gava ku hûn leqayî/rastî wan ên ku kufrê dikin hatin, tafilê li stûyî bidin, da ku hûn hêza wan bişkênin û peyre benê wan baş bişidînin, heta ku herb, giraniya xwe ji ser xwe bavêje, peyre yan wan azad bikin, yan jî wan bi fidye berdin. Bi vî awayî. Îca gava Ellah bixwaze, jixwe helbet wan têk dibe; çi heye ku ew hinekan ji we, bi hinekan belî dike. Îca yên di rêya Îlahî de tèn qetilkirin ku hene, Xudê helbet bi tu awayî ‘emelên wan beredayî berba nake.’”

Sedemê nazilbûna vê ayetê jî, gelek zêde girîng e. Li gor rîwayeta Qetade, Resûlê ekrem, dema ku ji ber fikara sûiqesdî ya Muşrikên çavsor, bi awayekî nepenî ji Mekkeyê koçber bû û diçû şikeftê ku xwe veşêre, li bajarê Mekkeyê fetilî û bi hesret got: Tu li ba Xudê, ji hemû beldeyan şîrîntir î. Di nav beldeyên Xudê de, tu ‘ezîztirîn belde yî. Ku ehaliyê te, ez dernexistima, min terka te nedikir.¹⁰¹

Elî Herîrî ku muhtemelen di sedsala derdora 16an de jiyaye, li gor zihniyeta serdema xwe ev berhem daye. Wî ew hestên cîhada ji bo dîne Îslamê ji xwe re kiriye mijar û bi vê berhemê xwestiye ku Xelîfe Umer û sehabiyên Cenabê Pêxember bi guhdar, yan jî bi xwendevanên xwe bide hezkirin; lê belê mîna ku haya wî ji van realîteyên eslî yên xezaya Nebî (e.s.w.) tune be, bi awayekî mubalexeyî, hin wesfên ku li pîr û edebê cîhada Îslamê nayin, tê de vegotiye.

¹⁰⁰ Muhemmed Se‘îd Remezani el Botî, *Fîqhu’s-Sîreti’n-Nebewiyye Me‘e Mûcizi li Tarîx’il-Xilafeti er-Raşideti, Dar’ul-Fikr’il-Mu‘asir, Beyrût, m. 1991; h. 1411, r. 105.*

¹⁰¹ Elmalılı M. Hamdi Yazır, *Hak Dini Kur’an Dili, Emir Yayınevi, İstanbul, 2000, r. 107.*

2. 4. Ziman û Vegotina Berhemê

Di metnên edebî de digel hêmanên mîna tema, mijar, bûyer, leheng û meknan, zimanê metnê berhemê jî girîng e. Berhem, bi xêra zimanekî zelal û vegotineke xurt, giranbuha dibe û digihîje lûtkeya hunerî.

Ji derbirîna devkî, yan nivîskî ku hestek, ramanek yan jî tema û mijarek pê tê ragihandin re “vegotin” tê gotin. Ev karê vegotinê, dibe ku ji hêla rûxsarî ve “nezmî” be, yan jî “pexşanî/bexşanî” be. Îca ji edîbê/edîba ku bi metnê edebî, mijar, kes û mekan dide naskirin û bûyerê radigihîne re, “vegoter” tê gotin.¹⁰²

2. 4. 1. Awayê Çavnêrîna Vegoter

Di karê vegotinê de “ci”yê vegoter, têra xwe girîng e. Gava bê pirsîn, ka gelo vegoterî, bi çi çavî li mijar, kes û bûyerê mêze kiriye, di bersivê de ew awayê çavnêrîna edîb derdikeve holê. Gava meriv awayê çavnêrîna edîb a li bûyer û mijarê tesbît bike, têgihîştina meriv a ji berhemê hêsatir dibe. Di vê hêlê de ji bo vegoter, sê awayên çavnêrîna (bakîş açîsî) hatine tesbîtîkirin¹⁰³:

1) Çavnêrîna hakimane/Îlahiyane: Vegoter bi her awa û aliyên kes û bûyerê dizane. Hem bi wan tiştên ku di dilê lehengên bûyerê de derbas dibe dizane, hem jî bi taybetiyên wan ên fîzîkî jî dizane.

2) Çavnêrîna lehengiyane: Vegoter, di nav lehengên bûyerê de ye, yek ji serlehengan bi xwe ye û bi wî çavî li bûyer û kesan dinêre û karê vegotina xwe dibe serî.

3) Çavnêrîna çavdêriyane: Vegoter, weke kameravanekî çavdêr, li derveyê bûyer û kesan e, tenê tiştê ku ji derve ve dibîne û dibihîse qeyd dike; bi dilê lehengan nizane û bi awayekî bêlayengirî bûyeran radigihîne.

Di vê berhema *Qewlê Hespê Reş* de vegoter, bi çavnêrîna çavdêriyane karê derbirîna kiriye. Çunkî ji komrêzan diyar e ku edîb, bûyerên ku di serê lehengan de derbas dibe, tenê weke ku dibîne, lê temaşe dike; bes nakeve nav wan û tenê bi awayekî çavdêr bûyerê vedibêje. Tiştê ku heye, carinan alîgiriya xwe ya bi şervanên Îslamî re, li hember şervanên fileh diyar dike. Ev jî, kêmahiyeye hunerî ye ji bo şairî.

35 Metran çi dehşet e

Girê dan ber û pişt e

¹⁰² Ayhan Meretowar, Hunera Axaftina Xweş û Nivîsandina Rind, Enstîtuya Zimanê Kurdî ya Amedê, Istanbul, 2005, r. 99.

¹⁰³ Yusuf Aras, Türk Edebiyatı, Esen Yayınları, Ankara, 2012, r. 292.

Bi dev û pîn dikuşt e

94 Hey hewara Ferfûr e
Di destê wî da şûr e
Çi kafîrek stûr e

Em di vê berhemê de rastî taybetiyên Kurdiya Kurmancî ya devoka Behdînanê tên. Zimanê wê, bi hin bêjeyên kurmanciya kevnar û hêza hunera gel hatiye hûnandin. Her nusxe, li gor devoka kesê ku wê vedibêje, reng û rû girtiye ser xwe. Ji hêla vegotinê ve, nusxeya li ber destê berhevkar Mihemed Emîn Osman ku wî ji devê Selmanê Reşoyê Şûşî girtiye, nusxeya Petersburgê û nusxeya Zeynelabidîn Amedî, li gor devoka Behdînî hatiye vegotin. Lê belê guhertoya wê ya ku ji aliyê Varlı ve hatiye çapkirin, ji hêla Kurmanciya herêman ve, bi temamî ji nusxeyên ber destê me cihê ye û bi temamî bi devoka Serhedê ye. Her wiha motîf û navên meknanan jî, li gor devera vegoteran guherîne. Zimanê helbestê, bi awayekî zelal nîşaneyên devoka Behdînanê dide der û bi zimanê gel ê rojane hatiye vegotin. Ev jî taybetiyeke Elî Herîrî ye. Ji ber ku zihniyeta şair, li ser pêserwextkirina gel a bi hêmanên Îslamî ye, wî jî berhema xwe li gor fêhm û feraseta gel nivîsiye.

Digel ku zimanê wê nêzî zimanê gel e jî, tê de gelek bêjeyên Erebi û hinek peyvên Farisî û du-sê peyvên Turkî hene. Navê hin serlehengên bûyerê jî, dişibin zimanê Suryanî û bivê nevê, têgihên dîne Îsewîyan jî tê de hene.

2. 4. 2. Nîşaneyên Kurmanciya Behdînanê

Em ji kêşana peyvên lêker/fîl ên berhemê derdixin ku devoka eslî ya şairê me, devoka herêma Behdînanê ye:

7 ‘Umer e **vedibîte**
‘Elî ji xwe fihêt e
Min tiştêk **nevête**

19 Go hiş e Mîr **dibihîtin**
Serê te **dibirîtin**
Zêr û malê **diçîtin**

- 39 Go: “Herin bila **bêtin**
Eger didêrî **bêtin**
Bila zêr lê **bikîtin**
Li meydanê **bidêtin**
Herwe ji bo xwe **bîtin**.”

Wekî dî, di tewanga “navdêr”an de jî Kurmanciya Behdînanê xwe dide der:

- 43 ‘**Umerî** digel Keşe
Hêlîna wan Ter Keşe
Meşiya Hespê Reş e

- 44 ‘Umer e çû kolanê
Hespî li tewlexanê
Ew xweş dihat cewelanê

2. 4. 3. Bandora Zimanê Erebi

Ji ber ku ev berhem, di serdema ku edebiyata Kurdî bi çand û medeniyeta/şaristaniya Îslamî-Erebî xemiliye, em dibînin ku hin term û têgihên ku xasî zimanê Erebi ne, ketine metnê.

- 2 Hespê di nêv **kuffaran**
Bi dil ew bû **Musulman**
Muħemmed pê ‘**elam** e
‘elam: Xeberdarkirin, agahdarkirin

kuffar: Însanên înkarkirox

- 8 ‘Umer sivik wek ba bû
Zû ji **dîwanê** rabû
Di **xizmetê** westa bû
xizmet: Pêkanîna kar û baran

- 23 Keşe birayê **Mîr** bû
Lê Lendeho **wezîr** bû

Pir ew ji wî **tedbîr** bû

Hero **dîwana Mîr** bû

dîwana Mîr: Ew mekana ku tê de serokên dewletê lê rûdinin û kar û barên dewletê dibînin.

60 ‘Umer çû bi deştê da

Dêrek dî wî di rê da

Çil **Rahib** in wî tê da

Rahib: Peyveke Erebi ye, di çanda ayinî ya Xisristiyanan de, ji wan ehlê dîn ên mîna keşîş û papazên ku tim li Menastirê dimînin û nazewicin re tê gotin.¹⁰⁴

102 Ewrekî reş î tarî

Baranek jê dibarî

Bo sonda ‘Elî û ‘Umerî

Şehîdêd **Huneyn** û **Bedrî**

Huneyn: Navê herbeke Musliman e ku li hember muşrikan kirine.

a) **Peyvên Erebi**

Peyvên Erebi ku me di metnê Qewlî de tesbît kirin, hinek jê ev in:

‘Amî, Bedr, beyanî, cellad, cewelan, dehşet, Duldul, dînbeçal, dîwan, eman, eşhabî, ‘elam, hesar, Huneyn, îzhar, kemal, kerem, kuffar, Laç, libas, mecnûn, Nebî, qasid, Qureyş, selewat, sewab, sileh, sual, tedbîr, tewhîd, wehîd xeber, xelas, weled, wezîr, Yasîn, yeqîn.

Bedr: Navê herbeke mezin e ku Cenabê Pêxember bi şexsê beşdarî wê bûye û li hember muşrikên Mekkeyê şer kiriye.

Duldul: Navê hespê Hz. Elî ye

Eşhabî: Ji wan Muslimanên ku di dewra seadetê de bawerî bi Cenabê Pexember anîne û pê re hevaltî kirine re tê gotin.

Nebî: Navekî Cenabê Pêxember e ku wateya “nûçegihan” ye.

Qureyş: Navê qebîleyeke ‘Erebên Mekkeyê ye.

b) **Terkîbên Erebi**

¹⁰⁴ Ferit Develioğlu, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 2012, r. 1021.

Digel ku hindik in jî, çend terkîbên bi Erebi tê de derbas dibin. Ew jî ev in:

Umer bin Xetab: Umerê kurê Xettab
Fîl hal: Di heman demê de, a niha
Xas û ‘am: Çi taybet çî jî bi giştî

2. 4. 4. Bandora Zimanê Farisî

Hat tesbîtkirin ku di vê berhemê de bandora zimanê Farisî gelek kêr e. Ji bilî çend peyvên mîna best, binyad, çaveryûd, guftarî, lêvud, yûd, ko, sermest û sot, bêjeyên Farisî tê de nehatine bikarînan.

27 Keşe weled hebû ne
Sivik in wekî **ko** (kûh) ne
Bi dîwanê ve diçûne

Ko/kûh: Çiya

15 Hatim izharî kim
Sirra xwe **guftarî** kim
Hespê Reş geryarî kim.

Guftarî: Xeberdan, peyivîn.

4 Eşhabî çil **Peter** in
Hemî têk difikirin
Mêr ji mêran çêtir in
Sirran ji yek digirin

Peter: Peder. Peyveke Farisî ye, tê wateya “bav”. Bi Kurmancî di vê berhemê de bûye “peter”. Di çanda ayînî ya gelê Kurd de, ji mezinên dînî re “baba” yan jî “bavo” tê gotin. Weke Baba Tahirê ‘Uryan. Hîna jî di serdema me de, ehlê terîqetê, ango mirîd, ji şêxên terîqeta xwe re “bavo” dibêjin.

41 **Keşe** dibû yoldaş in
Bi kenî û temaş in

Ji dîwan çûne paş in
Xeber bîr ew yoldaş in

Keşe: Peyveke Farişî ye, tê wateya “Papaz”, Papazê Dêrê/Kilîseyê, ango “rahîb”

35 **Metran** çî dehşet e
Girê dan ber û pişt e
Bi dev û pîn dikuşt e

Metran: Jê re “metropolît” an jî “piskopos” jî tê gotin. Di nav Xiristiyanên Katolik de, ji wî keşeyê/papazê ku serokê herêmê ye re jî Metran hatiye gotin.¹⁰⁵

2. 4. 5. Bandora Zimanê Turkî

Hejmara peyvên Turkî, didu ye: “Yaban” û “yoldaş”. Wekî dî tê de yek kelîmeyek tenê jî tune ye. Ev dide xuyakirin wê hinga ku ev berhem hatiye nivîsîn, desthilatdariya çand û perwerdehiya Turkî li ser Kurdî tune bûye. Ev jî ji me re dibe delîlek ku Elî Herîrî, bi rastî jî şairê herî kevnar ê Kurdî ye û ev berhema wî jî, berî gelek berhemên dî hatiye nivîsîn.

10 Bi çol û çolistanê
Li deşt û bi **yabanê**
Ajote şaristanê

Yaban: Ji wan ciyên dûrî şehr û bajaran re tê gotin. Ji vê peyvê peyva “yabancı” ya Turkî hatiye dariştin.

41 Keşe dibû **yoldaş** in
Bi kenî û temaş in
Ji dîwan çûne paş in
Xeber bîr ew **yoldaş** in

Yoldaş: Ji bo wan kesên ku hevrê ne tê gotin.

2. 4. 6. Bandora Zimanê Biyanî

Hin peyvên biyanî di berhemê de hene ku dirûvê wan dide bêjeyên Suryanî. Ev jî navê wan palewan û şervanên Xiristiyanên wê hingê ne. Peyva Selxûn, Şelemon, Leymon/Leymûn weke mînak in ji Suryanî re.

¹⁰⁵ Mevlüt Sarı, Qamûs-u Türki ‘Erebi, El – Mewarid, Gonca Yayınevi, İstanbul, 1991, r. 373.

23 Keşe birayê Mîr bû
Lê **Lendeho** wezîr bû
Pir ew ji wî tedbîr bû
Hero dîwana Mîr bû

24 Keşe keçek çê li bal bû
Ciwanek bikemal bû
Enî ji text û xal bû
Navê ewê **Leymûn** bû

49 ‘Umer siwarek serbest e
Ket û stû neşikeste
Celew maye di dest e
Kewran heyf lê dixweste

90 Hey hewara **Selxûn** e
Rimî wekî stûn e
Çi kafîrek mel‘ûn e

91 Hey hewara **Hovonîs** e
Kafîrek xûnalîs e
Kafir pê da li fêz e

92 Hey hewara **Bextiyar** e
Ji wir da hate xwar e
Çi kafîrek pir har e

93 Hey hewara wî **Nezr** e
Wî di destanî tevr e
Hat navê Pêgember e

94 Hey hewara **Ferfûr** e

Di destê wî da şûr e

Çi kfirek stûr e

Ferfûr: Bi Farisî, navê padîşahên Çiniyan e.¹⁰⁶

2. 5. Kevneşopiya Edebî ya Metnê Berhemê

Peyva “kevneşopî” ji hêla binesaziya xwe ve peyveke dariştî, ango çêkirî ye. Ji peyva “kevn” û peyva “şop” hatiye hevedudanîkirin, qertafa “-î” jî pê ve hatiye danîn wateyeke nû jê derketiye. Li ber peyva biyanî, “tradisyon”ê hatiye derxistin. Di zimanê Turkî de bergîdana wê, “gelenek” e.

Wateya vê peyvê di edebiyatê de ew e ku di her serdemeke dîrokî de, ji hêla zanîn, huner, edet û geşedana ray û ramanê ve, di metnên edebî de çandeke hevpar derdikeve holê û weqtakî dûredirêj berdewam dike. Ha di vê maweyê de piraniya edîbên heman serdemê, bi heman şêwaz û awayî berhemên xwe hildiberînin û ev di dîroka edebiyatê de dibe “kevneşopî”. Çawa ku di edebiyata Erebî, Farisî û Turkî de ev kevneşopiyên edebî hene, di dîroka edebiyata Kurdî de jî hene.

Çand û hunera Erebî, berî Îslamê, di nav kevneşopiyê xweserî serdema xwe de bû ku bi giştî, çî berhemên devkî bin, çî jî berhemên nivîskî bin, li ser jin, şerab û tiştên bêserûber bû. Bi zahîrbûn û serdestbûna çand û medeniyeta Îslamê re, huner û edebiyata Erebî, çî devkî be çî nivîskî be, ket bin reng û rûyê nû yê eqîdeya Îslamê. Ew kevneşopiya serberdayî, wek serdemekê bi dawî bû. Serdema Îslamê dest pê kir û bere bere bû kevneşopiyê nû. Dema ku fethên Îslamê ket rojeva gelên ‘Ereb, êdî berhemên edebî jî, bûn mirêka van xeza û serketinên betlên wan. Hestên civakê, bi rûhê têkoşîna li dij ne-musliman û bi berxwedana li hember zehmetiyên wan, hat xwedîkirin. Heta serdema desthilatdariya Emewîyan, ev kevneşopî di rewacê de ma. Di serdema Ebbasiyan de, merheleyê nû di edebiyata nivîskî ya Erebî de dest pê dike. Hikayeyên menzûm ên li ser evîna beşerî û pê re jî Îlahî, ciyê herî berfîreh digrin. Mesnewiya *Leyla û Mecnûn*, yek ji van e. Di edebiyata devkî de jî hikayeyên dînî bi xêra “Qussasan” dewlemend dibe. Bi taybetî, *Qisseyên Nebîyan* ku serkaniya wan *Qur’an* e, di nav civakê de têra xwe tê hezkirin. Di sedsala XIan a mîladî de, alimên mîna Qisafî û Se‘ilebî, di teşkîla ekola edebiyata dînî de, digihîjin serketineke mezin. Ev tevger, tesîrê li edebiyata nivîskî jî dike û tevî berhemên dînî yên mîna tefsîr, fiqih, hedîs, kalam û siyerê, berhemên edebî yên mîna mexazî jî tînin dayin û ev kevneşopî digihîje

¹⁰⁶ Hesên Enwerî, Ferhengê Foşordeyê Soxen, Intişaratê Soxen, 1382, Tehran, r. 1662.

tekamuleke mezin.¹⁰⁷ Vê kevneşopiyê, bi xwe re çand û edebiyateke dewlemend a Erebi anîtiye.

Edebiyata Farisî jî, bi serdema serdestbûna çand û medeniyeta Îslamî ketiye qonaxeke nû. Serê ewil, edîbên Îranî, zanist û edebiyata xwe, bi zimanê Qur'anê îcra dikin; bes piştî çendakî, li zimanê xwe vedigerin û dest pê dikin berheman werdigerînin Farisî. Wan serê pêşî, bi têgihên dînî dest bi tradisyona nû kir. Navê dezmêjê ku di Qur'anê de “wudû” bû, wan kir abdest, ji “selat”ê re navê “nemaz”ê danîn, ji Nebî re jî wan got “peyamber-peyxember”. Edebiyata Îslamî ya Îranê, bi xezel, rubaî û mesnewiyan ket geşedanê.¹⁰⁸

Şop û rêçên her serdemeke dîrokî ya edebiyatê, helbet di berhemên edebî de xwe didin der û bi xêra berhemên edebî jî wendabûnê xelas dibin û digihîjin nifşên dû xwe. Ne bi xêra van berheman be, ev kevneşopiyên edebî, nagihîjin nifşên dahatûyê/ayendeyê. Her taybetiyeke xweser a her kevneşopiyê, digel reng û rûyê zimên, awayê vegotinê, tema, mijar, hêmanên metnî yên avasaziya berhemê, bi xêra van berheman tên ragihandin. Nifşên nû, li ser tecrube û bingeha van berheman, berhemên nûtir û cihêtir didin û bi vî awayî, bi domana demê re her ku diçe, kevneşopiyên cihêrengî li dîroka edebiyatê zêde dibin. Kevneşopiya edebiyata gelêrî ya devkî, kevneşopiya edebiyata Îslamî û kevneşopiya edebiyata modern, bi vê teher û terzê ciyê xwe di dîroka edebiyatê de girtiye. Ji ber ku edebiyat, herî zêde bi awayê helbestê hatiye îcrakirin û berhema me ya ku em li ser wê radiwestin menzûm e, em jî dê bêtir li ser kevneşopiyên nezmî bisekinin.

2. 5. 1. Cûreyê Kevneşopiya Edebî ya Metnê Berhemê

Di helbesta Kurdî de, li gor taybetiyên dîrokî, hunerî, çandî, ramanî û edebî, mumkun e ku em sê cûre kevneşopiyan tesbît bikin:

a. Kevneşopiya helbesta gelêrî: Di serdema edebiyata devkî de teşe girtiye. Ev kevneşopî di nav gel de qels bûbe jî, hîn berdewam e.

b. Kevneşopiya helbesta dîwanê: Bi reng û rûyê edebî, hunerî û çandî yê Erebi-Îslamî ketiye geşedanê. Digel ku bi girtina medreseyan û bipaşdehiştina çanda Îslamî lawaz bûbe jî, her berdewam e û berhem tên dayin.

c. Kevneşopiya helbesta modern: Li ser bingeha çand û hunera Ewrûpî derketiye û hîna jî berdewam e.

Li gor D. Mesûd Cemîl, hozana Kurdî, dabeşî sê qonaxên sereke dibît:

¹⁰⁷ Nihad Sami Banarlı, Resimli Türk Edebiyatı Tarihi, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 2001, r. 130.

¹⁰⁸ H. b. r. 132.

- 1) Qonaxa hozana klasîkî
- 2) Qonaxa hozana folklorî
- 3) Qonaxa hozana niwî¹⁰⁹

Li gor Abdurrahman Adak, serdemên edebiyata Kurdî, li du dewran tê dabeşkirin:

Edebiyata Kurdî ya berî Îslamê: Ji destpêkê heta bi dema misilmanbûna Kurdan, wate heta bi sedsala heftan a mîladî didome. Nivîstekên Hewramanê, berhemên bi alfabeya Pînoşîd û Masî-Soratî, ji berhemên vê serdemê re mînak in.

Edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê: Ji destpêka misilmanbûna Kurdan heta roja me didome. Berhemên ku bi Kurdiya Kurmancî, bi Kurdiya Soranî, bi Kurdiya Goranî, bi Kurdiya Zazakî û bi Kurdiya Loranî hatine nivîsîn, mînakên vê serdemê ne.¹¹⁰

Di serdema Îslamî de edebiyata Kurdî ya nivskî, li çend deverên ku weke navend tînan qebûl kirin, li gor mercên xwe teşe girtiye. Herêma Hewreman, herêma Lorsitan, Hemedan, Erdelan, Behdînan, Hekariya, her yek ji van deran, di weqtê aktîfiya medreseyan de, ciyên girîng bûn ji edebiyatê re. Heta hin bajar jî, digel navçe û gundê xwe hebûn ku ji bo geşedana edebiyata Kurdî (Kurmancî, Soranî û Zazakî) navendên germ û şên bûn.

Ku em bînin ser *Qewlê Hespê Reş* û kevneşopiya wê ya edebî, di nav kevneşopiyên edebiyata Kurdî de, helbet em dê tê derxin ku ji nav kevneşopiya edeba gelêrî ye. Îca ji ber ku berhemêke dîna Îslamî ye, kevneşopiya wê ya edebî ya vê xezanemeyê, li ser kevneşopiya edebiyata Kurdî ya Îslamî ye. Helwesta şairên wê, ji serî heta binî diyar e ku li ser bingeha ezîzkirina *Alê Beyrê*, Hz. Elî û hevalên Cenabê Pêxember e. Dijberên ehlê Îslamê jî, di mercên wê hingê de, ji ehlê kîtabê, mîrek û şervanên Xiristiyan in.

Xezanemeya *Borê Qer*, ji aliyê ziman, pergala qafiyê, motîf, hêmanên mîtolojîk, lehengên awarte û dabeşbûna rêzan a li koman ve, gelek zêde dişibe berhemên edebiyata devkî ya gelêrî. Lewre bi ser van agahiyan de, me divê ku du nêrînan li ser vê berhemê derxînin pêş:

- 1) Ev berhem, serê pêşî ji aliyê melayekî hozan û şair ve hatiye hilberîn, di pirtûkan de hatiye nivîsîn û peyre, di nav meleyan de berbelav bûye û ji aliyê melayan ve, li civatan hatiye gotin û çîrokbêj, an jî dengbêjan ew ji melayan girtine, jidev kirine û îca wan bi xwe di nav gel de gotiye. Heta bi qasî ku me ji wan qewlbêjên mîna Nûrî Aslanê Kotekan û Hecî Mihemedê Holî fêhm kir, ev xezaneme, di helqeyên mirîdan de, li dergayê terîqet û tekiyayan, li ber elbaneyê, bi awayekî newayî hatiye gotin û di navê de jî selawat li ser Nebî hatine

¹⁰⁹ Mes'ûd Cemîl, Qonaxên Kêşnasiya Hozana Kurdî, Pertûkxaneya Bedirxaniyan, Dihok, 2014, r. 163.

¹¹⁰ Abdurrahman Adak, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Weş. Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 98.

dayin. Derwêş Mihemed jî di guhertoya xwe de, vê menzûmeyê, bi newayeke diyar, digel lêdana elbaneyê dibêje. Newaya Derwêş Mihemed, Şêx Nûrîyê Kotekan û Abdullahê Qulpî, heman newa ye.

2) Berhem, cara ewil ji aliyê hozanekî gel ve hatiye hilberîn û ji devê wî, bi awayê devkî belavî nava gel bûye; peyre şairekî ew derbasî nivîsê kiriye. Piştî van agahiyan, qenaeta me pê çê bû ku ev xezaname, ji aliyê gel ve hatiye hilberîn, hema hema li her deverên welêt hatiye vegotin û xezanameyeke siruştî ye ku bi derbasbûna demê re bûye anonîm. Piştî ku demeke dirêj bi ser de derbas bûye, edîbên navdar ên kurd, ev berhem bi rêbaza edebiyata nivîskî, derbasî nivîsê kiriye. Ji bo vê pêbaweriya xwe, em van sersedeman derdixin pêş:

1. Ev merheleyên çeşnê destanan, di edebiyatên devkî yên gelên dunyayê de jî heye û sê merheleyên wan hene:

- a. Merheleya hilberînê.
- b. Merheleya berbelavbûnê.
- c. Merheleya derbaskirina nivîsê.

2. Çawa ku di nav piraniya gelên cîhanê de jî heye, edebiyata devkî ya gel, berî edebiyata nivîskî ketiye jiyanê.

3. Baş tê zanîn ku edebiyata Kurdî ya devkî, ji edebiyata Kurdî ya nivîskî gelek zêde pêşdetir e. Lewre dibe ku berhem cara pêşî di nav gel de hatibe hilberîn.

4. Ehmedê Xanî jî, mesnewiya xwe ya bi navê “*Mem û Zîn*”, ji kelepura edebiyata devkî girtiye. Digel ku ev berhem derbasî nivîsê bûye jî, piştî Xanî jî hozanên gel, ew bi awayê devkî, li gor kevneşopiya xwe zindî girtine. *Destana Dimdimê*, hikayeyên “*Şêx Sen’an*” û “*Bersîsê ‘Abid*” jî gelêrî ne ku Feqiyê Teyran, bi terzê edebiyata nivîskî ew kirine pirtûk.

5. Di xezanameya “*Borê Qer*” de motîfên mîtolojîk ên edebiyata gel hene. Weke hespê mîtolojîk û çûka efsaneyî.

Bi qasî ku em ji van taybetiyên wê yên teşeyî derdixin, bi qenaeta me ev berhem, li ser kevneşopiya helbesta gelêrî hatiye hunandin. Hem awayê komrêzên wê, hem awayê pergala wê ya qafiyeyê, hem jî zimanê helbestê, gelek zêde li ser çexera kevneşopiya helbesta gelêrî ye. Em vê kevneşopiya edebiyata gelêrî ku hejmara yekeyên nezmî yên helbestê ji “sê” rêzan pêk tê, di cûreyê edebî yê edebiyata gel a anonîm de jî dibînin:

Sibe ye xunav li gulê

Ebdelîb dixwunitin digel bilbilê
Ez dê biçime tewafa gerdenê hemayilê

Sube ye sibe lend e
Kuro tu meger lê bazbend e
Muhbeta dilan gerîbend e¹¹¹

Ev xezanameya dînî, bi aliyên xwe yên mîna wezn, hejmara komên rêzan, pergala qafiyeyê û zimanê derbirînê, gelek zêde dişibe *Qewlên Êzdiyan* jî.

Ezîzê min navê te mîr e
Şêşimsê min navê te mîr e

Tu bavê Babdîn î
Tu bavê Babdîn î
Weliyê bor ve zîn î¹¹²

Bêjeya “*qewl*” ji zimanê Erebi ketiye Kurmancî. Di Qur’anê de jî ev bêje derbas dibe. Mesdera lêkera/fîla “qale” ye. Wateya wê, “gotin” e. Qewl, ew muqaweleya/pevrexivîna li ser ‘ehd û peymanan e û ew kelimê menzûm ê Erebi, yan jî Kurdî ye ku hikayeyekê, yan medhekê, yan jî çîroka evînekê di xwe de dihewîne.¹¹³ Ev bêje, di nav kurdan de bêtir di wateya helbestê de hatiye bikaranîn. Peyva “Qewl” di *Sûreta Elhaqqe* de derbas dibe: “Ew ne qewlê şairekî ye, gelo hûn çiqas hindik îman tînin. Ew, ne qewlê kahinekî ye jî. Gelo ma hûn çiqas hindik difikirin. Ji hêla Rebbê ‘aleman ve hatiye nazilkirin.”¹¹⁴ Ev peyv, ji zimanê Erebi hatiye ketiye edebiyata Kurmancî. Li ser babê kelîmeya “fe‘aal” e. Îca ji bo xezanameyên Îslamî yên Kurmancî ku “*Newala Sîseban*” û *Qewlê Borê Qer* e jî peyva *qewl* hatiye bikaranîn.

Ji helbestên devkî yên edebiyata Êzîdiyan re jî “qewl” hatiye gotin. Di ferhenga Ziyaeddîn Paşayê Xaldî de li ser peyva “*qewwal*” ev agahî heye: “Qewwal, ji sofîyên Êzîdiyan re tê gotin ku dengê wan ê stranê, ji merivan re xweş e û dîsa celebekî tivingan e

¹¹¹ Mehmet Gültekin, “Di Arşîva Prof. Ferdinand Justî de Mela Mehmûd Bazidî”, *Nûbihar*, Bihar, Stenbol, 2015, j. 131, r. 17.

¹¹² Tosinê Reşîd, Êzdayetî Oleke Hê Ji Nenaskirî, Weşananên Lîs, Stenbol, 2007, r. 140.

¹¹³ Yusûf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî El Meqdisî, El Hediyetu’l Hemîdiyyeti Fî’l Luxeti’l Kurdiyyeti, (Tehqîq: Muḥammed Mukrî) Weş. Mektebetu Diyarbekir, 2011, r. 184.

¹¹⁴ Sûreya El-Haqqetu, 41-43.

jî.”¹¹⁵ Di kilamên dengbêjan de jî em rastî bêjeya “qewal” tîn. Di kilameke Karapetê Xaço de jî ev bêje heye:

De dayê delan e
Li pêşiya malê me şer e
Li paşiya malê me ferman e
Şerê **qewalê** Êzîdiyan
Sofiyê Misilmanan e
Wele xweştir e ji şerê nêrî kolberan e¹¹⁶

Di çavkaniyên Îslamî de jî wateya *qewl* wiha hatiye diyarkirin: “qewl: Peyv, bêje, lihevkin, peyman, peyva ku tê axaftin, hevoka peyvê, îtîqad, delîl, tarîf, û îlham. *Qewlê leyvin*: Peyva nerm. Peyva ku ne hişk e. Peyva ku tê de ezezî tune ye. *Qewlê mucerred*: Peyva bêdelîl. *Qewlê şarih*: Peyva ku wateya wê rave dike, şerh dike. *Qewlê racih*: Peyva ku meqbûltir e, qenaet, fikir.”¹¹⁷ Curcanî jî peyva “qewl” rave kiriye: “Ji her peyva ku ji devê meriv derdikeve re tê gotin û çawa ku rastiya wê muhtemel e, xeletiya wê jî muhtemel e.”¹¹⁸

Navê vê berhemê, çî di nav Kurmancan de be, çî jî di nav Dimiliyan de be, li hin ciyên welêt weke “*Borê Qer*” tê binavkirin.¹¹⁹ Li gor nusxeya ku li ber destê berhevkar Mihemed Emîn Osman e, navê vê berhemê wiha ye: “*Beyta Hespê Reş*”¹²⁰ îca Zeynelabidîn Amedî jî, di nav kevanekê de navê wê, weke “*Borê Qer*” nivîsiye. Di destxeta Petersburgê de jî navê wê, *Hespê Reş*” e. Peyva “*qer*” di wateya “reş” de ye; bes wateya peyva “*bor*” hinekî balkêş hat. Lewre, me berê xwe da ferhengan. Di Ferhenga Kurdistanî de ev hatiye qeydkirin: “Rengekî di navbera spî û reş de ye. Faris jê re Xaki Necefî dibêjin (Axa Necefê ku Necef, ji bajarên pîroz e li ba Şî’îyan. Niha li Iraqê dikeve). Ji hespê ku di vî rengî de be jî, hespê bor dibêjin. Di ferhenga Burhanî Qatî’ (sala 1650 bi destê Mihemmed Husên Tebrîzî hatiye nivîsîn û bîst hezar peyv in) û Ferhengî Cihangîrî (ferhengeke sala 1595an Cemaleddînê Şîrazî, ji sultanê Hindistanê Cihangîr re pêşkêş kir û navê wê danî *Cihangîrî*) de bor, bi

¹¹⁵ Yusûf Ziyaeddîn Paşa h.b. r. 173.

¹¹⁶ Salihê Kevirbirî, Bir Çîglîgîn Yüzyılı Karapetê Xaço, Sî Yayınları, İstanbul, 2002, r. 95.

¹¹⁷ Abdullah Yeğîn, İslamî - İlmî - Edebî – Felsefî Lûgat, Yeni Asya Yayınları, İstanbul, 1975, r. 324.

¹¹⁸ Kadri Yıldırım, Ehmedê Xanî Külliyyatı, II, ‘Eqîdeya İmanê/İnanç Risalesi, Analiz ve Şerh, Avesta Yayınları, İstanbul, 2008, r. 178.

¹¹⁹ Li herêma Xerzan, li gundên derdora Batmanê, li Bidlîsê û li hêla Amedê/Diyarbakirê, li Farqîn, Erxenî û Pasûrê.

¹²⁰ Dîwanê Melan, Mihemed Emîn Osman, Emîndariya Giştî ya Rewşenbîrî û Lawan, Hewlêr, 1977, (Ji nusxeya bi alfabe ya Erebî)

wateya sor tê. Di baweriya nivîskar de (Elî Ekber çê li xwe dike) ev yek ne rast e. (di H.B. de *borekî û borelok*: Rengê nêzîkî bor. *Borî*: Rengê bor e.)”¹²¹

Çawa ku edebiyata Turkî de ev cûre berhemên “Meğazî” bi muslimanbûna wan re di sedsala XVan û XVIan ketine nav berheman, wisan jî ihtîmal heye ku berî van sedsalan ketibin edebiyata Kurdî. Bê guman edebiyata devkî ya Kurdî, berî edebiyata nivîskî ya Kurdî derketiye û di nav gel de reh berdaye. Ji ber ku gelê Kurd berî gelê Turk ketiye bin motîfên Îslamî, dibe ku ev çanda Îslamî, berî wan di edebiyata Kurdî de şax dabe. Çawa ku edebiyata Turkî ji hêla motîfên edebî-Îslamî ve ketiye bin bandora edebiyata Farisî, edebiyata Farisî jî, ketiye bin bandora edebiyata Erebî. Li gor Yusuf Aras, ew metnên ku di derdora bûyerê de çê dibin û hin ji navên wan, mîna “*Bettalname*” û “*Danişmendname*” ne, çend hîkayeyên destanî ne ku di sedsala 8an de, di serdema Emewiyan de, ketine edebiyata devkî ya Turkî. Wê hingê Emewiyan, li hember Bizansê, herbên dînî dikirin û qehremanekî bi navê Bettal, di van herban de nav û deng dabûye. Turkan, ji vî lehengî dînî re, “*Bettal Gazî*”, “*Seyyîd Bettal*” gotiye û hîkayeyên derbarî wî de bi awayê destanî vegotiye. Bere bere, ev qehremanê ku bi eslê xwe ‘Ereb e, di edebiyata Turkî ya devkî de, motîfên millî yên Turk jî girtiye ser xwe û mucadeleyên wî yên li hember Xiristiyanan hatiye vegotin. Peyre, di derdora sedsala 15an de derbasî nivîsê bûye¹²²

Ev berhema *Qewlê Hespê Reş*, di van sedsalan de, bi tesîra edebiyata Erebî û Farisî ya nivîskî, dibe ku ji hêla Herîrî ve derbasî nivîsê hatibe kirin. Edebiyata nivîskî ya Erebî, Farisî û Turkî, di medreseyên Kurdan de, ji hêla entellektuelên medreseyî ve hatiye xwendin û muhtemelen Herîrî jî, li ber wan ev berhem ji edebiyata Kurmancî ya devkî derbasî nivîsê kiriye. Ji ber ku Kurd, di serdema ewil a muslimanbûnê de li hember artêşa Îslamê neketine şerên tund, wan bi çavekî sempaî li betl û palewanên Îslamî nihêrtiye. Lewre ev şerê sehabiyên Cenabê Pêxember ku li hember ne-nuslîmên Bizansî hatine kirin, bi rêya destanî hatine vegotin û wan bi awayê devkî neqil kirine. Dîroknasan, dîroka fetha herêma ku Kurd tê de meskûn bûne, wiha qeyd kirine: “Serdema ku Hz. Umer xelîfe bûye (h. 15), imperatorê Bizansî, Heraklius(610-641) e. Artêşa Îslamê, sala 15yê hicrî, (m. 636) di Herba Yermukê de, artêşa Heraklius têk bir û bi ser Sûriyeyê ve girt(h. 16; m. 637). Jê bi şûn de, dor hatibû ser fetha wê herêma ku jê re Mezopotamyaya Bakur dihat gotin. Xelîfe Hz. Umer, ew wezîfe da ser milê ‘Iyaz bin Xenem. Ev sehabî, digel 8000 eskerî, ket tevgerê. Bi rê de, wî hin keleh bi rêya şer; hin jê bi rêya sulh û peymanê fetih kirin. Bi vî awayî hat heta ber kelehên

¹²¹ Elî Ekber Kurdistanî, Ferhenga Kurdistanî, (Werger: Jan Dost) Weşanxaneya Nûbihar, İstanbul, 2010, r. 60.

¹²² Yusuf Aras, Türk Edebiyatı, Esen Yayınları, Ankara, 2012, r. 134.

Amîdê(Diyarbakir). Serfermandar ‘Iyaz, xwe da ber Tellê (Deriyê Mêrdînê); Seîd bin Zeyd, Deriyê Rûm (Deriyê Urfayê); Muaz bin Cebel, Deriyê Ermen (Deriyê Çiya yan jî Deriyê Xarpêtê) û Xalid bin Welîd jî, Deriyê Babu’l Ma (Deriyê Avê, yan jî Deriyê Dicle, Yenikapî). Li gor ku Waqîdî radigihîne, wê hingê şehr, di bin desthilatdariya pîrekeke bi navê Meryema Dara de bûye; lê belê li gor ku Seîd Paşa ragihandiye, Amid digel Meyafariqîn (Silvan) di bin walîti û parastina femandarekî Rûm ê bi navê Antak de bûye. Lewre Antak, gava pê dihise ku artêşa Îslamê tê herêmê, bawer dike ku Amîd, qewî ye, dikare berevaniya xwe bike, ji ber wê, berê xwe dide Meyafariqînê û diçe ku berevaniya wê derê bike. Dorpêçkirina Amîdê, bi mehan berdewam dike. Artêşa Îslamê, çendîn car êrîş birin ser sûr û keleşan; bes tiştêk bi destê wan neket. Pênc mehên wan wisan derbas bû. Vê navberê ‘Iyaz bin Xenem, hêzeke eskerî di bin serfermandariya Hakem bin Hîşam de bi ser Meyafariqînê de şand û wan ew der jî fetih kir. Peyre Xalid bin Welîd, li dor sûrên bajêr, ket keşf û lêgerînan. Di van lêgerînan de, qenaleke nepenî ya avê, di bin sûran de dîtiye. Deriyê vê qenalê, li Çemê Dicleyê, li hêla rojhilatê bajêr dinêre. Ji bo ku eskerên xwe tê re bide derbaskirin, wî ev qenalê da firehkirin û xebera ‘Iyaz bin Xenem pê xist. Wan li hev kir û Xalid bin Welîd, digel 100 şervanên xwe yê ku piraniya wan sehabî ne, di vê qenalê re ketin nav bajêr. Wan kir ku artêşa Îslamê, di wî ciyê ku îro jê re “İçkale”, yan jî “Fetih Kapısı” tê gotin, bikevin şehir. Dema ku ketin hundirê şehir û wan xwest ku vî deriyê sûrê ji hevalên xwe re vekin, di şerê li hember pawanan de, 25 şervanên Musliman şehîd dikevin. Cendekê van şehîdan, hîna jî di meşheda Mizgefta İçkale/Hz. Suleyman de definkirî ne. Yek ji wan, Suleymanê kurê Xalid bin Welîd e.”¹²³

Em ji vê berhemê tê digihêjin ku gava Diyarbakir ji hêla artêşa Îslamê ve hatiye fetihkirin, desthilatdarên şehir, ne Kurd; bes Rûm in. Her wiha xelîfeyê Îslamê jî, Hz. Umer e. Nexwe ev xezanameya *Qewlê Hespê Reş* ku di edebiyata Kurdî (Kurmancî) de derketiye, ji ber vê sedemê ye ku pesnê Hz. Umer hatiye dayin. Îca gava em dîroka vê fethê li ber çavan bigrin ku sala 17an a hicrî; sala 639an a miladî ye¹²⁴ îhtîmal heye ku ev berhem, ji sedsala yekem a hicrî û sedsala 7an a miladî ve, di nav gel de hatibe derxistin/hilberîn. Tiştê ku divê em ji nedîtî ve neyin ew e ku li gor dîroka Îslamê, Hz. Umer di serdema xelîfetiya xwe de, nehatiye herêma Mezopotamyayê. Hêjayî behsê ye, çawa ku *Qewlê Newala Sîsebanê* lehengiya Xelîfe Elî derdixe pêş¹²⁵, *Qewlê Hespê Reş* jî, qaremaniya Hezretî Umer aniye zimên. Wisan xuya ye ku muhtemelen di edebiyata Îslamî ya Kurdî de xezanameya ewil

¹²³ Diyarbakır’ın Fethi, Tarihi ve Kültürü, (Hazırlayan: Zeynel Abidin Çiçek), Diyarbakır Söz, Diyarbakır, 2007, r. 24.

¹²⁴ h. b. r. 25.

¹²⁵ *Qewlê Newala Sîsebanê*, (Amadekar: Ahmet Demir), Weşanxaneya Nûbihar, İstanbul, 2012, r. 11.

Qewlê Hespê Reş e. Çunkî Herîrî, weke şairê yekem ê edebiyata Kurmancî tê hesabandin. Lewre dibe ku wî ev xezaname, berî xezanameya *Qewlê Newala Sîsebanê* nivîsibe.

2. 5. 2. Motîfên Dîrokî yên Berhemê

Ji bilî taybetmendiyên hundirîn, teşeyî û naverokî, wan aliyên peyamî, sembolîk û mîtolojîk ên berhemê jî bala me kişand. Me dît ku hin motîfên mîtolojîk û neteweyî yên vê berhemê jî di hemû nusxeyan de hene; lewre me jî ciyekî taybet da wan.

1) **Motîfên Kurdewar:** Di nav civaka Kurdan de rengê kesk û sor û zer, ciyekî xweser û girîng dibîne. Bi taybetî di alaya ku îro li Herêma Kurdan a Iraqê tê daleqandin de ev sê reng, digel rengê spî, pîroz têne dîtin. Çawa ku di *Qewlê Newala Sîsebanê* de ev heye, di van komrêzên jêr ên *Qewlê Hespê Reş* de jî ev çar rengên ha, digel nîrxên pîroz ên dînî hatine diyarkirin:

Koma sor û **spî** ye
Alay li ber ketî ye
Sed selewat li Nebî ne

Koma **kesk** û **sor** û **zer**
Eşhaban dî ketine ber
Ew birayê Pêgember

Rengê spî: Nîşana masûmiyê ye

Rengê kesk: Sembola xweşî û hêşînahiya welatê Kurdan e.

Rengê sor: ‘Elameta xwîna zaf a şehîdan e

Rengê zer: Sembola rojê ye ku di dîrokê de li cem Kurdan pîroz bûye.

2) Motîfa Rengê Reş

Rengê vî hespê ku bûye lehengekî sereke yê berhemê, balê dikşîne. Çima ne hespekî boz, kumêt, sor an jî spî; lê hespekî **qer**? Bi dîtina me “peyamek” di vî rengê **reş** de heye. Heta efsaneya duyem a “heywên” ku di berhemê de derbas dibe jî, ciyê mereqê ye. Çunkî rengê teyrikê bi navê “Hehecîk”ê jî **reş** e. Îhtîmal e ku ev jî hêmaneke sembolîk a berhemê be. Li gor çîrokbêjên herêma Xerzan, ciyê rûdana vê bûyerê, **Çiyayê Qêre** ye. Ev çiya, di

navbera şehre Batman û navçeya Qubîne de ye. Çiyayekî volkanî ye; kevirên wê deverê jî, mîna Çiyayê Qerecdaxa Diyarbekirê, seraser reş in. Heta hevkarîya “keşe” ya bi Hz. Umer re jî, dibe ku bi vê yekê re eleqedar be; çunkî rengê kincê keşe û “metranîsayîyan” jî reş e.

Ji ber ku rengê reş, di nav hezkiriyên Alê Beyta Hz. Muhammed de –bi taybetî di nav mezhebê Şîîyan de- nîşaneke bawerîya dînî ye, dibe ku hilberînerê vê berhemê jî ev reng, bi zanetî tê de hunabe. Di metna ku me ji devê Hecî Nûrî yê Mala Şêxê Kotekan ku gundê wan, li ser şehre Erxenîya Amedê ye girtiye de, diyardeyeke di jî heye: Xezanamebêj dibêje ku Hespê Reş, bi Farisî peyiviye. Heta Keşe jî bi Farisî peyiviye. Di nusxeya *Îbrahîm bin Hacî* ku ji aliyê Ebdullah Varlı ve hatiye çapkirin de, bêjeya “Pehlewî” jî heye:

“Sîne xetê spî ye ji kewê Çelebî ye

Qazmeş e, mehbûbî ye ew rindik **Pehlewî** ye

Rengê sor û spî ye hîva çardeşebî ye

Bedrek ji nû vedaye, ew çira xwe xuya ye

Wê hey hû ye, rengê hîva nû bûye¹²⁶

Di nav Kurdan de ji hespê qer re, “*Hespê ‘Ereb ê cins’*” jî tê gotin. Di kilamên gel de jî, navê hin kesên navdar, bi tevî hespa wî tê diyarkirin. Weke mînak em dikarin li vê kilama *Evdalê Zeynikê* binihêrin:

“Axawo ezê ji teyra teyrekî hur im

Per û baskê mî weşyane nikarim lî ser Sûra Diyarbekir bîfîrim

Kesê tunê xeberê bîde Bavê Evla Begê Sîyarê **Ereb** Mîrê Zîrav”¹²⁷

Di destana *Kela Dimdimê* de jî hespê reş bi navê “Ereb” hatiye wesifandinê:

“Kihêleke erebî Emer siyar bû

Rabû şebeqê, berbanga sibê

Revoyê hespa ajot û çû

Ajot û çû ber Gola Êrmiyê”¹²⁸

¹²⁶ Ebdullah M. Varlı, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn*, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 448.

¹²⁷ Şairê Kurda yê Efsanevi Evdalê Zeynikê, (Amadekar: Ahmet Aras), *Weşanên Deng*, İstanbul, 1996, r. 67. (Me dest nedaye awayê rastnivîsa vê jêderê)

¹²⁸ Casimê Celîl & Emerê Celalî, *Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrîn*, Nûbihar, İstanbul, 2011, r. 45.

Çawa ku di nav Kurdên Êzdî de *rengê spî* semboleke baweriyê ye, di nav Kurdên Şîî de jî *rengê reş*, sembolek e. Li navçeya Qubînê ku li ser Batmanê ye, sala 1982ê, gundiyên Êzdî ku hevalên min ên dibistanê bûn, li ser sembola xwe ya *rengê spî*, ji me re bi nezmî wiha digot:

Êzdî ne

Cilspî ne

Cennetî ne

Di hilberên devkî yê edebiyata gelêrî yê Kurdî (Kurmancî) de jî em rastî motîfeke erênî ya hespê tên. Di hin *gotinên pêşyan* de jî navê hespê wiha derbas dibe:

“Hespê çê, êmê xwe zêde dike.”

“Gava meriv ji ser pişta kerê dikeve, mûyên wê dibêjin stû bişkê; gava meriv ji ser pişta hespan dikeve, mûyên wan dibêjin Ellah Xudê.”

“Hespê çê, şivê li xwe naxe.”¹²⁹

“Hespa bi bez; jina bi lez.”

“Hespê bin xwe, nede kurê xwe.”

“Hespê çê, siwarê xwe di tengahiyê de nahêle.”¹³⁰

2. 5. 3. Hêmanên Mîtolojîk ên Berhemê

Du heywan di vê berhemê de weke serleheng hatine cîdan. Yek jê hesp, ya dî jî teyrikek e. Ev teyrik, li gor sê qewlbêjên gel ku me guhertoyên wan qeyd kirine, hehecîk e. Heywana duyem jî hesp e ku jixwe bûye navê berhemê.

1) **Hespê Efsanewî:** Ji ber ku çavkaniya edebiyata gelên Musliman a devkî û nivîskî ya serdema Îslamê, hedîs, tefsîr, kelam, siyer û fiqih bû, berhemên edebî ku di vê serdemê de hatine hilberîn jî, bi awayekî ji awayan, bi motîfên dînî hatine xemilandin. Çawa ku di serdema desthilatdariya Bîzansiyan de bandora çand û medeniyeta Xiristiyane li ser edebiyata gel hebû, bi desthilatdariya ‘Erebên Musliman re jî, tesîra nîrxên çand û medeniyeta Îslamê li ser gel çê bû. Çavkaniya sereke ya ray û ramana medeniyeta Îslamê, helbet û helbet Qur’an, hedîs û jiyana Cenabê Pêxember bû. Qur’an, kelimê qedîm ê Îlahî; hedîs jî, gotinên hekîm ên Pêxember bûn. Piştî van her du çavkaniyên sereke, di hişê gel de kana herî dewlemend û girîng, siyera Nebî, ango dîroka jiyana Hz. Muhemmed bû. Ha edebiyat jî, li ser vê bingehe

¹²⁹ Min bi xwe ev gotinên pêşyan ji diya xwe Yoldiz berhev kirine.

¹³⁰ Şêxmûs Aslan, Ferhenga Gotinê Pêşyan, Sözü Gazetecilik, Amed, 2006, r. 196-197.

reng û rû girt.¹³¹ Ji ber vê ye ku ev berhema ber destê me jî, li ser bingeha vê çandê hêşîn bûye. Çunkî em di ayetên Qur'anê de û di hedîsên şerîf de, rastî motîfa hespî tîn:

“Li hember wan[kuffariyan], li gor taqet û qeweta xwe, [ji bo cîhadê] hêzê, [halet û] hespên girêdayî [ku xwedîkiri û timarkirî ne] amade bikin. Hûn dê pê, dijminê Ellah, dijminê xwe û wan [dijmin] ên dî ku; hûn bi wan nizanin; lê Ellah bi wan dizane bitirsînin. Tu tiştêkî ku hûn di rêya Ellahî de nifq/serf bikin tune ye ku bi awayekî pir wefadarî ji we re bergîdana wî neye dayin û helbet bi tu awayî li we zulm naye kirin.”¹³²

Bi vê ayetê Xudê teala li Muminan ferman dike ku bi her tiştê herbê xwe amade bikin. Lewre ev ayet di hiyama Medîneyê de nazil bûbû. Xudê teala ji Muminan dixwest ku li hember wan neyarên xwe yên Muşrikên êrîşkar ên Mekkeyê û wan Munafiqên Yahûdî yên Medîneyê ku di *Herba Xendeqê* de li ser ehd û peymana xwe nesekinîn û bi Muşrikan re hevkarî kirin, hêzdar û zexm bibin.¹³³

Hinek hedîs jî li ser xêr û xweşiya hespan hene ku me ew ji berhema *Cem'ul Fewaid, Min Cami'il Usûl we'l Mecma'iz-Zewaid*, beşa Cîhadê û xêra hespan ku ji aliyê Îmam Muhemmed bin Muhemmed bin Suleyman er-Rûdanî ve hatiye telîfkirin, derxistin: Ebû Qetade ev derxistiye: “Bixêrtirê hespan, ew **hespê reştirîn** ê beş e ku lêva wî ya jor bekokî ye, piştî wî ew **hespê reştirîn** e ku sê lingên wî çal in, lê lingê wî yê pêş ê rastê, ne çal e. Heke yê **reştirîn** tune be, îca ew hespê kumeyt(sor) ku li ser van wesfan e tê.”¹³⁴

‘Urwetu bin Ce’id ev derxistiye: “Hesp, heta roja qiyametê ji bijiyê/biskê eniya xwe, bi xêr, ecir û xenîmetê ve girêdayî ye.”¹³⁵ Ebû Kebşete ew derxistiye: “Hesp, heta roja qiyametê ji bijiyê/biskê eniya xwe, bi xêrê ve girêdayî ye, ehlê wê ku li ser wê alîkar in û nefeqeya/mesrefa wê didin, wisan in mîna ku bi destê xwe, tim sedeqe belav bikin.”¹³⁶

Ebû Zerr ew derxistiye: “Tu hespekî ‘Ereb tune ye ku di weqtê her seherê de, jê re îzîn neye dayin ku ew van du duayan bike: Ya Rebbî, ji Benî Ademiyan, te ez ji kê re xwestim, ji wî re te ez bexişandim, tu min jê re bikî wî ehl û malê ku herî zêde li ber dilê wî şirîn e, yan jî tu wisan bikî ku di nav ehl û malê wî de wisan bim ku herî zêde jê hez dike.”¹³⁷

¹³¹ Nihad Sami Banarlı, Resimli Türk Edebiyatı Tarihi, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 2001, r. 103.

¹³² Sûreta Enfal, ayet, 60.

¹³³ Tefsîru Teberî, Teqrîb we Tezhîb, Li Îmami'l Mufessirîn we'l Muexxirîn Ebî Ce'fer Muhemmed bin Cerîr et-Teberî, ed- Diktor Selah Ebdu'l - Fettah, el – Xaldî, Daru'l Beşîr, Cidde, 1997, c. 4, r. 94.

¹³⁴ Tirmizî, nu, 1696.; İbn Mace, nu, 2789.

¹³⁵ Buxarî, Cîhad, 43-44, III, 215-216.; Muslim, Îmaret, 98-99, r. 1493-1494.

¹³⁶ Mecma', V, 259.

¹³⁷ Nesaî, Xeyl, 9, VI, 223.

Di edebiyata Kurdî (Kurmancî) ya gelêrî de, motîfa hespan, gelek berbelav e. Di hîkayeyên gel ên anonîm de, “hesp” weke lehengekî sereke hatiye bikaranîn. Ev hespên ku di efsane û destanên siruştî yên gel de navên wan hene, awarte, giranbuha û xusûsî ne.

Di hîkayeya gel a *Mem û Zînê* de jî hespekî efsaneyî heye. Navê wî *Bozê Kurê Behran* e. Ew jî, dema ku Mem ji bajêr derdikeve, ne bi dilê dê û bavê wî ye û wan lingê hespî qeyd û lele kirine, gava dike ku ji bajarê Muxurbiyan derkeve, paşa, derî lê girtine, hesp bi ser sûra bajarê Muxurbiyan de ferqaz dide. Bi rê de, lingê wî lele kiriye; lê haya Memî jê tune ye; Xoceyê Xizir tê hawara wî û haya Memî pê dixê. ¹³⁸ Mem, li ser piştta vî hespî digihîje welatê Zînê. Gava digihîje Cizîra Botan, camên xaniyên bajêr, ji ber şîhîna *Bozê Kurê Behran*, dişkên.

Motîfa *hespan*, di *çîrokên gelêrî* yên Kurmancî de jî bala merivan dikşînin. Di çîrokeke Mîrze Mihemed de, hesp wiha derbas dibe: “Hebû padşak, du hev kurê padişê hebûn. Navê yekî Mîrze Mihemed bû, navê yekî Elî bû. Padişa qet rû nedida Mîrze Mihemed. Rojekê Mîrze Mihemed diponije û divê: Qet rûmeta min li cem bavê min tune. Rabû hespê xwe yê Behrî siyar bû. Ji malê derket. Terkedunya bû çû.”¹³⁹

Di hîkayeya gel a “Reşîd Paşa û Xezalê”¹⁴⁰ de, hespeke efsanewî yê heye ku navê wê, *Xedra* ye. Reşîd Paşa, bêyî vê hespê nikare dilketiya xwe ya bi navê Xezalê bîne. Bavê Reşîd Paşa, ev hesp veşartîye û naxwaze bide kurê xwe. Ew jî wezîrên bavê xwe dixê dewrê û bi vî awayî Xedrayê jê distîne û qesda welatê Xezalê dike. Bêjeya “Xedra” bi zimanê Erebi ye, wateya wê jî, “kesk” e. Zayenda wê jî li gor rêzîmanîya Erebi, “mê” ye.¹⁴¹

Di destana Ker û Kulik de, hespekî efsaneyî yê Axayê Erebe Gêsî heye, navê wî *Bilêcan* e. Emer Axayê kurd, dixwaze ku vî hespî bi dest bixe, ji bo vê yekê jî, Kulik dişîne ku bîne.¹⁴² Her wiha, mehîneke din jî heye ku mîtolojîk e. Navê wê *Sosik* e. Me dest neda awayê nivîsîna wê: “... Dawîya dawetê da bûk siyar kîrîn, bîrîn, lî ber derê Sîlêmin peya kîrîn. Bavê Werdekê gelek cihêz da qîza xwe. Paşê gazi Sîlêmin kîr, got: Kurê mî, tu merîveki camêr û ked helal î, ev çend sal e rêncberya mî dîki; bêje ez çî bîdîm te? Sîlêmin got: Ez bî tenê

¹³⁸ Ev destana menzûm, li ber destê min heye û min ew ji Dengbêj Zahiro girtiye. Sala 2000î şevêkê li Amedê digel wî û Salihê Qubînî mam. Bandê wî jî li cem min heye. Min ew ji serî heta dawî derbasî kompîturê kiriye.

¹³⁹ Çîrokên Gelêrî û Destana Şemîkê Bêdiran, (Berhevkar: Î. İşler), Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 1998, r. 111.

¹⁴⁰ Ev hîkaye, ji aliyê Ayhan Yıldız ve, ji devê Hecî Mihemedê Holî hatiye berhevkirin û di şanoya bi navê “Hesreta Hezkirinê” de, cî girtiye. Ev şano, ji aliyê licneya musabeqeya sala 2011an a Şaredariya Bajar Mezin a Diyarbekirê ve, bi xelata mansiyonê hatiye perûkirin.

¹⁴¹ Yûsûf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî El Meqdisî, El Hediyetu'l Hemîdiyyeti Fî'l Luxeti'l Kurdiyyeti, (Tehqîq: El Ustaz Ed Doktor Muħemmed Mukrî) Weş. Mektebetu Diyarbekir, 2011, r. 188.

¹⁴² Destanên Kurdî, Ji Zargotina Kurdî, (Amadekar: Reşo Zîlan – Serdar Roşan) Weş. Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê, Stenbol, r. 105.

cenûya *Mihina Qer* dîxazim.. Axê cenû da Sîlêmin. Berya wexta rojekê, Sîlêmin ku dewar bîrîbû perê avê, hespeki behri derketîbû, lî mihînê ketîbû, çûbû. Peyra mihîn zabû, ew cenûya bîbû. Cenû, niv-zin bû. Sîlêmin lê siyar bû, xamiya wê şîkênand, xweyi kîr, lê rînd mêze kîr, cenû bû hespeke tekane. Navê wê *Sosîk* bû. Sîlêmin lî Sosîkê siyar dibû, bî gîregîrê êlê ra dîçû neçîrê. Dî yarişî da kehelên bînavûdeng, lî pîşt xwe dîhişt. Lî wî tixubi hespên ku bî wê ra bîbezîya tunebû.¹⁴³

Dîsa di destana Ker û Kulik de, bi navê “Bîlêcan” hespek heye ku ew jî mîtolojîk e. Ev hesp li cem eşîra Gêsiyan e. Rojekê çend derwêş tîn mala Emer Axayê Zengûzêrîn, ji xanima malê re dibêjin ku her tiştê vê malê tamam e; mixabin *mehîna Bîlêcan* jê kême. Xanim dibêje ew çi mihîn e? Derwêş wiha bersiva wê didin:

Bîlêcan mehînek e

Mehîneke kîras-kîriye

Kîrasê çarbask-kîriye

Çarbaska wê kîlit- kîriye

Mîfta kîlitan lî cem qîza Elisarê Gêsi ye¹⁴⁴

Emer Axayê Zengûzêrîn, ji bo ku vê hespê bîne, heft eşîrên ebra xwe li hev dicivîne, dibêje kî vê hespê ji min re bîne, ez dê qîza xwe ya bi navê Perîşanê bikim heleliya wan. Qawecî qaweyan li civatê digêrîne; bes tu kes cesaret nake û qaweyê hilnagre. Peyre dibêjin ku Ker û Kulik nehatine civatê. Dişînin pey wan, ew jî tîn û qaweya qawecî vedixwin, tevdira xwe digrin û berê xwe didin nav eşîra Gêsiyan. Piştî şerekî giran Bîlêcanê tînin û tîn; bes Kulik tê kuştin.¹⁴⁵

Di destana Rûstemê Zal de jî hespeke efsanewî heye. A. Sosin û E. Prym ku li ser hîkayeya Rûstemê Zal berhevkarî kirine, li ser hespa Rûstem ev agahî dane: “Wekî rabû ser xwe, Rûstem fikirî, şev e, carek di nivîstekî di xew re çû. Milyaket hate ser, gote Rûstem: Rabe ser xwe, carek li fecra sibehê de here ber gevenda behrê, ji xwe re çalekê bikole, hindek qîrş û qelaş bavêje ser xwe û rûne li wê derê. Gavekê te dît mehînek dê derkevît ji wê behrê. Destê xwe neavêje wê mehînê, bila biçit ji xwe re biçêrit, tu ji cihê xwe nelive, paşî wî wê bihnekî pêl dê bikevin behrê, behr bibit du qat, hespek dê ji nav derkevît, ew hespê çawan a, belek e mîna ya pilingan e, punyek sor e, punyek spî ye, punyek reş e. Wekî te dît derket, tu

¹⁴³ Kerr û Kulik, Mitolojiya Kurdi da Destanek, (Amadekar: Ahmet Aras), Fırat Yayınları, İstanbul, 1993, r. 17. (Me dest nedaye rastnivîsa vê jêderê)

¹⁴⁴ h. b. r. 26.

¹⁴⁵ Kurtbêjiya destana Kerr û Kulik e.

navê xwe û navê xwe jê re bêje, hesp bi xwe dê êt li ber te sekinit. Rûstem veciniqî, ji xewê rabû, kete mitala ji xwe re got ev xewn e, careke din çavê xwe dide hev, lê ew milyaket dîsa hat ser got: Rûstem rabe ser xwe, ew ne xewn e, ez qesîdê Ellah teala me. Rûstem ji xewê radibe û sibê diçe ber behrê, çawa ku jê re hatiye gotin û wisa jî dibe.”¹⁴⁶

Di edebiyatên gelêrî yên dunyayê de, bi piranî hêmanên mîtolojîk hene. Ji ber ku edebiyata gelêrî, berî edebiyata nivîskî derketiye, çavkaniyên edebiyata devkî, bi giştî efsane û hikayeyên mîtolojîk in. Jixwe meriv dikare bibêje ku edebiyatên gel, di serdema mîtolojiyê de derketine û teşe girtine. Lewre zihniyeta edebiyata gel, di bin zihniyeta gel a serdema mîstîk de maye. Hêza xwemalî û xeyalî ya hozanên gel, ev berhemên ha kirine bin tesîra xwe.

Di edebiyata gelêrî ya Turkan de jî, weke motîfeke mîtolojîk, di destanan de hesp heye. Hesp, hevlekî ba û wefadar ê serlehengên destanan in. N. S. Banarlı, li ser motîfa hespê ku di destanên Turkî de heye, ev agahî dane: “Di wesîqeya/belgeya herî ewil a nivîskî ya turkan ku Kîtabeyên/Nivîstekên Gokturkan in de, behsa hespan şerî heye. Navê wan hespên ku lehengên mîna Kul Tigîn li wan siwar bûne hene.

... Di destana berî Serdema Îslamî Oguz Kağan de jî behsa hespî heye. Oguz Kağan, li hespeke sor a qîrase siwar dibû û wî ji wî hespê xwe gelek zêde hez dikir. Di destana Serdema Îslamî Manas de behs tê kirin ku hesp, di herban de mîna lehengan bûne û wan jî wezîfe pêk anîne. Navê hespê Manas, *Ak Boz* bûye; navê hespê lehengê di ye destanê Er Yolay ku Mecûsî ye jî heye: *Aç Budan*.”¹⁴⁷

Di Qewlê Hespê Reş de şair, “*hesp*” bi ser sûrê de dide firandin. Li gor vê helwestê, ev ji bo şair, hunereke vegotinê ye. Ji ber ku mebest ji vî qewlî diyarkirina lehengiya Hz. Umer e, bala me lê ye ku motîfên epîk bêtir derketine pêş. Ev bi xwe jî, taybetiyeke xas a destanên siruştî ye. Vegotina alegorîk a xeyalê şairê kurd, xwe li vê derê dide der. Lehengên mîtolojîk, bûyerên awarte, reng û rûyê berhemê hê bêtir kiriye delavê çeşnê edebî yê destanê. Dibe ku ev xax û şarezatî ji Elî Herîrî be jî; dibe ku wî ev hêmanên ha, ji gencîneya edebiyata devkî ya gelêrî jî girtibe. Heta navê hespê Hz. Elî “Duldul” jî di vê xezanameya ha de derbas bûye. Duldul, ew qantira boz [rengê reş û spî tev li hev] e ku Hz. Muhemmed Pêxember ew daye Hz. Elî.¹⁴⁸

¹⁴⁶ Şemoyê Memê, “Di Zargotina Kurdî de Hesp”, *Zend*, j. 20., Bihar, Stenbol, 2013, r. 7-8.

¹⁴⁷ Nihad Sami Banarlı, *Resimli Türk Edebiyatı Tarihi*, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 2001, r. 34.

¹⁴⁸ Ferit Develioğlu, *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 2012, r. 219.

2) **Çûk/Hehecîk:** Li gor pîr û kalên derdora hêla Batman,¹⁴⁹ Pasûr¹⁵⁰, û Erxeniyê¹⁵¹ behsa wê dikin, gava ku Hz. Umer di Dêra Filehan de dikeve bin hesara şervanên dijminan, çivîka ku navê wê “Hehecîk” e û rengê reş e, gava tê cem Hz. Umer û halê wî dibîne, Hz. Umer rewşa xwe û Borê Qer li ser kaxizekî, bi xwînê dinivîse û li lingê Hehecîkê dilefîne û ev teyrik ji Dêrê derdikeve ku xebera rêgirtina Hz. Umer bigihîne Medîneya munewwer. Îca şervanekî dijmin, dibîne ku wa ye Hehecîk ji bal Hz. Umer derket, hema yekser fam dike û ew jî alîkarê wî ye û tîrekê berdide wê, lê tîra wî li qimçika Hehecîkê dikeve, qimçika wê diqelişe û hîna qimça vê çivîkê qelaştî ye. Lewre ev hehecîk, di nav gelê gundan de pîroz e û heta van salên dawî jî, ew di serê biharê de dihatin diketin hundir û sefikê malan û wan di arîkê xaniyan de hêlîna xwe çê dikir, hêk dikir û têjîkên xwe xwedî dikirin heta ku firoke dikirin, tu kesî dest nedida wan. Di nusxeya Ebdullah Varlı û yên ku min bi xwe li wan guhdarî kiriye de, ev motîfa mîtolojîk heye. Îca di guhertoya/varyanta ku *Ebdullahê Hesena*, vegot de, bûyera hehecîkê wiha ye:

Weqtê ku Umer di dêrê de ketiye
 Dibîne hehecîkek hatiye
 Divê hehecîka ser hêlînê
 Cewabê bibe Mek û Medînê
 Bibê kafira Umer aniye ber girtinê

Hehecîk hatiye Medînê, li ser çoka Resûlallah daniye
 Xwedê zar û ziman bi deva xistiye
 Gotiye kafira Umer aniye ber mirinê bi xwe ye

Resûlallah li Hz. Elî kiriye qîrîn e
 Hz. Elî rabûye Duldul ji tewlê derxistiye
 Divê nizanim cî û meskenê Umer li ku ye

¹⁴⁹ Elîyê Bilûrvan, temenê wî 62 ye, gundê wî Holê ye, li ser Hezoya Batmanê ye. Hecî Mihemedê Hecî Evdile jî bi heman awayî ev gotiye.

¹⁵⁰ Abdullah Çakir, ji gundê Hesena, 84 salî, wî jî 50 sal berê, li gundê Hesena, ji xalê xwe yê Muhemed Kuntaş girtiye. Muhemed Kuntaş, mîna derwêşan bûye û karê ew bûye, van beytên dîni di civatan de, bi mekin gotine. Sala 2014an, Ebdullahê Hesena, ev “Beyta Borê Qer”, li mala xwe ya Diyarbekirê, di 9ê meha Adarê de ji min re got û min jî ew qeydî kamerayê kir.

¹⁵¹ Hecî Huseynê Zaza, 70 salî. Xwendin û nivîsîna wî tune ye; hem bi kurmancî dizane hem bi kirmanckî. Wî ev qewl, sala 2005an li gundê Beşiktaşê, bi kurmancî got.

3. Tertîba Qewlê Hespê Reş

Ku me hemû metnên nivîskî, bi tevî guhertoyên wê yên devkî berawirdî hev kirin, me dît ku tertîba metnê bi awayekî hevgerî, ango bê nakokî hatiye pevxistin. Li gor nusxeya Zeynelabidîn Amedî û nusxeya Petersburgê, tertîba metnê berhemê wiha hatiye rêzkirin:

- a. Wada Cenabê Pêxember bo înana Hespê Reş
- b. Tercîha Hz. Umer a bo çûna hespî
- c. Çûna Hz. Umer a nav welatê ne-musliman
- d. Hewldanên Hz. Umer bo kirîna hespî
- e. Alîkariya Keşe
- f. Zalimiya mîrê bajêr
- g. Hevkariya Keşe û keça wî digel Hz. Umerî
- h. Şhadeta Leymûn û Keşe
- i. Pêstirngiya Hz. Umer di dêrê de
- j. Hawarxwestina Hz. Umer ji sehabîyan
- k. Hatina hawarê û şerê li hember şervanên mîr
- l. Biserketina şervanên Musliman û têkçûna şervanên mîrê Xiristiyan
- m. Dua

a. Wada Cenabê Pêxember bo înana Hespê Reş

Ev beş, bi van yekeyên nezmî dest pê dike:

Mecal ew mecal bû

Kafîrek dînbetal bû

Hespek çê li bal bû.

Hespê di nêv kuffaran

Bi dil ew bû Musulman

Muhammed pê ‘elam e.

Muhammed deng hiltîne:

“Heçî Hespê Reş bîne

Qesrek ji min bistîne.”

b. Tercîha Hz. Umer a bo çûna hespî

Gava ku Cenabê Pêxember vê nûçeyê ji sehabiyan re radigîhîne, serê ewil Hz. Umer xwe dide ber vê peywîrê û vegoterê vê hîkayeya menzûm, di yekeya nezmî ya 6an de wiha vê beşê qeyd kiriye:

“Ew hespê te divêtin
Biçim ji bo te bînim
Min Cildû nevêtin.”

Heman yekeya nezmî, di nusxeya M. E. Osman de jî weha ye:

Ya Hebîbê Xudêwo
Tu bo min bibêwo
Hespê Reş li kê wo
Da bo te biçimêwo

c. Çûna Hz. Umer a nav welatê ne-musliman

Di yekeyên nezmî yên 9, 10 û 11an ên nusxeya Petersburg û Amedî de, ev beş weha hatiye diayrkirin:

‘Umer e rabû xweş e
Li puştê best terkeş e
Çû țelbe Hespê Reş e

Bi çol û çolistanê
Li deşt û bi yabanê
Ajote şaristanê

Ez im mîrê belav e
Geriya li şaristan e
Sual kirî punhan e
Li Keşe bû mêhvan e

d. Hewldanên Hz. Umer bo kirîna hespî

Dema ku Hz. Umer digihîje welatê Hespê Reş, tê mala Keşe û daxwaz û merama xwe jê re diyar dike:

“Hatim izharî kim
Sirra xwe guftarî kim
Hespê Reş geryarî kim.”

Keşe gotî: “Bila ve
Buha zor û xav e
Çil tumin dirav e.”

Keşe go: “Min divêtin
Mihvanê min bibîtin
Navê xwe bibêtin.”

Go: “Navê min ‘Umer e
Kifş e ew ne bi der e
Qasidê Pêgember e.”

e. Alîkariya Keşe

Di hemû nusxe û guhertoyên devkî yê *Qewlê Hespê Reş* de alîkariya Keşe ku bi Hz. Umer re kiriye, hatiye diyarkirin. Di nusxeyên Amedî û Petersburgê de ew rêz ev in:

Keşe go: “Pa çi gotin e
Ser û malê di min e
Hemû têkî biçine

Ser'im bi serê te ra
Mal'im bi malê te ra
Çêr'im bidin ji xwe ra
Keşe ye barê şer ra.”

Di metnê M. E. Osman de jî ev beş weha hatiye:

Qeşe derge vekiriye
Îmam lê mêvan bîye
Ew bibît rûspî ye

Ez rabim bi feqîrî
Dê çîn bi êxsîrî
Dê çîne lalî Mîrî

f. Zalimiya mîrê bajêr

Li gor vegoterên menzûmeyê, mîrê wî bajarê ku Hespê Reş tê de girtî ye, mîrekî xedar e û birayê Keşe ye. Ev jî, di yekeyên nezmî yên 28, 29 û 30yî yên nusxeyên Amedî û M. E. Osman de weha hatiye diyarkirin:

Ew dîwana koran e
Kafir tê da westa ne
Lendeh û Keşe bira ne

Lendo go:
“Mîrê” m mêvanek bo Keşe hat Qureyş e
Mecnûn e bête pêş e
Hespê Reş kit teftêş e!

“Keşe birayê min e
Hinkî ferik û bi fenn e
Bigrin wî bikujin
Dujminê serê min e
De’wayê hespê min e

g. Hevkariya Keşe û keça wî digel Hz. Umerî

Di nusxeya Amedî û Ptersburgê de û di metnên devkî yên hîkayebêjan de jî ev beş heye û di yekeyên nezmî yên 23-25ên nusxeya Amedî de ev beş weha hatiye diyarkirin:

Qeşe keçek çê li bal bû
Ciwanek bikemal bû

Enî ji text û xal bû
Navê wê Leymûn bû

Leymûn e Leymûn e
Sirr lê zahir bûne
Min daye bi yeqîn e
Here ji bo xwe bîne

Leymûnê bi libas ke
Bi kevî û kiras ke
Mihvan'im xelas ke

Qeşe weled hebû ne
Sivik in wekî kone
Bi dîwanê ve diçûne

h. Şhadeta Leymûn û Keşe

Dema keşe, digel keça xwe Leymûnê bi Hz. Umer re alîkarî dikin, Hespê Reş ji nav lepên Mîr derdixin û Mîr bi hevkarîya wan û Hz. Umer diheser, yekser fermana kuştina wan dide. Di yekeyên nezmî yên 51-54an ên nusxeya Amedî de bûyer bûyer weha hatiye hunandin:

Lez kin û bilezînin
Kêran biçerxînin
Xewlanî jê'b derînin
Kêrê dem û kar in

Li Kewran bû hewar e
Ji burcan hatine xar e
Mewir û Qeşey qal e

Qeşey şer bi şîr¹⁵² kir

¹⁵² Ev bêjeya "şîr" di wateya "şûr" ê şer de ye. Li gor devoka Behdînanê, ev bêje wiha hatiye bilêvkirin û nivîsandin. (Notê transkîrîpekîrox)

‘Umer şer bi tîr kir
Meydan ji xûnê têr kir

Qeşe şerekî zor kir
Bi misrê muhur kir
Meydan ji xûnê sor kir

‘Umer şerek xweş kir
Bi tîrê şerş pir kir
Meydan tijî leş kir

Qeşê wehîd e
Mertebe tewhîd e
Kewran kir şehîd e

i. Pêşirtengiya Hz. Umer di dêrê de

Di versiyona ku ji hêla M. Emîn Osman ve hatiye berhevkerinê de ev beşa menzûmeyê, weha hatiye qeydkirin:

Umer çû wekî têz e
Kafir dû wî bîn rêz e
Term kirine hevêz e

Umer qoç û xoş e
Wekî gula geş e
Ew çû ser Borê Reş e

Demê Mîrî we dîtiye
Hespê Reş fayde nîye
Wekî Mîr wesa dibînît
Umer hespê dibeînît
Hiç çirkekî naînît

Kafîran lê da deng e
Şer kefte cê teng e
Dest hilînin, me dereng e

j. Hawarxwestina Hz. Umer ji sehabîyan

Hem di nusxeyên nivîskî de, hem jî di metnên devkî de ev beş bi awayekî berfireh hatiye şayessandin. Di nusxeya Amedî, komrêzên 67-71ê de weha hatiye hunandin:

Têpêt Kewran hatin
Li dor Dêrê wer hatin
Li hevdû gerandin

Têpêt Kewran tîne
Li dor Dêrê wer tîne
..... xêrê tîne

Kulkêt di tar
Tîr tîn wekû mar
Pê dikujin kuffar

Kulekêt di teng e
..... tîn wekû tîfing e
Pê digerin fireng e

Înê heta îne
Çûka li hêlîne
Sor bûye ji xûne
Cewabê bibe Medîne
..... haban go da biçîne

k. Hatina hawarê û şerê li hember şervanên mîr

Piştî ku çûkek diçe xeberê dibe bajarê Medîneyê û sehabiyên pê haydar dike, ew jî yekser xwe amade dikin û tîna hawara Hz. Umer û di menzûmeyê de ev hatina hawarê weha hatiye şayesandin:

Eshab rabûn xas û ‘am e
Hemî tîk hejînan e
Da biçîne tolan e

Hevheva Hemze ye
Şûrhungîvek zêde ye
...fir direvin wekî se ye

Hevhewa ‘Ebbas e
Xudan şûrê almas e
Kafir kirine xas e

Hevhewa Ebûbekir
Şîrîn e wekî şekir

Hevhewa ‘Usman e
Her di devî Qur-an e
Xudanê şûrê pan e
Kafiran kir eman e

Hevhewa ‘Elî ye
Li Dildilê Spî ye
Di komê firî ye

l. Biserketina şervanên Musliman û tîkçûna şervanên mîrê Xiristîyan

Ev beş, di yekeyên nezmî yên piştî 96an ên nusxeya Amedî de bi vî awayî hatiye şayesandin/teswîrkirin:

‘Umer ji Dêrê hate der e
Li Borê şidand teng û ber e
.... puştê ket ‘Umer e

‘Umer jor da têtin
Firfûrî davêtin
Çendî dî dixistin

...zî mêran tê
Nirrênê şêran tê
Ji ‘Elîyê heyran tê¹⁵³

‘Umer û eshaban kafîr dibizandin
Li piştberê mermer werdigrandin
Xaç li tewlê şidandin

‘Elî kafîr dibirin
Di çîl çîyan wer dikirin
Xaç ji xûnê çê kirin

m. Dua

Beşa dawî ku beşa “dua”yê ye, di metnên devkî û nivîskî de ne mîna hev diqede. Di metnên devkî de bêtir bi selewatên ser Cenabê Pêxember qediyane; bes di nusxeyên nivîskî yên Amedî û Ptersburgê de bi vê yekeya nezmî diqede:

Ewrekî reş û tarî
Baranek jê dibarî
Sond nekeve li ‘Umer û ‘Elî
Ji şehîdêt Deştê Bedr û Huneyn ra
Fatîhe

Di metnên devkî yê Abdullah de bi vî awayî qediyaye:

¹⁵³ Di nusxeya Z. Amedî de ev rêzika ha heye: *‘Elîyê Herîr jî sotê*

Wî ji jor da li kafira xistiye

Hz. ‘Elî ji jêr da li kafira xistiye

Mêrê sax ew e ku ji mala xwe nehatiye

Hz. ‘Elî û ‘Umer gihîştine hevdû ye

Wan **Borê Qer** aniye

Nusxeya Îbrahîm bin Hacî ku ji aliyê Varli ve hatiye çapkirin, bi vê yekeya nezmî qediyaye:

Xuda, ew rûreşê bênewa, muhtacê rehma te ra

Xilas bû ev rîsale, tarîx lefzê xesbkera

Ya Reb, deftera Ahmed bigrî di roya heşra

BEŞA SÊYEM

DANASÎNA NUSXEYÊN DESTXET Û ÇAPKIRÎ YÊN QEWLÊ HESPÊ REŞ

Destpêk

Ji bo dîroka edebiyatê, pêdivî bi neşr û tehlîla metnên kevnar heye. Ev metnên zemanê berê ku bi alfabeya Erebî hatine nivîsîn, gava ku li herfên Latînî bêne wergerandin, helbet dê ber li dîroka edebiyatê veke û dîroka edebiyatê, bi awayekî hîn zanistî ronî bibe. Bi ser de jî dê lêkolîn û nivîsîna dîroka edebiyatê, hêsatir bibe. Karê transkripsiyonê, di xebatên zanistî de, xwedî girîngiyeke gelek mezin e. Ev metnên ku nusxeyên wan tên peydekirin û li ser wan xebatên zanistî tênê kirin, divê ku li gor pîvanên/krîterên zanistî yê nuxxeyan bêne pêkanîn. Ji van krîteran çend jê ev in:

- a. Peydekirin xetta muellif bi xwe
- b. Agahiyên derbarê qeyda ferex
- c. Dîroka îstînsaxa nusxeyê
- d. Tam û tekûzbûna nusxeyê
- e. Ziman û rastnivîsa/îmlaya nusxeyê
- f. Haşîye û derkenarên nusxeyê¹⁵⁴

Xebatên li ser danasîn û tehlîla nusxeyan, li gor rêzeusûlên tênê kirin. Serê ewil, peydekirina/temînkirina nusxeyan, karekî zehmet e, lewre pêdivî bi bervekirina vê merheleyê heye. Piştî peydekirina nusxeyê, lazim e ku “şecereya her nusxeyekê” bête derxistin û tesbîtkirin. Piştî ku çend nusxe hatin bidestxistin, îca karê tesbîtkirin “cîhêrengiya nusxeyan” dest pê dike. Gelo nusxeya ku bi destê “muellif” bi xwe hatiye nivîsîn heye, yan na? Heke hebe, dê çawa bigihîje ber destê me? Nusxeya ku ji ber nusxeya muellif bi xwe hatiye nivîsîn kîjan e gelo? Erê, bi destê me ket ku nusxeya ku piştî nusxeya Mihemed Emîn Osman, nusxeya herî dawî bi destê Zeynelabidîn Amedî ve hatiye nivîsîn; bes ew nusxeya Petersburgê, ji aliyê kê ve, kengê, ji ber kîjan nusxeyê, li kê derê hatiye nivîsîn, ji ber kêmasiyên li ser nusxeyan, em negihîştin tu agahiyeke zanistî. Heke derfet çê bû û em gihîştin nusxeya Petersburgê, dibe ku ji hêla temenê kaxidî ve bigihîjin hin agahiyan.

¹⁵⁴ Fatih Köksal, “Metin Neşrinin Ana Esasları”, *Tubar*, XXXI-/2012, dergipark.ulakbim.gov.tr/article/download/.../5000067377

Di vî karê me de, derfeta me ya ku em herin pirtûkxaneyên derveyî welêt tune bû; bes me ji ser înternetê du nusxe peyde kirin. Du nusxe jî weke pirtûkên çapkîrî bi destê me ketin.

Nusxeyên *Qewlê Hespê Reş* ji hêla şecereya mustensixan ve ne tam û tekûz bûn. Mustensixan, derbarê wan nusxeyên ku wan li berê nusxeya xwe nivîsiye, tu agahiyeke zanistî nedane. Dîsan jî, ji ber ku me karê transkripsiyona vê berhemê, weke peywireke zanistî û neteweyî pejirand, li gor derfetên xwe, me li serê lêkolîn kir. Ev berhem, ji ber ku di edebiyata Kurdî-Kurmancî de berhemeke herî ewil e, xwedî girîngiyeke gelek mezin e. Li gor ku Ebdullah Varlı diyar dîke, heta niha 8 (heşt) guhertoyên vê berhemê ketine destê wî.¹⁵⁵ Di nav van 6 (şeş) nusxeyên ku em gihîştinê de nusxeya herî cihêrengî ew e ku Varlı, wê weke berhema Ehmedê Xanî destnîşan dîke. Ji xeynî vê nusxeyê, nusxeya Peterburg, Amedî, Emîn Osman, Sîrwe û Mela Îsmet, digel guhertoyên/versiyonên wan ên devkî gişt, ji hêla dabeşbûna yekeyên nezmî li koma rêzan û ji hêla mijarê ve, gelek zêde dişibin hev. Heta peyvên rêzên wan û çend ji yekeyên wan ên nezmî, eynî mîna ne hev. Bi vî awayî hejmara nusxeyên ber destê me ku a niha şeş in û heşt nusxeyên ku Varlı behsa wan dîke, digihîje 10an.

1. Nusxeyên Destxet

Li gor agahiyên ku a niha di destê me de hene, nusxeyên destxet ên vê berhemê ev in: Destxeta Zeynelabidîn Amedî û destxeta Petersburgê.

1. 1. Nusxeya Zeynelabidîn Amedî

Ev nusxe, di nav mecmû'eya bi navê *Menzûmetan* de hatiye bicîkirin. Ji rûpelê 84an dest pê dîke, heta rûpelê 94an dewam dîke. Hejmara rûpelên wê, 10 e. Her rûpelekî wê, dabeşî du aliyên bûye û berhem tê de hatiye nivîsîn. Di her aliyekî heman rûpelê de, 16 rêz hatine bicîkirin. Ev jî wisan nîşan dide ku di her rûpelekî de 32 rêz hatine bicîkirin. Heke ne wisan bûya, dê hejmara rûpelên wê, bigihîştin 20î. Nusxeya Zeynelabidîn Amedî, bi awayekî rêkûpêkî, bi zêr û zîber hatiye nivîsîn. Yek ji hêmana wê ya ahengê ku wezn e, bi temamî nebe jî, bi rêk û pêk e. Dabeşbûna rêzan a li koman jî, bi giştî “sêrêzeyî” ye; bes tê de digel hin malikan/beytan, çend çarîn û pêncîn jî hene. Pergala wê ya qafiyeyê, bi awayê aaa, bbb û ccc û wisan diguhere. Piraniya qafiyeya wê, bi rêya “redîf”ê hatiye hevdengkirin. Hin beşên berhemê ku ji yek rêzekê pêk hatine hene û wisan diyar e ku kêmahî di hejmara van beşan de heye. Ji xeynî yekrêz û malikan, 66 sêrêzî û 14 çarîn tê de hene. Temamiya rêzbandên wê,

¹⁵⁵ Ebdullah M. Varlı, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn*, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 419.

102 ye. Desxeta Amedî, ji aliyê Rojnameya Söze ve, bi awayê ofsetî, sala 2004an, li Diyarbekirê hatiye çapkirin.

Abdurrahman Adak jî li ser hîkayeta *Borê Qer* bi vî rengî agahî dide: “Borê Qer, ne ji aliyê kesekî bi tenê ve hatiye nivîsandin, tiştê ku xuya ye, hem Feqiyê Teyran, hem Eliyê Herîrî, hem jî hin kesên dî, versiyonên cuda yê nê menzûmeyê nivîsandine. Borê Qer ku bi aliyê Elî Herîrî ve tê nîsbetkirin, niha di nava destnivîsarên Petersburgê de heye. Herweha nusxeyek jî li cem Mela Dawud e (Birayê Mela Mihemedê Dengnekir). Feqiyê Mela Dawud, Zeynelabîdîn Amidî, nusxeyek li ber vê zêde kiriye û ev nusxe li Diyarbekirê çap kiriye.¹⁵⁶ Sernavê nusxeyê wiha ye:

“Hikaye Hespê Reş (Borê Qer) Qewlê Herîrî

Ev nusxe, bi vê yekeya nezmî wiha dest pê dike:

Mecal ew mecal bû
Kafîrek dînbetal bû
Hespek çê li bal bû.

Di vê nusxeyê de navê *Elî Herîrî*, di yekeya nezmî ya 64an ku ji çar rêzan pêk hatiye, wiha hatiye:

Gaziya wan mîran tê
Nirrênê wan şêran tê
Ev xebera ji ku tê
‘Eliyê Herîrî jî sotê¹⁵⁷

Yekeya nezmî ya dawî ya vê nusxeyê ev e:

Ewrekî reş û tarî
Baranek jê dibarî
Sond nekeve li ‘Umer û ‘Elî
Ji şehîdêt Deştê Bedr û Huneyn ra

¹⁵⁶ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 185.

¹⁵⁷ Zeynelabîdîn Amidî, *Menzûmetan, Ceme‘eha Zeynelabîdîn Amidî*, Weş. Diyarbekir Soz, Diyarbekir, 2004, r. 93-94.

Di dawiya vê nusxeyê de bi zimanê Erebi wiha hatiye nivîsîn:

“*Qed temmet kitabetu hazîhi’l Menzûmeti’l munîfeti’l mufîdeti, ‘ela yedi Zeyne’l ‘Abidîn el-Amedî, fî tarîxi: 2 Cemaziye’l Axire, 1423, hicrî. We 11 Agustos 2002 mîladî. We sellemallahu ‘ela seyyidina Muhammedina Muhammed we ‘ela alihi we eshabîhi et-Teyibîn et-Tahirîn ecme’in. Amîn.*”

Wateya wê wiha ye:

Nivîsîna vê Menzûmeta bifeyde, li ser destê Zeyne’l ‘Abidîn el-Amedî, di tarîxa 2 Cemaziye’l Axire, 1423, hicrî. We 11 Agustos 2002 mîladî de qediya. Selat û selam li ser mezinê me Muhammedina Muhammed û alê mala wî û hevalên wî yên tahir qenc hemû be. Amîn.

1. 2. Nusxeya Petersburgê

Destnivîsa vê berhemê li pirtûkxaneya Neteweyî ya Rûsyayê li Sank-Petersburgê, li bin hejmara Kurd-26, r. 61ê tête parastin. Me metnê destxeta vê nusxeyê, ji Mamoste Kadri Yıldırım girt, da ber nusxeya Zeynelabidîn Amedî. Nusxeya herî zêde ku bi mijar, kêş, awayê dabeşbûna rêzikan li komrêzan û hêmanên ahengê ve dişibiya nusxeya Amedî, ev nusxe bû. Çi heye ku di dawiya destxeta vê nusxeyê de navê Elî Herîrî derbas nebûye.

Xetên vê nusxeyê, hinek jê bê zêr û ziber in; hinek jî bi zêr û ziber in. Li ser jora rûpelê ewil ê vê destxetê, *Qewlê Hespê Reş* hatiye nivîsîn. Ji ber ku kaxizê wê gelek zêde kevn bûye, xwendina nivîsa wê, gelek zehmet bû. Heke ne bi xêra destxeta Zeynelabidîn Amedî bûya, jixwe qet ne mumkun bû me karibûya hin peyvên ku ketibûn dawiya rêzîkên wan rûpelên qetiyayî bixwenda. Cûreyê xetta ku ev nusxe pê hatiye nivîsîn, li gor tesbîta me, qismen “rîq‘e” ye; hinek jî “tewqî” e. Li gor Muhittin Serin, ev cûre xett, ji xeynî *Eqlamê Sitte[Şeş Qelem]* di serdema Osmaniyan de, ji ber pêdiviya nivîsîna bilezûbez derketiye. Di serê sedsala XIXan de, di nav qelemên Babê Alî de hatiye bipêşxistin û ketiye reng û rûyê qerekerê/rewiştê dîwanî. Di jiyana rojane, nivîsîna nameyan û nivîsên fermî de hatiye bikaranîn.¹⁵⁸

Li gor ku di lewheyê Şeyh Hamdullah de dixuye, destxeta Petersburgê dişibe xetta “Teqî‘ê”.¹⁵⁹ Ev cûre nivîs, ji bo wan belgeyên derbarê sultanê de tînin nivîsîn hatiye bikaranîn. Ev hunera xettê, di stûriya qelema sulus de ye (3-4mm.), di nivîsê de qeyde û teşeyên herfan,

¹⁵⁸ Muhittin Serin, “Hat Sanatı”, *İslam Sanatları Tarihi*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Ünite 4, Eskişehir, 2013, r. 84.

¹⁵⁹ TSMK, Emanet Hazinesi, nr. 2084.

li gor qelema sulus e; bes hin cihêrengî di navbera wan de hene. Herfên xetta tewqî'ê, li gor sulusê, gilovetir in. Nivîs, di xêza rêzê de, di tanga/hîzaya ciyê ku xet diqede, ber bi jorê ve bilind dibe. Ji ber ku nivîsa Tewqî' di Dîwanu'l İnşayê de zêde hatiye bikaranîn, ji wan şêwazan ku geşedana xwe zû qedandiye. Ev cûreyê nivîsa "Rîq'e", li gor rayişên wê hatiye derxistin. Stûriya qelemê, 1 mm. ye. Nivîsa Rîq'e, li ser wan kaxidên piçûk ên parşomen ku ber û dirêjahiya wan di hunera xettê de hatiye diyarkirin, bi awayekî zû hatiye nivîsîn. Osmaniyan, ji vê nivîsa Rîq'e re, gotiye "xetta îcaze".¹⁶⁰

Dabeşbûna koman, bi tu awayî ne diyar e. Hema çawa lê hatiye, mustensixê wê wisan nivîsiye. Heta guh nedaye qafiyeya dawîya rêzikan jî. Berhem hemû di çar rûpelan de hatiye bicîkirin. Di rûpelê ewil de hijdeh rêzik hatine bicîkirin. Di rûpelê dudu û sisêyan de şazdeh rêzik hene. Di rûpelê çaran ê dawî de jî hivdeh rêzik hene. Di her rêzeke kaxidê wê de, serê ewil tam yekeye nezmî, ango sê rêzên qit'eyê, li pey hev hatine bicîkirin; lê belê peyre, zêdetirî sê rêzan, di yek rêzeke wê de hatine bicîkirin ku xwendina wan zêde zehmet dibe. Mustensixê wê ne diyar e. Di binê rûpelê dawî yê nusxeyê de du sê rêzik hene ku ne bi destê mustensix; belkî peyre ji aliyê yekî dî ve li ser rûpelê wê hatibûn nivîsîn, bi tu awayî me nekarî bixwenda. Peyvên "temmet" û "fatîhe" di binê rûpelê dawî de hene.

Dîroka nivîsîna vê nusxeyê, ji ber ku di arşîva Akademiya Zanistê ya Petersburgê de hatiye parastin, dibe ku bi dîroka vê akademiya ve girêdayî be. Li gor ku Tmûrê Xelîl, ji Yêvgenya Vasilyêva radigihîne, Qeyserê Rûsyayê, Peterê Mezin, sala 1724an, Akademiya Zanistê ya Petersburgê damezrandiye. Di sedsala nozdan de, gelek zimanzan, Rojhilatzan, Kurdnas û Îranîzan, di wê akademiya de xebitîn. Ji van akademisyenan, August Jabayê nîjadpolonî ku bûbû qunsulusê Rûsyayê û Peter Lerchê Almanî, Johannes Albrecht Bernard Dornê Almanî û ji bilî wan, yê din di vê akademiya de dixebitîn û lêkolîn amade dikirin.¹⁶¹ Ji vê agahiya dîrokî diyar e ku ev berhemên Kurdî, piştî sedsala XVIIIan gihîştine ber destê akademisyenên akademiya. Îca dibe ku ev nusxeya *Qewlê Hespê Reş* jî, di vê sedsalê de hatibe nivîsîn. Mela Mehmûdê Bayezîdî (1797-1867) ku berhemên destxetên kelepura Kurdî, di derdora salên 1856-57an de daye Jaba¹⁶², muhtemelen vê nusxeya navborî, bêyî îstînsaxkirin ji wan re şandiye. Delîla me jî ew e ku cûreya xetta ku wî pê berhema xwe ya *Adat û Rûsûmatnameê Ekradiye* nivîsiye, ne wek a *Qewlê Hespê Reş* e. Her wiha ji reqem, hejmar û nimreya destxetên arşîva akademiya diyar e ku wî gelek zêde berhem rewaneyî wê

¹⁶⁰ Muhittin Serin, "Hat Sanatı", *İslam Sanatları Tarihi*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Ünite 4, Eskişehir, 2013, r. 73.

¹⁶¹ *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye* Mela Mehmûdê Bayezîdî, Lêkolîn: Jan Dost, Weşanên Nûbihar, Stenbul, 2010, r. 201.

¹⁶² h. b. r. 18.

derê kirine. Dibe ku nusxeya *Qewlê Hespê Reş* jî, bi destê Mela Mehmûdê Bayezîdî ji wan re hatibe şandin.

Em ji agahiyên lêkolînî yên derbarê berhema Mela Mehmûdê Bayezîdî ya bi navê *Adat û Rûsûmatnameê Ekradiye* tê derxin ku destnivîsa jimar (Kurd34), bi xeta nivîskar e. Tarîxa nivîsandinê, 1274 (1858-1859) e. Di nêva rêzan de, li tenişt kenarê rûpelan, bi latîni çavkanî hatine nîşandan û di nav tekst de, eve gahaî gelek dubare dibin. Herweha di nav tekstê de hin peyv bi Frensî hatine wergerandin û bi xeteke diyar navê berhemê *Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiye û Usûlê Nizamatê Kurmancî* hatiye nivîsîn. Pîvana destnivîsê, 125 x 71: 192 cm. e. Teksta Kurdî, li aliyê çepê yê rûpelê ye û jimarên rûpelan, bi Latîni li aliyê rastê nivîsnadî ne. Li aliyê çepê jî jimar her bi Latîni ne... Di rûpelên 7-9an de pîvana tesktê, 16,5x11,5 cm. e. Kaxez, Ewropî ne û xet, bi pênu-seke reş hatine nivîsnadin, bi şeweyê Ewropî, rengê kaxezan şîn e.¹⁶³ Ji vê agahiyê em tê digihîjin ku çawa ku ev nusxeya Bayezîdî bi van mercan tê parastin, nusxeya *Qewlê Hespê Reş* di pirtûkxaneyê Neteweyî ya Rûsyayê ya Sank-Petersburgê de, li bin hejmara Kurd-26, r. 61ê tête parastin. Ji nimreya arşîvê jî diyar dibe ku mecmûeya ku *Qewlê Hespê Reş* tê de cî girtiye, berî ya Bayezîdî hatiye arşîvkirin. Her weha hejmara berhemên li ser kelepura Kurdî, ji 1ê dest pê dike, bi nusxeya *Qewlê Hespê Reş* tê digihîje heta 26an û bi berhema Bayezîdî digihîje 34an. Nusxeya *Qewlê Hespê Reş* ku em gihîştinê û me ew transkribe kir jî, bi heman awayî, li vê akadmiyê hatiye parastin û di dawiya her rûpelê wê de, peyva “beqiyê” hatiye nivîsîn, di jora rûpelê dawî de jî peyva “beqiyê” hatiye nivîsîn û di binê rêzikên herî jêr de jî bi reqemên Latîni hejmara rûpelê hatiye nivîsîn. Ji bilî Jaba, wekî di hin kurdologên di jî hene ku di Akademiya Imperetotiya Rûs a Zanistê de li ser wêjeya Kurdî xebitîne û berhemên wan di nav weşanên vê akademiya de derketine.

Ji xeynî kurdologên Rûs, hin lêkolerên Almanî jî hene ku ew jî li ser wêjeya Kurdî ya devkî xebitîne û berhem dane. Yek ji wan, kurdnasê Alman Oskar Mann e. Li gor ku Jan Dost radigihîne, Cewad Qazî (1881 – 1946) bi kurdnasê Alman Oskar Mann re li Mehabadê têkilî daniye û wan bi hev re kitêba bi navê *Tuhfê Muzefferiye* amade kiriye, sala 1906an, li Berlinê çap kiriye. Di vê kitêbê de gelek stran û destanên Kurdî yên mîna *Las û Xezal*, destana *Zenbîlfiroş* û *Kela Dimdimê* hebûne.¹⁶⁴ Di vê agahiyê de behsa *Qewlê Hespê Reş* nehatiye kirin; bes dibe ku ew jî tê de hebe. Yekeya wê ya nezmî ya serê menzûmeyê wiha ye:

¹⁶³ Adat û Rusûmatnameê Ekradiye Mela Mehmûdê Bayezîdî, Lêkolîn: Jan Dost, Weşanên Nûbihar, Stenbul, 2010, r. 208.

¹⁶⁴ Adat û Rusûmatnameê Ekradiye Mela Mehmûdê Bayezîdî, Lêkolîn: Jan Dost, Weşanên Nûbihar, Stenbul, 2010, r. 20.

Mecal ew mecal bû
Kafîrek dînbetal bû
Hespek çê li bal bû

Yekeya wê ya nezmî ya dawîya menzûmeyê wiha ye:

Ewrekî reş û tarî
Baranek jê dibarî
Sond nekeve li ‘Umer û ‘Elî
Ji şehîdê Deşta Bedr û Huneyn ra
Fatîhe

Dema ku me ev nusxe da ber destxeta Amedî, me di jêrenotan de navê vê destxeta Petersburgê, bi herfa “P” destnîşan kiriye.

2. Nusxeyên Çapkirî

2. 1. Çapa Varlı

Nusxeya ku Varlı behsa wê dike û girtiye kitêba xwe, ji 1171 malikan pêk hatiye û li gor wî, ev berhema Ehmedê Xanî ye, sala 1681ê hatiye nivîsîn.¹⁶⁵ Li gor qenaeta me, zimanê wê qet naşibe zimanê Xanî. Çunkî hejmara komrêzên wê di dirûvê komrêzên kilamên dengbêjan de ye. Her wiha, devoka Serhedê, bi awayekî gelek zêde barîz xwe dide der. Devok, ne devoka şaîrekî medreseyê ye. Dîsîplîna ziman û hûnandina helbesta Xanî, bi tu awayî di vê berhemê de naxuye. Ne mumkun e ku şaîrekî alim, filozof, muesewwif û otorîte, rabe berhemeke wiha girîng, bi vî awayî wisan bê ser û ber, bê pîr û pergala binivîse. Zimanê rojane yê gel, bi temamê siruştiya xwe tê de diteyise.

Li gor ku Ebdullah Varlı behsa wê dike, xettatê wê, **Mela Nadirê Erdîşê** ye. Ev nusxe, ji hêla naveroka xwe ve qismen dişibe nusxeya Petersgurg û Z. Amedî: lê ji hêla awayê kêş, qafiye û dabeşbûna li komrêzan ve, gelek dûrî wan e. Hejmara her komrêzekê ji şeş û heft rêzan heta zêdetir jî dibe. Hejmara kêteyên rêzikan, carinan li derdora 7 û 8an e; lê belê carinan di hin beşan de diçe ji deh kêteyan jî derbas dibe. Qewl hemû, ji aliyê rêzemijarên xwe ve li 28 serbeşan hatiye dabeşkirin.

¹⁶⁵ Ebdullah M. Varlı, Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 419.

“Îbda”

“Destpêka Hikayetê”

“Mijûliya Hespê” “Agahdariya Pêxember bi Îslambûna Hespî” “Şêwra Pêxember Bi Sêwirandina Xwe” “Gotina Pêxember û Cewaba Sehaban” “Sêwirandina Umer” “Çûna Umer” “Dîna Umer” “Temaşeya Keça Keşe Li Cenga Umer” “Keç û Umer” “Şêwra Keş û Umer” “Şandina Qasid li Bal Mîr va” “Çûna Keşe û Umer li Bal Mîr va” “Çûna Dîwanê û Xêrhatina Mîr” “Buhayê Hespê” “Fermana Mîr Ji Bo Nokeran, Cewaba Lendo” “Tedbîra Lendo” “Musulmanbûna Destekê Ji Neyar” “Reva Umer û Xwegirtina li Dêrê” “Civîna Kafiran ku Êrîş Beher Ser Medîneyê” “Cenga Kafir Li Ser Medîne” “Agahdariya Çûkan Ba Pêxember” “Derketina Umer ji Dêrê” “Serfiraziya Sehabiyan” “Vegera bi Bal Medîneyê ve û Xatîme”

Destpêka vê nusxeyê, bi “Bismillah” dest pê dike; ne mîna nusxeyên dî ne ku bê “Bismillah” dest pê dikin. Beşa wê ya ewil, bi van rêzikan dest pê kiriye:

Qelem guftî bismîllah piştî wî sena

Summe wî selat bide li ser hebîbê Xuda

Xudê yek e bê weled da û baban ew neda

Bê şerîk û heval e bê nezîr e xulqê da

Her tiştî şahê kerîm hazir û nazirê erda

Hewce nîne ba derda ew e bi xwe darena

Rehîm dike aleman pur pêxember wî şanda

Ba îman gazî kirî go werine riya rinda

Bawer bikin ji bin va da xilas bin ji wunda

Xweşt werine hîdayet da nekebin dojê da

Xwe rêka dal parêzin xilas bin hemî benda

Hinek ji pêxemberan wî şand ba hemî ebda

Candar û bê canan hemî bawer biken bi Xuda
Bawer biken de'wa wî da xilas bin we'îda
Her yek bi zimanê xwe got Wahid Resûlî şanda
Gelî xelqê civatê bi zan hîkayet hilda
Me ew anî îna kir vêkxist di **xeyalê** da
Lê me nedît heqîqet hinek dibêjin bin da
Qise heye heqîqet wan **menbe'** nîşan neda
Bo me bûye rîwayet ala Muhemmed hilda
Eshab hev ra civîbûn da biçne cengê da
Bo kar biken ji bo xwe buheşt Xuda we'da
Cenga ji bo îmanê emrê wî Xuda dida
Bo kesê 'emelxalis Firdews wî we'de da
Gazî dike hûn werin ba xaşî lew min ew da
Gunehêd we ne borî di bin 'effa Xeffar da¹⁶⁶

Ev nusxe bi van rêzikan diqede:

Xuda, ew rûreşê bênewa muhtacê rehma te ra
Xilas bû ev rîsale tarîx lefzê gesbkera
Ya Reb deftera Ahmed bigrî di roya heşra¹⁶⁷

2. 2. Çapa Kovara Sirwe

Nusxeyek jî dîsa di destê Varlı de heye ku di kovara "Sirwe" de, li bajarê Urmiye hatiye çapkirin. Beytbêjê wê jî *Kamil* e. Agahiyên derbarê vê nusxeyê de, ji ber ku tenê yê

¹⁶⁶ Ebdullah M. Varlı, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn*, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 423-424.

¹⁶⁷ Ebdullah M. Varlı, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn*, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 499.

ku di kitêba Varlı de bi destê me ketin: “Ev kovara Sirwe, ji aliyê hoşka pergala Selaheddînê Eyûbî ve bi Kurdî, li bajarê Urmiyeyê hatiye weşandin. Ev nusxe bî vî awayî dest pê dike: Edebî Folkloriya Kurd. Beyta Hespê Reş. Beytbêj Kamil:

Hespek nav Kawran e
Nadet bo Misilman e
Hemed pê heyran e

We dibêjit Ebûbekir
Elhemd û lîla şukur

We dibêjit Osman e
Hespê sed kîsan e
Nebî nav Kawran e

We dibêjit ‘Elî ye
Hespekî cinsî ye
Layiqê Nebî ye

We dibêjit ‘Umer e
Hespekî mu‘iteber e
Layiqê Pêgember e

Dawiya vê nusxeyê jî bi vî awayî qediyaye:

Înandin înandin
Meşek mey bar kirin
Xaç qûnê şidandin
Medînê der înandin”¹⁶⁸

¹⁶⁸ Ebdullah M. Varlı, Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, Weşanxaneyê Sîpan, Stenbol, 2004, r. 419-420.

Ji bo agahiyên zêdetir li ser vê nusxeyê, me ji Mamoste Perwîz Cihanî çend pirsîn, wî tenê rê nîşan da ku em biçin Mehabadê û li wê derê hejmara wan kovarên ku ev nusxeyên *Hespê Reş* tê de hatine çapkirin bibînin. Wî ji me re got rast e ku me ew çap kiriye; bes naye bîra min kîjan hejmar bûn.

2. 3. Çapa Mihemed Emîn Osman

Nusxeya dî jî ew e ku ji aliyê Mihemed Emîn Osman ve hatiye berhevkerin û îca wî diyar kiriye ku ji devê Selmanê Reşoyê Şûşî girtiye. Ev nusxe gelêrî ye, li gor devoka Behdînanê hatiye hûnandin. Ev nusxe, sala 1977an, li bajarê Hewlêrê, bi arîkariya Emîndariya Giştî ya Rewşenbîrî û Lawan hatiye çapkirin. Li ser rûpelê wê yê ewil wiha hatiye nivîsîn: *Dîwanê Melan, Xerrkirin û Behevkirina û Lêkolîna Mihemed Emîn Osman*. Metn, bi sernavên beşan ji hev nehatiye veqetandin. Hejmara komrêzên wê 76 e. Hin komrêz ji du rêzikan, hinek ji sê rêzikan, hinek ji çar rêzikan, heta hinek jî jê ji pênc rêzikan pêk hatine. Hejmara komrêzên ku “sêrêzî” ne, ji yên dî zêdetir e. 45 komrêz, sêrêzîkî ne. Peyre komrêzên herî zêde çar, peyre pêncrêzî û yên herî hindik, durêzîkî ne. Hin rêzîk ji hêla ahenga dangan ve bi tenê mane. Kêşa komrêzan ne bi rêk û pêk e. Digel ku hejmara kîteyên hin rêzikan 6 û 7 e; ya hindik rêzikan diçe ji 10an derbas dibe. Navê şaîr tê de derbas nabe. Ev nusxe bi vî awayî det pê dike:

Çi şeveka eynî

Çi rojeka eynî

Muhemmed deng heltînî

Heçî yê Hespê Reş bo min bînî

Qesrekê li beheştê li min bistînî

Hemû ji 17 rûpelan pêk hatiye.

Yekeya wê ya nezmî ya dawî ev e:

Ewê lezandiye

Ew li hewa firiye

Hêlîna xû hêla biye

Çûçîkê wê di savan e

Ji vê beşa dawî jî diyar e ku bûyer neqediyaye û kronolojiya rêzebûyeran, ne bi rêk û pêk e.

2. 4. Çapa Mela Îsmet

Nusxeyeke di ku Ebdullah Varlı behsa wê kiriye, ew nusxe ye ku Mela Îsmet daye wî. Li gor ku wî diyar kiriye, sala 2002yan ketiye destê wî. Ev nusxe, li cem kalikê Mela Îsmet bûye. Navê kalikê wî, Mela Nadir bûye. Ji gundê Sogutliya Erdîşê ye. Ji Mela Nadir, gihîştîye kurê wî Mela Ebdullah, ji wî ketiye destê Mela Îsmet.¹⁶⁹ Ev nusxe jî bi vê yekeyên nezmî dest pê dike:

Serwer e serwer e

Dewran dixûn ji ber e

Selewat li ser Pêgember e

Belku ew zeman bû

Hespek nav Kawran¹⁷⁰ bû

Bi dil Musulman bû

Belkû ew mecal e

Kafirek dînbetal e

Hespek çê li bal e

Ez bêjim Pêgember e

Çi hespekî defter e

Bîne ji bo Pêgember e

Bala me lê ye ku ev nusxe jî, bi dabeşbûna rêzan a li yekeyên nezmî û bi kêşa xwe, dişibe nusxeya Ptersburg, Amedî, M.Emîn Osman û kovara Sîrwe. Nusxe, bi vê beşê qediyaye:

Heta rikêb negire xûnê

Ez naçime Medîne

¹⁶⁹ Ebdullah M. Varlı, Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 419.

¹⁷⁰ Dirûvê vê peyvê dide peyva "gawiran" jî.

Bi emrê Cebbarî
Baranek dibarî
Ji ewrê reş ê tarî
Xûn da rikêba şeng siwarî

Bi qeweta Xeffarî
Bi himmeta muxtarî
Hespê Reş ê Rûhanî
Ji bo Muhemmed anî¹⁷¹

Çawa ku ji yekeya nezmî ya dawî jî diyar e ku di vê nusxeyê de jî navê muellif û navê mustensix tune ye.

3. Hilberîvanê Eslî yê Qewlê Hespê Reş

Em dê li gor agahiyên ber destê xwe ku behsa hilberînerê eslî yê *Qewlê Hespê Reş* dikin, yeko yeko raxin ber çavan û xwediyê rastîn ê vê berhemê, li gor qenaeta xwe diyar bikin. Herekol Ezîzan radigihîne ku ev berhem, a Feqiyê Teyran e.¹⁷² Her wiha M. Xaznedar jî vê agahiyê radigihîne.¹⁷³ Xalid Sadinî jî diyar dike ku ev xezanameya Hespê Reş a ku lêkoler dibêjin ji aliyê Feqî ve hatiye nivîsîn, bi destê min neketiye û min li tu derî tiştek ji wê nedîtiye.¹⁷⁴ Hin kes dibêjin ku ya Mela Xalidê Zebârî ye, li gor ku Mihemed Emîn Osman ji vî ristevanê wê guhertoyê ragihandiye, *Qewlê Hespê Reş*, ji aliyê şairekî bi navê Elî Herîrî ve, li Şûşê hatiye nivîsîn.¹⁷⁵ Ev agahiyên gelêrî yên jêr ên Mihemed Emîn Osman jî, piştgiriye didin ku Beyta Hespê Reş, ji aliyê Elî Herîrî ve hatiye nivîsîn:

“Hindek dibêjin ku Feqiyê Teyran Beyta Hespê Reş wa gotî; belê we nîne. Ji ber ku kesî nedîtiye Feqî hatiye Şûş. Belê Elî Herîrî, di wê demê da dîn bibû, ji ber ilim û şûrgotinê. Heft sala kete çola û Xudê teala pezê kûvî lê kiribû xwedan. Kiwîvî, digel dihatin û diçûn û şîrê xwe didanê û şaxê xwe diçemandin di ser ra biçît. Alimekî yê ‘hey navê wî Mela Fetah e,

¹⁷¹ Ebdullah M. Varlı, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn*, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 418-419.

¹⁷² Herekol Azîzan, “Klasîkên Me – An Şahir û Edîbên Me ên Kevin”, *Hawar*, j. 33., Çiriyê Pêşîn, Şam, 1941, r. 8. (Çapa Nûdemê)

¹⁷³ Maruf Xaznedar, “Zembîlfroşa Feqiyê Teyran”, (Werger, Mîkaîl Canpolat), *War*, j. 4., Istanbul, 1998, r. 48.

¹⁷⁴ M. Xalid Sadinî, *Feqiyê Teyran*, Jiyan, Berhem û Helbestên Wî, Weşanxaneya Nûbiharê, Stenbol, 2011, r. 58.

¹⁷⁵ Ev berhema nivîskî ku Mihemed Emîn Osman ew ji devê Selmanê Reşoyê Şûşî girtiye, bi alfabe ya erebî ye û fotokopiya wê li ber destê min e. Sala 1972yan li Hewlêrê hatiye çapkirin.

*xelkê gundê Deka ye, ewîş gotî: Min yê li alima bihîstî ku Elî Herîrî, li gel kiwîviya dijî, wekî zistanê danivîst; wan kiwîviyan, difnêt xu pê ve dinan; da hilma germ biçîtê Meksê. Heta heft salêt wî tamam biwîn, dinaniya wî berda, îna kiwîvî, li ber revîn. Elî gote kiwîviyan: Ha heywanîna, hinek bo li ber min direvin? Kiwîviyan gotinê: Hinde em û tu xilas, Xudê kerem kir digel te, te hay ji xu hebiyeve, ev care xelkê dî, em dê li ber te revîn. Ji ber ku Xudê teala wekî tu dîn kirî, em li te kirine semiyân. Paşê Elî Herîrî hate Şûş.*¹⁷⁶

Li gor ku Celîlê Celîl radigihîne, xezanameya Qewlê Hespê Reş, berhema Elî Herîrî ye ku destnivîsa vê berhemê li pirtûkxaneya Neteweyî ya Rûsyayê li Sank-Petersburgê, li bin hejmara Kurd-26, r. 61ê tête parastin. Di destpêka vê berhemê de weha hatiye nivîsîn: “Qewlê Hespê Reş hîkayet, Elî Herîrî nam.”¹⁷⁷

Tehsin Îbrahîm Doskî ku di pirtûka xwe ya erebî de edebiyata kurdî bi giştî li du beşan teqşim dîke û behsa edebiyata gelêrî û edebiyata nivîskî ya Kurdî dîke, balê dikşîne ser edeba gel. Di vê beşê de navê esatîr/çîvanok û qises/çîrokan diyar dîke. Îca çeşnê çîrokan jî, li du sernavan dabeş dîke: Hîkayeyên betlê/hogiçiyê û hîkayeyên evînê. Piştî ku cî dide behsa cûreyê heyranok, gotinên pêşiyên û pêkeniyên, bi berfirehî li ser edebiyata nivîskî ya kurdî disekine û vê jî dabeşî du sernavan dîke: Hozan/şîr û nesr/pexşan. Di beşa hozanê de, piştî behsa “Rûbai”yên Baba Tahirê Hemedanî (935-1010), mijarê tîne ser “di edebiyata kurdî de Îslam”ê. Peyre behsa zahîrbûna helbesta tesewwufî û şîra dînî ya kurdî dîke û ew wan medhiyeyên kurdî ku li ser Siyera Nebî, tevî hozanvanêd wan ên mîna Xanî, Mela Huseynê Bateyî, Perto Begê Hekarî, Nûredînê Birîfkanî, Ehmed Emîn Nalbend, Şêx Tahirê Şûşî diyar dîke. Bi vê hincetê ew dorê tîne ser zahîrbûna mesnewiyên ku li ser Sîreta Resûlellah (e.s.w.) û xelîfeyên wî û li ser xeza û herbên musulmanan. Di vê derê de gava navê berhemên rêz dîke, behsa “Menzûmeya Beyta Sîsebanê” ku ji aliyê Şêx Xalidê Zebarî (h. 1170-1220) ve hatiye nivîsîn dîke û weke têbiniyekê, li ser *Beyta Hespê Reş*, vê agahiyê dide:

“Ustaz Ebdurrehîm el Muzûrî, di nivîsa xwe ya ku di kovara Rewşebîrî Niwî, hejmara 119an, Eylûl 1979an de hatiye çapkirin, li ser nisbeta rastî ya vê menzûmeyê bi vî şairî re salix dide. Ev ustaz behs dîke ku ji bilî Menzûmeya Sîsebanê, menzûmeyêke dî bi navê Beyta Hespê Reş li ser xezayêke dî heye. Hinekan nisbeta vê, bi bal Feqiyê Teyran ve kiriye. Çawa ku Sadiq Behaedînê rehmêtî jî di kitêba xwe ya Şu’erî’l Kurd, r. 210an de diyar kiriye. Lê belê Ustaz Mihemed Emîn Osman, di kitêba xwe ya Dîwanê Melan, r. 251ê de, vê agahiyê

¹⁷⁶ Mihemed Emîn Osman, “Beyta Hespê Reş” Hewlêr, (Ji nusxeya bi alfabe ya Erebi r. 248-249.)

¹⁷⁷ Xweşmêr, “Elî Herîrî,” *Nûpelda*, Wan, 2010, j. 3, r. 21.

*dûrî rastiye dibîne û destnîşan dike ku nisbeta wê, li ser Xalidê Zebarî ye û ev, bêtir nêzî rastiye ye.*¹⁷⁸

Ebdullah Varlı jî dîyar dike ku Ehmedê Xanî, rîstevanê çîrokê yê cara yekemîn e.¹⁷⁹ Çi heye ku li gor Tehsîn Brahîm Doskî, ev berhem ne ya Ehmedê Xanî ye, çunkî ji hêla uslûba edebî bilind a Ehmedê Xanî ve, gelek dûrî aqilan e ku wî ev nivîsîbe. Kadri Yıldırım jî ku behsa vê dike, ew jî vê berhemê weke berhemeke ku aîdiyeta wê bi Elî Herîrî re şikeber be destnîşan dike.¹⁸⁰ Bi rastî zimanê ku di nusxeya ber destê Ebdullah Varlı de hatiye bikaranîn, bi temamî devokeke nav gel a herêma Serhedê ye ku hema hema ji sedî not, pêşdaçekên bêjeyan nehatine bikaranîn. Pergala qafiyeya wê jî, gelek qels û lawaz e. Lewre bi me jî tesbîta Tehsîn Îbrahim Doskî, gelek maqûl e. Çavkaniyên lêkolînî yên ku li ser Ehmedê Xanî ne, behsa berhemeke wî ya bi navê *Qewlê Hespê Reş* nakin.¹⁸¹ Heta di xebata Murad Ciwan a li ser berhemên Xanî de jî, qet behsa berhemek wî ya bi navê *Qewlê Hespê Reş* nehatiye kirin.¹⁸²

Bi qasî ku me dît, çeşnê wê yê edebî, hilberînerê wê yê eslî, ciyê ku ev bûyer lê qewimiye û rastiya wê ya dîrokî, bi awayekî rêkûpêkî, di lîteratura kurdî de nehatiye diyarkirin û hîna jî gengeşî li ser wê û berhemdarê wê yê eslî heye. Li gor Abdullah Varlı, ev berhem ji hêla Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsandin¹⁸³, li gor hin kesan, berhema Feqiyê Teyran e¹⁸⁴ û li gor hin kesan jî, berhema Mela Xalidê Zebarî ye.¹⁸⁵ Bes bêtir qenaeta ku berhema Elî Herîrî ye, derdikeve pêş. Delîla me ya resen jî ev komrêz e:

99 Gaziya wan mêran tê
Nirrênê wan şêran tê
Ev xebera ji ku tê
‘El’yê Herîr jî sotê

¹⁷⁸ Doskî, Tehsîn Îbrahim, El – Medxel li Dîraseti’l Edebi’l Kurdî elû Mudewwin, Billhecetîş- Şîmaliyetî, El Cuzî’l Ewwel, Min Menşûrati Cemiyetî ‘Ulemai Kurdistan, m. 1993; h. 1413, r. 66.

¹⁷⁹ Ebdullah M. Varlı, Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 419.

¹⁸⁰ Kadri Yıldırım, Nûbehara Biçûkan, Ehmedê Xanî Külliyyatı, Avesta, İstanbul, 2008, r. 55.

¹⁸¹ Murad Ciwan, Ahmedê Xanî Jiyan Berhem û Bîr û Baweriyên Wî, Weşanên Doz, Stenbol, 1997, r. 85.

¹⁸² Murad Ciwan, Ahmedê Xanî, Weşanên Doz, Stenbol, 1997, r. 85.

¹⁸³ Ebdullah M. Varlı, Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, Weşanxaneya Sîpan, Stenbol, 2004, r. 419.

¹⁸⁴ Herekol Azîzan, “Klasîkên Me – An Şahir û Edîbên Me ên Kevin”, *Hawar*, j. 33., Çiriya Pêşîn, Şam, 1941, r. 8. (Çapa Nûdemê)

¹⁸⁵ Doskî, Tehsîn Îbrahim, El – Medxel li Dîraseti’l Edebi’l Kurdî elû Mudewwin, Billhecetîş- Şîmaliyetî, El Cuzî’l Ewwel, Min Menşûrati Cemiyetî ‘Ulemai Kurdistan, m. 1993; h. 1413, r. 66.

4. Elî Herîrî

4. 1. Jiyana Wî

Em dê li gor derfetên xwe behsa nav, nasnav, serdem, berhem û kesayetiya edebî ya şaîrî bikin. Navê Elî Herîrî, bi sê awayan hatiye qeydkirin: ‘*Elî*, ‘*Eliyo* û Şêx ‘*Elî*. Li ser navê wî, di nav lêkolerên tarîxa edebiyata Kurdî, dubendî û nelihevkerin tune ye. Mela Mehmûdê Bayezidî, Aleksandr Jaba, Ebdilreqîb Yûsif, Celadet Bedirxan, Feqî Huseyin Sağnıç, Selîm Temo, Mehrdad R. Izady û Abdurrahman Adak, gişt bi heman awayî navê şaîrê me didin.

4. 2. Serdema Wî

Li ser dîroka wiladeta Elî Herîrî, îxtîlaf heye. Bazil Nikitîn, wî weke şaîrê sedsala 9an nîşan dide, li gor Ebdilreqîb Yûsif, ew şaîrê sedsala 16an e, li gor Mehrdad R. Izady û Mamoste Qedrî, ew di sedsala 15an de jiyaye. Serê ewil agahiya ku li ser Elî Herîrî heye û di berhema Ehmedê Xanî de qeydkirî ye, bala me dikşîne:

Bînave ruha Melê Cezîrî

Pê hey bikira ‘Eliyê Herîrî

Keyfek we bida Feqîhê Teyran

Û heta bi ebed bimayî heyran¹⁸⁶

Ji awayê tertîba vê helbesta Xanî jî, diyar e ku Elî Herîrî, ji hêla serdema xwe ya dîrokî ve, muhtemelen berî Cizîrî ye. Agahiyên balkêş ên derbarê Elî Herîrî de ku bi destê me ketin, ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatine dayin. Wî hewl daye ku agahiyên xwe, bi malûmatên Melayê Jaba ku Mela Mehmûdê Bazîdî ye, piştrast bike: “Di nav şahirên kurdmancan de yê ko piştî islamiyetê rabûne û bi kurdmancî nivîsandine, ê pêşin Elî Herîrî ye. (Xwedê rehmeta xwe lê erzan bike û heke di ser bihuştê re bihuşteke din, bihuşteke bijarte heye, cih û meqamê wî tê de çêke.) li gora ko me bihîstiye, gundê wî Herîr, di welatê Soran de ye û Elî bi xwe sorî ye. Lê Melayê Jaba dibêje ko Herîr di welatê Şemdînan de ye. Me bi xwe tu esera wî ne dîtiye. Dibêjin ko dîwana wî heye. Melayê Jaba der heqê Elî Herîrî dibêje: Şahirê berê, Elî Herîrî ye. Dîwançeyê heye, şîhir û qesayid. Herîr jî gundek e, di cihê û nehya Şemzînan, di sencexa Hekariyan de, û şîhir û e[de]biyatê di wî jî di nêv Kurdistanê qewî zêde meşhûr û

¹⁸⁶ Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, (Amadekar: Huseyn Şemrexî) Nûbihar, Stenbol, 2010, r. 42.

marûf e. Texmîna ko di tarîxa çar sedê hicretê de peyda bûye û di çar sed û heftê û yekê de merhûm bûye û di nav Herîrê de medfûn e.”¹⁸⁷

Herîr, navê gundê wî ye, li wê derê hatiye dunyayê û kar û barê perwerdehiya ilmî kiriye, heta ku li wê derê wefat kiriye. Herîr, sedsala bîstan, girêdayî nehîya Şemzînanê ya Mîrîtiya Hekariyan bûye. Îro ev bajarok, li Başûrê Kurdistanê, li ser bajarê Hewlêrê ye.¹⁸⁸ Ziyaeddîn Paşa, wateya fehengî ya “Herîr” wiha rave kiriye: “Helawek e ku ji dims û tehîn tê girtin û ziwakirin/hişkkirin û peyre tê birîn.”¹⁸⁹

Mehrdad R. Izady jî li ser Elî Herîrî hin agahiyên kurt daye: “Ji hin şair û nivîskarên lîrîk ên ewil ku berhemên wan gihîştine roja me, ev in. Li herêma Hekariyê, li nêzî Rewanduzê, navçeyeke bi navê Herîr heye. Elî Herîrî (1425-1490?) jî wê derê ye.”¹⁹⁰ Diyar e ku li ser dîroka jiyana wî, îttîfaq naxuye; îxtîlaf heye. Li gor Mamoste Qedrî jî dîroka wîladet û wefata Elî Herîrî (1425-1490) ye.” Lewre edîbê herî kevnar ê edebiyata kurmancî ku berhemên wî gihîştine roja me, Elî Herîrî ye.¹⁹¹ Selîm Temo jî li ser Elî Herîrî ev agahî dane: “Sala 1010an li gundê Herîrî ya ku li ser navçeya Şemzînanê ya Culemêrgê hatiye dinê. Li gor hin dîrokzanan Rewanduz, li gundê Herîra ku di herêma Soran de ye hatiye dinê. Sala 1078an miriye. Li gor B. Nikîfîn, di sedsala 9an de jiyaye; li gor Ebdilreqîb Yûsif, di sedsala 16an de. Aleksandr Jaba diyar dike ku şairê yekem ê Kurdî ye. Gora wî, li gundê Herîrê ye. Gel, gora wî weke ziyaretgeh qebûl dike. dibêjin ku dîwana wî heye.”¹⁹²

Abdurrahman Adak, hin agahiyên cihêtir dide: “Li gorî Mela Mehmûdê Bazîdî, Eliyê Herîrî di salên 1010-1078 de jiyaye. Piştî Bazîdî, bi taybetî Kurdologên Rûs jî di vê mijarê de ew şopandine. Li gorî nêrîneke dî jî, dema Mela Camî (1413-1492) sala 1472yan di Erbilê ve çûye Hecê, ev beyt gotiye:

Pîremerdî bedîdeem zi Cizîr

Nîmemerdî bedîdeem zi Herîr

Ebdurreqîb Yûsif, di sala 1961ê de li Mûsulê mecmû’eyeke destnivîsar ku di sala 1767an de hatiye nivîsandin dîtiye ku di vê destnivîsarê de helbestên Eliyê Herîrî jî hene. Ji

¹⁸⁷ Herekol Azîzan, “Klasîkên Me – An Şahir û Edîbên Me ên Kevin”, *Hawar*, j. 33., Çiriya Pêşîn, Şam, 1941, r. 8. (li gor Çapa Nûdemê, r. 811.) Me dest neda rastnivîsa wê.

¹⁸⁸ Sagnîç, Feqî Huseyin, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Stenbol, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002

¹⁸⁹ Yûsûf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî El Meqdisî, *El Hedîyyetu’l Hemîdiyyeti Fî’l Luxeti’l Kurdiyyeti*, (tehqîq: El Ustaz Ed Doktor Muhemmed Mukrî) Weş. Mektebetu Diyarbekir, 2011, r. 61.

¹⁹⁰ Mehrdad R. Izady, *Bir El Kitabî, Kürtler*, (Ingilizceden Çeviri: Cemal Atila) Doz Yayınları, İstanbul, 2007, r. 311.

¹⁹¹ H. b. r. 119

¹⁹² Selim Temo, *Kürt Şiiri Antoojisi*, Agora Kitaplığı, İstanbul, 2007, c. 2. r. 1358.

vir tê fêmkirin ku Eliyê Herîrî, berî sala 1767an jiyaye. Lê tişta gelek balkêş ew e ku Ebdurreqîb Yûsif, di “Dîwana Kurmancî” de dibêje dîroknas el-Muhibbî di “*Xulasetu’l – Eser*” de behsa kesekî bi navê Şêx Ehmedê kurê Şêx Elî Herîrî kiriye. Li gor vê agahiyê, ev Şêx Ehmed li Şamê li gundê Esalê hatiye dinyayê. Bavê wî, Kurd e û ji Herîrê ye. Bi meriv re ev bawerî çê dibe ku di vir de behsa helbestvanê me hatiye kirin. Li gorî vê, Eliyê Herîrî, ji Herîrê çûye Şamê û li wir bi cî bûye, kurekî wî bi navê Şêx Ehmed heye û ev kurê wî, li gundê Şamê, Esalê hatiye dinyayê û di sala 1638an de li taxa Salihiyeyê ya Şamê wefat kiriye. Nexwe eger wisa be, madem kurê wî di sala 1638an de koçî dawiyê kiriye, bavê wî Eliyê Herîrî jî, texmînen di destpêka vê sedsalê de miribe û di sedsala XVIan de jiyabe.¹⁹³

Li gor qenaeta me jî Eliyê Herîrî, berrî 1767an jiyaye. Lewre zimanê wî jî, eynî mîna ye kurmançiya şairên vê sedsalê bi xwe. Heke ew jî mîna Baba Tahirê Uryan wisan di sedsala XIan de jiyabûya, helbet berhema Baba Tahir li ber destê me ye Kurdiya wî jî diyar e ku naşibe zimanê Elî Herîrî.

4. 3. Nasnavên Wî

Nasnavên şairê me, ev in: ‘*Eliyo*, ‘*Şêx ‘Elîyê Xerîb*, ‘*Elî Herîrî* û ‘*Elî Sadiq* e. Nasnavê ewil ku bala me dikşîne, di helbesta wî ya bi navê “*Dîsan Ji Nû Işqa Berî*” de bi awayê ‘**Eliyo**’ derbas dibe:

“Mehweş ku westan sef be sef ew hate der misrî ti kef

Wan got: ‘Eliyo la texef me b’ mirdinê qewî xweş e.’¹⁹⁴

Digel ku di hin çavkaniyan de ev helbestên wî di teşeyê çarînan de hatine qeydkirin jî, tme tercîha xwe li ser teşeyê “xezael”ê danî û bi awayê xezelkî ew li vê derê nivîsîn. Di nusxeya *Qewlê Hespê Reş* ku destxeta Zeynelabidîn Amedî ye de wî, nasnavê xwe bi awayê ‘**Eliyê Herîr**’ diyar kiriye:

Gaziya wan mîran tê

Nirrênê wan şêran tê

Ev xebera ji ku tê

‘**Eliyê Herîr**’ jî sotê

Di helbesta xwe ya “*Xelqno Werin Bibînin Çi Husnek Bi Kemal e*” ku di destxeta Z. Amedî de heye, wî, nasavekî xwe yê dî jî, bi awayê “**Elî Sadiq**”¹⁹⁵ diyar kiriye:

¹⁹³ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 181-182.

¹⁹⁴ *Dîwana Camî*, Berhevkar: Mela Ehmed Hilmî Qoxî ed-Diyarbekirî, Îhsan Yayınları, İstanbul, ?, r. 303

“Çend bêje ‘Elî Sadiq ji esrar û deqaiq
Ji wan wesfê di laiq ji husneya delal e”¹⁹⁶

Di helbesta bi navê “Dilê Mehzûn Kefaret Bît” de, şairê me, mexlesa “Şêx ‘El’yê Xerîb” bi kar aniye:

“Reyahîn sosin û werd in werestê ehmer û zerd in
Li Şêx ‘El’yê Xerîb ferd in hero sed car di efxan têt”¹⁹⁷

4. 4. Kesayetiya Wî ya Edebî

Elî Herîrî, şairekî alim e ku helbestên xwe bi awayekî serketî, bi şêwaza edebiyata klasîk dane. Ji helbestên wî diyar e ku wî hay ji edebiyata Erebi, Farisî û Turkî heye. Peyvên Erebi û Farisî, di helbestên wî de balê dikşînin. Zimanê wî gelek hêsa û nerm e. Bi rêbaza helbesta klasîk berhem dane jî, zimanê wî wisan zêde ne giran e. Her çi qas helbestên wî yên klasîk bi peyvên Erebi û Farisî dagirtî bin jî, ev berhema wî ya *Qewlê Hespê Reş*, bi zafî bi zimanê gel ê rojane hatiye hilberîn. Li gor piraniya tarîxvanên edebiyata Kurdî, Elî Herîrî, damezrînerê ewil ê helbesta Kurdî ya Kurmancî ye: “Di hişê Kurdî de helbestvanê klasîk ê yekem ew e. Ji aliyê teşe û naverokê ve bingeha helbesta klasîk a Kurdiya Kurmancî, digel Melayê Cizîrî, ji aliyê Herîrî ve hatiye avêtin.”¹⁹⁸

Aliyê herî girîng ê Herîrî ew e ku tesîra wî li ser Cizîrî û Xanî çê bûye. Bi qenaeta me, şopên Herîrî di dîwana Cizîrî de hene. Her wisan, diyar e ku Xanî jî hay ji Herîrî heye û wî jî daye ser şopa Herîrî; lewre wî bi berhemên xwe giranî daye ser kevneşopiya edebiyata bi Kurmancî. Ku Ehmedê Xanî *Mem û Zîn* ji nav berhemên edebiyata gelêrî-devkî derbasî edebiyata nivîskî ya klasîk kiribe –jixwe ev rast e- dibe ku wî ji Herîrî ev kevneşopî wergirtibe.

Herîrî, her weha bi “*Borê Qer*” nûnerekî cureya cengnameyê ye jî.¹⁹⁹

¹⁹⁵ Li gor A. Adak, ev helbest ne ya Elî Herîrî ye û nasavekî wî yê wiha tune ye; bes di destxeteke Z. Amedî ya Mecmû‘eyî de ev helbest, di bin sernavê Elî Herîrî de hatiye dayin. Li gor qenaeta me, digel ku şairekî wiha heye jî, îca ev şairê Kurmancî ku bi nasnavê “Sadiq”berhem daye, tenê ji Ebdureqîb Yûsif ve ev angaşt hatiye diyarkirin. Her wiha, çawa ku Elî Herîrî peyva “Xerîb” ji bo xwe bi kar aniye, îhtîmal heye ku wî ev bêjeya “sadiq” jî danîbe ber nasnavê xwe. (Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 184.)

¹⁹⁶ Zeynelabidîn Amedî, Menzûmetan, Ceme‘eha Zeynelabidîn Amedî, Weş. Diyarbekir Soz, Diyarbekir, 2004, r. 68.

¹⁹⁷ Huseyn Şemrexî, “Li Ser Du Helbestên ‘Eliyê Herîrî Nirxandinek”, *Nûbihar*, j. 110., Zivistan, Stenbol, 2010, r. 10.

¹⁹⁸ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 183.

¹⁹⁹ h. b. r. 179.

4. 5. Berhemên Wî

Bi qasî ku em gihîştinê, ji xeynî *Borê Qer (Qewlê Hespê Reş)* û çend helbestên wî, ew dîwana wî ku behsa wê hatiye kirin, bi destê me neketin. Heta niha, 6 helbestên wî hatine weşandin. Meriv dikare wan helbestên wî di kategoriya dîwançeyekê de bihesibîne.²⁰⁰

2. 1. Qewlê Hespê Reş

Ev berhema Herîrî, di edebiyata klasîk de xwedî ciyekî taybet e. Nusxeya ku navê wî tê de derbas dibe, tenê nusxeya Zeynelabidîn Amedî ye. Wekî dî, nusxeya ku ji aliyê Mihemed Emîn Osman ve ji nav gel hatiye berhev kirin û qeyd kirin, bi Elî Herîrî ve tê nisbet kirin; bes navê wî bi xwe di komrêzên qewlî de derbas nebûye. *Qewlê Hespê Reş*, ji hêla çeşnê xwe yê edebî ve, di nav kevneşopiya “xezaname”yan de weke berhemeke girîng û hêja ketiye nav edebiyata Kurmancî. Berhem, bi awayekî menzûm hatiye nivîsîn. Awayê dabeşbûna wê ya li komerêzan, bêtir “sêrêzoyî” ye. Wekî dî, hin komên rêzan, çar û hin jê jî pêncrêzî ne.

Kurteya bûyerê wê wiha ye: Cenabê Pêxember pê hisiyaye ku hespekî reş di nav destê gawiran de heye û ev hesp, ji bo cîhada sehabîyan, dixwaze bê bikeve ber destê Musliman. Lewre ew, rojêke îne vê agahiyê dide sehabîyan. Ji nav sehabîyan, Hz. Umer dibêje ez diçim wî tînim û dikeve rê, tê ku hespê reş bikire û bibe Medîneya munewwer cem Cenabê Pêxember. Li wî welatî, mîrekî xedar heye, ew dilhişk e û dijminê Musliman e; îca birayekî mîr jî heye, ew jî keşe ye û ev keşe jî bi awayekî xef bûye Musliman û tevî qîza xwe Leymûnê, alîkarî bi Hz. Umer re dike. Ew radibin hespî bi rêya siyasetê, bi zêran dikirin û ji nav destê mîr û eskerên wî derdixin. Gava dikin ku herin, eskerên mîr pê dihese ku Hz. Umer palewanekî Musliman e û didin pey wan. Hz. Umer, xwe tevî hespî diavêje dêreke filehan û li wê derê dikeve hesarê. Peyre çûkek, tê ba Hz. Umer, ew kaxizekî bi xwîne dinivîse û bi lingê wê ve girê dide û wê dişîne; da ku hawarê bibe bigihîne Medîneyê. Çûk diçe Medîneyê, vê xeberê dide wan û sehabî tînan hawara wî û şerekî dijwar diqewime; dawî bi xêra Hz. Elî, eskerê Musliman bi ser dikevin û Hespê Reş dibin digihînin ber destê Cenabê Pêxember. Berhem bi duayê diqede. Ji ber ku mijara teza me ev berhem e, em dê li pêş bi berfirehî li serê rawestin.

2. 2. Helbestên Wî

Helbestên wî, ji aliyê Ebdurreqîb Yûsif, Ahmed Hilmî Koxî, Zeynel Abidîn Amedî û Feqî Huseyin Sagniç ve hatine qeyd kirin. Qenatê Kurdo jî ew neqil kirine. Selîm Temo, ew di xebata xwe ya bi navê *Kürt Şiir Antolojisi [Antolojiya Helbestên Kurdî]* de belav kirine. Tê

²⁰⁰ h. b. r. 183.

gotin ku wî dîwanek jî hebûye; bes heta niha bi destê me neketiye. Helbestên wî yên ku gihîştine ber destê me ev in:

a. Dilê Mehzûn Kefaret Bît: Ev helbest, ji şanzdeh çarînan pêk hatiye. Pergala wê ya qafiyeyê, bi awayê “aaaa/bbba/ccca” ye. Mijara wê jî evîneke tesewwufî ye. Zimanê helbestê digel ku bi peyvên Erebi û Farisî xemilandî ye jî, piştî sedsalan, îro dîsan em, di têgihîştina wê de zêde natengijin. Huseyn Şemrexî, ev helbesta wî, digel nusxeyên wê yên cihê cihê daye ber hev û li serê krîtîkeke hêja kiriye û di hejmarê 110an a kovara Nûbiharê de daye belavkirin. Hilmî Qoxî, di mecmûaya xwe de vê helbetê weke “qesîde” bi nav kiriye. Ev helbest bi van rêzan dest pê dike:

DU QESÎDEYÊN ŞÊX ‘ELÎ HERÎRÎ

Dilê mehzûn kefarete bit ki imşeb taze mihman têt

Bi migînî beşaret bit ki mihman canê canan têt

Ki mihman canê canan e li ser çehvê me mihman e

Bi mala cumleê xan e ki şahê cumleê xan têt²⁰¹

Ev helbest, bi van beytan diqede:

Bibîne rûşemalîne were hindavê balîne

Ji dest ahan û nalîne çi rengferyad û ji esman têt

Bi feryad û biha were ji dest ahan min ew kar e

Mulazim bendeê jar e ji seydê çi ferman têt

Seyyidê heqnezêr vê ra di iqlîman ‘elem gêra

Qutara gewheran vê ra ji nîv kana bedexşan têt²⁰²

²⁰¹ Dîwana Camî’, Berhevkar: Mela Ehmed Hilmî Qoxî ed-Diyarbekirî, Îhsan Yayınları, İstanbul, ?, r. 300

²⁰² h. b., r. 302.

b. Xelqno Werin Bibînin Çi Husnek Bi Kemal e: Ev helbest, di “Menzûmetan”a Zeynelabidîn Amedî de, bi sernavê “*Xezele Elî Herîrî Fermayed*” cî girtiye. Serê helbestê wiha ye:

Xelqno werin bibînin çi husnek bi kemal e
Heyran ji dil bibînin ji sun'ê zulcelal e

Sun'ê Xudê ku dayî sefhe ji nûrê daynayê
'Enber li ser kêşayî ebruwê xett û xal e

Xalêd şubhê 'enberê dêm her wekî qemerê
Ez têr nabim ji menzerê; min naçît ji xeyal e

Helbest, bi van beytan qediyaye:

Ji hindê bînin talanî; bigrin kilê subhanî
Ji bo çavê sultanî; dem bîtin sersal e

Çend bêje 'Elî Sadiq; ji esrar û deqaiq
Ji wan wesfê di layiq; ji Husnaya delal e²⁰³

Heke em çeşnê edebî yê helbestê weke xezel bihesibînin, em dê wê bi awayê beytan/malikan binivîsin û hejmara beytên wê jî digihîje 19an; lê na heke ne xezel be, bi awayê “çarînan” jî mumkun e ku bê qafîyekirin. Bi qasî ku me ji peyvên îmgeyî û newayî yên vê helbestê fêm kir, tu şik û gumaneke me nema ku ev helbest her û helbet a Herîrî ye û Elî Sadiq jî ew bi xwe ye. Çunkî ji hêla zimên ve jî, rasterast dişibe şewaza Herîrî. Îca peyva “sadiq” ku di ber nasnava wî de hatiye, bi qenaeta me, bi wateya ku şair, gotina xwe “rast” e, ango ne derew dibêje.

c. Dîsan Ji Nû Işqa Berî: Ev komerêzên wê yên çarîn, hem bi awayê beytê, hem jî bi awayê çarîne jî tînen nivîsandin û qafîyeya wê xera nabe. Tercîha me li ser wê yekê ye ku çeşnê edebî yê vê helbestê, xezel e. Dirûvê vê helbesta wî dide xezelê; çunkî hejmara beytên wê 18 ye. Ev helbest ji pênc çarînan pêk hatiye. Pergala wê ya qafîyeyê, bi awayê “aaaa/bbba/ccca”

²⁰³ Menzûmetan, Ceme 'eha: Zeynelabidîn Amedî, Diyarbekir Soz, Diyarbekir, 2004, r. 65-68.

ye. Huseyn Şemrexî, ev helbesta wî, digel nusxeyên wê yên cihê cihê daye ber hev û li serê krîfîkek kiriye û di hejmara 110an a kovara Nûbiharê de daye belavkirin. Digel ku Şemrexî ev helbest bi awayê komrêzên çarînî nivîsîye jî, em wê weke beytên xezelê dihesibînin. Îca Hilmî Qoxî, ew weke cûreyê qesîdeyê bi nav kiriye. Ev helbest, bi van beytan dst pê dike:

*Dîsa ji nû işqa berê pur enderûn im ateş e
Zulxa muzeyyen 'enberî de'wa digel xala reş e*

*Xala li dêmê dilreva sed rûh û canim bin feda
Sotim gelo çûm tê nema terkîm kirin 'eql heş e*

*'Eql û heş im bûne esîr dunya gog e geh têtê bîr
Dêm şubheta bedra munîr zulfa ji werdê bîn xweş e*

*Werdan ji nîv zulfa derîn şu'la binevşê tê werîn
Bala û qedda 'er'erin heriayn li ser marê reş e*

*Dîsannî hey têt û diçît îhyayê emwatan dibît
Wechan mudam nûr jê diçît dêm şubhetê şem'a keş e*

*Şem'a şebistatanan ew e werda gulistanan ew e
Sirrê di bustanan ew e şoxa Herîrî dilgeş e*

*'Ecêb letîf û cindî ye ezman nizane rûmî ye
Ege ji 'işiqbazan niye mest û xumar û serxûş e*

*Serxûşê cama şerbetê dêm şubhê şem'a zulmetê
Horiya di baxê cennetê serdarê çendîn mehweş e*

*Mehweş go westan sef bi sef ew hate der Misrî di kef
Wan got 'Eliyo we la texef me bi mirdinê qewî xweş e'²⁰⁴*

²⁰⁴ Dîwana Camî', Berhevkar: Mela Ehmed Hilmî Qoxî ed-Diyarbekirî, Îhsan Yayınları, İstanbul, ?, r. 302-303.

2. 3. Dîwana wî

Ev behema wî, bi awayekî xweser neketiye destê me; bes dibe ku em wan her şeş helbestên wî tevî hev, weke dîwaneçeyekê bihesibînin.



METNÊ BI KRÎTÎK

1. Rêbaza Amadekirina Metnê

Me di vê beşê de nusxeya Zeynelabidîn Amedî esas girt û nusxeya destxet a Petersburgê pê re berawird kir. Aliyên wan ên ku li hev derketine û li hev derneketine, me diyar kir. Ji ber ku metnê vê berhemê bi awayekî devkî di nav gel de dihat vegotin, me jî di tehlîla metnê nivîskî de cî da guhertoyên/varyantên vê xezanameyê. Ji bo ku hin ciyên kêr û kurt ên metnê nivîskî tekûz bibe, me pêdivî bi berhevkirin û deşîfrekirina çend metnên devkî dît. Lewre me dît ku hin ciyên ku bi kêrî fêmkirina ji metnê nivîskî bibin, hene. Wekî dî, çawa ku tê zanîn, edebiyata Kurdî ya Îslamî, di nav Kurdan de, ji qedîmê zeman ve bi du hêlan ketiye geşedanê. Yek ji hêla hozanên gel ve; ya dî jî bi destê entelektuelên medreseyî û rayedarên resmî. Hozanên gel, li gor asta xwe, bi rengê edebiyata gelêrî, berhemên dînî-Îslamî dane; ehlê medreseyê jî, li gor awa û qaîdeyên edebiyata Îslamî berhem dane. Îca îcrakirina edebiyata gelêrî, bi awayê devkî bûye; îcrakirina edebiyata ehlê medreseyê jî, bi awayê nivîskî. Lewre me got li rex berhema edebiyata nivîskî, divê berhema edebiyata devkî jî hebe û me ew li vê xebatê zêde kir.

A) Rastnivîs û Xalbendî

Me li gor awayê ku îro di cîhana nivîsana Kurmancî de rayîşên rastnivîsê rûniştine, metnê xezanameya xwe nivîsî.

1. Me herfên serê rêzika bendê, bi tîpa girdek nivîsîn û me herfa pêşî ya wan navên taybet jî, bi herfa mezin nîşan dan.

49 **U**mer siwarek serbest e
 Ket û stû neşikeste
 Celew maye di dest e
 Kewran heyf lê dixweste

90 Hey hewara **S**elxûn e
 Rimî wekî stûn e
 Çi kafîrek mel'ûn e

91 Hey hewara **H**ovonîs e

Kafirek xûnalîs e
Kafir pê da li fêz e

85 Hey hewara **H**emze ye
Şûrhungîvek zêde ye
Kafir direv' wek se ye

86 Hemî hewara '**E**bbas e
Xudanê şûrê xas e
Kafir nebûn xilas e

2. Li ciyê ku axaftin/diyalog çê bûne, me nîşaneyê xalecotê (:) daniye û peyre jî me ew rêzika diyalogê kiriye nav nîşaneyê dunikê “....”

3 Muḥemmed deng hiltîne:
“Heçî Hespê Reş bîne
Qesrek ji min bistîne”

6 “Ew hespê te divêtin
Biçim ji bo te bînim
Min Cildû nevêtin”

7 ‘Umer e vedibîte
‘Elî ji xwe fihêt e:
“Min tiştêk nevête”

B) Kêş

Ji ber ku kêşa berhemê ne bi rêk û pêk bû, em zêde li ser kêşa wê nesekinîn û di transkrîpekirina metnê berhemê de pirsgirêka kêşê derneket hemberî me.

C) Alabeya Transkripsiyonê

Ji bilî çapa Varlı, Hemû nusxeyên destxet û nusxeyên çapkirî yê *Qewlê Hespê Reş*, bi alfabeya Erebî ne. Me ji bilî tîpa “q” “x”yê, tîpên dî ku di alfabeya latînî ya Kurdî de tune bûn, li gor alfabeya navneteweyî transkrîpe kirin. Alfabeya transkripsiyonê li jêrê ye:

ا : A a

ب : B b

پ : P p

ت : T t

ج : C c

چ : Ç ç

د : D d

ر : R r

ز : Z z

ژ : J j

س : S s

ش : Ş ş

گ : Ğ ğ

ف : F f

ق : Q q

ك : K k

ل : L l

م : M m

ن : N n

و : W w

ف : V v

خ : X x

ه : H h

ی : Y y

ی : Î î

ئ : Ê ê

Tîpên ku di alfabeya Kurdî de tune ne li jêrê ne:

ء : ‘

ث : Šš

ذ : Z z

ص : Ş ş

ض : Ž ž

ض : ë ð

ط : T t

ظ : Z z

ع : ‘

غ : Ğ ğ

ح : Ĥ ĥ

Daneberheviya Metnên Devkî

Çawa ku me li jorê, metnên destxeta Amedî û Petersburgê dane ber hev, di vê pêvekê de jî me dil heye ku em wan metnên ku me ji qewlbêjan girtine, bidin ber hev û ji wan, metnekî xweser derxînin. Ji bo vê yekê jî, metna ku herî zêde ji me re xweş hat, a Hecî Muhemed Erol bû. Lewre me bingeh girt û metnên jî –Abdullah, Şêx Nûrî Aslan û M. Emin Osman- li gor pêdiviyan, di jêrenotan de qeyd kirin.

Me ji metna qewlbêj *Şêx Nûrî Aslan* re herfa “N” îşaret daniye; *ji M. E. Osman* re herfa “S” daniye. Ji bo guhertoya metnê Muhemedê Holî jî, me herfa M daniye. Guhertoyeke wê ya devkî ku Dr. Abdurrahman Adak gihîştand ber destê me, ji aliyê Derwêş Mihemed ve, digel lêdana irbaneyê hatiye gotin. Me ji bo wê jî, herfa “D” daniye.

METNÊ HÎKAYEYA HESPÊ REŞ (BORÊ QER)*

Rêberê şerîet Muhemmed Mustefa ra selewat
Şefî'ulmuznibîn Muhemmed Mustefa ra selewat

Ya Ellahu ya ekber
Te çê kiribû Borê Qer
Xist destê kafîrê Lender

Pê hesiya gul Pêxember
Sellu 'ela Mueammed
'Ela ji 'alî Muhemmed

Dunya li min dunya bû

Ax kafîrek dînbetal bû

Hespê Reş wa li bal bû

Nebî Muhemmed pê 'elam bû²⁰⁵

Mecal ew mecal bû
Kafîrek dînbetal bû
Hespek çê li bal bû.

Selewat li canê Pêxember
Rojkî roja cim'ê ye
Ba kir gelî Eshaba

Bînin bînin wa bînin

* Digel Mustefa Xoceyê Cimika, me li Diyarbekîrê, li Medreseya Hecî Mihemed Elî Altundag, bi Seydayê Mela Zeynelabîdîn Amedî re roja 3ê Gulana 2014an, heypeyvînek pêk anî. Di vê hevdfîtinê de, wî destûr da ku ji boy teza xwe, destxeta wî bikim tîpên latînî. Mala wî ava be. Di vê xebatê de Nusxeya Z. Amedî esas hatiye girtin; nusxeyên dî jî pê re hatine berawirdkirin û zêdekirin. Ji bo nusxeya Petersburgê, tîpa "P" hatiye destnîşankirin.

²⁰⁵ Ev jî guhertoya Derwêş Miheme hatiye girtin.

Heçî Hespê Reş bo me bîne

Rewdek ji rewde²⁰⁶ Cennetê

Bi milkanî ji min distîne

Kî ji mi re Bor bigîne

Roja bû heşr û mehşer

Koşke Cennet bistîne²⁰⁷

Hespê di nêv kuffaran

Bi dil ew bû Musulman²⁰⁸

Muhammed pê ‘elam e.

Muhammed deng hiltîne: ²⁰⁹

“Heçî Hespê Reş bîne

Qesrek ji min bistîne.”²¹⁰

Eşhabî çil peter in

Hemî têk difikirin

Mêr ji mêran çêtir in

Sirran ji yek digirin.²¹¹

‘Umeru binu Xettab e²¹²

Kuşî da û bab e

Fîl halî da cewab e

²⁰⁶ Peyva “rewde” bi Erebî ye, wateya wê jî “baxçe” ye.

²⁰⁷ S: Çi şeveka eynî
Çi rojeka eynî
Muhammed deng heltînî
Heçî yê Hespê Reş bo min bînî
Qesrekê li beheştê li min bistînît

²⁰⁸ P: Bi dil musulman e.

²⁰⁹ S: Muhammed deng hiltîne
Heçî Hespê reş bo min bîne
Qesrekê li beheştê li min bistîne.

²¹⁰ P: Cildû ji min distîne.

²¹¹ P: Sirran ji yek dikirin.

²¹² P: ‘Umer ibn Xettab e.

Ne xêr ne sewab e
Ew şolekî sewab e:²¹³

Umerî rabûye
Cilê herbê hilaniye
Deşta û bêlan kar bûye
Navê Keşe zaniye
Zemanê wî tamam bûye

Ya Hebîbê Xudêwo
Tu bo min bibêwo
Hespê Reş li kê wo
Da bo te biçimêwo

“Ew hespê te divêtin
Biçim ji bo te bînim²¹⁴
Min Cildû nevêtin.”

Here lalê Qeşeyî
Ew li gel xwişkêwo
Evroke Îslam in
Tabiêt Hebîbê Xwedêwo
Here lalê Qeşeyî
Dê bi dest te ve hêwo

‘Umer e vedibîte
‘Elî ji xwe fihêt e:

²¹³ S: Dîwana Eşhaba
Ji çaka hel xeraba
Kesê neda cab e
Umer bin Xetab e
Kuştin day û bab e
Ne xêr e û ne xerab e

²¹⁴ P: Dê biçim ji bo te bînim.

“Min tişteke nevête”

Ez ê herim Bor ji Xeravbajar bînim

Li Medîne bi kar kim

Nebî Muhammed lê siwar kim

‘Umer sivik wek ba bû

Zû ji dîwanê rabû

Di xizmetê westa bû

‘Umer e rabû xweş e

Li puştê best terkeş e²¹⁵

Çû telbe Hespê Reş e

Bi çol û çolistanê

Li deşt û bi yabanê

Ajote şaristanê²¹⁶

Keşe ji qelban musilman e

Emer lê bû mêvan e

Ji xeynî Xaliq kes pê nizan e

Leymûnê sual kiriye

Way mêvano mêvano

Wa dest û ling ser seran o

Her mêvan ji me re bîne

Navê xwe ji me re dibêye

²¹⁵ P: Li puştê tîrkêş e.

²¹⁶ S: Hej da dolêt pan e

Çol û çolistan e

Berî û beristan e

Bi îzna yê Rehman e

Kol Qeşeyî bît mêvan e

Hinga mêvan ji nisleta kê ye

Ez ‘Emer im ‘Emer im
Xwedanê şemla zer im
Ez qasidê Pêxember im

Hatim Bor xwe kar kim
Bibim ji jorê qentar kim
Bibim Mekke û Medînayê
Nûr Muhemmed siwar kim

Ez im mîrê belav e
Geriya li şaristan e
Sual kirî punhan e
Li Keşe bû mêhvan e²¹⁷

Keşe ne li mal e
Keşe çûye bi dêrê ye
Heft sal e musluman e

Keşe ku çuhê xeber e²¹⁸
Merivê Pêgember e²¹⁹
Sed cara pê xeber e²²⁰

Qeşe ye û Qeşe ye
Melkîde û bavfile ye
Derî ji min veke ye

²¹⁷ N: Umer dada bi tîr û kevana
Ket çol û çolistana
Ketibû Geliyê Xerzana
Şevkî li Leymûnê bû mêvana

²¹⁸ P: Qeşe go çi xeber e.

²¹⁹ P: Merifê Pêgember e.

²²⁰ P: Sed cara bê xeber e.

Ku mēhvanê min hewce ye

Qeşe go: “Min divêtin

Mêvanê min bêtin

Navê xwe bibêtin.”

Ez ‘Umer im ‘Umer im

Kifşê ne bezer im

Qasidê Pêgember im

Hatî Hespê Reş kiryar kem

Be zêr û be mal kem

Da Muhammed lê siwar kem

Da di sûrê da diyar kem

Da bi sûrê da diyar kem²²¹

Go: “Navê min ‘Umer e

Kifş e ew ne bi der e²²²

Qasidê Pêgember e.”

“Hatim izharî kim

Sirra xwe guftarî kim

Hespê Reş geryarî kim.”²²³

Keşe gotî: “Bila ve

Buha zor û xav e

Çil tumin dirav e.”²²⁴

Qeşe derge vekiriye

²²¹ N: Wezê wurgî Umer im
Xwedanê bi şemla zer im
Têcirê Borê Qer im

²²² P: Kifş e ne bi zer e.

²²³ Ciyê vê komerêzê, di ya Petersburgê de guheriye.

²²⁴ Ev komerêz di ya Petersburgê de tune ye.

Îmam lê mêvan bîye
Ew bibît rûspî ye

Mêvanê min hatiye
Dixwe parek taştê ye
Esl û fêslê xwe dibêye
Em zanin ji nesla kê ye

Ez rabim bi feqîrî
Dê çîn bi êxsîrî
Dê çîne lalî Mîrî

Go: “Hiş e Mîr dibihîtin
Serê te dibirîtin²²⁵
Zêr û malê diçîtin.”²²⁶

Ka Mîrî çî gote
Heke wî Hespê Reş firote
Ku Hespê Reş bo te

Go: “Ez ‘Umerê sor im
Şîrê²²⁷ merteb ji jor im²²⁸
Ji serê xwe dibûrim
Di Hespê Reş nabûrim.”²²⁹

Weqtê welê gotiye

²²⁵ P: Serî dibirîtin.

²²⁶ P: Zêr û mal diçîtin.

²²⁷ Bêjeya “şîr” ji “şûr” re hatiye gotin. Di devoka Behdînanê de ev bêje wisan hatiye nivîsîn. (Notê amadekar)

²²⁸ P: şîrê murettab jor im.

²²⁹ S: Ez umer im Umer im
Kifşê ne bezer im
Qasidê Pêgember im
Hatî Hespê Reş kiryar kem
Be zêr û be mal kem
Da Muḥemmed lê siwar kem
Da di sûrê da diyar kem
Da bi sûrê da diyar kem

Hêja Keşe rabûye
Digazine digiriye
Dua ji Xuda xwestiye

Keşe go: “Pa çi gotin e²³⁰
Ser û malê di min e²³¹
Hemû têkî biçine²³²

Ser'im bi serê te ra
Mal'im bi malê te ra
Çêr'im bidin ji xwe ra²³³
Keşe ye barê şer ra.”²³⁴

Qesda qeral kiriye
Wan Cindî ye Cindî ye
Va mêvanek Huseynî ye
Heft bar zêr wî aniye
Têcirê Borê Qer e
Qasidê Pêxember e

Weqtê welê gotiye
Çavê qeral sor bûye

Bînin bînin bînin
Biste û kelbetanan bînin
Meşgule mey hilînin

²³⁰ P: Qeşe go ya pa digotine.

²³¹ P: Ser û malê min e.

²³² P: hemî têk biçine. Qenaeta me pê ew e ku rêzik bêhtir rast e.

²³³ P: Çi rê'im nadin ji xwe ra

²³⁴ P: Qeşe ye yarê şera.

Da qe ne Keşe bibim
Keşe bigre û bişewtînim

Keşe keçek çê li bal bû²³⁵
Ciwaneke bikemal bû
Enî ji text û xal bû
Navê ewê Leymûn bû²³⁶

Leymûn e xwe Leymûn e²³⁷
Sirr li wê zahir bûne²³⁸
Mîn daye bi yeqîn e
Here ji bo xwe bîne

Leymûnê bi libas ke
Bi kefî û kiras ke²³⁹
Mihvan'im tu xelas ke²⁴⁰

Keşe birayê Mîr bû²⁴¹
Lê Lendeho²⁴² wezîr bû²⁴³
Pir ew ji wî tedbîr bû²⁴⁴
Hero dîwana Mîr bû

Keşe rabû meşiya
Gurmîn ket Rehmaniya

²³⁵ P: Keşe keçek çê li bal bû.

²³⁶ N: Leymûnê ha Leymûnê
Şekirkî bi tevî rûnê
Gulî ji qurmê stûnê
Sir jê zahir dibûnê

²³⁷ P: Leymûn e Leymûn e.

²³⁸ P: Sir lê zahir bûne.

²³⁹ P: Bi kefî kiras ke.

²⁴⁰ P: Mihvan'im xelas ke.

²⁴¹ P: Qeşe birayê Mîr bû.

²⁴² Di nusxeya Mela Nadirê Erdîşê ku ji aliyê A. Varlı ve çapa wê hatiye kirin de ev nav, bi awayê "Lendo" derbas bûye. (r. 462)

²⁴³ P: Lendeho wezîr bû.

²⁴⁴ P: Bi ra û tedbîr bû.

Sibe ye sibe ye zû ye
Çûn bo dîwana Mîrî ye
Wî hesp jê xastiye
Beyan nekiriye

Mîr rabî deng heltînît
Heçî Hespê Reş rabît bînît
Teng û zîna lê bişidînît
Sê meydanê bibeziînît
Qet çirqekî naînît

Têcirkî Muhemmediyan hatiye
Li hespê Mîr pirsîye
Heqîbek zêr û zîv aniye
Bi zêr û zîv qeyar ke
Ji te ra kar mayîye

Keşe weled hebû ne²⁴⁵
Sivik in wekî ko ne
Bi dîwanê ve diçûne

Ew dîwana koran e²⁴⁶
Kafir tê da westa ne²⁴⁷
Lendeh û Keşe bira ne²⁴⁸

Weqtê welê gotiye

Pa Umer pê hisîye

Cil herbê hilaniye

²⁴⁵ P: Qeşe weled hebû ne.

²⁴⁶ P: Dîwana koran e.

²⁴⁷ P: Kafir têr westa ne

²⁴⁸ P: Lendeh û Qeşe biran e.

Qesda qeral kiriye
Tibê li qeral dayiye
Way sondêlê Cindî ye

Hatim Bor bazar kim
Bibim qenter kim
Bibim Mekke û Medînayê
Nûr Muhemmed siwar kim

Heke tu bi xweşî bidî
Tu rabe bi xweşî bide
Heke tu bi xweşî nadî

Pût û seneman diqulbînîm
Bi quweta şûr ji te distînîm
Li çavê te naniqînîm

“Mîrê” m mêvanek bo Keşe hat Qureyş e²⁴⁹
Mecnûn e bête pêş e
Hespê Reş kit teftêş e!²⁵⁰

Weqtê welê gotiye
Deqa çavê qeral teqiye
Umer li wî rabiye
Ber derî sekiniye
Pehîn li derî dayiye
Deriyê hespê şikandiye
Hirmîn bi Bor ketiye

²⁴⁹ P: Mîrê’ m mêvanek e ji Qeşe ra hatiye Qureyş e.

²⁵⁰ P: Hespê Reş dikit teftîş e.

Dewr û Yasîn xwendiyê

Ya Umero ya Umer

Ya xwedanê bi şemla zer

Dayne ser min zînê zer

Li min siwar be bi xweber

Bê ya Ellahu ekber

Ha tu dibînî digihîm yekser

Umerul farûq çû li derê Bor xistiye

Bor bi zimanê peyiviye

Ya Umerul Farûq va heft salê mi li paş derî ye

Ji bo Nebî Muhemmed sekinî me bi ‘eynî ye

Mora Muhemmed Pêgember bîr kiriye

Wê çaxê du rekaet nimêj kiriye

Destê xwe li dîwana Rebbil ‘alemîn vekiriye

Îmdad xwestiye hezretî Cebraîlê Emîn mor aniye

Hespê Reş çawa we derket

Kes neşêt xu nêzîk ket

Dê xelkî hilak ket

Ewa got qeydî nîye

Îmamî lezandiye

Bi Kelê serkeftîye

Ew çûbû serî ye

Bor ji tewlê kişandiye

Zînê zer li ser daniye

Ew û Keşe û Leymûnê siwar dibin bi ‘eynî ye

Meydankî duduya çûye

Umer e Umer e

Kifşê ne be zer e

Ez rojê dikujim çil mêter e

Ku alîkê bo min dikene ber e

Eşqa Pêgember e

Min mêje ev sefer e li ber e

“Keşe birayê min e²⁵¹

Hinkî ferik û bi fenn e²⁵²

Bigrin wî bikujin²⁵³

Dujminê serê min e

De’wayê hespê min e

Lez kin û bilezînin!

Kêrana²⁵⁴ biçerxînin!²⁵⁵

Xewlanî jê’b derînin!

Kêrê dem û kar kirin!”²⁵⁶

Bînin bînin bînin

Biste û kelbetanan bînin

Meşgule mey hilînin

Da qe ne Keşe bibim

Keşe bigre û bişewitînim

²⁵¹ P: Mîr go Qeşe birayê min e.

²⁵² P: Hinek virrek û bi fen e.

²⁵³ P: Bigrin bikujin.

²⁵⁴ Ev bêjeya “kêrana” muhtemelen bi wateya “kêr”ê ye.

²⁵⁵ P: Kêran biçerxînin.

²⁵⁶ P: Kêrê kar û kar in.

Ji serî heta xwar e
Bigrin hûn tev yek car e²⁵⁷

Lendeho got: “Qet venabin²⁵⁸
Qasid ji xû terxan in
Di nêv me ew ji wan in²⁵⁹
‘Amî pê dizanin
Xelat li ser milan in.”

Ku hespê te bidêtin²⁶⁰
Kuştî çil Mêter²⁶¹ e
Ew xwe jixwe ‘Umer e

Demê we gotiye
Îmamî lezandiye
Evra jî beziye
Wekî teyrê bazî ye

Weqtê welê gotiye
Pa Umer pê hisiye
Cil herbê hilaniye

Qesda qeral kiriye
Tibê li qeral dayiye
Way sondêlê Cindî ye

Hatim Bor bazar kim

²⁵⁷ P. Bigrin hûn yek car e.

²⁵⁸ P: Lendeho go Mîr’im qet venabin.

²⁵⁹ P: Di nêv me wan in.

²⁶⁰ P: Ku hespê te bidet re.

²⁶¹ Di çanda ayinî ya Filehên ermenî de, bi navê “metran” zilamên dîn hene. Di kilameke bi navê “Metran Îsa û Eli” ya dengbêjên welat de, navê vê bêjeyê derbas dibe. dengbêj Hecî Mihemedê Xato vê kilamê distrê û li ber destê min heye. (Notê transkrîpekiro)

Bibim qenter kim

Bibim Mekke û Medînayê

Nûr Muhemmed siwar kim

Heke tu bi xweşî bidî

Tu rabe bi xweşî bide

Heke tu bi xweşî nadî

Pût û seneman diqulbînîm

Bi quweta şûr ji te distînîm

Li çavê te naniqînîm

Weqtê welê gotiye

Deqa çavê qeral teqiye

Umer li wî rabiye

Ber derî sekiniye

Pehîn li derî dayiye

Deriyê hespê şikandiye

Hirmîn bi Bor ketiye

Dewr û Yasîn xwendiye

Ya Umero ya Umer

Ya xwedanê bi şemla zer

Dayne ser min zînê zer

Li min siwar be bi xweber

Bê ya Ellahu ekber

Ha tu dibînî digihîm yekser

Ewî hesp baş girtiye
Ser piştê keftî ye
Bi bircê Kelê da hatiye

Weqtê welê gotiye

Qeyd û nelbend şikandiye

Wî li Borî siwar biye

Ser sûrê ra firiye

Li mala Keşe daniye

Metran çi dehşet e
Girê dan ber û pişt e²⁶²
Bi dev û pîn dikuşt e

Hespî tu wî dizanî²⁶³
Kuştî çil xubanî²⁶⁴
Xasma ewî beyanî²⁶⁵

Weqtê di wî bibînî²⁶⁶
Divê tê derbitînî²⁶⁷
Bi talan dişeqînî²⁶⁸
Zêr û mal bo me dinûnî²⁶⁹

Mêrê qewî kerem bû²⁷⁰
Bi wan çêranê nerm bû²⁷¹

²⁶² P: Gêran ber û pişt e.

²⁶³ P: Hespî tu pê dizanî.

²⁶⁴ P: Kuştin çil xuyanî.

²⁶⁵ P: Xasxma ew beyanî.

²⁶⁶ P: Weqtê wî bibînî.

²⁶⁷ P: Divê tê dertînî.

²⁶⁸ P: Bi nalan dişivînî.

²⁶⁹ P: Zêr û mal bo me dimînî.

²⁷⁰ P: Mêrê kuran qewî kerem bû.

Rû lê zer û sor bû²⁷²

Go: “Herin bila bêtin²⁷³

Eger didêrî bêtin²⁷⁴

Bila zêr lê bikîtin²⁷⁵

Li meydanê bidêtin²⁷⁶

Herwe ji bo xwe bîtin²⁷⁷

Eger ew dê newêrî²⁷⁸

Celladê wî hazir î

Dê xwe li ku veşêrtin.”²⁷⁹

Keşe dibû yoldaş in²⁸⁰

Bi kenî û temaş in

Ji dîwan çûne paş in

Xeber bîr ew yoldaş in²⁸¹

Go: “Hey hote hey hote!

Mîrê me qenc gote!

Hespê di xwe firote!

Çûye beha negote!

Em şerker in ji bo te!”

Umerî digel Keşe²⁸²

Hêlîna wan Ter Keşe²⁸³

²⁷¹ P: Bi wan çêran nzim bû.

²⁷² P: Rû lê sor û zer bû. Diyar e ku rêzika rast ev e û rêzika Amedî bi awaykî dî ye.

²⁷³ P: Go herin bêjinê bila bêtin.

²⁷⁴ P: Eger diwêritin.

²⁷⁵ P: Bila zîn bikîtin.

²⁷⁶ P: Li meydanê ling bidetin.

²⁷⁷ P: Herwe ji bo xwe bibîtin.

²⁷⁸ P: Eger dê newêrî.

²⁷⁹ P: Dê xwe li ku veşêrî.

²⁸⁰ P: Qeşe û yoldaş in.

²⁸¹ P: Xeberbir oldaş in.

²⁸² P: Umerî gel Qeşe.

²⁸³ P: Hêlîna ter Qeşe.

Meşiya Hespê Reş e

‘Umer e çû kolanê

Hespî li tewlexanê

Ew xweş dihat cewelanê²⁸⁴

‘Umer çûye ji der da²⁸⁵

Yasîn xwendî jiber da

Borî digel xeber da:

Go: “Borî ber ke lêvûd

Tu çû min binyûd

Muhammed çaver yûd.”²⁸⁶

Hespê Reş ber Kelêwo

Borê Reş ber kelêwo

Bereketa Xudê lêwo

Tu bo min çi nebêwo

Te bem bo Hebîbê Xudêwo

Umerul farûq çû li derê Bor xistiye

Bor bi zimanê peyiviye

Ya Umerul Farûq

Va heft salê mi li paş derî ye

Ji bo Nebî Muhammed sekinî me bi ‘eynî ye

Mora Muhammed Pêgember bîr kiriye

Wê çaxê du rekaet nimêj kiriye

Destê xwe li dîwana Rebbil ‘alemîn vekiriye

Îmdad xwestiye hezretî Cebraîlê Emîn mor aniye

²⁸⁴ P: Xweş hate cewelanê.

²⁸⁵ P: Umer çû ji der da.

²⁸⁶ Ev bend tenê di destxeta Petersburgê de hebû.

‘Umer hesp anî der e²⁸⁷

Lê kirî zînê zer e²⁸⁸

Şidandî teng û ber e

Li puştê ket ‘Umer e

Bor ji tewlê kişandiye

Zînê zer li ser daniye

Ew û Keşe û Leymûnê siwar dibin bi ‘eynî ye

Meydankî duduya çûye

Çend seran digêrîne

Li hespê dixurîne

Li ser sûrê difirîne

‘Umer siwarek serbest e²⁸⁹

Ket û stû neşikeste

Celew maye di dest e

Kewran heyf lê dixweste

‘Umer hesp da meydanê

Yek bû li wî Sen’anê

Xeber be li Kewranê²⁹⁰

Keşe ê Muslimanê²⁹¹

Leymûnê şerkî çer kir

Hem şer kir hem sefer kir

Wan Leymûn û Keşe şehîd kir

²⁸⁷ P: Umer hesp îna der e.

²⁸⁸ P: Lê kir zînê zer e.

²⁸⁹ P: ‘Umer siwarek serbest e.

²⁹⁰ P: Xeber bir Kewranê.

²⁹¹ P: Qeşeê musulmanê.

Li Kewran bû hewar e
Ji burcan hate xwar e²⁹²
Digel Keşeyê qal e²⁹³

Umer çû wekî têz e
Kafir dû wî bîn rêz e
Term kirine hevêz e

Keşeyî şer bi şîr²⁹⁴ kir²⁹⁵
'Umerî şer bi tîr kir
Meydan ji xûnê têr kir

Keşe şerekî zor kir²⁹⁶
Bi misriyê muhur kir²⁹⁷
Meydan ji xûnê sor kir

'Umer şerekî xweş kir²⁹⁸
Bi tertîb û bi şeş kir²⁹⁹
Meydan tijî wî leş kir³⁰⁰

Ew Keşeê wehîd e³⁰¹
Mertebe wî tewhîd e³⁰²
Kewranê kir şehîd e³⁰³

Kewran û hem firenkan³⁰⁴

²⁹² P: Ji burcan hatine xwar e.

²⁹³ P: Mewir û Qeşey qal e. Ev kelîmeya "qal" diyar e ku bi Kuranciya îro, jê re dibêjin "kal" ango pîr.

²⁹⁴ Ev bêjeya "şîr" di wateya "şûr" ê şer de ye. Li gor devoka Behdînanê, ev bêje wiha hatiye bilêvkirin û nivîsandin. (Notê transkirîpekîrox)

²⁹⁵ P: Qeşey şer bi şîr kir.

²⁹⁶ P: Qeşe şerekî zor kir.

²⁹⁷ P: Bi misriyê muhur kir.

²⁹⁸ P: 'Umer şerek xweş kir.

²⁹⁹ P: Bi tîrê şeş kir.

³⁰⁰ P: Meydan tijî leş kir.

³⁰¹ P: Qeşeê wehîd e.

³⁰² P: Mertebe tewhîd e.

³⁰³ P: Kewran kir şehîd e.

Rim dane binê çengan³⁰⁵

Kafirani lê da deng e

Şer kefte cê teng e

Dest hilînin, me dereng e

Ciyek bi kûr û av bû

Hespê di Reş wî xam bû³⁰⁶

‘Umer jê bixû bin av bû³⁰⁷

‘Umerî dî wê carê

Dêrek li ber wî warî³⁰⁸

Qesd kiriye çû diyarî³⁰⁹

‘Umer çû bi deştê da

Dêrek dî wî di rê da³¹⁰

Çil Rahib in wî tê da³¹¹

Go: “Rebeno miraro”³¹²,

Ji Dêrê were xwaro,

Me di Dêrê hesaro!”³¹³

Senem e û senem e

Dê derî li min vekeme

Ez mêvan im yê hewce me

³⁰⁴ P: Kewran û firengan.

³⁰⁵ P: Rim dane bin çengan.

³⁰⁶ P: Hespê di Reş rê xam bû.

³⁰⁷ P: ‘Umer dî bi xunav bû.

³⁰⁸ P: Dêrek wî li berwarî.

³⁰⁹ P: Qesd kir çû diyarê.

³¹⁰ P: Dêrek dî di rê da.

³¹¹ P: Çil reben wî tê da.

³¹² Muhtemelen, dê ev peyva “miraro” ji peyva “metran”o rastî xerabûneke dangan hatibe. Çunkî di guhertoya Derwêş Mihemed de, peyva “metran” bi awayekî tekûz derketiye.

³¹³ S: Evro Îmamî lezandiye

Şer bi tîrê kiriye

Di Dêrê da asê bîye

Dora wî girtiye

Kewran kola cînûn e³¹⁴
Lez ke û bilezîne³¹⁵
Hesar di Dêrê da nîne
Dêrê me pir ‘asê ne³¹⁶
Hesar ji bo tunîne.”³¹⁷

‘Umerî ew sermest e
Hilîne her du dest e
Du‘a ji Xudê dixweste³¹⁸
Derê Dêrê şikeste³¹⁹

‘Umer bi xwe û hespê ve
Her du çûn bi Dêrê ve³²⁰
Dî çil Rahib di nêv e³²¹

‘Umer şolekî çê kir
Serê çil Rahibî jê kir³²²
Derê Dêrê ‘asê kir³²³

Têpêtê Kewran hatin³²⁴
Li dor Dêrê wer hatin
Li hev û dû gerandin³²⁵

³¹⁴ P: Kewran kola çî nûn e.

³¹⁵ P: Lez k û bilezîne.

³¹⁶ P: Dêra me asê ye.

³¹⁷ S: He siyaro yê la çiwîno
Hoçîka nehejîno
Eve Dêra Şileyimîwîno
Dêra min ya miskîno
Cihê şera lêre nîno

³¹⁸ P: Du‘a ji Xwedê xweste.

³¹⁹ S: Umer rast raweste
Dest danane ser dest e
Duayek li Xudê xaste
Dora derî şikeste
Wî hesp pê ve beste

³²⁰ P: Her du çûn bi Dêrê ve.

³²¹ P: Dî çil reben di nêv e.

³²² P: Serê çil rebenî jê kir.

³²³ P: Derê Dêrê pê asê kir.

³²⁴ P: Têpêt Kewran hatin.

Têpêtê Kewran tîne
Li dor Dêrê westîne
..... xêrê tîne³²⁶

Hehecika ser hêlînê
Nikûlsorê bi xwînê
Vî kaxîzi bibe Mekke û Medînê³²⁷
Bibe li ser çoka Îmam Elî dêne.³²⁸

Kelkêtê di tarînê³²⁹
Çûkanê li hêlînê
Dev sor bûye ji xûnê
Cewab çûye Medînê
Eşhaban got: “Biçûnê³³⁰

Kulekêt di teng e
..... tên wekû tifeng e
Pê digerin fireng e

Înê heta îinê

³²⁵ P: Li hevdu gerandin.

³²⁶ Ev rêzik, ji aliyê serê satirê ve neketiye ber xwendinê. Muhtemelen Z. Amedî jî nekariye bixwîne; lewre di nusxeya xwe de cî nedaye wê.

³²⁷ S: Çîçîkê ser hêlînê
Bazê ser xezînê
Tu pera ter ke li xwînê
Cabê bibe Mekke û Medînê

³²⁸ S: Ewî lezandiye
Çû Mekke û Medîna rûniştiye
Nêzkî derê mizgeftê
Ew hêdî bi jor keftiye

N: Umer Bor dibe li dêrê asê dikiye
Ew hehecika ser hêlînê
Vî kaxîzi bibe Mekke û Medînê ye
Ew kaxiz dibe li ser çoka Hezretî Elî datîne ye

³²⁹ P: Kulekêt di tar. Kelîmeya “kulekêt” bi qenaeta me, ji peyva “kulek”ê tê û wateya wê, ew ciyê ku duxanê ye ku pixêrî û kuçikên zemanê berê di quncikekî xaniyan de habûn û dumana wan tê de derdiket derve.

³³⁰ M: Hehecika ser hêlînê
Nikûlsorê bi xwînê
Vî kaxîzi bibe Mekke û Medînê
Bibe li ser çoka Îmam Elî dêne.

Çûka li hêlînê
Sor bûye ji xûnê
Cewabê bibe Medîne
.....haban³³¹ go da biçinê.”³³²

Wan go: “Hêj ‘Umer xweş e³³³
Bi tîr û bi terkeş e
Li puşta Hespê Reş e.”

Eşhab rabûn xas û ‘am³³⁴
Hemî tîk hejînan e
Da biçîne tewlan e³³⁵

Elî ba dîke Henîfa Romî ye
Dibê tengê Duldulê bişdîne bi ‘eynî ye
Umerul Farûq Bor aniye li dêrê asê kiriye îmdad xwestiye
Henîfa Romî navtengê Dildilê dişdîne
Du parsûyên wê şikandiye bi ‘eynî ye

Bi gurzan û bi xeylan³³⁶
Puf kirine nefîran
Hatine Şahê Mîran
Jê bibînin îxsîran³³⁷

Îmamî ya hinartiye
Yê li Dêrê da asê bîye
Derê mefer nîne

³³¹ Ji komerêza piştî vê qit’eyê diyar dibe ku ev cîyê ku di destxetê de derneketiye, bêjeya “Eşhaban” e.

³³² S: Ewî lezandiye
Çû Mekke û Medîna rûniştiye
Nêzkî derê mizgeftê
Ew hêdî bi jor keftiye

³³³ P: Eşhaban go hêj Umer xweş e.

³³⁴ P: Eşhab rabûn xas û ‘am e.

³³⁵ P: Da biçîne tolan e.

³³⁶ P: Kewran bexîlan.

³³⁷ P: Jê bînin îxsîran.

Ew Dêra Şileymiwîn e³³⁸

Evro tê da asê bîye

Lez kin û bilezînin

Bi zincîran hûn bînin³³⁹

Li dor Dêrê werînin

Çar kenar ser hilînin

‘Umer ji nav derînin

Dê biçin ser Medîne³⁴⁰

Nehêl bibe hewarê³⁴¹

Bikirine da talanê

Eshaban kirin birîn³⁴²

Rimêd qesebe bînin

Ku’ d hatin da biçînin³⁴³

Yaderê Muslumanan

Bezîne cebexanan

Bînin silahêd şêran³⁴⁴

Cebhexane vekirin³⁴⁵

Xure zere dibirin

Di ber xû û hespan dikirin

Koma selewatiyan e³⁴⁶

Alay li ber ketî ne³⁴⁷

³³⁸ Dirûvê vê peyva “Şileymiwîn” dide peyva “Şelmo”.

³³⁹ P: Zincîran hûn bînin.

³⁴⁰ P: Biçin ser Medîne.

³⁴¹ P: Nehêlin bîn hawarê.

³⁴² P: Eshaban go serhan e birînê.

³⁴³ P: Ku dihatin wa biçîne.

³⁴⁴ P: Bînin silahêd şêran.

³⁴⁵ P: Cebhexane vekirin.

³⁴⁶ P: Koma selewetîn e.

Sed selewat li Nebî ne

Koma kesk û sor û zer
Eshaban dî ketne ber
Ew birayê Pêgember³⁴⁸

Eshabe wî dihatin³⁴⁹
Kafir ji ber hilatin
Xudanê bût û Lat in³⁵⁰

Eshabê vê Qubîn³⁵¹ e
Kafir ji ber hiltîne
Dikevin sef dişkîne³⁵²

Hey hewara Hemze ye³⁵³
Şûrhungîvek zêde ye
Kafir direv' wek se ye³⁵⁴

Hemî hewara 'Ebbas e³⁵⁵
Xudanê şûrê xas e³⁵⁶
Kafir nebûn xilas e³⁵⁷

Hemî hewara Ebûbekir e³⁵⁸
Şêr e wekû Emîr e³⁵⁹

³⁴⁷ P: Ala li ber ketî ne.

³⁴⁸ P: Birahê Pêgember e.

³⁴⁹ P: Sehavî têne.

³⁵⁰ P: Xudanê bût û Lat in.

³⁵¹ Ev bêje, heman weke navê navçeya Bişêriye bi xwe ye. Ev navçe, li ser şehrê Batmanê ye. (Notê transkrîpekirox)

³⁵² P: Dikevin sett û dişkîne.

³⁵³ P: Hevheva 'Hemze ye.

³⁵⁴ P: Kafir direvin wekî se ye.

³⁵⁵ P: Hevhewa Ebbas e.

³⁵⁶ P: Xudan şûrê almas e.

³⁵⁷ P: Kafir kirine xas e.

³⁵⁸ P: Hevhewa Ebûbekir.

³⁵⁹ P: Şîrîn e wekî şekir.

Ewî xweş xwe du ta kir³⁶⁰
Di kom da kom ber ba kir³⁶¹

Hemî hewara ‘Usman e³⁶²
Her di dev de Qur-an e³⁶³
Xudanê şûrbirran e³⁶⁴
Kafiran kir eman e³⁶⁵

Demê Mîrî zaniye
Qeşey bigrin bi tamamî ye
Şevê dî mêvanê wî ye
Ew Qeşe digel haniye
Navê Qeşey Mîd e³⁶⁶
Qeşe kir şehîd e

Hey hewara Selxûn e³⁶⁷
Rimî wekî stûn e³⁶⁸
Çi kfirek mel‘ûn e

Hey hewara Hovonîs e³⁶⁹
Kafirek xûnalîs e³⁷⁰

³⁶⁰ P: Ewî xu du ta kir

³⁶¹ P: Li komê ra kom ber ba kir.

³⁶² P: Hevhewa ‘Usman e.

³⁶³ P: Her di devî Qur-an e.

³⁶⁴ P: Xudanê şûrê pan e.

³⁶⁵ S: Çi hewwa Umer e
Dest da şîrê zer e
Kafir dane ber e
Çi hewwa ‘Usman e
Şîr kêşa ji kavilan e
Radiket qesabxane

Evro Cennet erzan e

³⁶⁶ Li gor ku Qewlbêj Mihemedê Holî diyar dike, Keşe ku bûye muslim, navê xwe daniye “Mihemed Seîd” ev peyva “Mîd” dişibe kurtebêjiya wî.

³⁶⁷ P: Hevhewa Şelmûn e.

Li gor destxet û guhertoyên devkî, ev bêjeya “Selxûn” a destxeta Amed, ji binî xelet e; çunkî di hemûyan de ev bêje, bi awayê “Şelmo/Şelemûn” hatiye.

³⁶⁸ P: Rim wekî stûn e.

³⁶⁹ P: Hevhewa Hovanîs e. Di nusxeya Mela Nadirê Erdîşê ku ji aliyê A. Varlı ve çapa wê hatiye kirin de ev nav, bi awayê “Honoso” derbas bûye. (r. 474)

Kafir pê da li fêz e

Hey hewara Bextiyar e³⁷¹

Ji wir da hate xwar e³⁷²

Çi kafîrek pir har e³⁷³

Hey hewara wî Nezir e³⁷⁴

Wî di destanî tevr e³⁷⁵

Hat navê Pêgember e³⁷⁶

Hey hewara Ferfûr e³⁷⁷

Di destê wî da şûr e³⁷⁸

Çi kafîrek stûr e

Hey hewara ‘Elî ye³⁷⁹

Li Duldulê Spî ye³⁸⁰

Di komê da firîye³⁸¹

Wekî ew dê ‘Umer e³⁸²

Ji Dêrê biçine der e

Kafir û Muhammed’yan şer e³⁸³

³⁷⁰ P: Çi kafîrek pûxalîs e.

³⁷¹ P: Hevhewa Bextiyar e.

³⁷² P: Jor da hate xwar e.

³⁷³ P: Çi kafîrek har e.

³⁷⁴ P: Hevhewa Nezir e.

³⁷⁵ P: Vi di destan tevr e.

³⁷⁶ P: Hate Pêgember e.

³⁷⁷ P: Hevhewa Ferfûr e. Di nusxeya Mela Nadirê Erdîşê ku ji aliyê A. Varlı ve çapa wê hatiye kirin de ev nav, bi awayê “Feyfur” derbas bûye. (r. 478)

³⁷⁸ P: Di destî da şûr e.

³⁷⁹ P: Hevhewa ‘Elî ye.

³⁸⁰ S: Çi hewwa Elî ye
Dest havêt misrî ye
Zulfiqar kêşaye
Dikujît dînbeciwî ye

³⁸¹ P: Di komê firî ye.

³⁸² P: Wer dibê ya ‘Umer e.

³⁸³ P: Kafiran digel Muhammed şer e.

Sehabiyan evro lezandiye

‘Hecî yê ku pê çê bîye

Hemiyan hucûm kiriye

Ewî bi ser keftiye

‘Elî û ‘Umer in

‘Elî û ‘Umer heyran tên

Nirênît van şêran tên kolbêbit va kafiran tên

‘Umer ji Dêr hate der³⁸⁴

Li Bor şidand teng û ber³⁸⁵

Li ser puştê ket ‘Umer³⁸⁶

‘Umer ji wur da têtin³⁸⁷

Ferfûrî davêtin

Çendî wî dî dixeb’tin³⁸⁸

Gaziya wan mêran tê³⁸⁹

Nirrênê wan şêran tê³⁹⁰

Ev xebera ji ku tê

‘El’yê Herîr jî sotê

‘Umer û gel Eshaban³⁹¹

Wan kafiran dibizdand³⁹²

Piştberê me wergerand³⁹³

Xaç û peyker di destan d’³⁹⁴

³⁸⁴ P: Umer ji Dêrê hate der e.

³⁸⁵ P: Li Borî şidand teng û ber e.

³⁸⁶ ...ştê ket Umer e.

³⁸⁷ P: Umer jor da têtin.

³⁸⁸ P: Çendî dî dixistin.

³⁸⁹ P: ...zî mêran tê.

³⁹⁰ P: Nirrênê şêra tê.

³⁹¹ P: Umer û Eşhaban kafir dibizandin.

³⁹² Ev rêzik, berdewamiya rêzika jorê ye.

³⁹³ P: Li pişberî mermer werdigerandin.

³⁹⁴ P: Xaç li tewlê şidandin.

‘Elî kafîr dibirrîn³⁹⁵

Di çil çîyan wer kirîn³⁹⁶

Xaç ji xûnê çê kirin

Ewrekî reş î tarî

Baranek jê dibarî

Bo sonda ‘Elî û ‘Umerî³⁹⁷

Şehîdêd Huneyn û Bedrî³⁹⁸

Qed temmet 2 Cemaziyel Axir, 1423 hicrî; 11 Agustos 2002 miladî nivîsandina vê menzûmeya feydedar û mufîd li ser destê Zeynelabidîn Amedî.

³⁹⁵ P: Elî kafîr dibirin.

³⁹⁶ P: Di çil çîyan wer dikirin.

³⁹⁷ P: Sond nekeve li Umer û Elî.

³⁹⁸ P: Ji şehîdêd Deşta Bedr û Huneyrê ra Fatîhe.

ENCAM

1. Digel ku bi awayekî tamamî nebe jî, i xêra çavkaniyên ber destê xwe em gihîştin wê qenaetê ku Elî Herîrî di sedsala XVIan de jiyaye û wî berhemên xwe di salên 1500î de daye.
2. Helbestên wî yên ku ji hev bela wela ne, zêdetir di teşeyê xezelan de ne.
3. Me du nusxeyên *Qewlê Hespê Reş* da ber hev û ev her du nusxe jî, weke destxet bûn. Me ew nusxeyên çapkirî ku bi berhema Elî Herîrî re nehatibû nisbetkirin, bi van her du nusxeyên wî re berawurdî nekirin.
4. Her du nusxeyên destxet ên *Qewlê Hespê Reş*, ji hêla rêzbandên xwe ve tamam û tekûz nîn bûn. Çunkî hin ji rêzbandên wê yekrêzî, durêzî, hin sêrêzî, hin çarrêzî û hin jî pêncrêzî bûn. Her wiha di nav vegotina mijaran de valahî hatin dîtin.
5. *Qewlê Hespê Reş*, bi cûreyê xwe yê edebî, xezanameyeke menzûm e ku ji nav gelê Kurd, di serdema edebiyata Îslamî de, weke metnekî dînî derketiye. Hilberînerê wê yê eslî, ne diyar e; anonîm e. Her çendî hin kesên edîb û edebiyathez weke nusxeyan ew nivîsandibin jî, em nikarin wê weke berhemeke nivîskî ya xasî bi yek edîbekî tenê ve qebûl bikin.
6. Esl ji bûyera vê xezanameyê re hebe jî, ji ber ku vegotina wê li ser bingeha awayê devkî ye, kîjan vegoterî, li kîjan deverê ew vegotibe, wî hin motîfên herêma xwe lê zêde kirine û bivê nevê, ji rastiya xwe ya dîrokî dûr ketiye. Heta hin derbirînên dijberî ayetên Qur'anê, hedîsên Cenabê Pêxember û huqûqa Îslamê tê de hene.
7. Piştî vê xebatê, li gor qenaeta me, kesê ku ev xezaname bi terzê edebiyata nivîskî kiriye berhemeke klasîk, Elî Herîrî ye.
8. Di vê berhemê de hin motîfên mîtolojîk û neteweyî yên Kurdî jî di hemû nusxeyên wê de hene. Tişta herî balkêş ê vê xezanameyê ew e ku vegoterên xezanameyê, rengên ku di nav neteweya kurd de pîroz tînin dîtin, weke rengên ala sehabiyên Cenabê Pêxember nîşan dane. Lewre meriv dikare vê xezanameyê, weke berhemeke klasîk a Edebiyeta Kurd a Îslamî qebûl bike.
9. Hîmê motîfên vê xezanameyê, li ser pişta hespekî mîtolojîk e û têkiliya wî hespî, bi Cenabê Pêxember, Duldul û Hz. Elî re hatiye danîn. Tevî vê yekê, efsaneya çûka “Hehecîkê” jî ciyê xwe di nav lehengên bûyerê de girtiye.

10. Di berhemê de hin yekeyên nezmî bi awayekî zêde mubalexeyî hatine hunandin ku êdî bi rastiya zanista dîroka Îslamê û ilmê Siyera Nebî re li hev nakin û ketine îfratê.
11. Ev xezaname, li ser kevneşopiya helbesta gelêrî hatiye hûnandin. Hem awayê komrêzên wê, hem awayê pergala wê ya qafiyeyê, hem rewşa kêşa wê, hem jî zimanê helbestê, gelek zêde li ser şopa helbesta gelêrî ye. Heta, bi aliyên xwe yên mîna wezn, hejmara rêzikên komên beşan, pergala qafiyeyê û zimanê derbirînê, gelek zêde dişibe Qewlên Êzdiyan jî.
12. Digel pesindariya Hz. Umer û Hz. Elî, ew lehengên navdar ên Îslamî jî hatine medihkirin. Li hember Muslimanên ku dijminatî li hember Hz. Umer dikin, hevgirtin û hevkariya her çar xelîfeyên ewil ên Îslamî derxistiye pêş. Peyama zihniyetî ya vê xezanameyê wisan derketiye pêş ku serlehengiya tekane na; belê serlehengiya komî û hevkariyê nîşan daye. Her çî qas Hz. Umer bi tena serê xwe rabûye ku ji bo dînê Îslamê qehremaniyekê bike jî, nekariye bi serê xwe pêk bîne, heta ku ew sehabiyên mezin û navdar, tîh hawara wî û gişt bi hev re bi ser ketine. Di zihniyeta edebiyata klasîk a Kurdî de ev xal, hêjayî behsê ye.

قوله هسپه رش

مجال او مجال بو کافر دین بطل بو هسپه چی لبا
هسپه دین کورانه بدل مسلمان محمدی علاقه
محمد و نک هلشینه هوس هسپه جلد و زین بستینه
اصحا چاپترن حی نیک و فکرن میر میران چیتیرن
عم این خطابه کشتن داووبیا نه خیره نوآه الخال داووبه
او نو لک صواب هسپه رفیقن دی چیر تو بونیم من جلد و نقین
عمر و دینه عاز خوه فله من ننگه نسته عمر ننگه کایه
زور دیوانی بو و خرنه و هابو عمر ابو خوه لپشتی بیت
چو طله هسپه بچول و چو لسانی لداشتو بیایانی از
کمال شارستانه سوال کورینه لغتی بو میوانه قشی کوی خیره مری پیغیه
قش کورن رفیقن میوانی من بین نای خوه بیغین کونای من عمر کفته نه بذره فاصد
هاتمه اظهارکم سترخو کفتارکم هسپه رش کرایم قش کویوانم بلا بهاضور جلد و
کو خسته برده بیتن ستره بریتن زیر مال و حین کوز عمر صورت شیر برت لارم
ز سر خوه ربورم دهسپه رش تا بوم قش کویوانم ستره بریتن ستره بریتن ستره بریتن
مالم عالی ترا چرم لای ز خور قش یار رش قش بران لنده و وزیر بو پیراوتد پیر بو
هره دیوانا پیر قش کویوانم جوانک بکمال بو آتی ز خطه خال و نای وی لیمو بو
لیمو لیمو قش کویوانم من دانه بقینه هر ز خوه بیغین لیمو لیمو لیمو لیمو لیمو لیمو
میوانم خلاک قش کویوانم بدیوانی ز جوی دیوانا کورانه کافر رش

بقیه

بقیه ۲۹


لاند هو کو میر میوا ز قشته راهانیه و قشته چون همیشه هسی زو کت
 میر کو قشته بر آینه هکی فر کوفنه بکن بکنه و ز منی سکر منه و غول هسی
 لکن بلین کیران چرخین فولازی دین کیر دمو کار ز سر حنا کار بکر هویک
 لاند هو کو میر قط قشانی فاصد ز خوه خانی و قشته مد و رانن عامی درانی
 خلا سلسلانن کو هسی بدتره کوشن جلا میره او خوز خوه عمر میران چو کت
 کیران بز پیشته بدق پین دگشته هسی درانی کوشن چرخوانی خاها او بی
 رفتی وی پینی رفتی ورتینی بنالاد سقینی زیر مال او منی میر کرد کت
 بوان چیران نزم بو روی موروز بو کوهن تیری بلا بیتن اگر دوتین بدلان بکت
 لیدانی لنگ بدتن هرده ز خوه بیتن اگر دی نویر جلا و در حافری دوه کو قشته
 قشته دیولدانش بکنی و عاشن ز دیو اچونه پانن خبر اولادانش
 کوه هوه هوه میر منم فوج کوه هسی خوه فرقه چوبه ناکوه ام شکر ز بو
 عمر کاکت هلینا کت هسی هسی عمر جو کولاف هسی لئوله خانی
 حوشه پانه جولانی عمر چوز دردا پینن خود زردا بور دکا جزا کو بور بر کتلی قو
 نو جوتن بیسو و محمد چاقو بود عمر هسی اینه زده کی کر زنی زده شد اندا طنکوبه
 پستی کت عمره چند سیران دگرینه لیس خورینه لیس سوز دونه عمر سوار کت
 کت وسط و نشکته جلوما به دگته کوران خیندی خونه عمر هسی دامدانی
 یکدی رو صفا خبر کورانی قشته مسلمان لکوان بو هواره ز بر جایانه خا
 مؤ قشته قاله

بقیه ۳۰

13-a

وقتی که ...
عصر موهور که میدان از خود موهور که ...
میدان تشریش که ...
کوران و ...
عمر و ...
دیگر در ...
کوران و ...
علینا ...
دی حله ...
تیبیت ...
تیر ...
حباب ...
عبد ...
شاهی ...
تیسر ...

۱۳
۱۳
۱۳



دِجَلِ حِيَانِ وَ زِدْ كَرِيْمِ
 خَاجِ زِخْوِنِ حِيَكْرِ
 عَوْرَةِ كِي رِشِي طَارِي
 بَارَانِكِ زِي دِبَارِي
 بُو صَوْنِدَا عَلِي وَ عَمْرِي
 شَهِيدِيْدِ حُنَيْنِ وَ بَدْرِي

عَلِي حَرِيْرِي زِي صَوْتِي
 عَمْرُو كَلِ اصْحَابَاتِ
 وَ اَنْ كَا فِرَانِ دِي زِدَانْدِ
 پَسَنْتِ بَرِي مَه وَ زِ كَرَانْدِ
 خَاجِ وَ پِي كَرِ دِدِ سْتَانْدِ
 عَلِي كَا فِرِ دِي تَرِيْنِ

قد تمت كتابة هذه المنظومة المنيفة المفيدة على يد زين العابدين الأمدى
 في تاريخ: ۲- جمادى الآخرة ۱۴۲۳ هجرى. و ۱۱- أغسطس ۲۰۰۲ ميلادى

وصلّى الله على سيّدنا محمّد وعلى آله وأصحابه

الطيبين الطاهرين أجمعين.

أميت
 ۲۲
 ۲

DÊRA ZERCEL / Menastira Kiryakus (Navbera Batman û Bişêriyê)



ÇAVKANÎ

- Adak, Abdurrahman, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Weş. Nûbihar, 2013
- Adat û Rusûmatnameê Ekradiye Mela Mehmûdê Bayezîdî, Lêkolîn: Jan Dost, Weşanên Nûbihar, Stenbul, 2010
- Amedî, Zeynelabîdîn, Menzûmetan, Cem'eha Zeynelabîdîn Amedî, Weş. Diyarbekir Soz, Diyarbekir, 2004
- Aras, Ahmet, Kerr û Kulîk, Mitolojiya Kurdi da Destanek, Fırat Yayınları, İstanbul, 1993
- Aras, Ahmet, Şairê Kurda yê Efsanevi Evdalê Zeynikê, Weşanên Deng, İstanbul, 1996
- Aras, Yusuf, Türk Edebiyatı, Esen Yayınları, Ankara, 2012
- Aslan, Şêxmûs, Ferhenga Gotinê Pêşiyar, Sözü Gazetecilik, Amed, 2006
- Azîzan, Herekol "Klasîkên Me – An Şahir û Edîbên Me ên Kevin", *Hawar*, j. 33., Çiriya Pêşîn, 1941, r. 8. (Çapa Nûdemê)
- Banarlı, Nihad Sami, Resimli Türk Edebiyatı Tarihi, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 2001
- Batman İli Sosyo-Ekonomik Profili, Komsiyon, Batman Ticaret ve Sanayi Odası Yayını, Batman, 2011
- Bolayir, Fethi, Edebiyat ve Kompozisyon Bilgileri, Güven Yayıncılık, Ankara, 1988
- Casimê Celîl & Emerê Celalî, Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrîn, Nûbihar, Stenbol, 2011
- Cemîl, D. Mesûd, Qonaxên Kêşnasiya Hozana Kurdî, Pertûkxaneyê Bedirxaniyan, Dihok, 2014
- Ciwan, Murad, Ahmedê Xanî Jiyan Berhem û Bîr û Baweriyên Wî, Weşanên Doz, Stenbol, 1997
- Çîrokên Gelêrî û Destana Şemikê Bêdiran, (Berhevkar: İ. İşler), Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 1998
- Develioğlu, Ferit, Osmanlıca-Türkçe Lûgat, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 2012
- Dîwana Camî', Berhevkar: Mela Ehmed Hilmî Qoxî ed-Diyarbekirî, İhsan Yayınları, İstanbul,
- Dîwanê Melan, Mihemed Emîn Osman, Emîndariya Giştî ya Rewşenbîrî û Lawan, Hewlêr, 1977

Diyarbakır'ın Fethi, Tarihi ve Kültürü, (Hazırlayan: Zeynel Abidin Çiçek), Diyarbakır Söz, Diyarbakır, 2007

Doskî, Tehsîn İbrahîm, el-Medxel î Dîrasetî'l Edebi'l Kurdî elû Mudewwin, Billheçetîş- Şîmalîyetî, El Cuzî'l Ewwel, Min Menşûrati Cemiyetî 'Ulemai Kurdistan, m. 1993; h. 1413.

El Botî, Muhammed Se'îd Remezan, Fiqhu's-Sîreti'n-Nebewiyye Me'e Mûcizi li Tarîx'il-Xilafeti er-Raşideti, Dar'ul-Fikr'il-Mu 'asir, Beyrût, 1991

El Meqdisî, Yusûf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî, El Hediyetu'l Hemîdiyyeti Fî'l Luxeti'l Kurdiyyeti, (tehqîq: El Ustaz Ed Doktor Muḥemmed Mukrî) Weş. Mektebetu Diyarbekir, 2011

Enwerî, Hesên, Ferhengî Foşordeyê Soxen, Intişaratê Soxen, 1382, Tehran

er-Rûdanî, İmam Muhammed bin Muhammed bin Suleyman, Cem'ul Fewaîd min Camî'ul Usûl we Mecma'iz-Zewaid, (Büyük Hadis Külliyyatı, Tercüme: Naim Erdoğan) İz Yayıncılık, İstanbul, 2012

“et-Ṭeberî, Tefsîru Ṭeberî, Teqrîb we Tezhîb, Li İmami'l Mufessirîn we'l Muexxirîn Ebî Ce'fer Muhammed bin Cerîr, ed- Diktor Selah Ebdu'l - Fettaḥ, el – Xaldî, Daru'l Beşîr, Cidde, 1997

Erkan, Mustafa, Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi, İstanbul, 1996

Fuad, Dr. Kemal, “Bang Heq”, *Bîr*, j. 1, İstanbul, 2005

Hellaq, Muhammed Subḥî bin Ḥesen, eş-Şamilu'l Muyesser Fî Fiqh'il Kitabî wes-Sunnetî, Dar'ul İbad'ir-Rehman, Qahire, 2011

Hizmetli, Sabri, İslam Tarihçiliği Üzerine, Diyanet İşl. Başk. Yayını, Ankara, 1991

Izady, Mehrdad, Bir El Kitabı, Kürtler, (İngilizceden Çeviri: Cemal Atila) Doz Yayıncılık, İstanbul, 2007

Mehmûd Mela İzzet, “Desketinî Komarî Kurdistan”, *Bîr*, Stenbol, 2006

Karaman, Hayreddin, İslam'da Kadın ve Aile, Ensar Neşriyat, Tic. A.Ş., İstanul, 2010

Kevirbirî, Salihê, Bir Çığlığın Yüzyılı Karapetê Xaço, Sî Yayınları, İstanbul, 2002

Komsiyon, Batman İli Sosyo-Ekonomik Profili, Weş. Batman Ticaret ve Sanayi Odası, Batman, 2011

Köksal, Fatih, “Metin Neşrinin Ana Esasları”, *Tubar*, XXXI-/2012, dergipark.ulakbim.gov.tr/article/dowland/.../5000067377

Kur'an Yolu, Türkçe Meal ve Tefsir, Heyet, Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, cild IV, Ankara, 2008

Kurdistanî, Elî Ekber, Ferhengê Kurdistanî, (Weger: Jan Dost) Weşanxaneya Nûbihar, İstanbul, 2010

Mewdûdî, Ebu'l 'E'la Tefhîmu'l Qur'an, Kur'an'ın Anlamı ve Tefsiri, (Tercüme: Kurul) İnsan Yayınları, İstanbul

Newbehar, lîl 'Alîmî Fadilî wed-Derkî'l Kamilî, eş-Şeyx Ehmed el-Xanî, Nur Kitabevi, Diyarbakir

Nursî, Said, Mektubat, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 1998

Meretowar, Ayhan, Hunera Axaftina Xweş û Nivîsandina Rind, Enstîtuya Zimanê Kurdî ya Amedê, İstanbul, 2005

Öztürkmen, Arzu, Türkiye'de Folklor ve Milliyetçilik, İletişim Yayınları, İstanbul, 2009

Qedrî, Mamoste, “Dîroka Zimanê Kurdî yê Nivîskî û Perwerdehiya di Konsepta Medreseyê de” 3'yemîn Rojên Wêjeyê Li Diyarbekirê, Konferansa Zimanê Kurdî, Weş. Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, Stenbol, 2005

Qewlê Newala Sîsebanê, (Amadekar: Ahmet Demir), Weşanxaneya Nûbihar, İstanbul, 2012

Reşîd, Tosinê Êzdayetî Oleke Hê Jî Nenaskirî, Weşananên Lîs, Stenbol, 2007

Riza, Muhammed Muhammed Resûlellahu 'Eleyhî Wesellem, El Mektebetu'l İslamiyyetî, Qahire, 1996

Sadinî, M. Xalid, Feqiyê Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên Wî, Weşanxaneya Nûbiharê, Stenbol, 2011

- Sarı, Mevlüt, Qamüs-u Türki ‘Erebi, El – Mewarid, Gonca Yayınevi, İstanbul, 1991
- Sarıçam, İbrahim, Hz. Muhammed ve Evrensel Mesajı, Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, Ankara, 2002
- Serin, Muhittin, “Hat Sanatı”, *İslam Sanatları Tarihi*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Ünite 4, Eskişehir, 2013
- Tefsîra Şîrîn, Mela Muhammedê Kurê Mela Yehya Nîvelî, Çapxana Diyarbekir Soz, Diyarbekir, 1995
- Temo, Selim, Kürt Şiiri Antoojisi, c. 2, Agora Kitaplığı, İstanbul, 2007
- Türk İslam Edebiyatı, (Hazırlayanlar: Heyet; Ali Öztürk, 9. Ünite “Dini Tür ve Konular) T.C. Anadolu Üniversitesi Yayını, Ankara, 2013
- Xanî, Ehmedê, Mem û Zîn, (Amadekar: Huseyn Şemrexî) Nûbihar, Stenbol, 2010
- Xaznedar, Prof. Dr. Maruf, (Werger, Mîkaîl Canpolat), “Zembîlfroşa Feqiyê Teyran”, *War*, j. 4, İstanbul, 1998
- Xoşnaw, “Mehdî, Stenbul, Edebiyata Kurdî Le Başûrî Kurdistan”, Yekemîn Rojên Edebiyatê Li Diyarbekirê, Wş. Enst. Kurdî ya Stenbulê, 2003
- Xweşmêr, “Elî Herîrî,” *Nûpelda*, Wan, 2010, j. 3
- Varlı, Ebdullah M. Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn, Weşanxaneyê Sîpan, Stenbol, 2004
- Weledebegî, Behram, “Edebiyatî Kurdî Le Îran”, Yekemîn Rojên Edebiyatê Li Diyarbekirê, Wş. Enst. Kurdî ya Stenbulê, Stenbul, 2003
- Wöhlecke, Manfred, Troya Savaşı, İlya İzmir Yayınevi, Çev: Ali Erbak, İzmir, 2009
- Yazır, Elmalılı Hamdi, Hak Dini Kur’an Dili, Emir Yayınevi, İstanbul, 2000
- Yeğin, Abdullah, İslamî - İlmî - Edebî – Felsefî Lûgat, Yeni Asya Yayınları, İstanbul, 1975
- Yıldırım, Kadri, Nûbehara Biçûkan, Ehmedê Xanî Külliyyatı, Avesta, İstanbul, 2008

Yıldırım, Kadri, Ehmedê Xanî Külliyyatı, II, ‘Eqîdeya İmanê/İnanç Risalesi, Analiz ve Şerh, Avesta Yayınları, İstanbul, 2008

ÇAVKANIYÊN LI SER INTERNETÊ

Atalan, Mehmet, “Anadolu’da Cenknamelerin Toplumsal Yansımaları”, *Kelam Araştırmaları*, [http://www.Fille://c:/Users/Aktif/Downloads/167-537-1-PB%20\(3\).pdf](http://www.Fille://c:/Users/Aktif/Downloads/167-537-1-PB%20(3).pdf)

Mehmûd Seîd, “El-Xezawati’l Muhammediyyeti Fî’ş-ş’ri’l ‘Erebiyyi’l Qedîm”, Alwaei.com., <http://www./site/index.pdp?clD=1189>

Mercan, İsmail Hakkı, “Türk Tarihinin Kaynaklarından Olan Bazı Menakıbnâme ve Gazavatnameler Hakkında” *Sosyal Bilimler Dergisi*, <http://www.sbe.balikesir.edu.tr/dergi/edergi/c6s10/makale/c6s10m7.pdf> (22.10.2015)

Pehlivan, Gurol, “Varna Savaşı, Gazavatnameler”, *Turkoloji*. http://www.turkoloji.cu.edu.tr/GENEL/gurol_pehlivan_varna-savas_i_gazavatnameler.pdf(22.10.2015)

Gümüşkılıç, Mehmet, “Cumhur-name’de Hz. Ali’nin Özellikleri”, *Uluslar arası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, http://www.sosyalarastirmalar.com/cilt6/cilt6sayi24_pdf/gumuşkılıc_mehmet.pdf (22.10.2015)

Şamil, Şahin Kürşat, “Gazavatnameler Üzerine Yapılan Çalışmalar Hakkında Bir Bibliyografya Denemesi”, *Tukish Studies*, http://www.turkishstudies.net/Makaleler/1340573858_63_şahinkürşatşamil_997-1022.pdf (01.09.2015)

KESÊN KU ME JI WAN ISTÎFADE KIRINE

Abdullah ÇAKIR (55) Gundê Herîvê, li ser navçeya Pasûr/Kulp a Diyarbekirê

Ali YILDIZ (63) Gundê Holê/Taşlîdere ya navçeya Hezo/Kozluk ya Batmanê

Mehmet EROL (75) Gundê Holê/Taşlîdere ya navçeya Hezo/Kozluk ya Batmanê

Mehmed Nuri ASLAN (65) Gundê Kotekan ê navçeya Erxenyê/Diyarbekir



TC
Mardin Artuklu Üniversitesi
Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

QEWLÊ HESPÊ REŞ
(İnceleme-Metin)

Ayhan YILDIZ
12711018

Danışman
Yar. Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mardin 2015